



# PERİŞANNAMƏ

Mela Perışanê Dînewerî



*Shahab Vali  
Erol Şaybak*





PERİŞANNAME

SHAHAB VALİ & EROL ŞAYBAK

**avesta | MAGNA CARDUCIA: 838 | 38**

**Perîşanname**

**Mela Perîşanê Dînewerî**

Shahab Vali & Erol Şaybak

**Berpîrsê Giştî:** Abdullah Keskin

**Editor:** Alan Osman

**Berg:** Şener Ozmen

**Mîzanpaj:** Şîyar Danışman

**Çapa Yekem:** 2023, Stembol

**Jimar:** 1000 heb

**Çap:** Berdan Matbaası

Sadık Daşdögen Davutpaşa Cad.

Güven San. Sit. C Blok, No: 239

TOPKAPI / İSTANBUL

Tel: (0212) 613 12 11

© Shahab Vali & Erol Şaybak - Avesta, 2023

Jî xeynî danaşinê bêyi destûra wergêr û weşanxaneyê  
bi ti awayî nayê zêdekirin.

Sertifika no: 46902

**AVESTA BASIN YAYIN**

**REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.**

Şehit Muhtar Mahallesi Basma Tulumba Sokak No: 5

BEYOĞLU / İSTANBUL

Tel: (0212) 251 44 80

[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)

[avestayayinlari@yahoo.com](mailto:avestayayinlari@yahoo.com)

<https://twitter.com/avestayayin>

<https://instagram.com/avestayayin>

<http://www.youtube.com/avesta1995>

<http://www.facebook.com/wesanenavesta>

**ISBN: 978-625-8383-49-2**

PERİŞANNAME

MELA PERİŞANÊ DÎNEWERÎ

SHAHAB VALİ & EROL ŞAYBAK

**SHAHAB VALI** - (1973 ûrû) Perwerdahiya xwe ya lisansê li Tehranê, li ser dîroka ol û tesewûfê kiriye. Lîsansa bilind (2003) li Unîversiteya Jean Moulin-Lyon li Langues et Identités Culturelles (Ziman û Nasnameyên Kultûri), doktora ji (2008) li EPHE-Sorbonne Parisê li beşa Religions et Systèmes de Pensée (OI û Sistemên Hizîri) li ser birûbawerîyên kurdên Yarsan kiriye. Salên 2008-2012an li Tehranê li Institute for Research in Philosophy xebitî û li Unîversiteya Be-heshti dersên mîtolojî û tarîxa tesewûfê dan, Ji sala 2013an ve li Unîversiteya Mardin Artukluyê kar dike. Li ser dîrok û sîstemên hizîri yên kurdan bi kurdî, fransî, farîstî û tirkî kitêb û gotarêñ wî hene.

**EROL ŞAYBAK**: Sala 1987ê li Miksa Wanê hatiye dînyayê. Lisans û mastera xwe li Zankoya Artuk-luya Mêrdinê di beşa kurdî da temam kiriye. Bi navê "Şaneşin" (Bawer Ronâhi), "Xewndank" û "Eşîra Birûkiyan Çawa Keçen Izmîri Direvînin" sê pirtükên wî yên kurteçirokan hatine weşandin. Li Amedê mamostetiya kurdî dike.

## **naverok**

### **Pêşgotin / 9**

### **DESTPÊK / 13**

#### **BEŞA YEKEM**

##### **Paşxaneya Dîrokî / 17**

- Derbarê Mela Perîşanê Dînewerî Da / 17  
Şêx Recebê Bursî û Mela Perîşan / 21  
Mela Perîşan û İddiaya Hûrûftûna Wî / 26  
Mela Perîşan û 'Ilm-i Hûrûf / 31  
Şopên Şî'iyyî di Perîşannameyê Da / 39  
Mezheba Cafer / 41  
Şahê Welayetê 'Eli, Çardeh Me'sûm û Hz. Mehdi / 44  
Xedîr-i Xumm / 46  
Seqîfe-i Benî Sa'ide û Wesiyyeta Pêxember / 49  
Meseleya Baxçeyê Fedek / 51

#### **BEŞA DUYEM**

##### **Li Ser Perîşannameyê / 53**

- Nusxeyên Berdest yên Perîşannameyê / 53  
Nusxeya Berînâ / 54  
Ziman û Lehce / 55  
Kêş û Serwa / 57  
Teşe/Cureya Metnê / 57  
Analîza Naverokî û Tesnîfa Berhemê / 59  
Muqeddîme: Pendnameyek Li Ser Afrandina Gerdûnê û Meqamê Însan / 60  
Bab-i Evvel: Meqtel-i Huseyn û Zêmarek Ji Bo Kerbelayê / 65  
Bab-i Dovvom: Saqîname / 67  
Bab-i Sevvom: Şerî'et, Terîqet, Heqîqet û Me'rîfet / 69  
Bab-i Çeharom: Nav û Sifetên Xwedê Te'ala / 71  
Bab-i Pencom: İtirafnameyek Ji Bo Gunehên Giran / 73  
Bab-i Şeşom: Şefa'etxwazî Ji Xwedê, Pêxember û Şahê Welayetê / 75  
Bab-i Heftom: Rexneyeka Tund Li Ebû Bekir Siddîq û 'Umer bin Xettab / 76  
Xatime: Bexşxwazî Ji Bo Roja Mehşerê / 79

#### **BEŞA SÊYEM**


##### **Transkripsiyyona Berhemê / 81**

- Rêbaza Transkripsiyonê / 81  
Transkripsiyyona Perîşannameyê / 82

### **ENCAM / 195**

### **ÇAVKANÎ / 197**

### **FERHENG / 205**



(EDEBİYAT)

## KURTEBÊJE

- amd. : Amadekar  
b. : Beyt  
b. t. : Bê tarîx  
bnr. : Binêrin  
c. : Cild  
ç. : Çap  
dnd. : Di nav da  
ed. : Edîtor  
h. b. : Heman berhem  
h. : Hicrî  
h. q. : Hicrî qemerî  
h. ş. : Hicrî şemsî  
hej. : Hejmar  
hwd. : Her wekî dî  
hz. : Hezretê  
m. : Mîladî  
r. : Rûpel  
ss. : Sedsal  
wer. : Wergêr  
wrq. : Werek

## Pêşgotin

Heke niştimanê Kurdan, coxrafyaya wan a ji Çiyayêن Zagrosê dest pê dike û heta Deşta Mezopotamyayê dirêj dibe, wekî xezîneya "baweriyan" bê binavkirin, ji layê tarîxî ve ev dê ne angaşteke şas be. Gelek sedemên cuda ên hebûna plurâlîzma dînî û baweriyan hene li vê herêmê ku hêjayî niqaş û behskirinê ne.

Li gorî vegotina tarîxî ya klasîk, herêma navborî, ku niştimanê Kurdan e, ji demên qedîm ên tarîxê û vir ve, ji ber rewşa xwe ya taybet a stratejîk, hertim rastî gelek liv û tevgerên koçberî û êrîşen xelkên cuda hatiye. Helbet ev hemû faktor bûne sedema derketina gelek taybetmendiyên civakî, siyasi, aborî û çandî û hin caran jî pir-sigrêka berdewam di jiyana vê herêmê û gelê(n) ku li ser dijîn. Lîbelê dikare bê gotin ku ji bo gelên herêma navborî, pir-bawerîbûna wê di rîza pêşî ya van taybetiyan tê.

Li gorî daneyên tarîxî yên berdest, di serdema beriya Îslamê de, piştî baweriyan ku di warê Tarîxa Dînan de wekî "Dînên seretayî" têن binavkirin, baweriya Mîhrî/Mîtrayî, baweriya Anahîta, wekî xwedavenda Avê, Behdînî ku bi şâsi wekî Zerdeşî meşhûr bûye, Xirîstîyanî, Dînê Manî û Dînê Mezdek di nav xelkên herêma navborî de belav bûne.

Wekî tê zanîn bi hilweşîna Împaratoriya Sasaniyan (651) re herêma Zagrosê, ku wargeha sereke ya Kurdan bû, kete destê Erebê Misilman. Lê berevajî nêrîna fermî, ji bo belavbûn û qebûlkirina vî dînê nû di nav Kurdan de, çend sedsal lazim bûn.

Ji ber vê yekê jî serhildanên dînî-civakî yên li dijî vî dînê nû li hin deverên Zagrosê heta sedsala çaran a hicrî (ua zayînî) berdewam kir û pêvajoya îslamîbûna piraniya Kurdan li hin herêmên Kurdan, di sedsalên 7-8/ 14-15an de pêk hat.

Lê hemû Kurdan ev dînê nû qebûl nekirin û baweriyêن xwe yên berê di bin nav û şêwazên cuda de zindî hiştin. Di encama vê berxwedanê de sîstemên baweriya Yarsan û Ezidî derketin holê. Di heman demê de Kurdêن ku dînê Îslamê qebûl kirine û bûne misilman jî, di bin maskeyêن cuda de gelek baweriyêن xwe yên berê adapteyi dînê xwe yê nû kirine û parastine.

Dîsa, dikare bê dîtin ku di nav wan Kurdan de yên ku Îslam wekî dînê xwe qebûl kirin û bûne misilman jî, plûralîzma ku li jorê hat behskirin dîsa dewam kiriye, ya ku jî girîngtirîn taybetmendiyêن çandî yên civaka Kurdan e. Şaxêن sereke yên Îslamê, Sunnîti û Şîti, mezhebêن wan ên cuda yên wekî Şafîti, Henefîti, Dozdeh Îmamî, Elewîti û terîqetêن tesewufî yên wekî Qadirî, Neqşîbenditî, Nîmetullahîti û Xaksarî iro jî di nav Kurdan de berbelav in.

Berevajî nêrîna fermî, hemû Kurd ne Sunnî ne. Li gorî çavkanîyen tarîxî, pejirandin û belavbûna Şîtiyê di nav Kurdan de hêrî kêm bi qasî Sunnîtiyê kevn e û di sedsala 1ê hicrî de dest pê dike. Lewma, di edebiyata Şî de navê gelek kesayetên Kurd jî derbas dibe û gelek berhem jî bi destê wan hatine nivîsîn.

Di nav Kurdan de Şîti, ji xeynî Kurdêن Şî yên herêma Xorasanê û Kurdêن Elewî yên Bakûr, bi piranî li derdor an li ser rêya du bajarêن girîng ên ziyareta Şîiyêن Duwazdeh Îmamî, yanî Necef û Kerbelayê ne, ku gorêن îmamê yekem Hz. Elî, û îmama sêyem Îmam Huseyn, yên baweriya Şî'a, li wir in.

Yek jî girîngtirîn berhemêن ku ji aliye 'alimêن Kurd ên Şî'a ve, hatiye nivîsîn bêguman Perîşannameya Mela Perîşanê Dînewerî ye.

Lêkolîna berfiref a li ser berhemê nîşane me dide ku Mela Perîşanê Dînewerî ku di sedsalal Nehem a hicrî de jiyaye û xwedî leqeba

“Şêxul Îslam” bûye, berî her tiştî ‘alîmeke Kurd ê Şî'a ye û xwedî zanîneke kûr e li ser Quran, hedîs û tarîxa Îslamê. Di heman demê de şâ'irekî bêhemta ye ku hest û baweriyêن xwe bi helbestê anîne ziman.

Wekî ku tê zanîn di edebiyata Îslamî de gelek berhem ji aliyê ‘alîmên Kurd ve, li ser ilmên îtiqad, tefsîr, hedîs û kelamê hatine nivîsîn. Berhemên navborî (ji xeynî edebiyata tesewwufî) bi piranî bi zimanê ‘Erebî, ku wekî zimanê pîroz/dînî/îlmî yê baweriya Îslamê tê qebûlkirin, hatine nivîsîn.

Ji ber ku Mela Perîşanê Dînewerî bi zêdetirî sed ayetên Quranê, bi dehan hedîsan girîngtirîn mijarêن kelamî bi Kurdî nivîsandine, bi taybetî di warê lêkolînêن Kurdî de xwediyyê aliyekî pir girîng e.

Ji xeynî vê, Mela Perîşan û *Perîşanname* di warê lêkolînêن Şî'a de jî xwedî girîngiyeke bingehîn in. Ji ber ku Mela Perîşan bi xwe jî di *Perîşannameyê* de dibêje, ew bi tenê şagirtê ‘alîmê navdar ê Şî'a Şêx Recebê Bursî ye ku di lêkolînêن Şî'a de hatiye tespîtkirin.

*Perîşannameyâ* Mela Perîşanê Dînewerî, ku xwedî gelek destni-vîsîn cuda ye, dikare ji aliyêن cuda ve bê nirxandin. Beriya her tiştî *Perîşanname* yek ji kevintirîn berhemên Kurdî ye. Ji ber vê sedemê, ji bo tarîxa edebiyata Kurdan, ku ji ber sedemêن cuda pir dereng derbasî edebiyata nivîskî bûye an jî gelek berhemên xwe winda kirine, metneke sereke ye. Dîsa berevajî gelek berhemên Kurdî, tarîxa nivîsandin û serdema ku şair/nivîskar tê de jiyye, eşkere ye û tê zanîn.

Mela Perîşan berhema xwe di sedsala 9a hicrî de, li derveyî çerçoveya patronajê û bêyî ku pêşkêşî kesekî bike, di çarçoveya helbesta Pehlewiyatê de, ku şewazeke helbestî ya beriya Îslamê ye û taybetmendiya edebiyata herêma Zagros e, bi awayê masnewiyê nivîsiye. Di vî warî de dikare bê gotin ku *Perîşanname* kevintirîn mesnewiya Kurdî ye ku heta niha hatiye tespîtkirin.

Lê tevî van hemû xalêن girîng jî, tê dîtin ku di lêkolînêن li ser tarîxa edebiyata kurdî de, tenê çend agahiyêن giştî li ser vê berhemê û şairê wê hatine dayîn û heta niha ev berhem bi awayekî kûr û akademîk nehatiye lêkolînkirin û nusxeyeke kamil a berhemê nehatiye weşandin.

Armanca sereke ya berhema li ber dest, berî her tiştî pêşkêşki-rina nusxeyeke kamil a *Perîşannameyê* û nasandina hizir û ramana nivîskarê wê, yanî Mela Perîşan e ji bo xwendevanên Kurd û mëreqdarên kurdî û edebiyata wê, û vekirina derwazeyekî nû ye ji bo lêkolînên edebiyata Kurdî.

Di vê çarçoveyê de me hewl daye ku serdema ku şair tê de jiyaye, şîroveyên li ser ramanên wî, têkiliyên wî yên bi mamosneyê xwe re û mijarên ku di berhema xwe de behsa wan kiriye, bi bikaranîna daneyên ji çavkaniyên dînî û tarîxî yên Kurdî, Erebî, Farisî, Tirkî, Fransî û Îngilîzî bêñ zelalkirin. Peyv/têgînên ku di beytên cuda yên berhemê de hatine bikaranîn yek bi yek hatin lêkolînkirin û çavkanîyen wan ên Qur'anî û hedîsî hatine diyarkirin.

Helbet, wekî hemû xebatên akademik, di vê lêkolînê de jî gelek kîmasî hene. Lê wekî me berê jî behs lê kir, hebûna metneke kamil a *Perîşannameyê* di destê lêkolîneran de dikare di xebatên Kurdî de qadêن nû veke û bi demê re bibe sedema sererastkirin û berte-refkirina kîmasiyêñ muhtemel ên xebata hazır ji aliyê lêkolînerên din ve.

Spasiyên bêdawî ji bo Kak Abdullah Keskin û Weşanxaneyâ Avesta, ku bûn alîkar ku yekem car metna kamil û latînîzekîrî ya *Perîşannameyê* bigihîje xwendevanên kurd.

**Shahab Vali & Erol Şaybak**  
Mêrdîn/Amed 2023

## DESTPÊK

Mezheb, di tarîxa dîn û baweriyan da wekî ciyawaziyêن nav-dînî, ango wekî hîzr û bîrên cuda derketine meydanê û di nav dîsiplîna dînnasiyê da fenomeneka zêde berbelav e. Helbet dînê Islamê jî, ji vê qâideya cudabûnên bîr û baweriyêن nav-dînî, ne bêrî ye. ‘Alimên Islamê gelek caran amaje pê kirine, di dîrokê da cudahiya yekem a hîzrî, sala h. 11ê piştî wefata Muhemed Pêxember derketiye holê. Li gor çavkaniyêن dîroka Islamê, di gel wefata pêxember, misilman ketine nav telaşa hilbijartina imam/xelîfeyekî nû. Giregirêن cema’eta bawermendan li cihekî bi navê Seqîfe-i Benî Sa’ide civiyane, piştî nîqaşen dirêj, Ebû Bekir wek xelîfeyê yekem hatiye hilbijartin. Ji bo qebîleyên ‘ereb ên misilman, meseleyeka pir muhîm e ka divê kî wek xelîfe bête tayînkirin, lewma jî li ser vî postê yekta, reqabete tek dest pê dike. Ev reqabeta giregirêن qebîleyêن ‘ereb, wextê defin-kirina Muhemed Pêxember zelal û eşkere dibe, ji ber ku tenê pis-mam û zavayê wî ‘Elî û çend kesên dî ji ehlê beytê cenazeyê pêxember dişon, defin dikin û misilmanên dî, di definkirinê da cih nagrin.

Piştî ku Ebû Bekir wek “xelîfe” tê hilbijartin, malbata pêxember û hin sehabeyêن nêzîkî wan, xelîfetiya wî qebûl nakin û ev bûyer di dîroka dînê Islamê da wek yekem ciyawaziya nav-dînî ango ser-

sebebê derketina mezheba şı'a tê qebûlkirin. Kesên ku Ebû Bekir wek xelîfe nabînin, bî'etî wî nakin û piştî demekê jî wek "Elewî" an jî "Şî'ayê 'Elî" (alîgirêن 'Elî) tê binavkirin, sersebebê vê qebûl-nekirinê, xutbeya pêxember a li Xedîr-î Xumm nîşan didin ku li gor riwayetan pêxember li wê derê xîtabî hemû misilmanan dike û beriya wefata xwe xelîfeyekî li şûna xwe tayîn dike. Sehabeyên ku bî'etî Ebû Bekir nakin, wisa bawer dikin ku jîxwe pêxember di vê xutbeyê da bi awayekî eşkere gotiye; "Piştî min 'Elî mewlayê hemû misilmanan e" û 'Elî bin Ebû Talib wek xelîfe li şûna xwe tayîn kiriye. Ji ber ku li gor baweriya vê girseyê, çawa "pêxember" jî bo wezîfeya pîroz a pêxembertiyyê rasterast ji aliyê Xwedê ve hatibe hilbijartin, xelîfeyê piştî wî jî divê ji aliyê pêxember û Xwedê ve bihête tayînkirin. Ji ber ku di baweriya mezheba şı'a da, xelîfetî meqamekî pîroz û ruhanî ye, tenê bi terma "îmamet"ê ev meqam wateya xwe ya rastîn dibîne. Pêxember, di hizra mezheba şı'a da rasterast ji aliyê Xwedê ve tê hilbijartin, paşê îmamê piştî xwe destnîşan dike ku dê pêşengiya ummetê bike û ew îmam jî di saxiya xwe da îmamê piştî xwe tayîn dike.

JiNEYNî vê meseleya derheq baweriyyê da ku mijara 'ilmê kelamê ye, her çar îmamên ku misilmanên sunnî baweriyyê pê tînin û wek xelîfe qebûl dikin (Ebû Bekir Siddiq, Umer bin Xetta, Osman bin Affan û 'Elî bin Ebû Talib), bi çar usûlêن cuda wek xelîfe hatine hilbijartin, lewma jî ev awayê hilbijartinê ji aliyê mezheba şı'a ve her û her hatiye rexnekirin. Ji ber ku li ser hilbijartina xelîfe, usûl û doktrîneka hevpar nîne. Dewra xelîfetiya Ebû Bekir, bi şerê li hember "ehl-î redde" (yên ji dîn derketî) derbas bûye û her sê xelîfeyen piştî wî jî, bi destê misilmanan hatine kuştin. Herwiha sala h. 616 jî heftê û du kesên ji ehlê beyta pêxember, li Kerbelayê rastî komkujiyekê hatine. Li gor misilmanen şı'i, sersebebê van hemû şer û pevçûnen nav-dînî, ev usûlê nediyar ê xelîfetiyyê û "hilbijartina dinyewî" ye.

Ferq û cudahiyêن mezhebi yên Islamê, wek sunnî û şı'i, piştî qebûlkirina dînê Islamê, di nav miletê kurd da jî rû daye. Tevî ku di çavkaniyêن dîrokî da misilmanbûn/misilmankirina kurdan, di serê yekem sedsala hicrî da dest pê kiribe jî, herdu mezhebên sereke di nav kurdan da başebaş belav bûne û tê zanîn ku herdu mezheb jî,

ji aliyê girseyên kurd ve hatine pejirandin. Her çend tê qebûlkirin ku di serdema pêxember da, sehabeyê bi navê Cabanê Kurd yekem kurdê misilman e, li piraniya ‘erdnîgariya Kurdistanê bi awayekî girseyî misilmanbûna kurdan, piştî têkçûna Împaratoriya Sasaniyan dest pê dike.

Li gor berhemên dîroknasên İslâmê yên wekî Teberî, Belazûrî û Îbn Esîr, pêşî şerê Qadisiyye di navbera misilman û Sasaniyan da sala hicrî 15ê qewimiye, paşê şerê Tîsfûn sala 16ê û eynî salê dîsa şerê Celûla, bûye sersebebê têkçûna bajarê Medâînê paytext, piştre jî împaratoriya Sasaniyan hilweşiyaye. Kurdên ku piranî li ser sînorêni împaratoriye binecîh bûne, carna bi şer carna jî bi bac û xeracê, ketine bin hukmê misilmanan. Lîbelê misilmanbûna kurdan bi temamî, heta destpêka sedsala 4ê hicrî didome. Rasthatina mezheba şî'a di gel miletê kurd jî dîsa di sedsala ewil a berbelavbûna İslâmê da pêk hatiye. Li ser vê mijarê, dîskura herî kevn ‘aydê ‘eşîra Zengene ye ku roja iro di nav sînorêni Îranê da niştecih in. Zengeneyêni li herêma Kirmanşahê dijîn, îddia dikin ku cenazeyêni şehîdên Kerbelayê ji aliyê bab û kalêwan ve hatine definkirin lêbelê piştrastkirina vê îddiayê bi delîlên musbet, ne pêkan e.

Li gor çavkaniyêni tarîxa İslâmê, Muxtar bin Ebû Ubeyd Seqefî ji bo tolhildana şehîdên Kerbelayê serî hilhide. Sala hicrî 67ê serhil-dana wî tê serqutkirin û Muxtarê Seqefî tê kuştin. Kesêni ji neseba ‘Elî û gelek alîgirêni wî yên şî'i, bi mebesta dûrketina ji zilma hukumdarêni Emewî, dest bi koçê dikin berev rojava û ‘erdêni navendî yên Îranê. Vê koçê di sedsala duyem a hicrî da û piştî wê serdemê jî her berdewam kiriye. Girseyêni koçber ku ji bajarê Kufeyê bi rê ketine ber bi rojava û navenda Îranê ve çûne, neçar mane ji nav ‘erdêni kurdnişîn derbas bibin. Koçberêni şî'i, piranî ji bajarêni kurdan ên wekî Mendelî, Xaniqîn, Ser Polê Zehab, Dînewer, Kengawer û Nehawend dibûrin, bi vî awayî niştecihêni kurd ên van bajaran, baweriya şî'a nas dikin.

Navê gelek kurdan di çavkaniyêni hedîsêni şî'a da cih digrin ku nexasim di sedsala duyem a hicrî da wekî sehabeyêni imamêni şî'a hatine zikirkirin. Ji wan sehabeyan behsa Huseyn û Hesen Rawendî Dînewerî tê kirin ku wekî sehabeyêni imamê heştem Elî el-Riza (h.

203) hatine naskirin. Herwiha, îmamê nehem Muhemmed Teqî (h. 220) ji bo herêma Kirmanşahê, xaseten ji bo bajarê Dînewerê nûne-rekî taybet tayîn kiriye, ji ber zêdehiya hejmara bawermendên şî'a. Dîsa çavkaniyêن tarîxa mezheba şî'a behs dikin ku îmamê dehem Elî bin Muhemmed (h. 254) kurdekî bi navê Elî bin Ubeydullah Dînewerî, welî nûnerê Dînewerê tayîn kiriye û ev sehabê bi nasnavê Cebeli (Zagrosî) hatiye naskirin. Ji xeynî van, di dewra îmamê yanz-dehem Hesen el-Eskerî da (h. 260) navê sehabeyên kurd Hesen bin Harûn, Muhemmed bin Harûn, Ebûhesen bin Harûn Dînewerî, Ibn Xalê Şehrîzorî û Zeydan Sîmerezî di çavkaniyêن tarîxî da cih girtine.

Li gor baweriya şî'a, wextê xeyba biçûk (xeybetê suxra) a îmamê duwanzehem Muhemmed el-Mehdî ku di navbera salêن h. 260-329ê da qewimiye, ji 'alimên kurd Hesen bin Harûn, Ehmed bin Exîh û Ebûhesen Dînewerî, naîlê wê şerefê dîbin ku bi Îmam Meh-dî re hevdîtinekê pêk bînin. Xaleka muhîm di çavkaniyêن şî'a da nîşanî me dide ku bajarê Dînewerê yê Mela Perîşan lê dayik bûye, di tarîxa mezheba şî'a da xwedî cihekî taybet e. Piraniya sehabeyên kurd ên îmamên şî'a, bi 'eslê xwe ji bajarê Dînewerê ne. Lewma jî nîşaneyâ herî giring ew e ku di sedsala h. 9em da 'alimekî wekî Mela Perîşan, pabendê baweriya şî'a ji vî bajarî derketiye û ev yek ne tesaduf e.

Di encama van agahiyan da, em dikarin dupat bikin, her çend piraniya civaka kurdan sunnî be jî, piştî berbelavbûna Îslâmê li Kurdistanê, qismek ji kurdan baweriya duwanzdeh îmamî a mez-heba şî'a qebûl kirine û heta roja îro jî girseyeka mezin, baweriya vê mezhebê dihebîne. Piraniya peyrewêن vê mezhebê, roja îro di nav sînorêن Iraq û Iranê da, xaseten li bajarên Kirmanşah, Kurdistan, Îlam, Xoresan û Xaniqînê dijîn.

BEŞA YEKEM  
Paşxaneya Dîrokî

**Derbarê Mela Perîşanê Dînewerî Da**

Ehlê qada xebatên edebiyata kurdî ya klasîk, ji bo navê Mela Perîşanê Dînewerî û berhemna wî çavnas in lê mixabin agahiyêن sehîh û pêbawer li ser jiyana wî û berhemên wî, ne li ber dest in. Pirraniya lêkolînerên vê qadê tevî gelek îddiyayên curbecur, li hev dikin ku Mela Perîşan di sedsala m. 14ê da hatiye dinyayê û di nîvê yekem ê sedsala 15ê da jî wefat kiriye. Ji xeynî van xalên sereke, li ser jiyan û nasnavên wî, hetta mensûbiyeta wî ya ayînî, şiroveyêن ji hev cuda hatine kirin.

Li gor zanyariyêن berdest, Mela Muhemmed Ebûlqasim, bi nasnavê xwe yê edebî Mela Perîşan, di nîvê duyem ê sedsala m. 14ê de li Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Dînewerê hatiye dinyayê ku roja îro di nav sînorêن parêzgeha Kirmanşahê da dimîne<sup>1</sup>.

Bêguman ji bo zelalkirina naveroka Perîşannameyê, serê pêşî fîkr û raman û baweriya muellifê kitêbê divê bê naskirin. Hemû berhemên li ser dîroka edebiyata kurdî, wekî ‘şa’irekî hûrûffî’ behsa

<sup>1</sup> Xeznedar, M., *Mêjûy Edebî Kurdi*, c. 2, Dezgay Aras, Hewlêr, 2010, r. 22

Mela Perîşan dikan. Lébelê ev berhem û xebatên lêkolîneran, xwe naspêrin delîlên musbet û 'ilmî. Xuya ye sersebebê vê pêşqebûlê ew e ku Mela Perîşan di berhema xwe da 'ilm el-hûrûf', ango 'zanista herfan' bi kar anije. Dema bi hûrbînî lêkolînek li ser naveroka berhemêbihête kirin, eşkere dibe şirove û agahiyêni li ser hûrûfibûna Mela Perîşan, dibe ku ne rast bin. Li gor qena'eta me, du sebebê bingehîn ên vê xeletiyê hene: Ya yekem ew e ku naveroka Perîşan-nameyê, ji aliyê nivîskar û lêkolîneran ve, bi hûrgulî nehatiye tehlîlkirin. Sebebê duyem jî ew e ku lêkolîneren qadê ji dîrok û doktrîna 'şî'ayê danzdeh îmamî' başebaş ne agahdar in.

Helbet divê pêşî em ji tarîxa bajarê Dînewerê haydar bin ku Mela Perîşan lê hatiye dinyayê. Dînewera ku bi nasnavê 'qelbê herêma Med'i hatiye naskirin, bajarekî giring ê Împeretoriya Sasaniyan e (m. 224-265) û di dewra Seleukosiyan da hatiye avakirin. Piştî hilweşîna Împeretoriya Sasaniyan, li gor salnameya hicrî, di sala 21ê da, ji aliyê ereban ve hatiye fetihkirin<sup>2</sup>. Ji destpêka berbelavbûna Îslamê li Îranê, baweriya mezheba şî'a jî li dor bajarê Dînewerê belav bûye, ci ku tê zanîn gelek seyîdên ji nesebê xelîfeyê çarem 'Elî bin Ebû Talib, li wê derê binecih bûne<sup>3</sup>. Li gor qeydiyên dîrokî, piştî hicretê sedsala 9ê, ango di dewra Mela Perîşan da jî, baweriya serdest a bajarê Dînewerê mezheba şî'a bûye.

Baweriya şî'a, sedsala h. 9ê, li gelek herêmên Kurdistanê ji roja iro berbelavtir bû. Bo nimûne heman sedsalê, mutesewifê şî'i Seyîd Muhemed Nûrbexş (m. 1464-1465) xwe mehdî ilan kiriye û tê zanîn ku giregirêne kurdên feylî û bextiyârî bawerî pê anîne, ketine bin fermana wî, li ser navê wî xutbe hatiye xwendin û bi mohra wî pere hatiye çapkiran<sup>4</sup>. Baweriya wî tesîr li Bakurê Kurdistanê jî kiriye û Husameddin Elî Bidlîsi (m. 1494-95), babê dîrokñas û siyasetme-

<sup>1</sup> Bosworth, C. E., "Dînavar", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. VII, Fasc. 4, 1995, New York, r. 416

<sup>2</sup> Belazurî, Ehmed bin Yehya, *Futûl el-Buldan*, amd. A. Enîs el-Tebba', Muessise el-Muaf, Beyrût, 1987

rr. 430-431

<sup>3</sup> Jafariyan, R., *Tarîx Teşeyyu' der İran, ez Axaz ta Tulu'ê Dewletê Sefewî*, Neşrî Ilm, Tahran, 1388, r. 242

<sup>4</sup> Şüsterî, Qazî Nurullah, *Mecalis el-Muminîn*, cild 2, Kitabfirûşî İslamiyye, Tahran, 1377, r. 147

darê kurd Idrîsê Bidlîsî, bûye murîd û xelîfeyê wî, bi vî awayî berbelavbûna mezheba şî'a, di nav kurdan da dewam kiriye<sup>1</sup>. Ev herêma Mela Perîşan lê hatî dinyayê û bi ihtimaleke mezin piraniya jiyana xwe lê borandî, aşîna ye ji bo doktrîna mezheba şî'a. Herwiha, di berhema xwe da Mela Perîşan diyar dike ku Şêx Recebê Bursî, moste û şêxê wî ye, pênceh salan xizmeta wî kiriye.

Muellifê berhemê, bi nasnavên Mela Perîşan, Mela Perîşanê Dî-newerî an jî Mela Perîşanê Kurd hatiye naskirin. Tê bawerkirin ku sala m. 1356ê ji dayik bûye û dîsa li bajarê xwe, sala 1421ê wefat kiriye<sup>2</sup>. Li gor hin lêkolîneran, jê ra 'Mela Perîşanê Lur' jî hatiye gotin lê guman tê heye ku Mela Perîşan bi 'eslê xwe Lur be<sup>3</sup>. Di çavkaniyêne me yên sereke da zêdetir wek Mela Perîşan cih digre, lewma jî muellifê berhemê di vê xebatê da wek Mela Perîşan an jî Mela Perîşanê Dî-newerî dihête zikirkirin.

Li ser tarîxa jidaykûna Mela Perîşan, lêkolîner Marif Xeznedar iddia dike ku kevntirîn şâ'irê kurd e û ji çarçoveya helbesta baweriya Yarsan derketiye der. Bi diyalekta goranî ya zimanê kurdî berhemek nivîsiye<sup>4</sup>. Ev iddiaya ji bo gelek lêkolîneran bûyî referanseka bingehîn, beriya Xeznedar ji aliyê Kemal Fuad ve jî hatiye nivîsin. Herwiha Fuad, Mela Perîşan wek 'şî'iye kî fanatîk' bi nav dike lêbelê ji xeynî navê mustensîx Mihemmed Qulî Hersînî, derheq naveroka berhemê û jiyana muellifê wê da, zêdetir agahiyan nade<sup>5</sup>. Di hinek destxetan da navê muellifê berhemê wekî Mela Perîşanê Hersînî jî hatiye qeydkirin, lewma jî ihtimal e Mela Perîşan ji gundê Hersînê be ku roja îro nêzîkî navenda bajarê Kirmanşahê ye<sup>6</sup>.

<sup>1</sup> Bashir, Sh., *The Messianic Hopes and Mystical Visions, The Nûrbakhshîya Between Medieval and Modern Islam*, University of South Carolina Press, 2003, r. 168

<sup>2</sup> Ahmedî, C., *Tarîxê Edebiyatê Kordî Ez Axaz Ta Cengê Cîhaniyê Evvel*, Întisaratê Gotar, Seqiz, 2016, r. 75

<sup>3</sup> Umerayî, İ. X., *Şerh-i Dîvan-i Mola Perîşan*, amd. E. Xezenferî, Întisaratê Şapûrxwast, Xuremabad, 2008, r. 4

<sup>4</sup> Xeznedar, h. b., r. 22

<sup>5</sup> Fuad, Kamal, *Kurdische Handschriften-Verzeichnis der orientalischen Handschriften in Deutschland*, Wiesbaden, Deutschland, 1970, r. 94

<sup>6</sup> Hosseini Abbariki S. Arman, "Yaftehayi Novîn Derbarê Ehval ve Eş'arê Molla Perîşan", *Journal of Kurdish Literature*, Spring and Summer 2021, Vol. VII, No. 1, serie 11, rr. 4-6

Tekane çavkaniya *Mêjûy Edebî Kurdi* ya Xeznedar li ser Perîşannameyê, çapa 1916ê ya Kirmanşahê ye ku ji aliyê Feth'elî Heyderî Zîbacûyi ve hatiye amadekirin. Navê vê çavkaniyê ji xuya ye ji aliyê Xeznedar ve cuda hatiye nivîsîn. Li gor fihristên kitêbhauseneyên muxtelif yên Îranê, navê berhema Zîbacûyi ku hemançapa nusxeyeka berhemê ye, divê wiha be: *Muqeddime Ber Dîvan-i Molla Perîşan-i Kurd*. Di maweya amadekirina vê xebatê da nusxeyeka sehîh ji vê muqeddimeya Zîbacûyi, gîhişt ber destê me. Nusxeya berbehs, mixabin ku wekî gelek nusxeyen dî nîvçe ye. Zîbacûyi, di gel berawirdkirina çend nusxeyen cuda, bi hinek şerh û ronkirinan, xwestiye berhemê bide nasîn<sup>1</sup>. Ev xebata Zîbacûyi, roja îro bi awayekî dîjîtal ji berdest e. Navê berhemê ji aliyê Zîbacûyi ve, wekî *Dîvan-i Molla Perîşanê Kurd* hatiye qeydkirin. Tevî ku Xeznedar behsa destxeteka ji arşîva Zanîngeha Marborgê ji dike, di nav çavkaniyên wî da kunyeya nusxeyê cih nagire û em nizanin ka Xeznedar agahiyên xwe ji wê destxetê distîne an ji xebata Zîbacûyi.

Pisporekî dî yê edebiyata kurdî ya klasîk, Cemal Ahmedî bi şerh û ronkirinekê dide zanîn ku Mela Perîşan bi 'eslê xwe ne 'lur' e lê kurd e. Wekî gelek lêkolînerên dî, Ahmedî ji pirraniya agahiyên xwe dispêre Marif Xeznedar û çend xebatên dî yên ji Îranê û destnîşan dike ku Mela Perîşan sala 1356ê hatiye dînyayê û yekem şâ'irê kurd e ku bi lehceya goranî berhemek nivîsiye<sup>2</sup>. Bi ser de ji Ahmedî beyan dike, Mela Perîşan zêdetir li herêma Kirmanşah û Dînewerê maye û sala 1421ê li bajarê xwe wefat kiriye. Li gor agahiyên wî, ji xeynî muqeddimeya berhemê, saqînameya wî ya navdar û hinek beşen dî yên berhemê heta niha nehatine çapkiran<sup>3</sup>.

Lêkolîner Selîm Temo ji di antolojiya xwe ya helbestan da behsa çapa yekem a Kirmanşahê dike, wekî Xeznedar bajar û tarîxa çapê 'Kirmanşah-1916' qeyd dike. Di nav her du çapên pêşî yên Kurt Siiri Antolojisîya Temo da, navê Mela Perîşan di lîsteya kîmasiyan da cih digre û agahiyên behskirî di jêrenotekê da cih digrin. Di vê

<sup>1</sup> Zîbacûyi, Feth'elî Heyderî, *Divan-i Molla Perîşanê Kurd*, Çap-i Muhemmedî, Kirmanşah, 1916

<sup>2</sup> Ahmedî, Cemal, *Tarîxê Edebiyatê Kordî Ez Axaz Ta Cengê Cîhaniyê Evvel*, Întisaratê Gotar, Seqiz, 2016, r. 85

<sup>3</sup> h. b., r. 90

antolojiyê da tarîxa jidayikbûna Mela Perîşan 1398 e ku ev tarîx di esasê xwe da li gor hin çavkaniyên dî, sala wefata Şêx Recebê Bursî jî nîşanî me dide<sup>1</sup>. Hêjayî gotinê ye ku Temo jî berhemê wek ‘dîwan’ bi nav dike.

Yek çapa orjînala destxetekê ji sala 1916ê, yek jî şerha Umerayî ku salên 1980yî temam dibe lê sala 2008ê bi giştî belav dibe, *Perîşanname* du caran hatiye çapkiran. Tevî zêdehiya van çavkaniyên navborî, tevliheviya agahiyên li ser jiyana wî û nezelaliya tarîxa jidayikbûn û wefata wî, zehmetî û bedbextiya dîroknûsiya edebiyata kurdî nîşanî me dide. Naxwe, divê em li naveroka berhemê binêrin ka derheqê salên jiyan û wefata muellifê xwe da, berhem bi xwe ji bo me ci dibêje.

Agahiyeka beraqil ji berhemê bi xwe derdikeve û bi me dide zanîn ku Şêx Recebê Bursî şêx û rêberê Mela Perîşan e û heta sala 1398ê jî li heyatê ye<sup>2</sup>. Jixwe lêkolînerên sereke yên navborî jî qebûl dikan ku Mela Perîşan û Şêx Recebê Bursî di heman sedsalê da jiyane. Mela Perîşan bi xwe jî di *Perîşannameyê* da Bursî wekî şêxê xwe dide nasîn û bi sê beytan pêwendiya xwe di gel wî eşkere dike:

Ve tirsê sellem û sellem tirsî  
Şêx Recebê Bursî bi ew heme qursî (b. 392)

Pencah sal terîqê xidmetim guzaşt  
Curbuzey yek herf bîstir ew nedâst (b. 393)

Bêguman nasîna Hafiz Recebê Bursî û baweriya wî, dikare agahiyên giring bide me ji bo eşkerekirina mezheb û baweriya muellifê *Perîşannameyê* jî.

### Şêx Recebê Bursî û Mela Perîşan

Rezîeddîn Recep bin Muhemmed bin Recep el-Hillî el-Bursî,

<sup>1</sup> Temo, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, c. 1, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2013, r. 68

<sup>2</sup> Bîdakî, Hadi, “Fîhrîstê Tewâsîfê Mutûnê Xettîyê Kordî der Kitabxanehayê Iran-Menzûmehayê Dînî ve Aşıqane”, *Keşkol*, c. 1, hej. 2, Tahran 2016, r. 210

wek hafiz û muheddisekî pêşeng ê baweriya şı'a û felsefeya ‘irfanê hatiye naskirin’. Navê wî, di çavkaniyeka ‘alimên şı'a yên serdemê da, wek Receb bin Muhemmed bin Receb Bursî jî tomar bûye<sup>2</sup>. Navê Hafiz Recebê Bûrsî, hêj di serdama xwe da, di nav fêhristên ‘ulema û pêşengên mezheba şı'a da cih girtiye.

Bursî, di pirraniya çavkaniyan da wek muheddîs û ‘alim cih girtibe jî herwiha şı'a û edîbek e. Di nav berhemên wî da dîwanek jî cih digre û temayênen sereke yên helbestên wî, ‘medhê pêxember’, ‘ehlê beytê’ û ‘mersiyeya Huseynê şehîd’ e<sup>3</sup>. Hafiz Recebê Bursî, waqifê pirraniya ‘ilmên serdemê ye û bi taybet jî di ‘ilmê esrarê hûrûf da destê wî dirêj e<sup>4</sup>.

Agahiyênen sehîh û berdest ên li ser jiyana Bursî, mixabin ku kêm in. Lewma jî jiyana wî û telebeyê wî Mela Perîşan, dişibin hev. Têzanîn ku Bursî, li dor sala h. 743 (m. 1342), li gundê Bursê hatiye dinyayê ku ev gund roja îro di navbera bajarênil Hille û Kufeyê da dimîne. Di xortaniya xwe da, li bajarê Hilleyê<sup>5</sup> binecih dibe ku na-vendeka giring a rewşenbîriya wê serdemê ye.

‘Alimên sereke yên mezheba şı'a, li wê derê berhev dibin, li gor doktrîna şı'a şagirdên nû perwerde dikin û bi navê ‘Mekteb-i Hille’, ekolek derdikeve meydanê<sup>6</sup>. Bursî, demekê li wê derê dimîne, paşê berê xwe dide Xoresanê ku di wê serdemê da Hukûmeta Serbîdaran a şı'i (m. 1337-1381) li ser hukm e. Şêx Recebê Bursî, paşê diçe bajarê Meşhedê ku tirba imamê heştem e şı'i li wê derê ye, dikeve inziwayê û wekî zahidekî dest bi nivîsandinê dike. Bursî, beşa duyem a berhema xwe Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Heqayiq Esrar Emîr el-Muminîn, sala m. 1410-11ê, li bajarê Meşhedê nivîsiye. Ji

<sup>1</sup> Amir-Moezzi, M.A., “La Perle Précieuse Attribué a Rajab al-Bursî, Les 500 Versets Coranique au Sujet de ‘Ali”, di Ali, *Le Secret Bien Gardé*, CNRS Editions, Paris, 2020, rr. 251

<sup>2</sup> ‘Amîlî, S. M. E., *A'yan el-Şı'a*, c. 6, Dar-ul Te'aruf, Beyrut, 1983, r. 464

<sup>3</sup> Subhani, J., *Mosû'e Tebeqat el-Fuqeha*, c. 9, Mu'essisey-i İmam Sadiq, Qum, 1418, r. 106

<sup>4</sup> Bursî, H. R., *Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Heqayiq Esrar Emîr el-Muminîn*, wer. E. M. Yezdî, İntisaratê ‘Ilmî Ferhengî Sahib el-Zeman, Tahran, 1969, rr. 25-29

<sup>5</sup> Momen, Moojan, *An Introduction to Shi'i Islam*, Yale University Press, Connecticut, 1985, r. 87

<sup>6</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, Jambet, Christian, *Qu'est-ce que Le Shî'ism*, Fayard, Paris, 2004, rr. 194-199.

ber wê jî em dikarin bêjin Hafiz Recebê Bursî, piştî tarîxa 1410ê koça dawî kiriye<sup>1</sup>. Şêx Recebê Bursî, eger piştî sala 1410ê wefat kiribe, ne dûrî aqilan e ku ew û Mela Perîşan hevçaxê hev bin. Lewma jî li ser tarîxa jiyan û mirina Mela Perîşan, heta peydakirina belge û tarîxên teqezez, em ê van agahiyê berdest qebûl bikin. Li gor vê pêşqebûlê Mela Perîşan di sala 1356-57ê hatiye dinyayê û di destpêka sedsala 15ê da piştî xizmeta pênceh salan a li ber dergehê Şêx Recebê Bursî, berhemâ xwe Perîşannname nivîsiye û teqrîben sala 1420-21ê wefat kiriye. Cihê tirba wî nayê zanîn.

Wekî me berê jî amaje pê kirî, tevî ku Receb el-Bursî ‘alim û mu-heddisekî navdar ê şî’î ye jî, li ser jiyan û baweriya wî, tenê çend agahî û anekdotên ji metnên klasîk û hinek lêkolînên rojhilatnasان hene ku di van salêن dawî da hatine çapkirin.

Her çiqas fîkr û ramanêن Bursî di serdemâ xwe da ji aliyê ‘alimên şî’î ve nehatine qebûlkirin û Bursî wek ‘xalî’ (‘alimê ku derheqê îmamên şî’î da pirr mubalexe dike û zêde pesnê wan dide) bi kuf-fariyê hatiye súcdarkirin jî, pirraniya ‘alimên serdemê, fîkrên Bursî bi xweşbînî pêşwazî kirine û dane zanîn ku wî bi niyetaka pak, ji bo piştevaniya de’wa îmaman ev tişt nivîsîne<sup>2</sup>. Lewma jî Bursî, di dawîya sedsala 14ê da di gel ‘alimekî dî Seyid Heyder Amolî (ss. h. 8), ji wan ‘alim û mutesewwufêن<sup>3</sup> sereke tê qebûlkirin ku şî’ayê danzdeh îmamî ji hêla batinî vejandine<sup>4</sup>, bingeha wê eşkere kirine û mijarêن felsefî<sup>5</sup> şirove kirine.

Ji ber ku li ser jiyana Bursî agahiyêن pêbawer ne berdest in, der-

<sup>1</sup> Amir-Moezzi, M.A., “La Perle Précieuse Attribué à Rajab al-Bursî”, h.b., r. 254

<sup>2</sup> Lory, Pierre, “Souffrir Pour La Vérité Selon L’ésotérisme Chiite de Rajab Borsî”, di *Le Shi’isme Imâmîte Quarante Ans Après, Hommage à Etan Kohlberg*, sous la direction de Mohammad Ali Amir-Moezzi, Meir M. Bar-Asher, Simon Hopkins, Brepols, Belgium, 2009, r. 317

<sup>3</sup> Corbin, H., *En Islam Iranien, Aspects Spirituels et Philosophiques*, vol. III, *Les Fidèles d’Amour, Shi’isme et Soufisme*, Gallimard, Paris, 1972, r. 150

<sup>4</sup> Mir-Kasimov, Orkhan, “Esoteric Messianic Currents Of Islamic East Between Sufism and Shi’ism (7<sup>th</sup>/19<sup>th</sup>-6<sup>th</sup> /15<sup>th</sup> Centuries)” di *L’ésotérisme Shi’ite, Shi’i Esoterism*, Sous La Direction de Mohammad Ali Amir-Moezzi, édité avec: Maria de Cillis, Daniel De Smet, Orkhan Mir-Kasimov, Brepols, Belgium, 2015, r. 652

<sup>5</sup> Corbin, H., *En Islam Iranien, Aspects Spirituels et Philosophiques*, vol. IV, *L’école d’Ispahan, l’école Shaykhie, le Douzième Imam*, Gallimard, Paris, 1972, r. 140

heqê jiyanâ telebeyên wî de jî zanîna me kêm e. Li ser vê mijarê tenê H. Corbin behsa ‘alimekî bi navê Xwace Muhemmed bin Mehmûd dike ku ew jî li ser rêya Şêx Recebê Bursî ye û di sedsala m. 17ê da li bajarê Şîrazê hatiye dinyayê<sup>1</sup>. Lêbelê Xwace Muhemmed ne şagirdê wî ye, piştî Bursî hatiye dinyayê, di bin bandora berhemên wî da maye û peyrewê fîkr û ramanên wî ye. Mela Perîşan, dema di berhemâ xwe da behsa Bursî dike û xwe wek şagirdê Şêx Recebê Bursî nîşan dide, kêmasiyeka mezin a lêkolînên tarîxa mezheba şî'a, bi vê agahiya giring temam dike.

Hêjâyî behsê ye ku di destxeteka cuda ya Perîşannameyê da, Mela Perîşan wek şêx, Hafiz Recebê Bûrsî jî wek şagirdê wî hatiye qebûlkirin. Ji ber ku tarîxa jidayikbûn û wefata herdu ‘aliman jî bi belgeyên musbet nayênen zelalkirin, ihtimaleka ze’if be jî divê em bi şik û guman berê we bidin vê agahiyê. Herwiha, di heman destxetê da hatiye nivîsin ku Mela Perîşanê Kurd, wê serdemê ‘Şêx-ul İslâmî Dînewer’ ye, berhemâ xwe *Perîşanname* bi zimanê lurî nivîsiye û di nezera ‘ulemayê ‘alem da xwedî qedr û qîmeteka mezin e. Hafiz Recebê Bûrsî, nivîskarê berhemâ ‘Meşariq Enwar...’ yek ji telebeyên wî ye<sup>2</sup>. Li gor daneyên berdest, ne pêkan e ev îddiaya mustensîxê berhemê bi delîl û belgeyên pêbawer bihête piştrastkirin lê balkêş e ku ber’eksê çavkaniyêñ dî, di vê destxeta navborî da, Mela Perîşan wekî ‘alimekî mezin ê gehîşî mertebeya şêx-ul İslamtiyê, Şêx Recebê Bûrsî jî wekî murîdekkî wî hatiye qeydkirin.

Hafiz Recebê Bûrsî û Mela Perîşan li ku derê, kengî û çawa hev nas kirine, bi awayekî zelal nayê zanîn. Lêbelê, wekî me berê jî destnîşan kir, di çavkaniyêñ tarîxi da gundê Burs, di navbera Hille û Kufeyê da cih digire. Tê zanîn ku Dînewer nêzîkî bajarê Kufeyê ye û di serdemâ İslâmî da zêdetir wekî ‘Mah-i Kufe’ ango ‘Heyva Kufeyê’ hatiye binavkirin<sup>3</sup>. Naxwe, li ser hevnasîna van herdu ‘aliman, em

<sup>1</sup> Corbin, Henry, *Histoire de la Philosophie Islamique*, Gallimard, Paris, 1986, r. 461.

<sup>2</sup> Xeza’ul-Arifin, “Mecmûa-i ‘Ilmî ve ‘Irfanî ve Felsefi”, amd. Ali bin Muhammed Baqir el-Dameganî’ul-Esl-i Kirmanşahî Mesken, Şeban 1334, Kitabxane-i Meclîs-i Iran, wrq. 107

<sup>3</sup> Bekran, Muhammed bin Necib, *Cihannuma*, be kûşêşê M. A. Riyahî, İntisaratê Kitabxaneyê Ibn Sina, Tahran, 1342, r. 67

dikarin behsa sê ihtimalan bikin:

1. Şêx Recebê Bursî û Mela Perîşan li gundê Bursê hev nas kirine û bi hev re pêşî çûne Hilleyê paşê jî çûne Xoresanê. 2. Bursî û Mela, cara ewil li Hilleyê hev dîtine û paşê çûne Xoresanê û li wê derê binecîh bûne. 3. Bursî û Mela Perîşan, li Xoresanê hev nas kirine.

Wekî me berê jî amaje pê kirî, Mela Perîşan dibêje wî pêncêh salan xizmeta Şêx Recebê Bursî kiriye. Lewma jî ihtimala sêyem, ihtimaleka ze'if e. Li gor çavkaniyêن berdest, Şêx Recebê Bursî, sala h. 743yê (m. 1342) hatîye dînyayê û 813ê (m. 1410) koça dawî kiriye. Heke wekî Mela Perîşan beyan kirî, ew pêncêh salan di xizmeta wî da mabe, divê beriya ku Bursî hatî Xoresanê, van herdu 'aliman hev nas kiribin û Mela bûbe murîdê Bursî. Di wê serdemê da, bajarê Hille jî bo mezheba şî'a, navendeka 'ilmî û zanistî ye; ihtimaleka beraqil e Mela Perîşan jî wek Recebê Bursî ji bo tehsîlê çûbe Hilleyê, van herdu şexsiyetan li wê derê hev nas kiribin û paşê bi hev ra çûbin berev Xoresanê.

Li ser fîkr û baweriyê wan jî em dikarin bibêjin ku naveroka berhemâ Bursî ya navborî û naveroka *Perîşannameyê* zêde dişîbin hev. Berhemâ Bursî, li ser 'esasên baweriya Şî'ayê Danzdeh Îmamî ye'. Di vê berhemê da Bursî, bi giştî li ser itâ'eta mutleq a îmaman, parastîna heqê wan, naskirin û têgehiştina wan, kamiltiya wan a bêhevta û hikmetên wan ên nûranî, fîkr û ramanêñ xwe pêşkêş dike. Xaseten, puxteya berhemâ Bursî li ser te'rîf û ravekirina meqamê bala yê 'Elî bin Ebû Talib e. Bursî, di vê berhemâ xwe da, meqamên me'newî yên axretê destnîşan dike, giringî û elzemiya muhebbet û itâ'etê ji bo Îmam 'Elî û pejirandina 'meqamê welayetê' destnîşan dike. Li gor Bursî, 'meqamê îmametê', îlahî ye û ji meqamên 'nubuwet' û 'rîsalet'ê balatir û pîroztir e<sup>2</sup>.

Bursî, berhemâ xwe taybet li ser payeyêñ bilind ên Hz. 'Elî hû-

<sup>1</sup> Lawson, Todd, "The Dawning Places of the Lights of Certainty in the Divine Secrets Connected with the Commander of the Faithful by Rajab Bursî (d.1411)", di *The Heritage of Sufism* (vol. 3): *The Legacy of Medieval Persian Sufism* (150-1500), ed. Leonard Lewisohn, Oneword Publications, Oxford, 1999, r. 262

<sup>2</sup> Panahloo, Omran, İhtişaminîa, Mohsen, "I'tiqadat-i Îmamiyye der Hewzê Îmamet ez Menzerê Hafiz Recep Bursî", *Feslnamê Ilmî-Pejûhişî Pejûhişhâyê I'tiqadî-Kelamî*, sal 9, şomarê 34, Tabistan 1398, rr. 43-72

nandiye û hewl daye welayeta wî şirove bike. Herwisa, di ‘alema zerreyan da, li herdu cîhanan meqamên bala û me’newî yên Hezretê ‘Elî rave dike, bêşînoriya ‘ilm û zanîna wî eşkere dike û diyar dike ka însanê welayeta wî încar bike û dijminahiyê li Îmam ‘Elî bike, dê rastî ci encamên xirab bê<sup>1</sup>. Ev têgehêن navborî, ‘esasên se-reke yên baweriya mezheba şî'a pêk tînin. Di cîhanbîniya hizrî ya şî'yan da, hebûna berî-hebûnê (pre-existence) ya Îmam ‘Elî, mijara herî nazik û kûr a felsefeya hebûneweriyê ye. Bingeha vê baweriyyê digehe hedîsên dewra ewil a baweriya şî'a<sup>2</sup>.

Terma ‘welayet’ê ji Qur'anê hatiye wergirtin û welayeta ‘Elî jî qo-naxa herî muhîm a baweriya mezheba şî'a ye<sup>3</sup>. ‘Ilmê îmam, bi temâ-mî ji aliyê Xwedê ve hatiye bexşandin, lewma jî rabirdû, roja îro û dahatû di nav çarçoveya vî ‘ilmî da cih digrin<sup>4</sup>. Wekî rêberê xwe Şêx Recebê Bursî, di heman paşxane û kontekstê da muellifê Perîşan-nameyê, Mela Perîşanê Dînelerî jî van têgehêن sereke bi kar tîne û bi zarê helbestê, van mijarên muhîm şirove dike.

### Mela Perîşan û İddiaya Hûrûfîbûna Wî

Berî ku naveroka Perîşannameyê bi şerh û şiroveyeka kamil çap bibe, Mela Perîşan di piraniya berhemên dîroka edebiyata kurdî da, wek şâ'irekî hûrûfî hatiye binavkirin. Ji ber ku tesîra rêbaza edebî ya Tevgera Hûrûfiyye di nav berhemê da bi awayekî eşkere xuya dike, navlêkirineka bi vî awayî serê pêşî maqûl xuya dike lê ji aliyê inter-tekstualîteyê ve, bi hêsanî mirov nikare bêje Mela Perîşan rasterast peyrew an jî endamekî vê tevgerê ye. Ji ber ku lêgerîna

<sup>1</sup> Seyyidi, S. H., İnayetî Rad, M. J., Huseynî Şahrûdî, M., “Berresî Mefhûmî Guluw der Nezeriyatê Welyî Hafiz Receb Bursî”, *Costarhayî der Felsefe ve Kelam*, sal 49, şomarê peyapey 98, 1396, r. 73-100

<sup>2</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, “La Préexistence de l’imam”, di *La Religion Discrète, Croyances et Pratiques Spirituelles dans l’Islam Shi’ite*, Vrin, Paris, 2006, rr. 135-150

<sup>3</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, “Notes à Propos de la Walâya Imamite”, di *La Religion Discrète, Croyances et Pratiques Spirituelles dans l’Islam Shi’ite*, Vrin, Paris, 2006, rr. 177-207

<sup>4</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, “Savoir C’est Pouvoir, Exégèses et Implications du Miracle dans L’Imamisme Ancien”, h.b., r. 155

me'neyên cuda ji şikl û hejmarêñ herfan, di nav gelek cema'et û tevgerêñ batinî da jixwe hatiye ceribandin. Lê divê bê gotin ku ev iddia ne taybet e bo berhemêñ tarîxa edebiyata kurdî ya klasîk.

Fatih Usluer, lêkolînerê ku bi zimanê tirkî li ser Tevgera Hûrûfiyye bi dehan gotar çap kirine, cih dide hûrûfibûna Mela Perîşan. Ew jî xwe dispêre zanyariyêñ ji berhema *Zemîne-î Iranşinasî* ya Ali Muhammed Sakî û behs dike ku ji xeynî Ehmedê Lur, şâ'irekî dî ji Luristanê heye bi navê Mela Perîşan û helbestêñ wî yên 'aydê 'eqîdeya hûrûfiyan, li mala Seyîd Abdal Tahirî, di civînan da hatine xwendin'. Li ser vê pêwendîya Seyîd Abdal Tahirî û Mela Perîşan çavkaniyêñ edebiyata kurdî ya klasîk, agahiyekê nadîn me. Eger bi delîl û belgeyêñ musbet li me 'eyan bû ku di nav wan herdu şexsiyetan da pêwendiyeka bi vî rengî heye, wê demê şik û gumanêñ me yên li ser hûrûfibûna Mela Perîşan, dê berteref bibin.

Hûrûfiyye, wekî tevger û ekoleka dînî û edebî di dawiya sedsala 14ê da, pêşî li Îran û Azerbaycanê berbelav bûye<sup>2</sup> paşê jî wek kevneşöpiyeka 'ilmê sirra herfan, ji van rê û rîbazêñ beriya xwe gelek sûd wergirtiye û tesîreka mezin li mezheb û terîqetêñ cuda kiriye. Lêkolînerêñ qadê yên Mela Perîşan wek nivîskarekî hûrûffî bi nav dikin, hûrguliyeka giring paşguh dikin ku lîteratura hûrûffî bi giştî li ser berhemêñ Fezlullah Esterabadî (m. 1340-1401) hatine nivîsin û pirraniya wan rasterast 'alim û edîbêñ sereke yên vê tevgerê wek referans di metnêñ xwe da nîşan didin. Ji bo zelalkirina vê mijarê em ê pêşî di vê beşê da bikevin pey berbelabûna Tevgera Hûrûfiyye, paşê jî hewl bidin ku têkiliya Mela Perîşan û berhema wî di gel vê tevgerê li gor agahiyêñ berdest şirove bikin.

Pirraniya lêkolîneran, doktrîn û Tevgera Hûrûfiyan wekî şaxeka nû di nav İslâmê da qebûl dikin<sup>3</sup>. Hin zanyarêñ dî jî vê tevgerê wekî 'dînekî cuda' an jî 'baweriyeka pûç' bi nav dikin<sup>4</sup>. Sersebebê vê binavkirinê ew e ku di nav hinek berhemêñ hûrûffî da, danerê tevgerê

<sup>1</sup> Usluer, Fatih, *Hurufilik İlk Eilden Kaynaklarla Doğuşundan İtibaren*, Kabalcı Yayıncılık, İstanbul, 2014, r. 22

<sup>2</sup> Usluer, h. b., r. 126

<sup>3</sup> Usluer, h. b., r. 126

<sup>4</sup> Gölpinarlı, Abdülbâki, *Hûrûfilik Metinleri Katalogu*, TTK Basımevi, Ankara, 1973, r. 2

Fezlullah Esterabadî bi payeyêن îlahî an jî bi taybetiyêن pêxembe-riyê hatiye te'rîfkinin. Pirraniya xebatêن wan lêkolînerên ku di pê-naseya vê tevgerê da hudûdê 'ilmê bezandine û di şiroveyêن xwe da tehqîr û heqaret rêz kirine, bi zanatî di vê lêkolîna me da nehatine zikirkirin.

Di hizra hûrûfî da rûyê însanan kitabek e, divê xetêن li ser rûyê însanan bi awayekî rast, xaseten li gor 28 herfên Qur'anê û 32 herfên nutqa Fezlullah bihête xwendin. Rû û devê însanan 'hê' (ه), guh 'fê' (ف), çav 'dat' (د), difin 'tê' (ت) û birh jî 'nûn' (ن) e. 'Lam' (ل) bi çengalê xwe şeklê temamê birh û difina însanan nîşan dide<sup>1</sup>. Wê demê bi guh, çav, birh û difnê, li ser rûyê însanan kelimeya 'fezl', ango navê pîroz yê Fezlullah Esterebadî dihete xwendin.



آدم آن لوح وجود عالم است  
فضل حق مطهور وجود است

Resm-1: "Adem an lewhê wucûdê 'alem est / Fezlê heq mestûrê wechê adem est."<sup>2</sup>

Nivîskarê Cavîdannname, Muhebbetname, Newmname, Wesîyet-

<sup>1</sup> Usluer, h. b., r. 193-194

<sup>2</sup> Di literatura Tevgera Hûrûfiyye da, navê 'Fezl' û şexsiyeta Fezlullah Esterabadî wek hêmaneka sereke û pîroz tê qebûlkirin. bnr. Bashir, Sh., *Fazlallah Astârabadi and the Hurufîs*, Oneworld Publications, Oxford, 2005, r. 120

*name* û *Erşnameyê*, Seyyîd Fezlullah Ne'îmî Esterabadî an jî Fezlul-lahê Hûrûfî, di qeydiyeên muxtelîf yên xelîfeyêن xwe da, bi şecereya xwe ya dirêj hatiye nasandin û wek seyyîd hatiye nasandin<sup>1</sup>. Pêşengê Tevgera Hûrûfiyye, 'alimekî herfzaniyê û şirovekarê xewnan e. Riwayet e ku Esterabadî di xewna xwe da Hz. İsa, Hz. Suleyman, Hz. İbrahîm û Hz. Muhemmed dibîne, bi wan re dikeve nav guftû-goyê<sup>2</sup>. Di nîvê sedsala 14ê da li Tebrîzê ji xwe ra girseyeka murîdan peyda dike, paşê koçî Isfahanê dike û li wê derê dest bi teblîxa doktrîna Tevgera Hûrûfiyye dike. Her ku meclîsên wî yên suhbetê berfireh dibin, hejmara murîdên wî jî roj bi roj zêdetir dibin.

Li gor zanyariyêن muxtelîf, Fezlullah ji bo şahê dewletê Tîmûrê Leng (m. 1336-1405), mektûbekê dinivise û jê dixwaze ku zulmê neke,bihête ser rêya heq, û bi awayekî 'adilane hukumdariyê bike. Tîmûr, ji ber vê mektûbê aciz dibe, pêşî Fezlullah ji Azerbeycanê sirgun dike, paşê jî fermana kuştina wî dide. Mîranşahê kurê Tîmûr, wê demê waliyê Azerbaycanê ye û li gor riwayetan ew bi destê xwe Fezlullah Esterabadî dikuje, cendekê wî jî dişewitîne<sup>3</sup>. Li gor hindek çavkaniyan jî bi emrê Mîran Şah, hakimê Şîrvanê Şêx İbrahîm, ji qaziyê xwe Beyazid dixwaze ku fetwayekê bide ji bo Esterabadî bihête îdamkirin. Bi wê fetwayê Fezlullah di 56 saliya xwe da tê kuştin, cesedê wî li nav sûk û kolanan tê gerandin û paşê jî Esterabadî li herêma Alincakê tê definkirin<sup>4</sup>. Ji xelîfeyên wî Seyyîd Nesîmî jî, sala m. 1417ê li bajarê Helebê hatiye îdamkirin û riwayet e ku beriya kuştinê, çermê wî hatiye gurandin, cesedê wî kirine heft parça û ji bo hemî bajarênu ku murîd û xelîfeyên wî lê hene, parçeyek hatiye rîkirin<sup>5</sup>.

Sersebebê dijminahiya Dewleta Tîmûriyan ji bo vê tevgerê û hewldana qelandina koka murîdên Fezlullah Esterabadî, li gor hin çavkaniyan ne mektûbek lê sûîqasteke siyasîye. Murîdekî Fezlullah

<sup>1</sup> Gölpinarlı, *h.b.*, r. 4

<sup>2</sup> Usluer, *h.b.*, r. 36-37

<sup>3</sup> Usluer, *h. b.* r. 20

<sup>4</sup> Arıkoğlu, İ., "Ferişteoğlu'nun Cavidân-nâme Tercümesi: 'Îşk-nâme'" (teza doktorayê ya çapnebûyi), Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Van, 2006, r. 7

<sup>5</sup> Browne, E. G., *A History of Persian Literature-Under Tartar Dominion*, Cambridge University Press, Cambridge, 1920, r. 449

bi navê Ehmedê Lur, piştî xutbeyê Mîrza Mîranşah (m. 1366-1408) kér dike. Di hindek çavkaniyan da li şûna Mîranşahê kurê Tîmûr ev sûiqastê li Şahrûx Mîrza (m. 1377-1447) hatiye kirin lê plana sûiqastê bi ser naeve û Ehmedê Lur li wê derê tê kuştin<sup>1</sup>. Xuya ye piştî vê bûyerê û xaseten jî piştî idamkirina pêşengê tevgerê Fezlullah Esterabadî, di navbera hûrûfiyan û Dewleta Tîmûriyan da dijminahiyeq çêdibe. Dûmahîka sedsala 14ê jî qiyama hûrûfiyan dest pê dike û heta nîvê sedsala 15ê dewam dike.

Doktrîn û rîbaza hûrûfiyye, ji aliye Fezlullah Esterabadî ve hatiye danîn û piştî demekê ji Isfehanê heta Helebê, ji Qefqas û Balqanan heta dergehêne xewle yên Bektaşiyê Anatolyayê, ji aliye murîd û xelîfeyên wî ve li seranserê cografayayeka mezin a Rojhilata Naverast hatiye belavkirin. Herî dawî ev dergahêne veşartî yên Anatolayayê bûne stargeha doktrîna hûrûfiyan<sup>2</sup>. Berhemên ehlê vê tevgerê, gehiştine girseyeka mezin ji ber ku Esterabadî bi duristiya xwe û bi leqebe 'helalxur' hatiye naskirin<sup>3</sup>. Lîkolîner qebûl dîkin ku bi saya şirovekirina xewnan, şohreta Esterabadî zû belav bûye. Li gor riwayetên muxtelif û zanyariyên berdest, vê tevgerê dewra Fatih Sultan Mehmed (m. 1432-1481) û Kanuni Sultan Süleyman (m. 1494-1566), di qesra Osmaniyan da rasterast derfeta tesîrkirina îqtîdarê jî bi dest xistiye lê wekî dewra Tîmûrê Leng, Şahrûx û Cîhanşah, ji aliye hin wezîr û paşayê Osmaniyan ve peyrewêne vê tevgerê ji seraya Osmaniyan hatine dûrxistin û hindek ji wan jî hatine kuştin û şewitandin. Her çend piştî kuştina Esterabadî, berhemên hûrûfi di nav tekya û serayan da ji xwe re cih dîtibin jî, wekî tevgereka mîstik a sosyo-ayînî û edebî, pirr bi lez ji holê rabûye<sup>4</sup>.

Lê xaleka muhîm e ku ber'eksê pirraniya berhemên hûrûfi, di Perîşannameyê da agahiyeq li ser Fezlullah an jî tevgera wî cih nagare. Naxwe Mela Perîşan, ne peyrewekî Tevgera Hûrûfiyye ye û dema qiyama vê tevgerê dest pê kiriye, Fezlullah Esterabadî li Şîrvanê ha-

<sup>1</sup> Usluer, h. b., r. 21

<sup>2</sup> Corbin, H., *History of Islamic Philosophy*, wer. L. Sherrard, The Institute of Ismaili Studies, London, 1962, r. 309

<sup>3</sup> Aqîlî, S. A., "Zuhûr-i Firqey Hûrûfiyye ve Tesîrat-i Fikrî ve Siyasiyê An Der İsfahan", *Mecelleyê Pejûheşhayê Tarîxiyê Iran ve Islam*, hej. 10, 2012, r. 2

<sup>4</sup> Corbin, h. b., r. 310

tiye kuştin lê Mela Perîşan hay ji vê bûyera mezin nebûye. Navê Fezlullah, Nesîmî, an jî xelîfeyekî wî di Perîşannameyê da cih nagre. Lewma jî peyrewî an jî murîdiya Mela Perîşan ya vê tevgerê, ji bo niha ne agahiyeka sehîh e. Hêjayî dupatkirinê ye ku Fezlullah Esterabadî di sala m. 1401ê, li Şîrvanê, xelîfeyê wî Seyyîd Nesîmî jî sala m. 1417ê li Helebê hatine kuştin û li gor zanyariyên me wan salan Mela Perîşan li heyatê ye. Eger ji xeynî goteget û agahiyên ferezî, pêwendiyeka rasterast a muellifê Perîşannameyê di gel hûrûfiyan hebûye; referansek, navek, agahiyek an jî telmîhek li ser kuştina Esterabadî û hin pêşengê dî yên tevgerê, di Perîşannameyê da divê cih bigirta. Herwiha, ihtimal e ku Perîşanname, beriya qiyama hûrûfiyan û kuştina Esterabadî hatibe nivîsîn.

Naxwe ev berhem, ji xeynî tettbîqkirina hinek xalêن hevbeş ên rîbaza edebî ya ‘zanista herfan’, bi awayekâ bisteh bi me nadî zanîn ka muellifê wê bi xwe jî hûrûfî ye an na. Dîsa ihtimal e ku Mela Perîşan ev rîbaza ‘ilm-i hûrûfî ji şêxê xwe wergirtibe, ji ber ku 28 herfîn ku dengêن Qur'anê pêk tînin û koka wê di ‘ilmê hûrûfê da jixwe heye, ji aliyê Hafiz Recebê Bursî ve jî bi heman rîbazê hatine ravekirin. Dibe ku muellifê berhemê ne endamekî tevgera hûrûfiyye be û beriya ku hûrûfiyye li Îran, Kurdistan û Anatolyayê başebaş belav bibe û kuştina Esterabadî deng bide, Mela Perîşanê Dînewerî ev berhema xwe nivîsîbe. Lewma jî li ser berhemên hûrûfî û qiyama vê tevgerê, tiştek di nav metnê da peyda nabe.

### Mela Perîşan û ‘Ilm-i Hûrûf

Şêx Recebê Bursî, her çiqas di berhema xwe da cih dabe gelek hêmanêن ‘ilm-i hûrûf jî, wekî nivîskarekî hûrûfî nehatîye qebûlki-rin. Di berhema wî *Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Heqayiq Esrar Emîr el-Mumînîn* da, baweriya şî'ayê danzdeh îmamî, bi mîstîsîzmeka rojhilatî di gel raveya şiklî ya hejmar û şiroveyên herfan, pesnê ehlê beytê û taybet jî medhê ‘Elî bin Ebû Talib cih digre.

Li gor van agahiyên berdest, Hafiz Recebê Bursî ne peyrewekî tevgera hûrûfiyye ye û beriya ku ev tevger û qiyama wê nav û deng bide, jixwe Bursî di berhemên xwe da rîbazê zanista herfan bi

kar anije. Herwiha temayên sereke yên berhemên wî, bi temamî guncaw û yekgirtî ne di gel naveroka *Perîşannameya* Mela Perîşan. Ji ber ku pesnê pêxember, ehlê beytê û mersiye Hz. Huseyn, temayên hevbeş ên *Perîşannameyê* ne jî. Naxwe, Mela Perîşanê ku di berhemê xwe da cih daye rîbaz, hêman û hejmarêñ herfan, ev zanyariya xwe û naveroka berhemâ xwe rasterast ji Şêx Recebê Bursî wergirtiye û li ser şopa wî ya edebî û ayînî *Perîşanname* nivîsiye.

Mela Perîşan bi xwe jî wekî Şêx Recebê Bursî bi terza xwe ya edebî, di bin bandora rîbazên herfzaniyê da ye lê ev taybetiya berhemê wan li ser xwendin an jî piştrastkirina metnêñ tevgera hûrûfiyye nehatine raçandin. Herwiha, wekî berê jî me cehd li ser kir, di *Perîşannameyê* da navek an jî berhemeka hûrûfi cih nagre. Hevçaxêñ hev in lê pêwendîya wî rasterast di gel pêşengêñ sereke yên hûrûfiyan Fezlûllah Ne'îmî Esterebadî (m. 1340-1401), zava û murîdê wî 'Elî-yul E'la (m. 1369-1407) an jî xelîfeyê wî Seyyîd Ne-sîmî (m. 1369-1417) çênebûye.

Divê bê diyar kirin ku tarîxa dariştina wateyêñ cuda ji herf û dengan, ku wekî 'ilm-i hûrûf tê naskirin, heta serdemêñ neo-platonî diçe. Di nav Mûsewyîyen Kabalayê da sistêma herf û hejmaran rîkûpêktir hatiye dariştin' û di nav edîb û şâ'irêñ misilman da jî hesaba ebcedê hatiye 'emilandin. Bingeħa van ekol an jî rîbazên mîstîk ên herf û hejmaran, li ser herfnasiya Yewnana Antîk û çend şaxêñ baweriya Xirîstiyanîyê geş bûne.<sup>2</sup> Ereban jî wek yewnanan ji bo her herfa alfabeyê, nirxekî hejmarî diyar kiribûn û bi tîpan, reqem nişan didan û hesab dikirin. Ev pergala hesabkirinê wek "Hesaba Cummel" (حساب جمل) tê nasîn.

Bikaranîna 'Hesaba Cummel' di welatêñ îslamî da, bi piranî di nav stêrkñas û muhasiban da berbelav bûye<sup>3</sup>. Piştre, wek ilmê "Cefr" di nav ehlê batin û mutesewwifan da, bi taybetî jî di nav alimên şî'a da wek pergala şirove û te'wîlkirina herfan hatiye bikaranîn. Li gor vê pergâlê, nirxê 28 tîpêñ alfabeşa erebî, bi sisteme-

<sup>1</sup> Corbin, *h.b.*, r. 310

<sup>2</sup> Schimmel, Annemarie, *The Mystery of Numbers*, Oxford University Press, New York, 1993, r. 17

<sup>3</sup> Musahib, G., *Dayiret'ul-Me'arîfî Farsî*, c.1, Întişaratê Amir Kebir, ç. 3, Tahran, 1381, r. 5

ka taybet bi navê 'Hesaba Ebcedê' hatine dabeşkirin: Ebced (ابجده), Hewwez (هۆز), Huttî (حُطّى), Kelimen (كلمن), Se'fes (سعفص), Qereşet (قرشەت), Sexiz (شەذ), Zezix (ضەظخ).

Li gor hesaba ebcedê, nirxên hejmarî yên tîpêñ erebî bi vî awayî hatine danîn:

ا : A a: 1	ب : B b: 2	ج : C c: 3	د : D d: 4
ه : H h: 5	و : Vv / W w: 6	ز : Z z: 7	ح : H h: 8
ط : T t: 9	ي : Yy: 10	ك : K k: 20	ل : L l: 30
م : M m: 40	ن : N n: 50	س : S s: 60	ع : '70
ف : F f: 80	ص : \$ \$: 90	ق : Q q: 100	ر : R r: 200
ش : \$ \$: 300	ت : T t: 400	ث : S_s_: 500	خ : X x: 600
ڙ : Z z: 700	ڙ : ڙ ڙ: 800	ڦ : Z z: 900	ځ : ځ ځ: 1000

Wekî me berê jî diyar kir, rêbaza edebî-ayînî ya hûrûfiyan, ji bo şirovekirina rûyê însanan û gelek hêmanên cuda yên dînî di gel reqem û sîrrên herfan ji aliyê gelek sha'irê navdar ve hatiye bikaranîn. Hemanên rêbaza şirovekirinê, ji aliyê Mela Perîşan ve ji bo termêñ bingehîn ên baweriya şî'ayê danzdeh imamî hatine revîze-kirin. Li vir divê bê gotin ku herf û hejmarêñ Perîşannameyê gun-caw in di gel hejmar û şiroveyêñ Hafiz Recebê Bursî:

Lam qelbê elif elif qelbê lam  
Eger deryaftî qabil ï ilham (b. 45)

Beyyineyê elif namê 'Elî ye  
Ji lam hem muşteq namê Nebî ye (b. 46)

Li gor hûrûfiyan me'neya peyvan rûpoşek e û divê mirov li pişt zahirê gotinê, me'neya heqîqî ya peyvê bizane; eger li gor merteba-ya xwe bêne rêzkirin 'esiltirîn herf *elif* (ا) e, piştî wê jî *waw* (و) û *yê* (ي) têñ<sup>1</sup>. Mela Perîşan, wekî hûrûfiyan di navbera herfan da hiyerarşiyeka bi vî rengî danayne; li şûna wê, navê kesayetêñ sereke yên baweriya xwe li gor van herfan şirove dike, taybet jî nav û nasnavêñ

<sup>1</sup> Usluer, h.b., r. 122

## İmam 'Elî.

Di hindek peyvan da herfek, car caran tenê bi herfên eczaya xwe carna jî bi ebceda xwe, dibe sembola navek, bûyerek, pêşbîniyek an jî sifetekê di cîhanbîniya hûrûfiyan da. Mela Perîşan jî ev rîbaz li ser pesidayîna Hz. 'Elî û şirovekirina mertebeya wî di gelek beytan da 'emilandiye û zêdetir bi herfên *elîf* (î), *lam* (J) û *waw* (و) paşxaneşa baweriya xwe pênase kiriye. Ji van herfan *elîf* û *lam*, kinaye ne ji navê Pêxember û 'Elî, *waw* jî delîlê welayeta 'Elî ye. Herwiha Mela Perîşan cih daye gelek hedîs/gotinên İmam 'Elî ku li gor baweriya şî'a di pirtûka wî *Nehc-ul Belaxeyê* da cih digrin.

Ji ber ku danerê Tevgera Hûrûfiyye, Fezlullah Esterabadî bi 'eslê xwe îrânî ye, hûrûfi li 28 herfên Qur'anê çar herfên farsi jî zêde dîkin. Pirraniya edîb û mutefekkirên hûrûfi wek delîl, ayetên Qur'anê û hedîsên pêxember şirove kirine û xwestine ji me'neya zahirî ya peyv û dengan wêdetir, me'neya batînî peyda bikin. Ji ber van şiroveyên şexsî, her çiqas di nav musulmanan da ji bo kesayetiya Fezlullah, hurmet û hezkirinek hebe jî, gelek 'alimên İslâmê rê û rîbazên hûrûfiyan bi tundî rexne kirine<sup>1</sup>. Hûrûfiyên ku Fezlullah wek pêxember dibînin, di pesn û medhiyeyên wî da mubalexeyên mezin dîkin, bûnê sersebebê van rexneyan.

Ferqeka 'esasî heye di navbera rê û rîbazên berhemên hûrûfi û Perîşannameyê da. Her çend ji aliyê gelek hûrûfiyan ve Hz. 'Elî û ehlê beytê xwedî mertebeyeka pirr bilind hatibin qebûlkirin jî, wekî Mela Perîşan xîmê baweriya xwe li ser vê yekê ava nakin. Ji bo wan hebûn, herf û deng bi temamî sembolên yekîneyên batînî ne. Mezhebên sunnî û şî'i, ji bo hûrûfiyan ne nasnav û payeyên 'esasî ne. Bawerî û hurmeta bo 'Elî di gelek berhemên hûrûfi da ji bo Fezlullah jî têne rîzkirin. Jixwe Fezlullah bi xwe jî sunnî ye. Di Perîşannameyê da çend caran peyva "fezl" cih girtibe jî pesdayînek li ser navê Fezlullah Esterabadiyê avakarê tevgera hûrûfiyye li ber çavê me nakeve.

Mela, di berhema xwe da hinek mijarên teorîk ên 'ilm-i hûrûf, li gor baweriya xwe rave dike. Texmîna me ew e, terza wî ya nivîsê bûye argumana sereke ji bo lêkolînerên ku Mela Perîşan wekî şâ'irekî

<sup>1</sup> Bashir, Fazlallah Astarabadi and the Hurufis, h. b., rr. 61-62

hûrûfî bi nav dikin. Lêbelê divê neyê jibîrkirin, ev cure şiroveya li gor herfzaniyê di nav lîteratura şî'a da jixwe cihekî sereke digre û ev teknîk ne taybetî terîqeta hûrûfiyan e. Nexusim jî di sedsala h. 9em da, ‘arifên şî'a yên wekî Seyîd Heyder Amolî û Şah Nîmetullah Welî, tevî ku ne hûrûfî ne jî, di berhemên xwe da ji ‘ilm-i hûrûf sûd wergirtine. Xeyn ji vê, muhîm e ku mamosteyê Mela Perîşan, ‘alîmê şî'î Hafiz Recebê Bursî jî di berhema xwe da cih daye zanista herfan û gelek hêmanên vî ‘ilmî bi kar anîne.

Bursî, di berhema xwe *Meşariq Enwar el-Yeqîn...* da beyan kiriye ku herfzanî ‘ilmekî temam e, ango cem’ e. Lewma jî razên îlahî di nav xezîneya herfan da -di nav kitêba pîroz a Xwedê Te’ala da- veşartî ne. Hafiz Recebê Bursî, ji bo eşkerekirina hêmanên baweriya şî'a, ma’neya her herfê yek bi yek destnîşan kiriye<sup>1</sup>. Herwiha tê zanîn ku berhemeka dî ya Bursî heye bi navê *Esrar el-Hûrûf*. Naverok û temayêن sereke yên helbestên dîwana<sup>2</sup> Bursî jî, heman mijar û temayêن *Perîşannameyê* ne.

Yanî bikaranîna pergala hejmarî ya herfan, ji bo şirove û te’wîla wateya peyvan, rîbazeka berbelav e di nav alimên şî'a da. Yek ji wan alimên ku ev pergal wek rîbazekê di berhemên xwe da bi kar anîye, Şêx Recebê Bursî ye. Di *Perîşannameyê* da tê dîtin ku Mela Perîşan jî, rîbaza mamosteyê xwe dişopîne û heman şewaza herfzaniyê bi kar tîne. Di gel ku Mela Perîşan, berevajî Recebê Bursî li ser wateya herf/peyvîn ku di berhema xwe da bi kar anîye, şiroveyekê nake. Lêbelê ji bo baştır fêmkirina naveroka Perîşannameyê, em dikarin ji nivîsên Bursî sûd werbigirin.

Şêx Recebê Bursî, di *Meşariq’ul-Envar’il-Yeqîn...* da bi awayekî sîrrî, behsa wateya batinî ya hin herf/peyvan dike. Li gor Bursî, “Sirra Xwedayî” emanetek e di xezîneya herfan da û zanîna vê jî ilmek e ku di “Kitab’ul-Llah” da veşartî ye<sup>3</sup>. Lêbelê ne caîz e ku mirov wateyê eşkere bike; ji ber ku wate, sîrr e. Herwisa, sîrra reqeman jî

<sup>1</sup> Bursî, el-Hafiz Receb, *Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Esrar Emir el-Muminîn*, Mensûrat Muessise el-E’lemî li-l Metbû’at, Beyrût, b. t., r. 18

<sup>2</sup> Bursî el-Hillî, el-Hafiz Receb, *Dîwan el-Hafiz Receb el-Bursî el-Hillî*, Tehqîq: S. M. el-Gayurî, el-Tab’â el-Husayniyya el-Muqaddasa, Bagdad, 1436

<sup>3</sup> Bursî, Hafiz Receb, *Meşariq’ul-Envar’il-Yeqîn Fî Heqayiq Esrar Emîr’el-Muminîn*, wer. M. S. Yezdî, h. b., r. 68

di nefsa beşer da, li ser sûretê hemû însanan heye û ‘eslê hikmetê ye’. Li gor Bursî, zanista herf û reqeman, zanistek e ku Xweda şeva Mî’racê ew daye pêxemberê xwe û piştre ev ilm, di gel Elî bin Ebû Talib û nifşê wî, heta hetayê gerandiye<sup>2</sup>.

Li gor Bursî, xetê elif (ا / ئ) işaret dike bo roja secdeyê (يوم المسجود). Elif, tiştâ yekem e ku hatiye îcadkirin û mertebeyên din ên ‘alemê jî elif in. Elif, xwedî zahirek û çendin batin e. Zahira yekem sê herf e: ‘A’, ‘L’ û ‘F’ (ا، ل، ف) û teqabulî ‘erş, lewh û qelemê dike. Zahira duyem, ji sê xal an jî nuqteyan (نقطه) pêk tê. Batina ewil a elifê, sê ye û di hejmarê da di gel ‘eql, ruh û nefşê wekhev e. Batina duyem a elifê jî, di hejmarê da sed û deh e<sup>3</sup>. Li vîr divê bê gotin ku li gor hesaba ebcedê, reqema sed û deh tê wateya ‘Elî (علی). Elif, qayim e bi sirra aqil û hemû herf di sirra Elifê da ne lê di nav wan da ji aliye mertebeyê ve, cudahî heye<sup>4</sup>.

Bursî dibêje ku ‘Elifa mebsût’ ango dirêj, ji ‘Bê’yê pêk tê û di Qur’anê da herfa ewil a wehyê ku nazil bûye, ‘Bê’ya Bismillahê ye. Sirra ‘Bê’yê ji berfirehî û feyza ‘Elif’ê ye û sirra wî bi sirra ‘Elif’ê qayim e. ‘Bê’, piştî ‘Elif’ê sirra ‘alema berçav û ‘alema enwar e (ronahiyan) û heqîqeta sirrên wê bi xal/nuqteyê ve girêdayî ye. Gotina navdar ya Hz. Elî “Ez nuqteya binê ‘B’yê me”, li ser vê yekê ye<sup>5</sup>.

Sirra Qur’anê di ‘Fatihe’tul-Kitab’ê da û sirra ‘Fatihe’ye di ‘Bismillah’ê û sirra ‘Bismillah’ê di ‘Bê’yê da û sirra ‘Bê’yê jî di nuqteya binê wê da ye<sup>6</sup>. Nuqte, nazilbûna hebûna mutleqê zahir e ber bi batin ve û ji destpêkê ber bi dawiyê ve<sup>7</sup>. Dawiya herfan ‘xal’ e û ew dawiya her tiştê ye. Xal, delaleta ‘Zatê Pîroz’ e û ew xala Wî feyza ewil e ku ji ‘Sahîbê Celal’ derketiye. Asoya Cemalê Wî, wek ‘Aqilê Çalak’ (عقل) hatiye binavkirin; ango xuliqandina Hz. Muhemmed. ‘Xal’â wî ‘Nur’ul-Enwar’ û ‘Sîrr’ul-Esrar’ e<sup>8</sup>. Zahirê ‘Xal’ê, ‘Sifet’ul-Llah’ e (صفت الله) û batina wî ‘Xeyb’ul-Llah e (غیب الله). Ji ber vê yekê ew ‘Xal’ zahira

1 h. b., r. 85

2 h. b., r. 98

3 h. b., r. 71

4 h. b., r. 76

5 h. b., r. 72

6 h. b., r. 77.

7 h. b., r. 75.

8 h. b., r. 86.

'Navê E'zem', sûreta temamê 'alemê ye û medara kufr û İslâmê, li ser wî ye<sup>1</sup>. Feyza ewil a 'Xal'ê wahid û tekane ye û ji wî 'Elifa Xeybê' eşkere dibe. Gava xet dewam dike, 'Elif' eşkere dibe û ji sê xalan pêk tê. 'Xal'a yekem, ji bo wî 'Aqil' û 'Ruh'ul-Qudus' e. 'Xal'a duyem, 'Ruh'ul-Llah' e, herfa wî 'B' ye û ew, hicaba 'Rebb' e. Zahira 'Xal' wahid e û laşê wî ye. Ji bo 'B'yê, hukum zahir û eşkere ye, heqîqeta wî wekî 'Nubuwet'ê ye. 'Xal'a sêyem jî ruhê 'Emîr' e û ji wî ye geryana 'Hebûn'ê di 'alema zahirî da<sup>2</sup>. 'Xal' bingeha herfan e û ew heman 'Elif'a wenda ye ku destpêka 'Hebûn'ê ye û 28 herf ji nav wê derdikevin<sup>3</sup>.

Li gor Bursî, di pergala ebcedê da, 'D' (د), işaretek e bo roja afirandina mirov (Yewm Xelq'ul-adem) û 'C' (ج) işaret dike bi roja tunekirin/teswiye kirina mirov<sup>4</sup>. 'Q' (ق), batina qelemê û sirra emir/fermanê ye û mebest ji sirra emir/fermanê jî 'Qeder' e<sup>5</sup>. 'S' (س), herfek e ji herfîn zahira 'Navê E'zem' (اسم اعظم) û her kesê ku batina 'S'yê bizane, 'Navê E'zem' ê ılahî peyda kiriye<sup>6</sup>. 'T' (ط), herfekî teyar e di temamê 'alemê da û sirra wî di bingehêñ ewwel û zewqa icadatê ye, di 'alemên jor (علویات) û jêr (سفلیات) da pêçayî ye<sup>7</sup>. 'C' (ج) herfeke asimanî ye ku ji 'B'yê hatiye derxistin. 'C' di hemû 'alemên milyaketî da hevpar e û Xweda, wê di ewwelê 'Esmaê Celal'a xwe da eşkere kiriye û 'erş bi celala 'C'yê qayim e û di navêñ 'Cewad' û 'Cebar' da tecellî kiriye<sup>8</sup>. 'K' (ک), herfeke eşkere û zahir e di navê 'Melik' da û izzet ji bo wî ye. Ew batina 'ilm û emir û 'erş û kursî û sûretêñ asimanî û 'erdî ye<sup>9</sup>. 'Eyn' (ع), ewwelê sirra 'erş û 'aqil e; ewwelê sirra 'alemê xweşî ye ku lewh, qelem, kursî, eflak û 'erdan hildigire.

'Aqil, hilgirê ruh e, ruh hilgirê nefş e, nefş hilgirê qelb e, qelb

<sup>1</sup> h. b., t. 89.

<sup>2</sup> h. b., r. 103.

<sup>3</sup> h. b., r. 97.

<sup>4</sup> h. b., r. 70.

<sup>5</sup> h. b., r. 73.

<sup>6</sup> h. b., r. 73.

<sup>7</sup> h. b., r. 74.

<sup>8</sup> h. b., r. 73-74.

<sup>9</sup> h. b., r. 74.

hilgirê cism e û wisa hêza hilgir temam dibe<sup>1</sup>. ‘S’ (س) herfek e ku di peyvîn ‘Waris’ (وارث) û ‘Ba’is’ê (باعث) zahir e. Zahirbûna wî di ‘Waris’ê da fanîbûna hemû tiştên heyî işaret dike. Di ‘Ba’is’ê da jî bi ‘Bi’set’ê (بعثت) yanî ‘Rabûn’ a wan a piştî mirinê û kombûna wan a piştî belavbûnê, işaret dike<sup>2</sup>. ‘Z’ (ز), herfeke şerîf e di lefza ‘Ezîz’ da zahir e. Ji ber vê yekê ‘Izzet’ bi tevahî taybet e bo Xweda û ji Wî ye gihadina ‘Izzet’ê bo hemû aleman, li gor rêzekî<sup>3</sup>. ‘V v / W w’ (و), herfek e ji herfîn ‘erşê ku seyyar e di zerreyên ‘alemê da digere û girêdayî du aliyên ‘Kun Feyekûn’ e (كُنْ فَيَكُونْ)<sup>4</sup>. ‘H’ (ه), işaret e bi ‘Huwe Ellah’ (هُوَ اللّٰهُ)<sup>5</sup>, rabûna herfîn din bi wê ye û çavkaniya hemû sirran e<sup>6</sup>. ‘M’ (م), herfeke agirîn û pîroz e. Ji bo herfa ‘M’ya du ‘alem hene. Ji ber ku di bingeha wê da du ‘M’ (مîm) (مِيم) hene. ‘M’ya yekem işaret dike bi ‘alema ‘Mulk’ û ‘M’ya duym jî işaret dike bi alema ‘Melekût’ê<sup>7</sup>. ‘H’ (ح), herfeke nûranî û asimanî ye, heqîqeta wê heşt e ku reqema ‘erşê ye<sup>8</sup>. ‘D’ (د) herfeke tarî ye ku heqîqeta berdewam ji bo wê ye, navê ‘Dayim’ ji wê zahir bûye. Ew ji bo Hz. Muhammed e û dewama mulk, melek û nûrê ye<sup>9</sup>.

Dema mirov dikeve nav detayên naveroka Perîşannameyê, eşke-re dibe ku Mela Perîşan jî mijarên bingehîn ên Bursî behs dike, bi heman paşxaneyê di berhema xwe da şirove dike. Heke em xula-seya vê mijarê binivîsin, divê serê pêşî em destnîşan bikin ku di sedsalâ 9ê hicrî da, ‘alîm û ‘arîfîn mezheba şî'a, di berhemên xwe da cih dane hêmanên serekî yên ‘ilm-i hûrûf û ev rîbaz ne tenê ‘aydê peyrewêñ Tevgera Hûrûfiyan e. Lewma jî ev terza herfzaniyê di Perîşannameyê da ji bo ravekirina hinek hêmanên olî hatîye bikaranîn, nek delîleke musbet e mirov xwe bispêrê û Mela Perîşan wekî şâ’irekî hûrûffî bi nav bike.

<sup>1</sup> h. b., r. 74.

<sup>2</sup> h. b., r. 74.

<sup>3</sup> h. b., rr. 74-75.

<sup>4</sup> h. b., r. 75.

<sup>5</sup> h. b., r. 81.

<sup>6</sup> h. b., r. 100.

<sup>7</sup> h. b., r. 95.

<sup>8</sup> h. b., 96.

<sup>9</sup> h. b., r. 96.

## Şopêن Şî’itiyê di Perîşannameyê Da

Bi analîza naverokî em dikarin bêjin ku Mela Perîşan wekî Şêx Recebê Bursî, bi baweriya xwe pabendê mezheba şî'a ye û ji aliyê îtiqadê ve Îsna'esperî (danzdeh imamî) ye. Di berhemê da li ser vê yekê gelek referansên ehlê beytê cih digrin lê ji bo terîqeta wî çav-kaniyeka zelal nîne. Mela Perîşanê ku li gor berhemê pênceh salan xizmeta terîqetekê kiriye, li ser navê terîqeta xwe tiştek negotiye. Xwe wekî peyrewekî welayeta Îmam ‘Elî destnîşan kiriye û baweriya xwe bi vî rengî pênase kiriye:

Ya ‘Elî min ‘ebdê ‘uqûbetbar im  
Ji kiştey ‘emelê wêm şermsar im (b. 424)

Ne Heq ne Nebî ne Welîm dîye  
Desim ve damanê welayet bin bîye (b. 425)

Naveroka berhemê ‘eyan dike ku ber’eksê îddiaya hindek lêkolîneran, Mela Perîşan ne peyrewê baweriya Yarsan e. Ji ber ku di kev-neşöpiya kurdêñ Yarsan da di gel rêzgirtinê, tu erka Qur'anê tune. Yarsan, ji bo hemû kitabêñ pîroz rêzê digrin lê metnêñ xwe yên pîroz li gorî baweriya xwe beyan dikin<sup>1</sup>. Di berhemê da gelek ayetêñ Qur'anê cih digrin û muellif bi me dide zanîn ku xwînerêkî qenc yên Qur'anê ye, hetta mumkin e wekî şêxê xwe hafiz be. Li gor agahiyêñ berdest, em dikarin îddia bikin ku Mela Perîşan ji aliyê mezhebê ve şî'i ye û şaxa wî ya mezhebî, ‘danzdeh imamî’ ye. Herwiha li gor hizra ayînî divê li dijî itiqada eş'erî be ji ber ku di berhemê da hinek dijûn û rexneyêñ tund hene ji bo baweriya eş'erîyye.

Muelifê berhemê, bi xwe nîqaşen li ser ziman û nasnameya xwe berteref dike û di munazarayekê da beyan dike ku ew kurd e. Mela Perîşan ev niqaş di gel Melayek Eş'erî pêk anije. Balkêş e ku di vê munazarayê da Melayê Eş'erî tirkî diaxive, dibêje: “kurd bê iman in”. Nîqaşa ku di rêwingiyekê da pêk tê, pêşî li ser başî û xirabiyê

<sup>1</sup> Vali, Shahab, *Kurdêñ Yarsan-Dîrok û Mîtoloji*, wer. S. Orak Reşitoğlu, Weşanêñ Avesta, Stembol, 2018, r. 31

dimeşê, Mela Perîşan pesnê 'Elî bin Ebû Talib dide, Melayê Eş'erî ji pesnê 'Umer bin Xettab. Piştre munâqışeya wan gur dibe û di çend beytan da Mela Perîşan bi tirkî dijûn û heqaretên giran ji bo Melayê Eş'erî rêz dike:

Behsiman kîşa ji xêr û ji şer  
Min balay 'Elî ew balay 'Umer (b. 490)

Min fezlê 'Elîm vat ew fezlê 'Umer  
Tesdîqîş kirdim ve quesdê kafer (b. 491)

'Umer ve te'rîf 'Usman in muhtac  
Zexmê serê seg, seg mekey 'ilac (b. 493)

Ew ve muzbereh min ve seqlemî  
Arwadin qehbe kopekoxlî (b. 494)

Her çé mawerdim delîl ji Qur'an  
Mewat yalandir kurd yoxdir îman (b. 495)

Li vir divê bê gotin, digel ku Mela Perîşan di vê besê da bi awayekî eşkere xwe wek kurd bide nasîn ji, bi qena'eta me *Perîşanname* ne yekem metna kurdî ye ne ji mirov dikare bêje ev berhem dîwanek e. Li ser pirraniya destxetan, ji aliyê mustensîxan ve tarîxa nivîsîna *Perîşannameyê* wekî sedsala 9ê hicrî qemerî (m. 14) hatibe danîn ji, tarîxa nivîsîna berhemê bi zelalî ne diyar e.

Li gor naverok û serenavê berhemê, navên şexsiyetan, termîno-lojiya dînî/mezhebî û şêwaza edebî ya berhemê, em dikarin bêjin ku *Perîşanname* di dawiya sedsala 14ê an ji di destpêka sedsala 15ê da hatiye nivîsîn. Di gel van taybetiyêن xwe ev berhem, ji bo niha kevintirîn mesnewiya kurdî ye. Ji bo tesbîtkirina tarîxa tequez ya nivîsîna berhemê, bi raya me, hewcedarî bi xebateka berawirdî û dûdirêj heye li ser nusheyêن cuda û çavkaniyêن kevtir.

## Mezheba Cafer

Li ser agahiyên jor û piştî behsa van bûyerên dîrokî, hizreka cuda li me peyda dibe ku Mela Perîşan, nek şâ'irekî hûrûfî lêbelê 'alimekî şî'ayê danzdeh îmamî ye û wek şêxê xwe Recebê Bursî xwestiye bi delîlên dîrokî yên musbet, xelîfetî û welayeta 'Elî bin Ebû Talib û îmamên şî'a îsbat bike. Sersebebê vê hîzr û qena'eta me jî ew e ku ji xeynî van agahiyêن dîrokî û doktrînel ên dînê İslâmê, di beyta 522yê da Mela Perîşan mezheb û baweriya xwe wekî rasterast 'Mezheba Cafer' bi nav dike.

Tê zanîn ku mezheba şî'ayê danzdeh îmamî, hêj di sedsala hicrî zyem da, ango di dewra îmamê şeşem Cafer el-Sadiq da (h. 148), wekî 'Caferî' dihat binavkirin<sup>1</sup>. Sersebebê vê yekî jî ew e ku cara yekem Îmam Cafer el-Sadiq, ferman daye sehabeyên xwe ku gotinên îmamên beriya wî, bi rîkûpêk bêne nivîsin. Bi vî rengî, berhevokên pêşîn ên hedîsên mezheba şî'a derkotine meydanê<sup>2</sup>. Ji ber giringiya vê hereketa nivîsinê, ev navlêkirin heta roja iro jî dewam dike.

Berteka neyînî ya Mela Perîşan li hember tesewwuf û mutesewwufan jî divê bi baldarî were nirxandin. Di beytên 522-534ê û di berdewama wê beşê da jî Mela Perîşan, sofî û mutesewwufan bi awayekî tund şermezar dike û wan wekî 'kafir', 'şerabxur', 'tiryakkêş', 'înkarkerên Mezheba Caferî' û 'terkenimêj' bi nav dike. Hetta di berdewama beşê da ji bo ehlê tesewwufê dibêje "Ew ji ker, kûçik û heywanên dirrinde du tebeqe jîrtir" in. Ev dijberiya Mela Perîşan ya li hemberî mutesewwufan, di seyra dîrokî da gelek caran ji aliyê 'alimên şî'i yên sereke ve jî wek rexne û şermezarkirinên tund hattine nivîsin.

Ji 'ulemayê mezheba şî'a, Şêxê Sedûq (h. 381), Şêxê Mufid (h. 413), Şêxê Tûsî (h. 460), Tebrîsi (h. ss. 6), Xace Nesreddîn Tûsî (h. 672) û 'Ellame Hillî (h. 726), wekî Mela Perîşan dijberiya ehlê tesewwufê kirine û di nivîsên xwe da ne'let li wan barandine. Di

<sup>1</sup> Modarressi, Hossein, *Crisis and Consolidation In The Formative Period Of Shi'ite Islam, Abû Ja'far ibn Qiba el-Râzî and His Contribution to Imâmite Shi'ite Thought*, The Darwin Press Inc., Princeton, 1993, r. 54

<sup>2</sup> Vali, Shahab, "Negahî be Fermanê Mensûb be Îmam Sadiq", Meskûye, Danişgahê Azadê İslâmî Şehrê Rey, şomarê 5, 1385, r. 154

sedsala 9ê hicrî da, Seyîd Heyder Amolî ku me berê jî behsê kir, di berhemâ xwe *Cami' ul-Esrar we Menbe' ul-Enwar* da hewl daye îsbat bike ku baweriya şî'a û felsefeya tesewwufê di 'esasê xwe da wek hev in<sup>1</sup>. Amolî, xaseten di bin tesîra bîr û baweriyêن Îbn 'Erebî da maye û kitêba wî ya navdar *Fusûs ul-Hikem* jî şerh kiriye<sup>2</sup>. Lîbelê di mijara 'Xatem ul-Ewliya' da, li hember fîkrêن Îbn 'Erebî derketiye.

Her çend lêkolînên derheq pêwendîya şî'a û tesewwufê da, xalêñ hevbes<sup>3</sup> ên van herdu ekolêñ hîzrî/dînî nîşanî me bidin jî, cudadhiyêñ wan ên bingehîn<sup>4</sup> divê neyêñ paşguhkîrin. Sersebebê van cudadhiyêñ doktrînî, bêguman têgeha 'welayet'ê ye, ji ber ku ne zelal e ka 'welî' kî ne û li gor ci hatine tayînkîrin. Terma 'welayet'ê, wekî cewhereka bingehîn tê qebûlkîrin ku mezheba şî'a jî ekola tesewwufê jî li dewrûberê wê ava bûne. Di baweriya mezheba şî'a da, welayet tenê meqamekî pîroz e; bêyî navgîn û amraz, rasterast ji aliyê Xwedê ve ji bo 'Elî bin Ebû Talib û yanzdeh îmaman hatiye bexşandin. Ji xeynî wan welî nînin û dê êdî neyêñ jî.

Xatem el-Ewliya, ango weliyê dawîn jî kurê îmamê yanzdehem Hesen el-Eskerî ye; sala h. 255 an jî 256ê li bajarê Samirraya Iraqê hatiye dînyayê û navê wî Muhemmed bin Hesen e. 'Mehdî', 'Qaim', 'Sahîbê Zeman' û 'Weliyê 'Esr', çend nasnavêñ wî ne ku di navbera salêñ h. 260-329ê da, berev 'Keybetê Suxra' (windabûna biçük) û piştî sala h. 329ê jî berev 'Keybetê Kubra' (windabûna mezin) ve-kişiyaye. Dema dawiya dînyayê hat, dê wekî 'Hezretê Mehdi' ango 'Qaimê Al-i Muhemmed' li dînyayê zuhur bike. Ev doktrîn, yek ji 'esasên sereke ye ji bo Mezheba Caferî û şî'ayê danzdeh îmamî. Muhemmed bin Hesen, ji bo hemû însanan 'Huccet' e; delîl, rîber û burhanê tekane ye. Ji xeynî Mehdî, welî nînin û dê neyêñ jî. Ev

<sup>1</sup> Amolî, Seyid Heyder, *Cami' ul-Esrar ve Menbe' ul-Enwar*, muqeddime: Henry Corbin, Osman Ismail Yahya, tecumê: S. J. Tabatabâ, Muessisê el-Tarîx el-Erebî, Beyrût, 1426

<sup>2</sup> Amolî, Seyid Heyder, *Ness ul-Nusûs fi Şerhî Fusûs ul-Hikem*, teshîh: Henry Corbin, Osman Ismail Yahya, IFRI, Tahrân, 1352

<sup>3</sup> Şeybî, Kamil Mustafa, *Hembestegî Miyanê Teşeyyu' ve Tesewwuf*, tercumê A. A. Shahabi, İntişaratê Danişgahê Tahrân, 1354

<sup>4</sup> Şeybî, Kamil Mustafa, *Teşeyyu' ve Tesewwuf Ta Axazê Sedê Dewazdehumê Hicrî*, tercumê A. Zekaveti Qaragozloo, İntişaratê Amir Kabir, Tahrân, çap 5, 1387, rr. 64-67

bawerî, di gel jiyanâ Mehdî, ‘elametên zuhura wî û kitekitê li ser hejmar û nasnameya sehabeyên wî, di lîteratura şî'a da ji aliyê gelek ‘aliman ve hatiye teorîzekirin û heta roja îro hatiye’.

Her çend ‘welayet’ û ‘weli’, du termên sereke yên ekolên tesewwufî bin jî, ne meqamekî taybet e bo ewladêن ‘Elî. Ji serdema berbelavbûna tesewwufê heta roja îro, mutesewwufan eşkere parastine ku ji bo ‘terîq’ê -rêya hîzr û baweriyyê-, her sofiyekî hewcedarî bi pîrekî/îmamekî heye lêbelê ev pîr/îmam, ne şert e ji nesebê ewladêن ‘Elî be<sup>2</sup>.

Bi kurtî em dikarin bi vî rengî encamê li vê mijarê bînin: Ji xeynî Neşebendiyye, silsileya hemû terîqetên tesewwufî digehe ‘Elî bin Ebû Talib lêbelê ehlê tesewwufê, tu carî sê xelîfeyên pêşî yên dînê İslâmî wekî xayîn nabînin û ne’letê li wan nabarînin. Wan di berhemên xwe da cih nedane bûyerên tarîxî yên ku me li jor ravekirin û behsa binpêkirina heqê welayeta Hz. ‘Elî jî nekirine. Mutesewwufan jî wek doktrînekê qebûl kirine ku heta roja qiyametê her dem li dînyayê dê weliyek hebe. Lêbelê ew ‘weli’ ne ‘mehdî’ye mezheba şî'a ye. Mewlana Celaluddîn Muhammed Belxî el-Rûmî (m. 1207-1273), di deftera duyem a ‘Mesnewiya Me’newî’ da li ser vê mijarê puxteya fikra mutesewwufan wiha aniye ziman:

“Wiha her dewrekê, welîyek Qaim e  
Azmûn heta qiyametê daim e  
Wiha Îmamê Heyyê Qaim ew Welî ye  
Yan ji nifşê ‘Umer e yan ji nifşê ‘Elî ye”<sup>3</sup>

Heke em hîzr û baweriya Mela Perîşan bi van agahiyêñ berdest li gor naveroka Perîşannameyê binirxînin, zelal dibe ku ‘alimekî şî’ayê danzdeh îmamî ye û ji ber vê yekê, hûrûfiyye jî tê da ne pêkan

1 Tebrisî el-Nûrî, Huseyn, *el-Necm ul-Saqib fi Ehwal el-Îmam el-Huccâ el-Galib*, tehqîq: S. Y. Musavî, Enwar Huda, Qum, 1415 / Şêxê Sedûq, Ebî Ce’fer ibn Bâbûye, *Kemal el-Dîn ve Temam el-Nîme*, tehqîq: H. A’lamî, Muessise el-E’lemî li I-Metbûat, Beyrût, 1412

2 Valî, Shahab, “Mefhûmî Pîr der Fermanê Mensûb be Îmam Sadiq”, *Cawîdan Xired*, dowerê Cedîd, şomarê 6, 1389, rr. 63-82

3 Mewlana, Celaluddîn Muhammed Belxî el-Rûmî, *Mesnewî Me’newî*, teshîh: M. A. Movahhid, c. 1, ç. 2, Întişaratê Hermes, Tahran, 1396

e ew peyrew, murîd, alîgir an jî mensûbê terîqeteka sûfiyan be.

### Şahê Welayetê ‘Elî, Çardeh Me’sûm û Hz. Mehdî

Heke em ji hêla sosyolojîk ve lê binêrin, di sedsalên hicrî 8. / m. 14 û h. 9 / m. 15ê da, piştî dewra Moxolan û êrişên Tîmûrê Leng (m. 1336-1405), li Îran, Iraq û Anatolyayê buhraneka siyasî dest pê dike û atmosferekâ mîna ‘dawiya dinyayê’ li pirraniya welatên Rojhila-ta Naverast berbelav dibe. Ji ber vê atmosferê, cema’etên bê sebr û aram li benda rizgarker ‘Mehdî’ mayî, gelek civak û terîqetên siyasî-dînî yên şî’î, di vê dewrê da derdi Kevin meydanê, dibin xwedî hêz û bi hezaran murîdên wan çêdibin.

Hinek şêx û pêşengê van terîqetan xwe wekî vejîn an jî reenkarnasyona îmaman, rizgarkerê axirzemanê Hz. Mehdî didin nas-kirin, hetta hin kes rasterast xwe wekî tecelliya Xwedê Te’ala nîşan didin. Lêbelê hemû pêşengê van terîqetan ji aliyê ‘alimên İslâmê ve wekî zindiq, kafir û jidînderketî hatine sûcdarkirin’. Di serî da jî bêguman pêşengê terîqeta hûrûfiyan, Fezlullah Esterebadî, bi vî rengî hatiye sûcdarkirin. Dîsa jî ev mijar û nîqaşen wê dewrê di na-veroka Perîşannameyê da cih nagrin û li gor Mela Perîşan, meqamê ‘welayet’ê ne ‘aydê şêx û meşayîxên terîqetan e; ‘welayet’ her tenê mexsûsê nesebê îmam ‘Elî ye û ji neviyên wî îmamê danzdehem Mehdî, xudanê dawî yê vî meqamê pîroz e.

Wekî me berê jî amaje pê kirî, ji bo têgehiştina hîzr û baweriya Mela Perîşan, çavkaniya herî giring a li ber dest, berhema wî ya yekane Perîşanname ye. Me cehd li ser kiribû ku temaya sereke ya berhema Mela Perîşan, hewldana îsbatkirina welayeta Îmam ‘Elî û yanzdeh îmamên piştî wî ne. Mela, ji bo îsbata vê mijara giring, şêwaza klasîk a ‘alimên şî’â bi kar tîne.

Muellifê berhema me Mela Perîşan, di beyta 40ê da, wekî hemû ‘alimên şî’â, behsa ‘Çardeh Kes’an dike. ‘Çardeh Me’sûm’êñ baweriya mezheba şî’â, cara ewil ji aliyê sahabeyê pênc îmamên pêşî Suleyman bin Qeys el-Hilalî ve (h. 76) hatiye nivîsîn<sup>2</sup>. Ev berhem

<sup>1</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, Jambet, Christian, *h.b.*, r. 198

<sup>2</sup> el-Hilalî, Suleyman bin Qeys, *Kitab Suleym bin Qeys*, Tehqîq: M.B. Ensarî, Teb'

kevintirîn çavkaniya sahabeyekî şî'a ye, ji ber vê jî di tarîxa şî'a da xwedî cihekî taybet e' û ji bo xebat û lêkolînên piştî xwe bûye çavkaniya sereke. Li gor berhemê el-Hilalî û berhemên piştî wî hatî nîvîsîn, çardeh kesên me'sûm ev in: Pêxember Muhemed (1), keça wî Fatima (2) û Danzdeh Îmamên mezheba şî'a: 'Elî (3), Hesen (4), Huseyn (5) û îmamên dî yên ji nîfşê Elî; Zeynelabidîn el-Seccad (6), Muhemed el-Baqir (7), Cafer el-Sadiq (8), Musa el-Kazim (9), 'Elî el-Riza (10), Muhemed el-Teqî (11), 'Elî el-Neqî (12), Hesen el-Eskerî (13) û Muhemed el-Mehdî (14)<sup>2</sup>. Dema Mela Perîşan behsa van Çardeh Me'sûman dike, wiha dinivîse:

Seb'ê heft mesanî ve me'na duwan  
Seb'ê mesanî hemdê Çardeh Ten zan (b. 40)

Têgeha du-heft an jî 'seb'ê mesanî', tê zanîn ku ji Qur'anê ye û di Sûreya Hicr, ayeta 87em da cih digre. Li gor Mela jî Çardeh Me'sûm, ango du-heft kesên di Sûreya Fatîheyê da hemd ji bo wan heye, her heman kes in û di Perîşannameyê da pesnê wan tê dayîn. 'Alîm û mufessirê navdar Eyyâşî (h. 320) vê mijarê ji gotinên îmamê şeşem Cafer el-Sadiq, bi vî awayî neql dike:

"Ji ber ku di nimêjê da Sûreya Fatîhe du caran tê xwendin, wek seb'ê mesanî/du-heft tê binavkirin. Qesda vê ayetê ehlê beytê ye ku wek diyarî bo pêxember hatiye dayîn."<sup>3</sup>

Mela Perîşan, bi uslûbeka edebî, vê hedîsê tîne bîra me û di te-mamê naveroka Perîşannameyê da, doktrîna 'esasî û giring a baweriya mezheba şî'a rave dike. Li gor vê doktrînê îmamê me'sûm ku pêxember bi xwe ye, 'kitêba bideng' e (kitab-i natiq) û Qur'an jî

Xamis, Delîl Ma, Qom, 1428

<sup>1</sup> Amir-Moezzi, "Note Bibliographique sur le Kitâb Sulaym b. Qays, le Plus Ancien Ouvrage Shi'ite Existant", Le Shi'isme Imâmîte Quarante Ans Après, Hommage à Etan Kohlberg, sous la direction de Mohammad Ali Amir-Moezzi, Meir M. Bar-Asher, Simon Hopkins, Brepols, Belgium, 2009, rr. 33-49.

<sup>2</sup> Algar, Hamid, "Cahârdah Ma'sûm", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. 4, Fasc. 7, New York, 1990, rr. 627-629

<sup>3</sup> el-Eyyâşî, Şeyx Ebî Nezr Muhammed bin Mesûd, *El-Tefsîr, el-cuz' el-sanî, Mu-essise el-Bîse*, Qum, 1430, r. 437

'kitêba bêdeng' e (kitab-i samit)<sup>1</sup>.

## Xedîr-i Xumm

Di pêdeçûna berhema xwe da Mela Perîşan hewl daye bi ayetên Qur'anê, hedîsan û agahiyêن tarîxî, li gor doktrîna mezheba şî'a, îddiaya welayeta imaman îsbat bike. Ev jî nîşanî me dide ku Mela Perîşan, Qur'anê baş dizane û di 'ilmê hedîsê da jî xweyî zanîn û agahdariyeka berfireh e. Ji xeynî vê jî Mela Perîşan, bo îsbata baweriya mezheba xwe, wekî 'alimên dewrê, behsa sê bûyerên giring ên tarîxî dike. Ji van sê bûyeran ya herî giring bêguman meseleya 'Xedîr-i Xumm' e ku di beytên 250 û 251ê da behsê dike.

Li gor çavkaniyêن îslamî, di sala 10ê hicretê da, piştî ku pêxember ji heca dawî ya wedayê (Heccet'ul-Weda) vedigere Medîneyê, ayeta 67ê ya Sûreya Maîde, jê re nazil dibe: "Ey pêxember! Ya ku ji teref Xwedê ve ji bo te hatiye nazilkirin, teblîx bike bo însanan. Heke tu vê nekî, tu dê peyama wî belav nekî. Dê Xwedê Te'ala te ji însanan biparêze. Bêguman, Xwedê kafiran nagehîne hidayetê." Wê demê, qefleya misilmanan, digehe nêzîkî newala Cuhfeyê, li wê derê hewzeka avê heye bi navê Xedîr-i Xumm ku di navbera Mekke û Medîneyê da cih digre. 18ê heyva Zi'l-Hicce, roja pêncsemê danê nîvro ye û li duryana Xedîr-i Xumm, rîyêن gelek bajaran digehin hev.

Pêxember ji hêstir/deveyê xwe peya dibe, ji munadiyan re dibêje ku bang bikin heçî pêş da çûyî bila vegere û heçî paş da mayî jî bila bileyzîne xwe bigehîne qefleyê. Dema her kes kom dibe, ji kurtanêن hêstiran minbereka bi qasî sê derenceyan bilind, ji bo axaftina pêxember tê çêkirin. Ev heca dawî, wekî Heca Wedayê, Heca Kêmalê, Heca Belaxê an jî Heca İslâmê hatiye binavkirin. Di belgeyêن dîrokî da li ser hejmara însanên tevlî vê hecê bûyi, reqemên ji hev cuda hatibin nivîsîn jî, wisa tê qebûlkirin ku ji eshabê pêxember herî kêm 40 hezar kes li wê derê hazir bûne.

Ji ber germahiya hewayê, sehabeyan qismekî cilêن xwe avêtine

<sup>1</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, *Le Coran Silencieux et le Coran Parlant, Sources Scriptuaires de l'Islam Entre Histoire et Ferveur*, CNRS Editions, Paris, 2011, f. 115

ser serê xwe û bi qismekî jî lingên xwe pêçane. Piştî nimêjê, pêxember derdikeye ser minberê. Hemd û senaya xwe bo Xwedê Te'ala dibêje, işaret bi pêxembertiya xwe dike û paşê ji eshabê xwe dipirse: "Ey cema'eta bawermend! Xwedê Te'ala bi min 'eyan kiriye ku 'umrê min hatiye ber xilasiyê û di nêz da ez ê guh bidim gaziya Rebbê 'Alemê, koça xwe ji vê 'alema hebûnê bar bikim û biçim. Ez jî hûn jî, em berpirsyar in ji bo teblîxkirina vê rastiyê. Hûn ci dibêjin?"

Hemû sehabê dibêjin "Em şahidiyê dikan, ji bo te ci nazil bûye te ew teblîx kir; te şer kir û şîret kir, Xwedê bila ji te razî be û bi xêr û xweşiyê te pêşwazî bike." Li ser vê, Muhemed Pêxember dipirse: "Hûn şahidiyê dikan ku Xwedê yek e, Muhemed 'evd û resûlê Wî ye, biheşt û dojeh heye, piştî mirinê jiyaneka dî heye, roja qiyametê heye û tu şik û guman di van de nîne?" Hemû sehabê bersivê didin û wiha dibêjin: "Belê, em şahidiyê dikan". Pêxember dibêje "Xwedayê min bibe şahid" û dewam dike: "Di koça axretê da, ji bo gehîstina ber rehma Xwedê Te'ala, ez ê li pêşiya we hemûyan bim, hûn ê jî li ber peravê hewza rehmetê bigehin min. Dirêjahiya wê hewzê bi qasî navbera Sen'a û Bûsrafê ye, bi qasî stêrkên asîmanan qedehêن zîvîn li wê derê hene. Dema hûn gehîstîn min, ez ê ji we bipirsim: Du tiştên sereke yên xwedî qedr û qîmeteka bêhempa, ci ne û we di vê jiyanê da çawa mu'amele li wan kiriye?.."

Li gor riwayetekê, yek ji sehabeyan dipirse: "Ya Resûlê Xwedê, ew herdu tiştên di qedr û qîmetê da bêhempa ne, gelo ci ne?" Pêxember wiha bersivê dide: "Mirov nikare qedr û qîmetekê diyar bike ji bo du tiştan: Ya yekem, kitêba pîroz ya Xwedê Te'ala ye; seriyeq di destê we de, yê dî jî di destê Xwedê Te'ala da ye. Xwe li wê kitêba muqeddes bigrin, wê bernedin û neguherînin. Ya dî jî ehlê beyta min e. Xwedayê ji her tiştî agahdar, ji min re beyan kir ku heta em li peravê wê hewzê hev bibînin, ev herdu tiştên bêhempa dê ji hev cuda nebin. Ez çawa ji bo we dibim xelef û xelîfe, hûn ê li van herdu tiştan binêrin û bizanin."

Paşê, Muhemed Pêxember ji eshabê xwe dipirse: "Ma ez ne ji hilîm û nefesa bawermandan nêziktr û qenctir im ji bo wan?" Her kes bi hev ra dibêje "Belê, rast e ya Resûlallah." Resûlê Xwedê dîsa dipirse: "Ji bo her jin û mîrê bawermend, ma ez ne ji hilîm û nefesa

wan nêziktir û qenctir im?" Eshabê wî dîsa cewabê dide û dibêje, "Belê, rast e." Piştî wê pêxember gazî Hz. 'Elî dike, li ser minberê 'Elî li aliyê rastê disekine, pêxember destê wî yê rastê radike jor û dibêje: "Ez mewlayê kê bim, 'Elî jî mewlayê wî ye". Paşê destê xwe vedike û vê du'ayê dike: "Ya Rebbî, heçî dostê 'Elî ye, tu jî bibe dostê wî; heçî dijminê wî ye, tu jî bibe dijminê wî; heçî alîkariya wî bike, tu jî alîkariyê bideyê; heçî heqaretê lê bike, tu jî heqaretê lê bike; rastî û duristiyê bike rêhevalê 'Elî." Paşê fermanê dide eshabê xwe; kê li wê derê şahidiya vê bûyerê kiribe, bila ji bo yên nedîtî û nebihîstî, vê bûyerê rast û durist bibêje<sup>1</sup>.

Piştî vê teblîxê, ayeta sêyem a Sûreya Maîde nazil dibe: "Îro min dîn we ji bo we kemiland, ni'meta xwe jî li ser we temam kir, wekî dîn min ji bo we dînê İslâmê hilbijart." Piştî nazilbûna vê ayetê, herdu xelîfeyên ewil, Ebû Bekir Siddiq û 'Umer bin Xetta'b, berî her kesî diçin û 'Elî pîroz dikin. 'Umer, ji bo 'Elî wiha dibêje: "Pîroz be, xwezî bi ruhê te ey kurê Eba-Talib! Îro tu bûyî mewlayê min û pêşengê hemû jin û mîrênen bawermend"<sup>2</sup>.

Muheddisêni ji ehlê sunnetê, yên kitêbên wan wekî şes kitêbên sehîh yên hedîsan têن qebûlkirin; Îbn Mace, Tîrmîzî û Neseî, herwiha îmamê mezheba Henbelî, Ehmed bin Henbel, Hakimê ku bawerî bi çavkaniyêñ kitêbên wî heye, Xetîbê Xarezmî û Mutteqî Hindî, li ser meseleya Xedîr-i Xumm nivisîne. Ji sedalsa hicrî 1ê, ji sihî zêdetir zanyarêñ olî, muheddis û mufessirêñ serdemê yên wekî Se'lebi, Wahidî, Qurtubî, Qadî Beyzawî, Fexr-i Razî, dîrok-nasîn wekî Belazûrî, Ibn Quteybe, Teberî, Ibn Kesîr, Ibn Xelîkan û Suyûtî, kelamzanêñ wekî Ebû Bekir Baqîlanî, Seyyîd Şerîf Cur-canî, Teftazanî û Alî Quşçî, di berhemêñ xwe da meseleya Xedîr-i Xumm nivisîne. Ji 'eshabê rawiyêñ hedîsê sed û deh<sup>3</sup>, ji tab'iên wan heştê û çar<sup>4</sup>, ji 'alîmîn şî'i-sunnî jî, sê sed û şêşt<sup>5</sup> kesan riwayeta Xe-

<sup>1</sup> Amolî, Seyid Ebdilhuseyin Şerefeddîn, *Munazirat-i Şî'a ve Sunnî, tercüme-yi Farîsi-yi El-Muracaat*, wer. Serdar Kabulî, Neşrî Sayî, Tahran, 1380, rr. 73-78

<sup>2</sup> Ji bo zêdetir agahiyêñ li ser bûyera Xedîr-i Xumm ji çavkaniyêñ cuda yên şî'i/sunnî û rawiyêñ wan, bnr: Eminî Necefî, Ebdilhuseyin, *El-Gedîr fi el-Kitab ve l-Sunne ve l-Edeb*, Muessise el-E'lemî li-l Metbûat, Beyrût, 1994

<sup>3</sup> *El-Gedîr*, h. b., rr. 35-88

<sup>4</sup> h. b., rr. 89-101

<sup>5</sup> h. b., rr. 102-190

dîr-i Xumm neql kirine. Mela Perîşan jî wekî ‘alimên şî’â, meselaya Xedîr-i Xumm wekî nîşaneyâ welayeta ‘Elî qebûl kiriye ku ji aliyê pêxember ve li Xedîr-i Xumm, bi awayekî zahirî jî hatiye îlankirin.

### Seqîfe-i Benî Sa’ide û Wesiyeta Pêxember

Agahiyeka dî jî meseleya ‘Seqîfe’ ye ku Mela Perîşan wekî bûyereka dîrokî ji bo îsbata welayeta ‘Elî behs dike; neheqiyêne lê hatî kirin bi vê bûyerê pênase dike. Li gor çavkaniyê dîrokî, beriya we-fata Muhammed Pêxember, di nav sehabeyan da fîkr û ramanêni ciyawaz berbelav bûne û nîqaşan dest pê kiriye. Resûlê Xwedê xwes-tiye wesiyeta xwe binivîse û wiha kerem kiriye: “Ji min ra heft cêr av bînin, pişkên wê li ser û çavên min bikin, paşê qelemekê jî bînin. Ez wesiyeta xwe bo we bidim nivîsandin, da ku piştî min hûn qet rêya xwe winda nekin.” Sehabeyan jî li ser nivîsîna wesiyeta pêxember dest bi nîqaş û gengeşeyan kirine. Hindekan ji wan gotine qey hişê pêxember ne li serê wî ye û ji ber tîna nexweşiyê wisa diaxive, lewma jî wesiyeta pêxember nehatiye nivîsîn<sup>1</sup>.

Piştî wefata pêxember, di navbera sehabeyan da zêdetir nakokî û dubendî derketine. Hetta, di gusl û definkirina pêxember da, tenê çend kesan cih girtiye. Hezretê ‘Elî, pêxember şûştiye, spartîye axê<sup>2</sup> û di vî karî da milyaketê Xwedê, Cebraîl alikariya wî kiriye<sup>3</sup>. Mela Perîşan di beyta 948em a *Perîşannameyê* da vê bûyerê wiha neqil dike:

Pey jî şeqawet kirdey nameqbûl  
Mehrûm ji techîz nemazê Resûl (b. 948)

Wê demê, pirraniya misilmanan jî li cihekî bi navê Seqîfe-i Benî Sa’ide kom bûne û piştî nîqaşen dirêj, Ebû Bekir wek xelîfe hatiye

<sup>1</sup> Gölpinarlı, Abdülbaki, *Tarih Boyunca İslam Mezhepleri ve Şiiilik*, Dar Yayınlara, 2003, rr. 49-52

<sup>2</sup> Ye'qûbî, Ehmed bin İshaq, *Tarîxâ Ye'qûbî*, cild 1, Tecumê M. İ. Ayeti, ‘İntişaratâtê ‘Ilmi ve Ferhengî, Tahran, 1382, r. 510.

<sup>3</sup> h. b., r. 523

hilbijartin<sup>1</sup>. Lébelê hemû sehabê û misilmanan ji bo wî bî'et nekiri-ne. Ji wan kesan yên sereke ev in: Zava û pismamê pêxember Hezretê 'Elî, mamê pêxember Ebbas û kurê wî Fazl bin Ebbas, Zubeyr bin Avam, Miqdad bin Eswed, Selmanê Farisî, Emmar bin Yasir û Ebûzerê Xeffarî<sup>2</sup>. Ji wan sehabeyan Selman, Miqdad, Emmar û Ebûzer, eşkere gotine ku heqê 'Elî hatiye bînpêkirin û wek xelîfe ji bo Ebû Bekir bî'et nekirine. Ev her çar sehabê, di baweriya mezheba şî'a da wek *Erkan-i Erbe'e* (çar rukn) hatine binavkirin<sup>3</sup>. Li gor baweriya şî'a, ev her çar kes, di dewra pêxember da jî hetta piştî wefata wî jî, şî'i bûne<sup>4</sup>.

Mela Perîşan, di beytên 81 û 83yem ên berhema xwe da neql dike ku Xwedê Te'ala sê cûre însan afirandine: Nas (insanê rastîn), şibhê nas (şibî însanan) û nesnas (aferîde). Ev her sê kategoriyêن însanan ku Mela Perîşan behs dike, di literatura mezheba şî'a da cih digrin<sup>5</sup>: Li gor mezheba şî'a, însanê rastîn, ango însan-i kamil, tenê 'çardeh me'sûm' in ku berê jî me behsa wan kiribû. Piştî wan, ew însanên ku bawerî bi wan anîne û bî'et kirine, dibin 'şibhê nas'. Yen mayî jî 'am in, ango aferîdeyêner dera hanê yên ku nenas in. Mela Perîşan dema behsa 'şibhê nas' dike, çar navêن bîngehîn ên baweriya şî'a rîz dike: Miqdad bin Eswed, Selmanê Farisî, Emmar bin Yasîr û Ebûzerê Xeffarî. Bi qencî behskirina van çar kesan jî pêkan e wek argumaneka qewî ji bo şî'ibûna Mela Perîşan bê nirxandin.

Divê bê gotin ku meseleya Seqîfe, ji aliyê dîroknaşen misilman û lêkolînerên rojavayî<sup>6</sup>, başebaş hatiye analîzkirin. Ev bûyer, di dîroka

<sup>1</sup> Teberî, Muhammed bin Cerîr, *Tarîx el-Rusul ve I-Mulûk*, cild 4, tercumê A. Payandeh, çap 3, Intîşaratê Esatîr, Tahrân, 1362, rr. 1342-1354 / Ibn Esîr, Izzed-dîn, *El-Kamil*, cild 3, tercumê S. H. Rûhanî, Intîşaratê Esatîr, çap 3, Tahrân, 1383, rr. 1199-1208

<sup>2</sup> Ye'qûbi, h. b., r. 524

<sup>3</sup> Şeyx Mufid, Muhammed bin Muhammed bin Nu'man, *El-Ixtisas*, be kuşesê A. A. Gaffârî, Cemaet el-Muderrisin fî Hewze Ilmiyye, Qum, b.t., r. 6

<sup>4</sup> Nubextî, Hesen bin Mûsa, Qomi, Sa'd bin Abdullah, *Fireq el-Şî'a*, teshîh: A. el-Hefeni, Dar el-İşâd, 1412, rr. 28-29

<sup>5</sup> Amir-Moezzi, Mohammad Ali, "Seul l'Homme de Dieu est Humain, Théologie et Anthropologie Mystique à Travers L'Exégèse Imamite Ancien", *Arabica*, Vol. 45, No. 2, 1998, rr. 193-214

<sup>6</sup> bnr. Lammens, "Le Triumvirat Aboû Bakr, 'Omar et Aboû 'Obaida", *Mélanges de la Faculté Orientale de l'Université St. Joseph de Beyrouth*, vol. iv, 1910, rr. 113-144 / Caetani, L., *Annali dell'Islam*, 1905-26, 10 vols.

mezheba şî'a da xwedî cihekî muhîm e. Misilman li Seqîfeyê kom dîbin ji bo hilbijartina xelîfeyekî nû û li gor baweriya şî'a, ev yek rasterast înkara Xedîr-i Xumm û wesiyeta pêxember e<sup>1</sup>. Di navbera beytên 346 û 351ê da Mela Perîşan behsa Seqîfe dike û vê bûyerê wekî roja mehşerê pênase dike. Li gor muellifê berhemê, bûyera Seqîfe, fitne û fesadiya xelîfeyê duyem ‘Umer bin Xettab e, lewra piştî Ebû Bekir jî ew wek xelîfe hatiye tayînkirin. Li gor Mela Perîşan, ji ber van fitne û fesadiyên ‘Umer bin Xettab, piştî salan ‘Elî, Hesen û Huseyn hatine şehîdkirin<sup>2</sup>.

Gelek çavkaniyêن navborî yên tarîxa İslâmî destnîşan dîkin ku Ebû Bekir bi piştgirî û yarmetiya ‘Umer bin Xettab wekî xelîfe hatiye tayînkirin. Madelung, li dîjî vê fîkrê dibêje Ebû Bekir wekî tacir, şêwirmendê pêxember û siyasetmedarekî, beriya wefata pêxember, jîxwe pêşbîniya wan rojan kiriye û bi hûrgulî bûyer û qewamên serdemê analîz kiriye. Ebû Bekir di saxiya pêxember da, wekî xelîfe nehatiye îlankirin lê dîsa jî guman jê nîne, wî beriya wefata pêxember qerara xwe daye ku bibe xelîfeyê yekem ê Dewleta İslâmî. Ji bo vê armanca xwe pêk bîne jî, berî her tiştî divê îddiaya xelîfetiya ehlî beytê pûç bikira û li şûna yekî ji malbata pêxember, ew bi xwe bûbûya xelîfe<sup>3</sup>. Ji ber ku di Qur'anî da jî pesnê ehlî beyta pêxember heye û di nav misilmanan da payeya wan bilinditir e. Civîna li Seqîfeyê, ev derfet daye wî û tevî ku ne endamê ehlî beytê ye, Ebû Bekir wek xelîfeyê yekem hatiye hilbijartin.

### Meseleya Baxçeyê Fedek

Bûyereka dîrokî jî li ser meseleya baxçeyê xurmeyan a bi navê ‘Fedek’ e ku Mela Perîşan di berhema xwe da nivîsiye. Mezheba şî'a, ev bûyera muhîm wek delîla neheqiya li ehlî beytê qebûl kiriye û di çavkaniyên dîrokî yên herdu mezheban da jî ev bûyer hatiye

<sup>1</sup> Muzaffer, Muhammad Riza, *el-Saqîfe*, Muessisê Ensariyan Li l-Tiba'e ve l-Nesr, Qum, 1415, rr. 60-66

<sup>2</sup> Dawûdî, Said, Rostam Nijhad, Mehdi, ‘Ashoora, Rîşê ha, Engîzê ha, Rûyadâha, Peyamed ha, Întîşaratê İmam Ali, çap 5, Qum, 1387, rr. 115-126

<sup>3</sup> Madelung, Wilferd, *The Succession to Muhammad, A Study of the early Caliphate*, Cambridge University Press, 2004, r. 39

nivîsîn.

Li gor çavkaniyêن dîrokî, piştî xelîfetiya Ebû Bekir qewî dibe û hêz dikeve destê wî, pasevanêن Fatima bi darê zorê ji baxçeyê Fedekê derdixe û 'eraziyê li ser navê beyt-ul mala Dewleta İslamê zebt dike. Ev baxçeyê xurmeyan piştî fetha Xeyberê (h. 7) ketiye para pêxember. Li ser emrê Sûreya Îsra' ayeta 26ê û Sûreya Rûm ayeta 38ê, pêxember ev baxçe ji bo keça xwe Fatimayê wel mîras hiştiye. Ebû Bekir jî li ser riwayeta hedîsa pêxember "Mîrasa pêxemberan nîne, tiştîn me hiştî sedeqe ne", ev baxçe daye zebtkirin û ji ehlê beytê standiye.

Fatima, heta wê demê, dahata vê baxçeyê xurmeyan her daye feqîran. Ji bo ku ev baxçe neyê zebtkirin 'Elî, Hesen û Huseyn diçin cem xelife Ebû Bekir û ricayê jê dikin, herwiha derheqê mîrasbûna baxçeyê da, şahidiya Ummu Eymen jî, ji aliyê xelife Ebû Bekir ve nayê qebûlkirin. Di çavkaniyêن dîrokî û kitêbên hedîsan da hatiye nivîsîn ku piştî demekê, Xelîfeyê duyem 'Umer bin Xettab, baxçeyê Fedek daye 'Elî bin Ebû Talib; xelîfeyê sêyem Osman bin Affan jî (h. 35) bexş kiriye ji bo pismamê xwe Merwan bin Hekem (h. 65)<sup>1</sup>.

Wekî gelek 'alîmê mezheba şî'a, Mela Perîşan jî, behsa Baxçeyê Fedekê kiriye, di sê cihêن cuda yên berhema xwe da. Di beyta 949ê da wiha nivîsiye: "Ji bo destdanîna ser baxçeyê Fedek, wan derew kir, heta roja qiyametê bila ne'leta Xwedê li ser wan be." Di beyta 964ê da jî, destdanîna ser baxçeyê Fedekê, dişibîne hilweşandina tirba pêxember. Di beytên 968 û 969ê da jî wiha dibêje: "Heke meq-seda wan fesadî nebûya, Fedek ji bo Zehra (Fatima bintî Muhammed) ne tiştekî zêde bû. Wan Fatima ji mîrasê bê par hiş, ne ji Xwedê tirsîyan ne ji Pêxember." Mela Perîşan, yên ku bûne sebebê vê bûyerê bi awayekî tund rexne û şermezar dike.

Piştî râvekirina van her sê bûyerên dîrokî, di beşa duyem a xeba-ta xwe da em ê hewl bidin naveroka Perîşannameyê li gor 'esasên bingehîn ên baweriya mezheba şî'a, bi awayekî berawirdî zelal bîkin û bi giştî naveroka Perîşannameyê li gor temayêن binbesen ber-hemê rave bikin.

<sup>1</sup> Gölpinarlı, h. b., rr. 67-68

BEŞA DUYEM  
Li Ser Perîşannameyê

### Nusxeyên Berdest yên Perîşannameyê

Heta niha lêkolîneka berfireh li ser nehatibe kirin jî, zêdetirî bîst nusxeyên Perîşannameyê hatine tesbîtkirin. Ji van destxetên li kitêbxaneyên muxtelîf pênc nusxe bi awayekî dîjîtal jî berdest in. Me birrek nusxeyên berhemê kom kirin, ji aliyê qebare û tesnîfa na-verokî ve dane ber hev û ji bo lêkolîna xwe nusxeya dîjîtal ya arşîva Martin Hartman hilbijart.

Sersebebê vê hilbijartinê ew e ku di nav nusxeyên hazir da kamiltirîn nusxe ew e û ji aliyê naverokê ve bi awayekî qenc, beş bi beş hatiye tesnîfkirin. Herwiha sebebek jî ew e ku ji bo xwendin û tê-gehiştinê, ev nusxeya Berlînê guncawtir e, ji ber ku gelek nusxeyên berhemê yên li Îranê hatine parastin, hem ji aliyê naverokê ve xwedî cudahiyên giring in hem jî pirraniya nusxeyan ji aliyê qebareya xwe ve kêm in. Pirraniya wan tenê ji muqeddimaya berhemê pêk tênen û qebareya wan di navbera 550-600 beytan da ye. Destxeta ku me ji bo lêkolîna xwe hilbijartiye ji xeynî beytên dubare yên saqîname û meqtelê, ji 1017 beytan pêk tê.

Li gor fihrista lêkolîner Hadî Bîdakî amade kirî, 19 destxetên cuda yêن Perîşannameyê hene li kitêbxaneyên muxtelif yêن Îranê. Hindek ji wan, ji aliyê qebareya xwe ve pirraniya berhemê muhafize dîkin lê nusxeyeka kamil û tesnîfskirî wekî ya Berlînê, di nav wan da nîne û ev yek jî karê muqayesekirina destxetan zehmettir dike. Bo nimûne nusxeya Kitêbxaneya Millî ya Îranê, teqrîbî ji 580 beytan pêk tê û li ser nusxeyê di wereqa pêşî da wek serenav Dîwan-i Molla Perîşan hatiye nivîsin.

Di dawiya destxeta me da piştî xatimeyê beşek ji meqtelê hatiye dubarekîrin. Ev beş bi ferqên piçûk tekrara meqtelê ye ku di xeba-ta me da wek 'Bab-i evvel' cih girtiye. Herwiha piştî wê, dubareya saqînameyê dest pê dike ku di navbera wê û saqînameya yekem da çend ferq û cudahî xuya dibin lê gumana me jê nîne ku ev beş wekî 'deftera xeletan' nehatiye nivîsin. Belkî mustensîsekî, cuda ji bo nî-sandayîna keyfxweşîya xwe ji bo van herdu beşen berhemê, paşê li destxetê zêde kiribe.

Hêjayî gotinê ye ku destxetaka dirêjtir ji destxeta me, di arşîva Kitabxaneya Şûray İslâmî ya Îranê da heye û bi hejmara 18086/209251 hatiye qeydkîrin. Balkêş e ku di dawiya vê destxetê da du beşen dî hene, di destxeta me da nînin. Beşa yekem celebeka cuda ya qewlê Bersîsê 'Abid e. Di beyta yekem da nivîskar diyar dike ku çîrok ji kitêbekê wergirtiye. Ya duyem jî medîheyek e ji bo Elî bin Ebû Ta-lib. Ihtimal e ev herdu beş ji berhemeka dî bin lê bi 'eynî xetê ji aliyê mustensîx ve lê hatibine zêdekirin. Ji bo tesbîtkirina 'aydiyeta van herdu beşan, edîsyon-krîtika berfireh û muqayeseya destxeta me û destxeta navborî, elzem e. Herwiha, di heman arşîvê da destxetaka cuda heye, wek pexşan hatiye nivîsin. Lêbelê teví bîst û sê nusxeyên menzûm, tenê yek nimûneya pexşanê heye, lewma jî ne pêkan e mirov Perîşannameyê wek pexşan qebûl bike.

### Nusxeya Berlinê

Berhem, di arşîva M. Hartman ya Berlînê da wek kitabçeyeka bi berga qehweyî hatiye parastin. Li ser tarîxa berhemê tiştek nehatiye gotin lê ev nusxeya Perîşannameyê ji aliyê mustensîx Muhammed

Qulî Hersînî ve hatiye îstînsaxkirin. Hersînî, di dawiya xatimeyê da roj û sala nivîsîna nusxeyê eşkere dike:

Temmet-ud dîbaçeyê zîbaçe be 'ewni Melîk-ul mennan fî xamis Şehr-i Siyam yewm-ul erbe'a senet 1313 'ela yedd-ul heqîr-ul feqîr-ul 'asî-yul xatî-yul mezlûm wel cuhûl we-l muntezir bi şefa'etê Sibt-sur Resûl, Hezretê Ebî 'Ebdullah 'eleyhî selam, Muhammed Qulî Hersînî cihetê yadîgarî tehrîr şod iltimasê du'a est. (wrq. 52b)

Çaremin roja Remezanê sala h. q. 1313ê, wek diyarî ji bo kesekî hatiye tehrîkirin. Sala li ser destxetê m. 1896 e. Kesê ku destxet di arşîvê da qeyd kiriye, bi hibra reş tarîxa 1904ê li ser daniye. Martin Hartman wan salan li gelek deverên Kurdistan û Îranê geriyaye û ihtimal e ev destxet yadîgarek be ji wan seferan.

Berhem di wereqa sêyem da bi nivîsa *Şe'neh-ul 'ezîz, huwellahû te'ala* dest pê dike. Serenavê berhemê bi hubra sor di wereqên sêyem û çarem da hatine rîzkirin. Berhem, bi hubra reş hatiye nivîsin û cureya xeta wê nestelîq e. Destpêka berhemê 'Bismillahi-r rehmani-r rehîm' e. Rengê wereqan zer e û ebatên wê teqrîben 14.5 û 19.5 cm ne.

Ji xeynî xeta mustensîx, şopê sererastkirineka cuda tê da nînin. Bi temamî nebe jî pirraniya hedîsan û ayêtêن Qur'anê bi hubra sor hatine işaretkirin. Berhem bi yek xetê hatiye nivîsin û di dawiyê da deftera xeletan cih nagre. Di wereqa dûmahîkê da tarîxa tesnîfa berhemê wek 28ê Gulana 1975ê hatiye nivîsin<sup>1</sup>. Roja iro ev arşîva Martin Hartman bi gelek formatêن cuda yên dîjital li ser malpera Bibliotheka Berlînê berdest e û ji bo her cure lêkolînê vekirî ye.

## Ziman û Lehce

Ji aliyê termên ayînî ve, ferhenga zimanê 'erebî di hin beşan da zêde li ber çavan bikeve jî berhem ji serî heta binî taybetiyêن grammâtik yên zimanê kurdî di nav xwe da dihewîne. Lehceya berhemê goranî ye, devoka wê Kirmanşahî ye. Mezmûn, têgîn, term û

<sup>1</sup> Staatbibliothek zu Berlin, Digitalisierte Sammlungen, 2014, [https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht?PPN=PPN781376718&PHYSID=PHY\\_S\\_0001&DMDID=&view=picture-toolbox](https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht?PPN=PPN781376718&PHYSID=PHY_S_0001&DMDID=&view=picture-toolbox) (10.05.2022)

qalibên zimanê ‘erebî di berhemê da serdest in. Bi taybetî ayet û telmîhên ji Qur'anê gelek zêde ne û bi dehan hedîsên ji çavkaniyêñ mezheba şî'a di berhemê da cih digrin ku di beşa Transkrîpsiyonâ Perîşannameyê da yek bi yek wekî jêrenot hatine ravekirin.

Antolojiya Marif Xeznedar, hin agahiyân li ser zimanêñ Mela Perîşan dide me. Xeznedar îddia dike ku muellifê berhemê gelek baş ‘erebî û farsî dizane. Bi dehan ayetêñ Qur'anê û çend beytêñ farsî ji Mewlana Celaluddîn Muhammed Belxî el-Rûmî di berhemê da hene û bi ser da tirkî jî dizane<sup>1</sup>. Ji van zimanân, tirkî di nav berhemê da tenê bi sê-çar gotinan cih digre ku ew jî dijûn û heqaret in bo Melayê Eş'erî. Li ser zanyariya Mela Perîşan ya derheq zimanê tirkî da, naveroka berhemê, agahiyêñ têra xwe qanehker nade me. Lîbelê guman jê nîne ku zimanê Perîşannameyê kurdî ye.

Mela Perîşan ji aliyê hindek lêkolîneran ve wek şâ'irekî lur hatiye nasandin û berhema wî jî wekî berhemeka bi zimanê lurî hatiye şirovekirin<sup>2</sup>. Di hindek danasînê destxetan da zimanê berhemê jî wek farsî hatiye nivîsîn lê ev ne rast e. Mela Perîşan bi xwe di berhemê da behsa ziman an jî lehceya xwe nake lê zêmara beşa meqtelê û saqîname bi temamî taybetiyêñ gramatik û morfolojik yêñ zimanê kurdî nîşan didin. Pirraniya lêkeran li gor qâideyêñ rêzimana kurdî hatine serfîkirin û gelek lêkerêñ ku wekî mesder di metnê da cih digrin, li ser qertafêñ lêkerçêker ên kurdî hatine dariştin lê di berhemê da gelek lêkerêñ farsî û ‘erebî jî cih digrin. Jixwe beytêñ farsî ji aliyê mustensîxê berhemê ve wekî zimanekî biyanî, bi xetekî ciyawaz ji gewdeyê metnê cuda hatine nivîsîn.

Ji aliyê serfa lêkeran, cînav, pêş û paşdaçekan ve berhem taybetiyêñ sereke yêñ goranî/hewramî nîşan dide. Lewma jî, pirraniya besêñ berhemê rê li ber me vedikin ku em bi hêsanî ziman û lehceya berhemê diyar bikin. Ji xeynî çend beytêñ farsî, di berhemê da cînav, lêker û daçkêñ farsî kêm in. Herwiha, di metnê da munazarayek di gel Melayê Eş'erî cih digre û tê da Mela Perîşan, wî wek ‘tirk’, xwe jî wek ‘kurd’ bi nav dike. Ev jî bi me dide zanîn ku zimanê metnê kurdî ye û Mela Perîşan bi xwe jî beyan dike ku ew kurd e.

<sup>1</sup> Xeznedar, h. b., r. 23

<sup>2</sup> Umerayî, h. b., r. 6

## Kêş û Serwa

Berhem bi terza helbesta Yarsan bi deh kîteyan hatiye nivîsîn. Ev celeba kêşa helbestê rengê hindek behrên ‘erûzê dide lêbelê di encama lêkolîna xwe da, em gehiştine wê qena’etê ku berhem bi kêşa ‘erûzê nehatiye nivîsîn. Kêşa berhemê pênc û pênc, deh kîte ye. Mela Perîşan jî li ser şopa gelek şâ’ir û kelamnûsên Yarsan, ev terza xwemalî tercîh kiriye. Her çend diyalog û kelamên pîroz yên Yarsaniyan ji aliyê ruxsarî ve bi terza pehlewiyata helbesta Îranê hatibin nivîsîn jî piştî demekê ev qalib veguheriye.

Li ser peydabûna vê kêşa helbestê fîkrêni ciyawaz hebin jî, pirra-niya lêkolînerên vê qadê wisa pê bawer in ku terza helbesta gelêrî ya kurdêñ Yarsan piştî demekê sirayetî edîbêñ dorhêla Kirmanşahê kiriye û şâ’irêñ kurd yên Yarsan exleb ne bi ‘erûzê lê bi vê kêşa xwemalî helbestêñ xwe nivîsîne. Taybetmendiyeka helbesta Yarsan jî ew e ku nîvmalika ‘ewil, zêdetir bi xîtabekê an jî bi bismillahê dest pê dike û ji tekrarekê pêk tê. Dûmahîka nîvbeyta duyem ‘eynî 5 kîteyêñ destpêkê tekrar dike. Mela Perîşan jî di destpêka berhema xwe da guh dide vê rîbazê:

Min ji bismillah

Ibtida mekim min ji bismillah (b. 1)

Tevî ku di nîvmalikêñ duyem da gelek ayet, hedîs du'a û gotinêñ ‘erebî cih digrin, serwaya berhemê wek “aa, bb, cc, dd” hatiye da-riştin. Ev celeba serwayê pirranî di mesnewiyan da tê bikaranîn û di nav qalibekî ‘erûzê da cih digrin. Çend lêkolînerên qadê, ev dariştina serwayê wisa şirove kirine ku berhem wekî mesnewiyekê bi nav kirine. Herwiha di berhemê da saqînameyek, munacatek, mi’racnameyek û xatimeyek cih digre û ew jî besêñ serbixwe yên mesnewiyê ne.

## Teşe/Cureya Metnê

Heta niha li ser teşe û cureya metnê, di nav lêkolîneran da lihev-

kirinek derneketibe meydanê jî, bi giştî bi sê awayan *Perîşanname* hatiye binavkirin; 'dîwan', 'mesnewî' û 'menzûmeya dînî'. Zêdetir lêkolîner dupat dîkin ku ev berhem dîwanek e lê sebebên qaneher pêşkêş nakin. Ji ber ku naveroka metnê bi awayekî eşkere nayê zanîn, di gel binavkirineke giştî, berhem zêdetir wekî 'dîwan' hatiye pênasekirin.

Lêkolîner Kemal Fuad, dema bi awayekî kurt û panoramîk agahîyan li ser arşîva Berlin Bibliotekhê dide, ji bo berhema Mela Perîşan dibêje 'kevintirîn metna kurdî' ye û 'mesnewiyeka sofist' e. Fîkrêñ xwe yên derheq taybetmendiyêñ mesnewiyê û sebebên vê navlêkirinê eşkere neke jî, xuya ye ji ber sîstema serwayê, dabeşkiranina serenavêñ berhemê û naveroka wê, biryarê dide ku *Perîşanname* mesnewiyek e. Her çend di van çavkaniyêñ da sebebên dîwanbûna berhemê nehatibine eşkerekirin jî gumana me jê heye ku ev navlêkirin ji ber serenavêñ destxetan e. Ji ber ku di hindek destxetan da wek *Dîvan-i Mola Perîşan* cureya metnê li ser hatiye nivîsin. Bal-kêş e ku destxetêñ berhemê pirranî cih didin muqeddimeyê tenê û besêñ wek saqîname, meqtel, munacat û xatime di gelek destxetan da cih nagrin.

Eşkere ye ku qismê muqeddimeyê ne wek dîwaneka muretteb ne jî wek dîwançeyekê hatiye nivîsin. Zêdetirî bîst temayêñ dînî-tesewwuffî tê da cih digrin û bi teşeya xwe temamê vê berhemê nabe dîwanek. Lê ev cureyêñ edebî hemî bi hev ra muqeddimeyekê pêk tînin û besêñ dî yên berhemê jî li gor pêdeçûna mesnewiyekê hâtine nivîsin.

Ji bo navlêkirineke ji derveyî naverokê em bala xwe bidin tesnîfa berhemê, wê demê jî *Perîşanname* bi vî halê xwe wek 'mesnewî' xuya dike. Bi serwaya mesnewiyekê hatiye nivîsin û serenavêñ beşan jî bi hişmendiya mesnewiyeka aynî hatine dariştin lê ji ber ku pirraniya mesnewiyêñ dînî an jî aşiqane di nav qalibê 'erûzekê da têne nivîsin, ev berhem mesnewiyeka bê 'erûz e. Herwiha em dizanîn Mela Perîşan hayedar e ji cureya mesnewiyê jî ber ku wek referansa cureyeka edebî, Mesnewiya Mewlana di *Perîşannameyê* da cih digre.

---

<sup>1</sup> Fuad, h.b., r. 25

Naxwe taybetiyêñ naverokî û şeklî em bi hev re binirxînin, em dikarin bêjin ku *Perîşannname* bi temamî menzûmeyeka dînî ye û bi kêşa kîteyê, di qalibê mesnewiyê da hatiye nivîsîn. Jixwe di navbera celeba metnêñ lehceyêñ kurdî da hem ferqa dînî/mezhebî heye hem jî têgehiştina edebî ne hevpar e. Lewma jî eger lêgerîna cureya metna me, illehî li ser navekî hevpar be di gel cureyêñ edebî yên zaravayêñ dî, naxwe ev berhem mesnewî ye û ji aliyê hindek mustensîxan ve ev yek li ser destxetêñ metnê jî hatiye nivîsîn. Wê demê nîqaşa meşhûr ya ‘yekem mesnewiya kurdi’ dibe ku dîsa bête bîra me.

Lêkolîner Ayhan Tek di xebata xwe *Hamîsiz Şair Babasız Metin* da beyan dike ku *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* yekem mesnewiya edebiyata kurdî ya klasîk e. Tek, gumana xwe eşkere dike û kîmasiya xebatêñ ‘ilmî yên li ser vê qadê tîne ziman û dibêje nusxeyeka sehîh ya *Perîşannnameyê* li ber dest nîne, tenê îddiayêñ hindek lêkolîneran hene lê ne ‘ilmî ne. Ew van îddiayan wekî agahiyêñ pêbawer qebûl nake û dibêje ku jixwe zimanê wan berheman heta beriya dewra Xanî naçin<sup>1</sup>. Ji ber ku heta niha nusxeyeka kamil nehatiye çapkîrin û agahiyêñ li ser berhemê kêm in, gumana rexneyî ya Tek, di cih da ye.

Ev metna ku bûye bingeha xebata me, diyar e ku nusxeyeka kamil a *Perîşannnameyê* ye. Tarîxa vê berhemê eger sedsala 14 an jî 15ê be, naxwe em dikarin bêjin, demeka gelek dirêj beriya *Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, mesnewiyêñ aşiqane û menzûmeyên dînî yên di qalibê mesnewiyê da bi lehceya goranî hatine nivîsîn. Naveroka berhemê, termêñ dînî û zimanê edebî jî nîşan dide ku ev berhem sedsala 14 an jî 15ê hatiye nivîsîn.

### Analîza Naverokî û Tesnîfa Berhemê

Ji aliyê termêñ ayînî ve, qismen ev berhem dirûvê metneka hûrûfî dide. Nûra yekane û du birqên wê yên hevta; nûra welayetê û nûra nubûwwetê bingehêñ baweriya muellif û çavkaniyêñ wê nîşan didin. Bi qasî 40 beytêñ vê beşa sereke, li ser çêbûna gerdûnê

<sup>1</sup> Tek, Ayhan, *Hamîsiz Şair Babasız Metin*, Nûbihar, İstanbul, 2018, r. 22

û afirandina însanan hatine nivîsîn. Em ê di bin vê serenavê da na-veroka besên berhemê bi rêzê rave bikin û li ser van têgînên sereke cih bidin çend şiroveyên derheq metnê.

### Muqeddime: Pendnameyek Li Ser Afirandina Gerdûnê û Meqamê Însan

Gîrîzgaha Perîşannameyê û termên ayînî yêng vê besê, di pêna-skirina hizra edebî û ayînî ya muellifê berhemê da cihekî giring dig-rin. Hema hema nîvê destxetê ji vê besê pêk tê û ev beşa bingehîn a berhemê hêja ye li gel çavkaniyê ji gelek qad û dîsiplinê wekî teoloji, 'ilm-i hûrûf, kurdolojî, imamolojî û tarîxa İslâmê bihête şerhkirin, da ku muqeddimeya metnê bi awayekî berfireh bihête şirovekirin.

Navê besê yê orjinal di destxetê da bi vî awayî hatiye nivîsîn:

Muqeddime der beyanê nukatê m'enewî ve rimuzatê muhtewiyê heqîqî ve işaret ve kinayat der milehayê muxtelif ve halat ve ixba-ratê burhaniyyê şer'iye ve terîqiyyê rezewiyyeyê rezewiyyeyê be lisan ve ilhanê natiqiyê haliyye. (wrq. 3b)

Beytên destpêk û dawiya muqeddimeyê bi vî rengî ne:

Min ji bismillah  
Ibtida mekim min ji bismillah (b. 1)

Her ke ra esrarê Heq amûxtend  
Mohr kerdend ve dehâniş duxtend (b. 574)

Li gor tesnîfa Cemal Ahmedî, beşa muqeddimeyê di nav xwe da zêdetirî bîst mijarêna cuda dihewîne û temayêna sereke yêng besê ev in: Me'rîfeta Perîşannameyê, nubûwwet û welayet, naskirina Xwendê, beyana meqamê însan, wesfê bendegî, Mi'rac, Zatê qedîm, Xummê Xedîr, wesiyyeta Resûl ji bo 'Elî, Zulfeqar û 'Elî, pêxemberê dilan, şanê pêxemberê İslâmê, munazaraya 'eql û 'eşqî.

<sup>1</sup> Ahmedî, C., h.b., r. 88

Beriya ku li ser afirandina gerdûnê û meqamê însan hîzr û baweriya xwe binivîse, Mela Perîşan du hêmanên bingehîn ên baweriya şî'ayê danzdeh îmamî ji bo xwîneran eşkere dike û ji bo pêwendîya di navbera Muhemmed Pêxember û 'Elî da, du mertebeyên 'esasî pênase dike. Yek ji wan mertebeyan 'nubûwwet' e. Xeleka pêxemberiyê ya bi şexsê pêxemberê İslâmê, Muhammed bin Abdullah temam bûye. Mertebeya duyem 'welayet', bi wefata pêxember dest pê kiriye û piştî wî bi şexsêن 'Elî bin Ebû Talib û herdu ferzendêن wî Hesen û Huseyn ev paye hatiye temsîlkirin û wekîlêñ heq yên pêxember ew in. Pişti hatina Îmamê Danzdehem Mehdî, meqamê welayetê jî bi dawî dibe<sup>1</sup>. Ev hiyerarşî û kategorîzekirina ayînî di baweriya danzdeh îmamî da li ser şexsiyetên pêxember û xelîfeyê çarem hatiye sistematîzekirin.

Li gor Mela Perîşan, 'eqîdeyên mezheba şî'a; pêxembertî (nubûwwet), kamilbûn û parastina dînê İslâmê (welayet) xelekek e. Li gor hukmê ayetan bi şexsê pêxember û xelîfeyê dûmahîkê, ev xelek temam dibe. Ev herdu têgîn, di muqeddimeya berhemê da bi awayekî berfireh têne ravekirin û di çend besen dî da jî têne dubarekirin.

Ve ew xud kinaye ji welayet in  
Ne min ye vatim nessê ayet in (b. 17)

Li gor Mela Perîşan, di destpêka 'welayet'ê da herfa 'waw' heye û bi awayekî sergirtî ew herf kinaye ye ji bo şexsê Îmam 'Elî bin Ebû Talib. Ev rîbaz ji aliyê hûrûfiyan ve, ji bo gelek peyvan hatiye tetbiqkirin ku hem herfîn eczayê hem jî ebceda herfan ji bo ravekirina reqemên wan hatine 'emilandin lê ber'eksê metnên hûrûfi, Mela Perîşan behsa 32 herfan nake. Ji bo wî tetbiqa 'ilm-el hûrûf ji 28 herfîn Qur'anê pêk tê û 4 herfîn dî yên farsî (p, ç g, j) daxili vê hesabê nake. Li ser hejmara herfan fîkrîn wî û edîbên hûrûfi, li hev nayêن.

Zemanê eyamê cahiliyet bî

<sup>1</sup> h. b., r. 86

Nebî hat ji b'ed nazil bî Nebî (b. 9)

Nebî vat velêm ji Yezdanê ferd

Nebî û welîyûllah wîş sabit kerd (b. 10)

Lîsanullah, zimanê Xwedê ye, mebesta şâ'ir Muhemed Pêxember e ji ber ku nutqa Qur'anê bi dengê wî hatiye qeydkirin. Mela Perîşan di destpêka berhema xwe da pêwendîya di navbera Muhemed û 'Elî da bi hedîseka navdar tîne bîra me: "Ez bajarê 'ilmê me û 'Elî jî deriyê wî bajarî ye."

Lîsanullah vat perî mudde'a

Min medîney 'ilm 'Elî babûha (b. 14)

Mela Perîşan di beşeka dî da dîsa cih dide hedîseka ji çavkaniyêñ şî'a û bi vî awayî nubûwwet û welayetê, ango payeya pêxember û xelîfe, wekî du şewqên cuda pênase dike ku ji yek nûrê hatine aferandin.

Kerrat Nebî vat raki' û sacid

Ene we 'Elî min nûrin wahid (b. 32)

Di beşeka dî da jî Mela Perîşan bi hedîsa nebewî ("Lehmîke lehmî...") Goştê wî goştê min e, xwîna wî xwîna min e, ruhê wî ruhê min e, cismê wî cismê min e" nêzîkatiya xwe û 'Elî misoger dike. Zahîrî, Muhemed û 'Elî du kes in lê bi me'neya batînî yek in:

Tu ve Pêxember herdu bî şek î

Ne sûret duwan ve m'enî yek î (b. 926)

Hergiz jîy behse nemarûn kemî

Bi nessê hedîsê lehmîke lehmî (b. 927)

Di gel afirandina gerdûnê ku Mela Perîşan wê wekî çîrûşkekâ Xwedayî qebûl dike û dîsa bi referansa hedîsa "min nûrin wahid.."

(ji yek nûrê) wan bi nav dike. Di hindek beytên dî da ji bo 'Elî, Fatime, Hesen û Huseyn wekî sifetên taybet vê çavkaniya nûra Xwedayî rave dike.

Çun Heq ji îcadê masewa perdaxt  
Ji nûrê Ehmed lewh û qelem saxt (b. 325)

'Erş û kursî hem ji nûrê Murteza  
Asman û zemîn hem ji Mucteba (b. 326)

Ji nûrê Huseyn bihişt kird bîna  
Cilwe kerbî nûrê Betûlê 'Uzra (b. 327)

Nûrê Betûl kird meşate her heft  
Etlesê eflak kirdîş ve zer beft (b. 328)

Mezmûna *enasir-i erbe'a* ku di şî'ra tesewwufî ya kurdî da jî gerek caran hatiye 'emilandin, her çar heyberên bingehîn ên cîhanê temsîl dikin: Av, ax, ba û agir. Mela Perîşan vê mezmûnê, ango hebûna zahirî ya her çar unsûran, ji bo sehkîrin û têgehiştina zahirî ya pêxemberê İslâmê şirove dike:

Xak û bad ab û ateş zahir in  
'Unsur pey îmkan me'naş mahir in (b. 38)

Tu xud me'cûnî le çar 'enasir  
Pey şinasay yek le çarîn qasir (b. 398)

Balkêşirîn temaya 'îrfanî ya berhemê, munazaraya 'esq û 'eqî, di vê besê da cih digre. Piştî du beytên ku behsa Şêx Recebê Bursî dike, Mela Perîşan bi me dide zanîn ku ew û Şêx Receb rûniştine, li ser 'eqî suhbeteq kirine û 'esq di cih da ketiye nav civata wan. Ev gînzgaha munazarayê întibayeka wisa dide ku mumkin e muellîfê berhemê ev munazaraya şêx û murîd, wekî 'esq û 'eqî alegorîze kîribe.

Ême ve 'eql û huş behsman kêşa  
Er wehm ve xwar hat 'esq bê perwa (b. 393)

'Eql vat Perîşan pur bî perwa yî  
'Esq vat ferqha mabeynê kûr û bîna yî (b. 394)

'Eql vat kemahî çîşit in menzûr  
'Esq vat muhebbet hesûd mekey kûr (b. 395)  
Kesên zêde mubalexe dîkin, carna hudûdêñ hîzr û bîreweriyê  
dibezenin û di pesindayînê da payeyeka xwedayî didin 'Elî bin Ebû  
Talib, di lîteratura îslamî da wek 'xullat' ango 'mubalexeker' têñ  
qebûlkirin. Bezandina sînorêñ xullûvê/pesindayînê, gelek caran bi  
ayet, hîdîs û fetwayêñ 'ulema, hatîye şermezarkirin û gotinêñ wan  
wek kufrê hatine binavkirin.<sup>1</sup> Mela Perîşan bi xwe di çend beytan  
da rexneyan li wan kesan dike lêbelê dibêje ku ew bi xwe ne xullat  
e, di pesndayîna 'Elî da mubalexe nekiriye. Di vê besê da eşkere ye  
ku Mela Perîşan jî xwe wekî Şêx Recebê Bursî 'xullat' qebûl nekiriye  
û li gor wî di berhemê da mubalexe nîne.

Li wesfê Zatit mekirdim 'ulluvv  
Xarê rahim bî meqamê xulluvv (b. 217)

Ne min ve memduh bel mexlûq ve min  
Xulluvv mekeran ji neqsê batin (b. 218)

Ji xeynî van temayan, mi'raca pêxember, serencama Zulfeqar,  
afirandina çardeh me'sûman û gelek babetêñ dî yên derheq tarîxa  
îslamê, di muqeddimaya berhemê da cih digrin û her yek ji wan bi  
mezmûn, şibandin û telmîhêñ xwe yên balkêş hêjayî şerh û şiro-  
veyêñ dûvedirêj in.

<sup>1</sup> Yavuz, Yusuf Şevki, "Gulûv", dnd. İslâm Ansiklopedisi, c. 14, Türkiye Diyanet  
Vakfı Yayınları, Ankara, 2003, rr.192-195

## Bab-i Evvel: Meqtel-i Huseyn û Zêmarek Ji Bo Kerbelayê

Meqtel cureyeka helbesta klasik e ku taybet ji bo temayekê û li ser kuştina şexsiyeteka muhîm têne nivîsin. Koka peyvê wek îsm-i mekana ‘cihê qetlê’ ye. Ev nav zêdetir bûye serenavê wan berhemên ku ji bo qetlîama Kerbelayê hatine nivîsin. Menzûmeyên bi vî rengî yêñ ku li ser Kerbelayê û qetla ehlê beytê hatine nivîsin, bi giştî wek ‘meqtel-i Huseyn’ hatine binavkirin<sup>1</sup>. Di edebiyata farsî, kurdî û tirkî da gelek nimûneyên vê cureya edebî hene û pirraniya wan jî di teşeya mesnewiyê da hatine nivîsin. Meqtel, bi awayekî kronolojîk û bi berfirehî, bi detayên dilsoj behsa pêkhatina komkujiya Kerbelayê dike.

Her çend Kerbelaya ku simbola mezlûmiyetê ye wekî motîfeka edebî di edebiyata ş'ia da zêdetir cih girtibe jî, hindek şâ'irên kurd ên sunnî jî, serbixwe ji bo vê bûyerê berhem nivîsîne. Şêx Ebdurehmanê Aqtepî (m. 1854 - 1910) yek ji wan şâ'iran e ku bi mexlesa Rûhî, di *Rewdin Ne'îmê* da mersiyyeyaka taybet bi navê *Der Mersiyyeyê Şehzadegan Hesen û Huseyn* ji bo neviyên pêxember û ehlê beytê nezim kirîye<sup>2</sup>.

Mele Perîşan, di *Perîşannameyê* da beşek serbixwe wek meqtel nivîsiye. Bêgunehiya zar û zêçen ehlê beytê, neheqî û zilma Yezîd, pesn û şabaş ji bo Huseyn bin 'Elî, çend taybetiyên vê beşê ne. Bi temamî 96 beytên berhemê ji bo vê beşa meqtelê hatine terxankirin. Di tesnîfê da ji aliyê muellifê berhemê ve beşa meqtelê bi vî rengî hatiye binavkirin:

Bab-i evvel: Der mu'zezi ve pend be zebanê hal ve der yaftenê ehlê 'îrfan ve m'erîfet der heqqê işan ve gurîz be sehrayê purmelalê Neynewa ve şuhedayê Kerbela (wrq. 31b)

Beytên destpêk û dawiya beşa meqtelê bi vî awayî ne:

<sup>1</sup> Gündöör, Ş., "Makîtel-i Hüseyin". dnd. *İslam Ansiklopedisi*, c. 11, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2003, rr. 456-457

<sup>2</sup> Aqtepî, Şêx Ebdurrehmanê, *Rewdin Ne'îm*, Weşanxaneya Spîrêz, Duhok, 2011, r. 159

Muderris watiş ferzendê xelef  
‘Ezîzê danat kirdin mukellef (b. 575)

Nezer ker ve kînê çerxê çenberî  
Quwwetê kuffar ze'fê Heyderî (b. 671)

Kerbela, ji bo hîzr û bîreweriya dînê Îslamê û xaseten ji bo mezheba şî'a sembola huzn û qehrê ye. Heftê û du qurbanîyên vê qetlî'amê bi gelek awayêni ciyawaz, bûne mijara edebiyat û folklora îslamî. Wekî şikestineka bîreweriyê Kerbela, di bîra kolektif a misilmanan da, şînê dike semboleka mayinde û pê ra hestêni tolhildanê jî mezin dike. Lewma jî di tarîxa Îslamê da tu bûyerê bi qasî Kerbelayê deng nedaye û nebûye sebebê perçebûna hişê hevpar yê bawermendan<sup>1</sup>.

Mefhûma Kerbelayê, di lîteratura hûrûfî da jî cihekî giring digre. Bo nimûne di wesiyetnameya xwe da Fezlullah Esterabadî kuştina xwe wekî ‘Aşûra’ û bajarê qetla xwe Şîrvanê jî wekî ‘Kerbela’ya xwe bi nav dike<sup>2</sup>. Komkujiya Kerbelayê wekî sembola mezlûmîyet û şînê hem di lîteratura hûrûfî da hem jî di nav berhemên ‘elewî-bektaşîyan da wek motîfeka dînî-tesewwufî cihê xwe girtiye û hejmareka zêde ya berhemên menzûm li ser vê temayê hatine nivîsin<sup>3</sup>.

Di Perîşannameyê da beşa meqtelê wekî kakilê metnê hatiye hûnandin û di çend besên dî da jî referans hene ji bo Huseyn bin ‘Elî û Kerbelayê. Bo nimûne di beşa muqeddimeyê da Mela Perîşan, piştî neqilkirina hedîseka ji çavkaniyên şî'a; “Huseyn ji min e, ez ji Huseyn im...”, sersebebê kuştina neviyê pêxember, wek kiryareka mechûl û serdayînek ji bo nebî bi nav dike:

Eger huşyar ì m'enî ker û 'eyn  
Huseyn minnî ene min Huseyn (b. 332)

<sup>1</sup> Tek, Ayhan, “Kolektif Bellekte Kirılma ve Yeniden İnşa Olarak Kerbela Yası”, *Monograf*, hej. 11, 2019, İstanbul, r. 14

<sup>2</sup> Bashir, Sh., *Fazlallah Astarabadi and the Hurufîs*, h.b., r. 39; Browne, E. G., h.b., r. 449

<sup>3</sup> Türkoğlu, S., “Türk Edebiyatında Makatel-i Hüseyinler ve Bekâî'nin Kitâbî Kerbelâ Mesnevisi”, A. Ü. *Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, hej. 58, Ankara, 2017, r. 107

Qurbanîy Huseyn herfek mechûl in  
Serdadey Huseyn ihyay Resûl in (b. 341)

Heft beytên meqtelê bi redîfa ‘Huseyn’, hevdeh beyt jî bi redîfa ‘ro!’ di nav atmosfera zêmarekê da hatine nivîsîn. Nîdaya ‘ro!’ yan jî ‘hey ro!’, li herêma Hewramanê ji bo heyflêanîn û mixabiniyê dihête gotin. (b. 651-667) Di kurmancî da beramberî vê, ‘wey li min!’ tê gotin û di formên folklorîk yên stran û kelamên goranî da ev yek hatiye parastin. Ev *beşa* lîrik bi saya dubareya van nîdayan di nav berhemê da cihekî taybet digre:

Perwerdey axûşê Xeyr-ul Beşer ro  
Şuca’ şehîdê sanî yê Heyder ro (b. 651)

Bazûy pehlewî ji kar keftit ro  
Gerd alûy sûretê mahê du heftit ro (b. 652)

Zînetê damanê Zehray Betûl ro  
Pey mergê yaran zar û melûl ro (b. 653)

Lû'lû'yê mercanê behrê Qur'an ro  
Warisê 'ulumê pêxemberan ro (b. 654)

### Bab-i Dovvom: Saqîname

Helbestên ku bi awayekî mecazî û ‘arifane an jî rasterast behsa atmosfera meyxaneyê dikin û hêmanên meyxuriyê di nav xwe da dihewînin, bi ‘erebî wek ‘xemriyat’, bi farsî wek ‘saqîname’ an jî ‘alemnuma’ tên binavkirin. Saqîname, teşeyeka helbesta klasik e ku tê me’neya ‘rîsaleya meygêrê’. Di edebiyata kurmancî da jî saqîname, ji aliye Ehmedê Xanî, Rûhî û Şêx Eskerî ve di dîbaceyên mesnewiyan da hatine nivîsîn<sup>1</sup>.

Nimûneya sereke li gor vê muhtewayê, bi zimanê farsî ji aliye

<sup>1</sup> Adak, Abdurrahman, *Teşeyîn Nezmî-Dî edebiyata kurdî ya klasîk da*, Nûbi-har, İstanbul, 2019, r. 300

Nîzamîyê Gencewî ve hatiye nivîsîn û terza wî bi qalibê 'erûzê wek kevneşopiyeke di edebiyata klasîk a rojhilatî da cih girtiye<sup>1</sup>. Piştî sedsalâ 16ê bûye cureyeka xweser û saqînameyê musteqîl derkotine meydana edebî. Pirraniya van berheman bi behra 'muteqariba nesalim' hatine nivîsîn:

Feûlun / feûlun / feûlun / feûl  
+ - - / + - - / + - - / + -

Beytên destpêk û dawiya beşa saqînameya Mela Perîşan ev in:

Saqî bawere camî pey mestî  
Sûdim mestîyen ziyan ji hestî (b. 572)

Bê zexmê xedeng mujey mehrûwan  
Neng in ve sehray qiyamet liwan (b. 588)

Saqînameya Mela Perîşan, ji 17 beytan pêk tê lê dubareya metnê bi guhertina çend kelîmeyan û bi zêdekirina çend beytan di dawa-ya destxetê da car dî cih digre. Di vê beşê da taybetmendiyê se-reke yên zimanê kurdî derdikevin pêş û ferhenga berhemê -ku di muqeddimêye da zêdetir bi zimanê 'erebî ye- ber bi kurdiya goranî ve dadigere.

Muellifê berhemê, di vê beşê da meya mecazi bi armanca gehiştina mertebeya 'fenafillah'ê ji saqiyê ezelî Xwedê Te'ala dixwaze, ji bo ku hebûna xwe di nav hebûna Xwedê da bihelîne û seyrî sulûka xwe temam bike. Mela Perîşan, bi vexwarina meyê dixwaze dinya û mafîha, zahir û batin, her tiştî bi temamî ji bîr bike û bigehe mer-haleya fenafillahê:

Camî ke mexzim bawerû ne cûş  
Dinya û mafîha bikem feramûş (b. 673)

<sup>1</sup> Karaismailoğlu, Adnan, "Sâkînâme", dnd. *İslam Ansiklopedisi*, c. 36, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2009, rr. 14-15

Şibî gelek edîbên rojhilatî Mela Perîşan jî di berhema xwe da cih daye vê armancê û ev paye wekî merteyeba herî berz bûye mirazê dilê wî. Li gor Mela Perîşan, însan ji meyxaneyeka kevnare, ku me-best jê hebûn e, bi vexwarina meya baqî di mertebeya fenafillahê da êdî ji xeta û gunehêن xwe rizgar dibe:

Jû badey' bîxeş xûmxaney dîrîn  
Meşrê merd-efken telxê leb şîrîn (b. 676)

Bider ta yek ca pak ji gunah bûm  
Mestî bawerû fena'fillah bûm (b. 677)

Di gel Marif Xeznedar, lêkolînerê ji Rojhilatê Kurdistanê Cemal Ahmedî jî bisteh dibêje kevintirîn saqînameya kurdî, ji aliyê Mela Perîşan ve di destpêka sedsala 15ê da hatiye nivîsîn<sup>1</sup>.

### Bab-i Sevvom: Şerî'et, Terîqet, Heqîqet û Me'rîfet

Li gor hizra tesewwufî, murîd li ser çar qonaxêن sereke xwe di-gehîne payefa ‘însanê kamil’ û derbasî mertebeya fenafillahê dibe. ‘Şerî'et’, temamê hukm û qaîdeyên zahirî yên dînê Islamê, an jî rê û rîbazêن exlaqî û hûqûqî yên baweriyyê ne<sup>2</sup>. ‘Terîqet’, rê û rîbazêن hîzîr ne ku muîd ji bo xwe ya guncaw hildibijêre, da xwe bigehîne Xwedê Te’ala. Ji bo ku muîd bi hizra terîqeta xwe tefekkur bike û xwe bigehîne merheleya fenafillahê, rîberiya şêzekî/pîrekî jê re lazim e. ‘Heqîqet’, rastiya essehî ye û di heyna lêgerîna rastiyê da derbasbûna ji sînorêن zahirî û têgehiştina sir û efsûnêner gerdûna batînî ye. Armanca bingehîn ya hizra tesewwufî, lêgerîna heqîqetê ye. ‘Me'rîfet’, zanîn e û bi rîya zanînê naskirin û pesendkirina nav û sifetên Xwedê ye. Eger şerî'et nebe, terîqet, heqîqet û me'rîfet jî nabe<sup>3</sup>. ‘Arif û mutesewwufêن hema bêje hemî terîqetan, di şiro-

<sup>1</sup> Xeznedar, h.b., r. 31; Ahmedî, h.b., r. 90

<sup>2</sup> Cebecioglu, Ethem, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ağaç Kitabevi, İstanbul, 1997, r. 253

<sup>3</sup> h. b., r. 173

veyên xwe yên ayînî û felsefî da cih dane van her çar merheleyêن bingehîn.

Serenavê beşa sêyem a *Perîşannameyê* li ser vê hizrê hatiye danîn û di gel fikra ‘wacib-il wucûd’ çar qonaxêن sereke yên pirraniya doktrînê tesewwufî rave dike. Navê beşê di destxetê da bi vî awayî hatiye nivîsîn:

Bab-i sevvom der beyanê tewhîdê hezretê wacib-il wucûd berreviy-  
yê ve qanûnê edilleyê şerî et veterîqet ve heqîqet ve m’erîfet (wrq. 4a)

Beytên destpêk û dawiya vê beşê ev in:  
Bi namê Xuday Rehman û Rehîm  
Bexşendey heyat Tuwanay Qedîm (b. 689)

Je lay ‘uqela kî mebû mesmu’  
Yekî bê wucûd sani’ û mesnu’ (b. 730)

Di gel pend û şîretên destpêkê, sûfî û ehlê mutekebbîr (xudan-kibr) dîbin armanca tîrêن Mela Perîşan. Dijberiya wî ne tenê li ser zahidbûn an jî sûfîtiyê ye, rasterast peyrewêن du rîyêن sereke yên terîqetê, wekî însanêن kafîr, kêmeaqil û nezan bi nav dike:

Ve mezhebê Ce’fer du hûz kafîr in  
Yekî sûfîyye yekî mutekebbir in (b. 522)

Xeznedar vê sûcdarkirinê û fîkrêن Mela Perîşan yên li ser te-sewwufê, wekî ‘dijberiya derwêşîzmê’ şirove dike<sup>1</sup>. Di nav peywenda muqeddimeyê da rast e ku Mela Perîşan, sûfiyan wekî ‘kafîr’ destnîşan dike lê di besen dûmahîkê da sersebebê vê eşkere dike ku sofî dixwazin bi çav û guh û dev hebûna Xwedê, yanê ‘wacib-il wucûd’ müşahede bikin lê nikarin ji ber ku aqîlê wan kêm e û hûdûdê wan nîne.

B’ezî nehudûd tecawiz kirdin

<sup>1</sup> Xeznedar, h.b., r. 28

Pey ve biyaban-i zelalet bardin (b. 727)

Delîlê bê pa ve bê ca awerdin  
Ve 'eqlê naqis wî tewr fehm kirdin (b. 728)

Hulûlê wacib ve kullê mewcûd  
Qedîmê 'alem wehdetê wucûd (b. 729)

Li gor Mela Perîşan, sofî û derwêş, hizra 'wehdet-i wucûd'ê qebûl dikan lê rastî ew e ku hizra rastîn ya terîqetê divê 'wacib-il wucûd' be. Li gor Mela Perîşan fêhm û ferasata wan têrê nake ku hebûna Xwedê bi 'eql û qelbê xwe bibînin. Lewma jî dibêje sûfiyên kêmaqil ev mesele xelet fêhm kirine. Herwiha di beytekê da ehlê sûfiyye dişibîne heywanên wekî se û ker, çend cure heqaretan jî ji bo wan rêz dike.

Lakin m'enay sûfiyyeyê peşm-pûş  
Gulab û seb'a dewab û wuhuş (b. 530)

Tarîkê selat malê merdimxwer  
Bi m'ena sûfiyye wêney' seg û xer (b. 531)

### Bab-i Çeharom: Nav û Sifetê Xwedê Te'ala

'Du'a' û 'munacat' du besêن giring in ku di gelek cureyên edebî yên rojhilatî da cih digrin. Di nav pirraniya mesnewiyan da besêن musteqîl hene ji bo pesnê Xwedê Te'ala. Mela Perîşan di berhemâ xwe da hem cih daye du'a û munacatekê, hem jî beşeka serbixwe ji bo sifetê Xwedê Te'ala nivîsiye. Ev beşa ku di wereqa 39a-yê da cih digre, ji aliyê muellifê berhemê ve bi serenavê 'Der Sifetê Barî Te'ala' hatiye nivîsîn.

Di destpêk û dawiya vê beşê da ev herdu beyt cih digrin:

Ya Reb tu raziqê rûzî xwaran î  
Menşe'-i sehab qetreyê baran î (b. 731)

Bes in pey tenbîhê her sahib-şu'ûr  
*Ela îlellah tesîr-ul umûr* (b.757)

Gelek navêن Xwedê yên ku di nav 'esma-ul husna'yê da cih dig-rin, di gel serwayeka tam û tekîl di vê beşê da hene. Eşkere ye ku Mela Perîşan ji bo navêن Xwedê, ji çavkaniyêن cuda yên şî'a îstîfade kiriye.

Qadirê Qehhar hem burdbar î  
Ji dirextê sebz agir berarî (b. 735)

Xalîq û Barî hem Musewwîr î  
'Ezîz û Ce'bar Mutekebbir î (b. 736)

Sani' î Cabirê 'ezmî kesîr î  
Kerîm î Xafûr Zenbê kebîr î (b. 737)

Li gor 'cewşena mezîn' ku zêdetir di nav çavkaniyêن şî'a da tê dîtin, hezar û yet navêن Xwedê hene. Cewşena piçûk û cewşena mezîn du du'ayê bingehîn in û li gor riwayetan herdu jî 'aydê pêxember in<sup>1</sup>. Beşa 'Der Sifetê Barî Te'ala' bi dehan ayetên ji sûreyên Rehman, Şûra, Beqere û hwd. hatîye hûnandin. Ji bîst û heft beytan pêk tê û medhiyeyek e ji bo sifetên zatî yên Xwedê Te'ala:

Ber neçyan ji text hikmet-i ins û Can  
*La tenfuzûne illa bî sultan* (b. 754)

Her kes bezanû 'esa tekrehû  
Rizza û qeza ve quđret mebû (b. 755)

Cuyayê xeyr tu xiyâliş xam in  
Metleb her tu yi xeyr ji tu kam in (b. 756)

<sup>1</sup> Toprak, Mehmet, "Cevşen". dnd. *İslam Ansiklopedisi*, Diyanet Vakfı Yayımları, Ankara, 1993, r. 462.

## Bab-i Pencom: Itirafnameyek Ji Bo Gunehêن Giran

Di nav edîbên Rojhilata Naverast da, tradîsyona lixwemikurhatinê û behskirina gunehêن xwe, di cureyên edebî da wekî metnên musteqîl an jî besên mesnewiyan cih digrin. Di van metnan da muellif xeta û gunehêن xwe rêz dike û jî ber wan gunehan, şefa'et û 'efûyê dixwaze ji Xwedê Te'ala. Mela Perîşan beşa pêncem a berhema xwe bi navê 'Der itiraf be gunahan ve nadimşoden ez 'emalê qebîhe ve amalê şeniy'e', terxan kiriye ji bo vê celebê. Beş bi du'a û xîtaba Xwedê dest pê dike, piştî çend beytên pesn û medhkîrinê, muellif xeta û gunehêن xwe rêz dike. Di Perîşannameyê da destpêk û dawiya vê besê bi vî awayî hatiye dariştin:

Ya kerîm-ul 'ef 'ezîm-ul birr î  
Xeyr-el mes'ûlîn 'Alîmê sîrr î (b. 758)

Mucrim ferawan bi wîş kird sitem  
Feteb 'eleyh-i Rebb exferû erhem (b. 865)

Giraniya gunehan Mela Perîşan dide zorê ku bi terzeka 'arifane hem şikayetê ji 'dîvê recîm' (şeytan) bike hem jî bi tekrara peyva 'zunûb' (guneh) xeta û poşmaniyêن xwe temamî rêz bike.

Zunûbî katib ji ew aciz bû  
Zunûbî şafi' lis muhteriz bû (b. 775)

Zunûbî 'alem ji ew peşîv bû  
Zunûbî mayey' surûrê dêw bû (b. 777)

Giranîy gunah piştim şikestin  
Leşkerê hewa ray rast lêm bestin (b. 779)

Çenî bêbakan bêbakim kirdin  
Gerdenem gunay fire ve kirdin (b. 780)

Tab'iê hewanefsê le'îm bîm  
Esîrê kemendê dêwê recîm bîm (b. 782)

Li gor Mela Perîşan însanê gunehkar her dem ahê dikêşe û şermende ye. Ji ber ku heyat rîyeka dirêj e û însan hêşir e di destê nefsa xwe da. Her çend xeta û gunehan bike ji, mehkûmê nefsa xwe ya bê sebr e û divê 'efûyê bixwaze ji Xwedê.

Bayed bikîşûm her demî sed ah  
Ji kemîyê tûşe ji dirazîyê rah (b. 814)

Çun min şermende hîç bende nîyen  
Xêyr ji tu zîba-dehende nîyen (b. 815)

Min bendey 'asî ji xeyr bê nesîb  
Giriftar bi destê nefse naşekîb (b. 816)

Di berdewama itirafnameyê da Mela Perîşan, bi metafora keştiyê, li hember pelên behrê, gunehêne xwe te'rîf dike. Li gor wî, însanê gunehkar keştiyeka bargiran e û di nav behra 'usyanê da bi tena serê xwe ye. Dijberî 'aliman ku li perava ewle sekinîne, gunehkarên wekî wî di nav pelên deryaya gunehan da li ber xwe didin.

Ya Xafur uz-zenb tewbe-pezîr î  
Ne behrê 'usyan tu destgîr î (b. 826)

Keştim ha ne mewc xired naxudaş  
Xired naxuda heyran in ji laş (b. 827)

'Aliman melah kem se'yê kahil  
Min ve keç mewc ewan ve sahil (b. 828)

Serencamên pêxemberan ji Qur'anê werdigire û bi bîr tîne ku di her cure tengasi û zehmetiyê da Xwedê alîkariya wan kiriye. Bi vê daxwaza şefa'et û 'efûyê, Mela Perîşan nîşan dide ku di "qisesê

enbiya” û hunera “telmîh”ê da hoste ye.

Ya faliq-ul behr pey Mûsa ji Nil  
Ya rizvan-numay agir pey Xelîl (b. 853)

Yûnis xelas ker ji betnê mahî  
Yûsuf ji çah berû textê şahî (b. 854)

Ya red-konendê Yûsuf û Ye'qûb  
Ve islah awer zerer ve Eyyûb (b. 855)

Hazim-ul ehzab pey Xeyr-ul Beşer  
Ya qali'-ul bab Xeyber pey Heyder (b. 857)

Ya pezîrendey tewbe ji Dawud  
Ya mursel-ur reyh pey 'Ad û Semûd (b. 858)

### Bab-i Şeşom: Şefa'etxwazî Ji Xwedê, Pêxember û Şahê Welayetê

Munacat, beşeka sereke ya menzûmeyên dînî ye ku pirranî bi me'neya şefa'etxwestin, lavayî û du'ayê tê gotin û termeke 'aydê helbesta îslamî ye.<sup>1</sup> Ji xeynî çend besên kurt yên xwestina 'efûyê ji bo gunehan, Mela Perîşan di berhemâ xwe da beşeka xweser wek munacatê jî nivîsiye. Di naveroka berhemê da beşa munacatê bi vî rengî hatiye pênasekirin:

Bab-i şeşom der munacat be dergahê qazî-yul hacat ve hezretê xetmê risalet ve cenabê şahê velayet-meab ra, şefî'e nimûden bi cihetê isticabetê du'a ve 'ef şodenê cerayim ve şerhê b'ezî ez mutalibat. (wrq. 45a)

Beyta destpêkê bi gaziya Xwedê dest pê dike û beyta dawî bi mexlesa *Mucrim*, diqede:

<sup>1</sup> Macit, Muhsin, "Münâcât", dnd. *İslam Ansiklopedisi*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2006, r. 563

Xudaya ve zatê pakê Xuda yît  
Ve yeganegî ve tuwana yît (b. 866)

*Mucrim* çem werdin ji siqlê gunah  
Ya ‘Elî işfe’ lena ‘inde Ellah (b. 938)

Di vê besê da medhiyeyeka bi temaya mewlîdnameyê jî heye ku  
behsa şeva jidayikbûna pêxember dike. Dema pêxember tê dinyayê,  
agirê ateşgedeya mezin a Îranê vedimire, Deryaya Zawe hişk dibe û  
Taqê Kesra hildiweşe, hukmê kitabên pîroz yên berî Qur'anê, betal  
dibe. Mela Perîşan bi hunera telmîhê û bi zikirkirina kitabên pîroz,  
jidayikbûna pêxember welî berbelavbûna bêhneka xweş te'rîf dike.

Ya Şay ulûl-‘ezm rehnumay rehber  
Tewrat û Incîl sûhûf mensûx ker (b. 882)

Ji mewludê tu cehan bî bû-muşk  
Taqê Kesray kesr Deryay Sawe xuşk (b. 883)

Seylê celalit cehan girt newer  
Ateşkedey Fars xamûş kird yekser (b. 884)

### Bab-i Heftom: Rexneyeka Tund Li Ebû Bekir Siddîq û ‘Umer bin Xettab

Hesasiyetên mezhebî bi gelek awayan di berhemê da xwe nişan  
didin. Lewma jî, ji xeynî Elî bin Ebû Talib, her sê xelîfeyêni dî Ebû  
Bekir Siddîq, ‘Umer bin Xettab û Osman bin Affan, bi kiryarêni xwe  
yên nebaş têniliklerin. Di serenavê besê da jî her sê xelîfe bi si-  
fetên înkarker, bêîman, xasib û diz têne sûcdarkirin; ji ber ku li  
gor baweriya muellifê berhemê sê xelîfeyêni ‘ewil yên dînê İslâmê,  
payeya welayetê ji ‘Elî bin Ebû Talib bi zorê standine û heqê wî xesb  
kirine. Navê vê besê di destxetê da bi vî rengî hatiye danîn:

Bab-i heftom der mezemmetê xulefayê selase ve munkirîn ve  
munafiqîn ve xasibînê heqqê hezretê emîr ve m'esûmîn ‘eleyhûme

selam (wrq. 48b)

Herdu beytên destpêk û dawiya besê bi vî rengî ne:

Ya 'Elî bi heqq-i 'Elîyyê 'ezîm  
Ve ismê e'zem Dawerê Kerîm (b. 941)

Le'nişan biker ey Xuday ehed  
Le'nin la yuxtir malê Ehmed (b. 974)

Di cîhana edebî ya mezheba şî'a da wek temayeka binecih, bi vî terzî şermezarkirina her sê xelîfeyan cih digre û dijberî pesnê 'çar-yarê guzin' e. Mela Perîşan bi mubalexe û peyvîn tund bi nebaşî behsa xelîfeyan dike.

Xulefayê naheq ji bedan bedter  
Hergiz nekirdin xêyr ji karê şerr (b. 953)

Hem di muqeddimeya berhemê da hem jî di beşä heftem da, her sê xelîfe bi xesbkirina xelîfetiya 'Elî bin Ebû Talib, bi fitne û neheqiyê hatine tawanbarkirin. Xaseten, xelîfeyê duyem 'Umer bin Xettab bi terzeka tund hatiye rexnekirin, hetta car caran ev rexne bi peyvîn heqaretamîz hatiye nivîsîn. Mela Perîşan, bi navlêkirina 'şeytan' xîtabî 'Umer bin Xettab dike û wî dişibîne Ebû Sufyanê ku di tarîxa Îslâmê da wekî dijminê sereke yê Pêxember hatiye naskirin. Herwiha, xelîfeyê duyem bi sifeta 'şeytanê jirêderketî' pênase dike, şecereya wî dişibîne dara ku fêkiya wê fitne ye û wî bi fitnebâziyê tawanbar dike:

Bugzer jîy gulfey exway şeytanî  
Le 'esebbîyetê Ebû Sufyanî (b. 505)

Dirextê bê mêwe' sahib hurmet e  
Şecerey 'Umer mîwêş fitnet e (b. 349)

Di berhemê da zêdetir li ser xelîfeyê duyem 'Umer rexne hebin

jî, bi heman awayî xelîfeyê yekem Ebû Bekir û xelîfeyê dawî ‘Usman jî bûne armanca van tîrên rexneyan. Kesên ku dilsoziya xwe nîşanî xelîfeyê yekem dane û bî’et kirine, li gor fikra Mela Perîşan girseye-ka bê dîn û îman e:

Bey’etişan kird gurûhê bêdîn  
Ve Bûbekrê şûm bedbextê le’în (b. 945)

Sûcdariya sereke bo xelîfeyan ew e ku piştî wefata pêxember pey-mana di navbera wan da ji aliyê her sê xelîfeyan ve hatiye şikandin. Di berhemê da du caran behsa vê peymanê hatiye kirin û herêma Xedîr-i Xumm wek cihê peymanê hatiye dupatkirin. Herwiha li gor Mela Perîşan, beriya wefata xwe, Muhammed Pêxember qelem û qirtas (kaxiz) xwestiye ku wesiyeta xwe binivîse lê ‘Umer rê li ber girtiye ku wesiyeta Hz. Muhammed bi awayekî nivîskî bihete qey-dkirin:

Ji muxalifetê ceyşê Usame  
Ji mumani’etê wesîyyetname (b. 954)

Her sê xelîfe di gelek beytan da bi peyvîn ‘fitnebaz’ û ‘mela’în’ têne binavkirin. Ji ber xirakirina peymanê, Mela Perîşan wan bi tundî rexne dike û le’netê li wan dîbarîne. Herwiha Mela Perîşan diyar dike ku Muhammed Pêxember berî wefata xwe şireteka muhîm li misilmanan kiriye, ji wan ra gotiye piştî min ji hev re şûrê xwe nekêşin û ebeden şerê navxweyî nekin.

New weqtê rehlet xemxwarê ummet  
Ve Aqay Qenber kirdîş wesîyyet (b. 252)

Be’d li min şemşîr mekîş ji xilaf  
Meger heşt mu’în daştî ve mesaf (b. 253)

## Xatime: Bexşxwazî Ji Bo Roja Mehşerê

Mesnewiyê dînî û aşiqane exleb bi beşa xatimeyê têne temamkirin. Bi me'neya xwe ya ferhengî xatime, 'temamkirin' an ji 'dawî' ye. Di dûmahîka Perîşannameyê da bi serenavê 'Xatime der haletê musennif ve sifatê rûzê mehşer ve 'edlê Xalîqê Ekber', beşa şefa'etxwaziya roja mehşerê cih digre û berhem bi vê besê temam dibe.

Di destpêk û dawiya besê da ev herdu beyt cih digrin:

Ya Malik-ul mulk bedî'ul eflak  
Aferîdet kird Bû-l Beşer ji xak (b. 973)

Rûy rehmetit kirdî muştê xak  
We el-'efû 'innî heyn el-qak (b. 1017)

Beşa xatimeyê bi raveya afirandina însan, melek, şeytan û bi telmîha secdenekirina iblîs dest pê dike. Li gor Mela Perîşan benî admîn ku dikevin xefka gunehan ji rîya rast dûr dikevin û iblîs, gelek însanan ji dîn bêzar dike.

Melayîk memûrê sucûdiş kirdî  
Iblîs iba kird merdûdiş kirdî (b. 974)

Muhlet teleb kird na fermanê şûm  
Metleb rewan bî ta Yewm ul-me'lûm (b. 975)

Dêwê xudpesend sicde inkar kir  
Dîndaran çend ji dîn bêzar kir (b. 977)

Di cil û pênc beytên xatimeyê da temaya sereke, wekî besênen pêncem û şeşem, pesnê Xwedê û du'a ye. Muellif di xilasiya berhemê da ji Xwedê, Muhemmed Pêxember, şahê welayetê Elî û Huseyn bin 'Elî şefa'et û bexşandinê dixwaze. Mela Perîşan, bi du'a û lavayî ji Xwedê niyaz dike ku roja mehşerê bi dengê Sûrê, wî hisyar bike û

di nav cema'eta salih-'emelan da cihekî bide wî.

Çun ji nefxê Sûr bîdarim bikey  
Bi sehray mehşer ihzarim bikey (b. 1006)

Daxil bi Eshabê Yemînim bikey  
Sahib ixlasê yeqînim bikey (b. 1007)

Tevî ku di beşeka berhemê da ji bo gunehêne xwe 'efû xwestiye,  
Mela Perîşan di vê beşê da jî bi heman temayê du'ayan dike ji bo şe-  
fa'et û 'efûkirinê. Wekî beşa pêncem ya lixwemikurhatina gunehan,  
di vê beşê da jî muellif hemî gunehan yek bi yekrêz dike.

Ji buxl û sem'e ji cewr û zina  
Ji kibr û hesed ji 'ucb û rîya (b. 983)

Şerab û xumar pes exnîya  
Kizb û xudbînî xiybet û rîya (b. 984)

Ji ber ku Xwedê mohlet dayê heta roja qiyametê, Şeytan dibe  
nêçîrvan, benî adem jî dibe nêçîr. Çavnebarî, dizî, fesadî, kibr, zîna,  
şerab, qumar, xemmazî û buhtan, çend gunehêne sereke ne ku 'dêwê  
xudpesend' (şeytanê jixwerazî), bi saya wan rûniştiye li ber dehfika  
xwe û nêçîrvaniya însanan dike.

Daniş ve rûy dam paşa ve bî qeyd  
Ew bî ve seyyad Benî Adem seyd (b. 981)

Ji xulf û enam yemîn û yesar  
New' new' gunahan temam da qerar (b. 982)

# BEŞA SÊYEM

## Transkrîpsiyona Berhemê

### Rêbaza Transkrîpsyonê

Veguhesina metneka klasîk ji elifbêya aramî bo latînî, me'lûm e di gel xwe kêşeyên teknîkî derdixe meydanê. Ji ber ku bi tîpguhêziya metnê, hûrguliyên zimanî û taybetmendiyên elifbêya metna orjînal jî divê bêne guhastin bo elifbêyeka nû. Di vê beşa dawiyê da em ê serê pêşî rê û rîbazên qulibandina elifbêya metnê eşkere bikin û paşê jî cih bidin temamê metna orjînal a destxetê.

Qertafa ravekên navdêrî, xaseten jî yên ku peyvên ‘erebî û farsî tê da hene li gor konteksta metnê car caran wek ‘-i’ hatine transkrîbekirin lê di gelek ravekan da ji bo rihetiya xwendinê me awayê berbelav yê nivîsîna qertafêñ kurdî tercîh kir. Bo nimûne: ‘mergê yaweran’. Dawiya raveberan, li gor kêş û serwaya beytê car caran wekî ‘-y’ car caran jî ‘-ye’ hatine veguhastin. Bo nimûne; ‘sehray Kerbela’ û hwd. Herwiha, di xwendina nîvbeytekê da kîteyek zêde be, me dîsa li gor telaffûza lehceya goranî dawiya raveberan wekî ‘-y’ an jî wek ‘-i’ nivîsî da ku erka zîhafekê pêk bîne û kîteya zêde di xwendinê da ahengê xira neke. Bo nimûne; ‘Nuqtey teht-i Ba zewcê

Betûl in'. Yanzdeh kîteyên vê nîvbeytê bi vî awayî dibil deh kîte û kêşa beytê temam dibe.

Qertaf, gihanek û daçekên goranî yên mîna 've', 'pey', 'û', 'ne' wekî rênivîsa mustensîxê berhemê ji gewdye peyvan cuda hatin latînî-zekirin. Herwiha di metnê da lêkerêن kurdî, 'erebî û farsî li gor qaîdeyê telaffûza van zimanân hatine danîn. Ji aliyê serfa lêkeran ve Mela Perîşan pirrî caran guh nade qaîdeyê hevoksaziyê û her sê zimanê metnê; kurdî, 'erebî û farsî car caran pêk ve bi kar tîne. Ji ber vê, mumkin e ku di transkrîpsiyona hin peyvan da, du-sê şiklêñ cuda derkevin meydanê.

Daçeka 'ji' eger beriya hevalnava nîşaniyê be, ji bo ahenga xwendinê hatiye kurtkirin: 'ji+îy' wekî 'jîy', 'ji+û' wekî 'jû' hatiye nîvîsîn. Ji ber ku di metnê da gelek ayet û hedîs bi zimanê 'erebî hatine nîvîsîn, li gor cih û erka wê, pêşqertafa 'el'a 'erebî ku 'herf-i te'rîf' e, me bi çend awayêñ cuda veguhast. Ev qertafa berbelav ku transkrîpsiyona wê bi yek şiklî zehmet e, li gor ravekêñ navdêrî û hetmen li gor peywenda beytê, me car caran wekî '-ul', car caran wekî 'l-', car caran jî wekî 'el-' danî.

### Transkrîpsiyona Perîşannameyê

Şe'nuh-ul 'ezîz

Huve Ellahû Te'ala

Bismillahi-r rehmani-r rehîm

Ez fermayısatê teb'e serşarê guherbarê xewwasê behrê m'erîfet ve nuktesencê me'anîyê laliyê lecveyê şerî'et ve remzdanê beyanê terîqet ve şinasayê cevahirê zevahirê heqîqetê 'ena qutb-ul 'arîfin ve-l 'alimîn ve-l 'amilîn ve-l kamilîn el-vasilîn merhûmê mexfürê mebrûr Mela Perîşan tabillahû sûrah ve 'erfehû derecatûhû min el-cinan...

Muştêmel ber yek muqeddime ve heft bab ve xatime. Emma muqeddime der beyanê nukatê me'newî ve rimuzatê muhtewiyê heqîqî ve işaret ve kinayat der milelhayê muxtelifî ve at ve ixbaratê burhaniyyê şer'iyyê ve terîqiyyê rezîyyeyê rezewiyyeyê be lisan ve ilhanê natiqiyê iyye fermayed

Bab-i evvel der mu'ize ve pend be zebanê hal ve der yaftenê ehlê 'irfan ve me'rîfet der heqqê işan ve gurîz be sehrayê purmelalê Neynewa ve şuhedayê Kerbela gûyed: *Muderris watiş ferzendê xelef*

Bab-i dovvom der mededxwasten ez saqiyê heqîqî be cihetê tewhîdê Rebb-ul Erbab: *Saqî bawere camî pey mestî*

Bab-i sevvom der beyanê tewhîdê hezretê Wacib-il Wucûd be reviyyê ve qanûnê edilleyê şerî'et ve terîqet ve heqîqet ve m'erîfet: *Bi namê Xudayê Rehman û Rehîm*

Bab-i çeharom der sifatê Barî Te'ala: *Ya Reb tu raziqê rûzî xwaran î*

Bab-i pencom der i'tiraf be gunahan ve nadimşoden ez e'malê qebîhe ve amalê şen'i'e: *Ya kerîm-ul 'eff'ezîm-ul birr-î*

Bab-i şesom der munacat be dergahê Qazî-ul Hacat ve hezretê xetmê risalet ve cenabê Şahê welayet-meab ra şeffî' nimûden bi cihetê icabetê du'a ve 'ef şodenê cerayim ve şerhê be'zî ez mutalibat gûyed: *Xudaya ve zatê pakê Xuda yît*

Bab-i heftom der mezemmetê xulefayê selase ve munkirîn ve munafiqîn ve xasibînê heqqê hezretê Emîr ve m'esûmîn 'eleyhû-messelam: *Ya 'Elî bi heqq-i 'Elîyyê 'ezîm*

Katime der haletê musennif ve sifatê rûzê mehşer ve 'edlî Xaliqê Ekber: *Ya Malik ul-mulk bedî'-ul eflak*

Ve temmim bil xeyr bi heqqê e'immet-ul huda selewatullah ve selamû 'eleyhim ecme'in ve bihî neste'in

Ve be'd-el hemdûllah Rebb-il 'Alemîn ve selewatûllah 'ela Resûlihî Muhemmed ve weliyyihî 'Elî ve wesîyy-un nebî ve 'ela ewladihî ve surriyetihî ve sehabet-ul ecme'in

Muqeddime ed-dîbaçeyê zîbaçe der beyanê nukatê me'newî ve rimuzatê muhtewiyê heqîqet ve işaret ve kinayat der milehayê muxtelif ve halat ve ixbaratê burhaniyyê şer'iyyê ve terîqiyyê rezîyyeyê rezewiyyeyê be lisan ve ilhanê natiqiyê haliyye fermayed.

Bismillahi-r rehmani-r rehîm

1. Min ji bismillah

Ibtida mekim min ji bismillah

2. Perîşannamey zikr mekim billah

Ne eray her kes pey fena fi-llah

3. La retbin la yabisin illa fi Kitab<sup>2</sup>

Kitab derc û hemd û fesl ul-xitab

4. Hemd û bismillah munderic biyen

Ew nîz ji bayê bax hezar gul çiyan

5. Ba du yek Xuda yekî Resûl in

"Nuqtey teht-i Ba" zewcê Betûl<sup>3</sup> in

6. Qale Mewlana 'Elîyyê umran

Ene nuqtetû min teht-i ba<sup>4</sup> zan

<sup>1</sup> Navê 'Elî li gor hesaba ebcedê no e. ( $\underline{\text{E}}=70$ ), ( $\underline{\text{J}}=30$ ) ( $\underline{\text{S}}=10$ )

<sup>2</sup> Qur'an, En'am 6/59: "Çi tiştê terû ci yê hişk her di kitêbeke (Lewhul Mahfûzê) de ne." Temamê ayetê bi vî şekli ye: "Kilitên cihana nependî her li cem Xwedê ne, ji Wi pê ve kes bi wan nizane û li bejahiyê û deryayê ci hebin, Ew bi tevan dizane. Ci peleke ku ji darê bikeve ew her pê dizane û ci liba di tarîtiyên zemînê de û ci tiştâ şil û ci ya ziwa her di kitêbeke diyar (Lewhul Mahfûzê) de ne." bnr. Qur'an, wer. Mela Huseyn Êsi, Mela Se'id Girdarı, Mela Muhammed Bérkevânî, c. 4. Şûra Yayınları, İstanbul, 2014. Ji bo hevteribiya xebata me, hemî ayetên Qur'anê, ji vê me'alé hatine wergirtin û piştî vê jêrenotê di gel hejmara sûre û ayetan, bi kurtasî weki Qur'an dê bête zikirkirin.

<sup>3</sup> Pak, paqîj. Leqebla Fatima bintî Muhammed. Keça bakîre ku ji bo Xwedê, dev ji dinyayê û her tiştê dinyewî berdaye.

<sup>4</sup> "Ez nuqteya binê herfa bê'yê me." Ev hedîs mensûb bi 'Elî bin Ebû Talib tê qebûlkirin. Temamê gotinê bi vî şekli ye: "Bize ku hemî sîrrîn Xwedê di kataben semawî da ne, sîrrîn kitabên semawî di Qur'anê da ne, sîrrîn Qur'anê di sûreya Fatiheyê da ne, sîrrîn Fatiheyê di kelimeya "Bismillah"ê da ne, sîrrîn "Bismillah"ê di herfa "bê"yê (...) da ne û ez nuqteya binê herfa "bê"yê me." bnr. El-Qundûzî el-Heneffî, Suleyman bin İbrahim, Yenabi' el-Mevedde, el-teb'e el-Sabi'e, Mensûrat el-Heyderiyye ve Mektebetuha fi el-Necef el-Eşref,

7. Ba şinasa bî ve nuqtey tehtiş  
Aşikara bî deryay rehmetiş
8. Qur'an jî bezmekey medê xeber  
Kitabun mubîn me'nî beyan ker
9. Zemanê eyyamê cahiliyet bî  
Nebî hat ji be'd nazil bî nebî
10. Nebî wat ve lêm ji Yezdanê ferd  
Nebî û Welî Ellah wêş sabit kird
11. Ve yek herf kirdiş sê metleb temam  
*Kelam-ul mulûk mulûk-ul kelam'*
12. Huş dared ve hedîs çeniş mewcûd in  
Maçan ye me'nay qews-i si'ûd in
13. We qewsê si'ûd û qewsê nizûl  
Eray şinaxten zahir bî Resûl
14. Lîsanüllah<sup>2</sup> wat perî mudde'a  
*Min medîney 'ilm 'Elî babuha<sup>3</sup>*
15. Xeyr-ul umûr ewseteha teleb  
Ta ke biçîman ve ser metleb

<sup>1</sup> 1384/1965, r. 79

<sup>1</sup> "Kelamên padışahan, padışahêñ kelaman in."

<sup>2</sup> Zimanê Xuda. Mebest jê Muhemmed Pêxember e.

<sup>3</sup> Hedîsa nebewî: "Ez bajarê 'ilmê me, 'Elî deriyê wî bajarî ye." Ev hedîs, di nav çavkaniyêñ şî'î û sunnî da bi hin şiklêñ cuda jî hatiye neqilkirin. Bo nimûne: "Ez bajarê hikmetê me û 'Elî jî deriyê wî bajarî ye. Ji bo tu têkevî nava bajêr, divê tu ji derî derbas bibî." bnr. Hakim Nişabûrî, Ebî Ebdillah Muhammed bin Ebdillah, *Mustedrek, el-cuz' salis, Kitab el-Hicre, Kitab el-Mexazî ve l-Suraya, Kitab Me'rifet ul-Sehabe*, dirase ve tehqîq Mustefa Ebdilqadir Eta, Li Neşr Kutub el-Sunne ve l-Cema'e, Dar ul-Kutub el-Ilmiyye, Beyrut, Lubnan, 1422/2002, rr. 137-138

16. Evvelîn herfê nubûwwet nûn in  
Melfûziş sê herf waw têş kemûn in
17. Ve ew xud kinaye ji welayet in  
Ne min ye watim nessê ayet in
18. Ewwelîn herfê welayet waw in  
Ew nîz melfûziş ve sê herf dav in
19. Ewset elif in ji ulûhiyyet  
Munkir încar kird ji billûhiyyet
20. Munkir ve 'edû mezanî kî in  
Xasibê duwom' cayê Nebî in
21. Bugzer ji idrakê mutessefil  
We ifrat kirdin pey teserrufil
22. Ve kîşê 'ewam î qewm 'arif in  
Xuda mezanût mute'arif in
23. Be'zî dûn be'zî erbabê 'emayim  
Pey tefrît kirdin pa meken qayim
24. Çun nîren quwwêy derkê xurresî  
Muteqqedis in ji muqeddesî
25. Li'ezayê dîn bayed girt matem  
Lew fesedet ul-'alim fesedet ul-'alem<sup>2</sup>
26. Pey ifrat tefrît ism û fi'l û herf  
Her yek di cay xud bi nehw kir serf

<sup>1</sup> Dagirkirê duyem. Anglo duyem kesê ku cihê Muhammed Pêxember xesb kiriye, mebest ji vê gotinê xelîfeyê duyem 'Umer bin Xettab e.

<sup>2</sup> "Eger 'alim xira bin, 'alem ji xira dibe."

27. Destê yedê quđret qelem Pêxember

Sevaúllah mutleq xututê defter

28. Qelem yekser daşt xetiş nehat rast

Ve qa'idey e'dad yek dest bê sidast

29. Çun destê quđret faq ve qelem da

Ne pehlûy'Ehmed 'Elî bî peyda'

30. Ne 'işqê 'Ehmed husn kird Yektay dana

Lîk meşiyetê husn û 'işq bî peyda

31. Menişş şerî'et meşiyîş terîqet

Me'naş er yaftî heqîqet

32. Kerrat Nebî wat raki' û sacid

Ene we 'Elî min nûrin wahid<sup>2</sup>

33. Fermûdey Nebîm wîrdê zuwan in

Kufr in her ke wat Xuda duwan in

34. Ve hudus qidem mihr firûzenî

1 Hebûna Muhemed û 'Elî ya beriya-hebûnê (pre-existence) yek ji mijarên herf muhîm e di hedîsên 'îrfanî yên baweriya şî'a da. Anglo, herdu jî beriya 'afirandina gerdûnê' ji aliye Xwedê ve hatine afirandin. Li gor hedîsên şî'a yên xweyi naverokêni batinî, bi hezaran sal beriya afirandina gerdûnê, li dewrû-berekî bi navê 'La-Mekan', Xwedê Te'ala ji nûra xwe tîrêjeke bi navê 'Umm el-Kitab' (ev gotin ji ayetên Qur'anê hatiye wergirtin: Al-i İmrân 7, Ra'd 39 û Zuhurf 4) Muhemed Pêxember afirandiye. Paşê ji wê tîrêjê, yeke dî afirandiye. Ya yekem tîrêja/nûra nubuwetê, ango 'nûr-i zahir' e û ya Muhemed e. Nûra duyem jî hemcinsê nûra ewil e, ango 'nûr-i batin'a 'Elî ya îmamet û welayetê ye; herdu nûr ji 'eynî kokê ne. Lewma jî navên Muhemed û 'Elî, ji navên Xwedê hatine wergirtin. Navê Muhemed 'el-Mehmûd' e û navê 'Elî jî 'el-'Eliyyü el-E'la' ye. bnr. Amir-Moezzi, M. A., "La Préexistence de L'Imam", h. g., rr. 110-111

2 Hedîsa nebewî: "Ez û 'Elî ji yek nûrê ne." Ev hedîs bi gelek şiklên cuda di nav çavkaniyêñ şî'a da cih digre. bnr. El-Hillî, Hesen bin Yusif bin Mutahhar, *Kesf ul-Yeqîn fi Fezayil Emîr el-Muminîn*, tehqîq: H. Dergahî, el-Teb' el-Üla, Tâران, 1411/1991, rr. 9-14

Wêney subh berzex şeb û rûzen î

35. Berzexî in li beyn hudûs û qidem  
Xeyr ul-umûr ewset<sup>1</sup> keyf û kem

36. Ji ülûhiyyet nekerîn ikrah  
*En-nar fî-ş sîta xeyrûn min Ellâh<sup>2</sup>*

37. Mewcûdê her şey' li ketmê 'edem  
Xudast deryab herfê hudûs ji qidem

38. Xak û bad ab û ateş zahir in  
'Unsur pey imkan me'naş mahir in

39. Ve qewsê si'ud û qewsê nizûl  
Eray şinaxtenê zahirê Resûl

40. Seb'ê heft mesanî ve me'na duwan  
Seb'ê mesanî hemdê Çardeh Ten<sup>3</sup> zan

41. Hemd du mertebe hat ji asman  
Yektayî muxtesê Zatê Heq bizan

42. Bîst heşt hûrûf<sup>4</sup> her duwan ve yek  
Çardeh Me'sûm<sup>5</sup> in perît bê şik

1 Hedîsek mensûb bi pêxember û hinek imaman: "Ya qenc ew e mirov li gor radde û rîjeyeka maqûl her tiştî bike." bnr. Erbilî, Ali bin Isa, *Kesf ul-Xeme fî Me'rîfet ul-E'imme*, muheqqiq-musehhîh: H. Rasuli Mahallati, c. 2, Neşr-i Benî Haşimî, Tebriz, ç. 1, 1381/2002, r. 229

2 "Agir di werza zivistanê da qencyek e ji Xwedê."

3 Çardeh endamên bêguneh ên ehlê beytê: Muhemmed Pêxember, Fatima û danzdeh imamên baweriya şî'a.

4 Nutqa Pêxember, ayetên Xwedêango elisbêya Qur'anê ji 28 herfên elisbêya erebî pêk tê. Di gel çar herfên farsi "پ", "ڦ", "ج", "گ" (پ, ڦ, ج, گ) di metnên hûrûfi da dibin 32 herf. Edib û peyrewên tevgera hûrûfiyye behsa van 28 û 32 herfan dîkin û li gor hejmara ebced û eczaya herfan, wateyên nû ji peyvan derdixin. Lîbelê di berhema Mela Perîşan da lêgerîneka bi vî awayî xuya nake.

5 bnr. Çardeh Ten.

43. Masewellah vî herf munderic biyen  
Kam metleb ji bîst û heşt herf niyen

44. Mufredat viyerd murekkeb ve ca  
Terkîb pey çi kird ve lam elif la

45. Lam qelbê elif elif qelbê lam  
Eger deryaftî qabilî ilham

46. Beyyineyê elif namê 'Elî ye  
Ji lam hem muşteq namê Nebî ye

47. Durret-ul beyzayê<sup>1</sup> ewwelîn qelem  
Misdaq me'nayê hudûs ji qidem

48. Çun Heq ji ezel meylê birûz kerd  
Xast aşikara key Zatê tenya ferd

49. Wat *kuntu kenzen mexfiyyen ehed*<sup>2</sup>  
Nutqey teht-i ba kirdîş ve 'Ehmed

50. Ellah ismike mustecme'i sifat  
Sifat rah nêyrît elbette ve Zat

51. Ji fertê zihûr mexfî sifat e  
*Ya men delle 'ela Zatê bi-z Zat e*<sup>3</sup>

1 Durrê spî. Yek ji leqebehê Hz. Fatima.

2 Hedisâ qudsî: "Ez xezîneyeka veşarîf bûm, min xwest ez bêm zanîn". Hedîsên ku pêxember rasterast ji teref Xwedê ve neqil dike, wek hedîsên qudsî têñ binavkirin. Di van hedisan da ma'ne û mezmûn ji Xwedê ye, lefz ji Pêxember Muhemmed e. Mezmûnen hedisên qudsî, ji aliyê milyaketan ve an ji wek feyzelek ji bo pêxember têñe neqilkirin. Lîbelê hedisên qudsî ji ayetên Qur'anê cudatir in. Ji ber ku Qur'an hem bi lefz hem ji bi mezmûn, kelama Xwedê ye. Lî tenê mezmûnen hedîsên qudsî ji kelama Xwedê ne.

3 Ji du'a'yâ Sebahê ya 'Elf bin Ebû Talib: "Ey yê ku zatê wî delîl e bi zatê te.", Meclisî, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar, Kitab tasi'* eşere, *El-Qur'an ve l-Du'a, Ihya el-Kutub el-Islamiyye*, Qum, 1388, rr. 491-492

52. Kî wat çend sifat ji 'eynê Zat in  
Zat her xud Zat sifat sifat in

53. Ism û fi'l û herf me'nay sifat in  
Ellah teswîrê hicabê Zat in<sup>1</sup>

54. Zat er sifat daşt 'eqlê kul nemewat  
*Ma 'erefname Heq<sup>2</sup> me'rîfet e bi Zat*

55. Çun mebû 'eded daxil ve wahid  
Kullema meyyîz yetluhû şahid<sup>3</sup>

56. La ism û la resm la sifat zan  
Bê xeber ci yaft xud ji bê nîşan

57. Kemalê tewhîd nefyê sifat in  
*La tuhîtu bi şey'e<sup>4</sup> Nebî watin*

58. Çenî wehdetîş ray duyî niye  
Tewhîdiş sezay me'newî niye

59. 'Ilmê sifat waq'i ve teht-i Zat in  
Key şinasay Zat heddê sifat in

60. 'Aciz in 'ilm hem ji idrakê Zat  
Çun Zat muhît in muhat lêş sifat

<sup>1</sup> Nivîsa herfên navê Ellah (الله) perdeyek e wek hicabê, Zatê Xweda di nav xwe da vedişere.

<sup>2</sup> Hedîsek mensûb bi Pêxember: "Min tu bi têra xwe nas nekirî û ji bo te îbadet nekir." Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li I-Durer Exbar el-E'immet el-Ether, Kitab xamis 'esere, El-İman ve I-Kufr ve Mekarim ul-Exlaq*, el-qism sanî, Ihya el-Kutub el-İslamiyye, Qum, 1388, r. 105

<sup>3</sup> Qur'an, Hûd 11/17: "Erê, ma ew ê ku ji cem Xwedayê xwe li ser delileke aşkera be û digel vê ji ji teref Xwedê ve şahidek (jê re) hebe û beriya wê ji, kitêba Mûsa ya ku rêber û rehmet bû, jê re şahid be, (ma mîna yê ku bêdelîl be?) ev ên ha bi wê baweriyê tînin (ji wan re bîhişt heye)."

<sup>4</sup> Qur'an, Taha 20/110: "Li pêş û pişta wan (li dinya û axreta wan) ci hebe, Xwe- dê hemûyan dizane. Lê zanîna wan têra vê yekê nake."

61. Şinasayê Heq ta heddik caíz  
Semendê fikrit nemanû acîz
62. Ve ahengê fikr bugzer jî perde  
Mesnu' bi sani' le ku pey birde
63. Bugzer jî qeyd bavit hane bend  
Korî kar nedaşt mujey wîş mekend
64. Sî new' pilewer rahî biyen bî xud  
Pey dînê Sîmurx delîlişan Hudhud
65. Ta ca lêşan mend fire û endekî  
Ta ke baqî mend ji her new'e yekî
66. Ayînekan dî sî murxê newî  
Nezerbazî kirdin sî murxişan dî
67. Bi rayê dînê min huşder ve dilxwah  
Hudhud Cebreîl emrax xelqullah
68. Nefsê wêt binas perî mertebe  
*Men 'erefe nefse feqed 'erefe Rebbe'*
69. Dest der ve daman ve lay Al-i Yasîn<sup>2</sup>  
Ta ji bereketşan nefsit binasîn
70. Seme'tu fî-l leyli Şahê Merdan<sup>3</sup>  
Ve lefzê fesîh qale ya filan

<sup>1</sup> Hedîsek mensûb bi Pexember û Elî: "Kî xwe nas bike, Rebbê xwe nas dike." Ibn Ebî el-Hedîd, *Şerhê Nehc ul-Belâxe*, el-Mucellid 'Aşîr, tehqîq: M. İbrahîmî, Dar ul-Kitab el-Kerbî, Bagdad, 1428, r. 415

<sup>2</sup> Malbata Pêxember e. bnr. Tebrîsi, Ebî 'Ali el-Fezîl bin el-Hesen, *Mecme' ul-Beyyan fî Tefsîr el-Qur'an*, el-cuz' el-samin, Dar ul-Murteza, Beyrût, 1427, r. 251

<sup>3</sup> "Min bi şev ji 'Elî bin Ebû Talibbihîst."

71. Ji qewlê Resûlê Xuda rux metab  
*Wat mali-t Turab bi Rebb-ul erbab'*
72. Dil ve behr jerfê fîkr firû reftin  
 Ta yek rubâ'î metbû'êm keftin
73. *Subhanallah Qadirê bê çun bûden*  
*Ba her kem û efzûn kem û efzûn bûden<sup>2</sup>*
74. *Ba cumle yekî vez heme bîrûn bûden*  
*Ba ìn heme çun û çend bî çun bûden<sup>3</sup>*
75. Ji Zat çun 'acîz menî bûs-i leb  
 Ji sıfat derk kir tetemmey metleb
76. Mahê çardehê bedrê firûx in  
 Salê çardehê sinnê bilûx in
77. Vehab Cewadyed Taha Wechullah  
 Key mutessif in ve sıfatê Ellâh
78. Ve sûret Çardeh yekî ve me'na  
 Burhanîm 'edad Taha Heq dana

1. Riwayetek mensûb bi Pêxember: "Çi peywendî heye di nav xak (însan) û Xwedê da". Meybûdî, ji bo tefsîra Sûreya 'Erafê, ayeta 143yê, wiha nîvisiye: "Dema Hz. Mûsa dibêje 'Ez dixwazim Xwedê bibînim', milyaket vê cewabê didin Mûsa." bnr. Meybûdî, Ebûfezl Reşîdeddî, Keşf ul-Esrar ve'det ul-Ebrar, Me'rûf be Tefsîrê Xwace Ebdullah Ensarî, c. 3, amd. A. A. Hikmet, İntîşarat Emîr Kebîr, Tahran, 1376, f. 732.

2. "Subhanallah Qadirê bêhevtabûn / Bi her kêm û zêdebûnê kêm û zêde bûn."

3. "Di nav her kesî da derveyî her kesî bûn / Bi hemû çun û çandan bê çune ye bêhevtabûn."

79. Yedullah<sup>1</sup> guwah Wechullah<sup>2</sup> şahid  
 Çardeh ve 'eded muxatebê wahid
80. Wechullah 'Elî 'uşrê 'ela hû  
*Kullû şeyîn halik illa wechûhû*
81. Ewwel û axir ewset gişt Ehmed  
 Dubîn ehwel in ve ferdê Ehed
82. Sê new' beşer xelq kird Xuday 'Alem  
 Nas û şibhinas nesnasi efhem
83. Nas Çardeh Me'sûm şibhinas bizan  
 Bûzer û Miqdad 'Emar û Selman<sup>3</sup>
84. Mabeqî mexlûq mutleq nesnas in  
 Ji semeddîyet Xuda neşnas in
85. Her kes ke tehsîlê me'rîfet kirdin  
 Du qedr li cenbey nesnasi ferd in
86. *Ma xeleqte cinn we-l ins<sup>4</sup> wat Bêçûn*  
*İlla lî ye'budûn we eyye li y'erîfûn<sup>5</sup>*
87. Xerzad û xerzîst xermirdin aman  
 Dîde bugşa qedrê me'rîfet bidan
- 
- 1 Destê Xweda. Qur'an, Feth 48/10: "Bêguman ew ên ku peymanê didine te, bi rastî ew peymanê didin Xwedê; destê Xweda li ser destêwan e. Vêca kî peymana xwe bîşkîne webalê peymanşikandina wî ji wî re ye. Kî wê peymana ku daye Xwedê bîne cih, vêca Xweda dê xelateke mezîn bide wî.
- 2 Rûyê Xweda. Qur'an, Beqere, 2/115: "Rojhilat û Rojava (tevekê 'erdê) milkê Xwedê ye. Vêca (di nimêjê de) çi cihê hûn berê xwe bidinê ew qible ye (ew a ku Xwedê emrê we pê kiriye). Bêguman Xwedê qencifireh e, zana ye."
- 3 Çar dostê 'Elî bin Ebû Talîb ku piştevaniya wî kirine û hevalbendê wî yên pêşî ne: Ebû Zer el-Xeffarî, Selmanê Farisi, Miqdad bin Eswed û 'Emmar bin Yasîr. Ev her çar kes, weki 'erkanê şî'a' tênen qebûlkirin.
- 4 Qur'an, Zariyat 51/56; "Min cin û însan afirandine..."
- 5 Qur'an, Zariyat 51/56: "...bes ji bo ku ibadetê min bikin."

88. Wesfê bendegî li min biker gûş

Eger huşyar î mekey feramûş

89. Wesfê bendegî bizan sê herf in<sup>1</sup>

Herfê sê kelam bi nehw û serf in

90. Ji waw wird wedd wefa biker zebt

Ji sad sebr û sidq sefa meker xebt

91. Fê feqr û faqe fena û mehel

Xeyr-ul kelam wat *ma qull we dell*<sup>2</sup>

92. *Fe exle'e ne'leyk hat ve Mûsa neda*

Ji Heq bilwad-ul muqeddesê tuwa<sup>3</sup>

93. Ye'nî biyel ve hacetê xeyrê Heq

Muqeyyed dûr in ve bezmê mutleq

94. Ji seray Umm-i Hanî<sup>4</sup> Durret-ul Beyza

Ûrûc kird ve 'erş *leylet-ul esra*<sup>5</sup>

95. Mehrem ta mucrim yek nuqte xetast

Su'ûd-i nuqtey ba 'ebdê 'inde Mewlast

96. Çî we la-mekan Seyyîdê 'Ereb

Irade kird xel'ê ne'leyîn ji edeb

97. Şineft ya Ehmed mekin ne'leynit

Ye'nî Fatime'Elî û Sebteynit

1 Sê herfên peyva 'wesf': Waw (و), sad (س) û fê (ف).

2 "Başlırmış gotin, gotina kurt û bi delil e."

3 Qur'an, Ta-Ha 20/12: "Ez im, Ez Xwedâye te me! Vêca sola xwe ji lingê xwe bike. Lewra tu li newala pîroz, li Tuwayê yi!"

4 Qesra ku Pêxember jê radibe diçe Mi'racê.

5 Şeva Leylet-ul Qedrê.

98. Girt ne'leynit zîynet in ve 'erş  
Bar ta xalî bût ji ruh cismê ferş

99. Payey bendegî ve cayî nîşan  
*Lem yetmishûnne ins we la Can<sup>1</sup>*

100. Her qedr xud selb kird ji her mekan  
Temşîyet ferma ve Kerrûbiyan<sup>2</sup>

101. Bal ve hem şemîn î rahê tefte  
Xuda mezanût ew kes ke refte

102. Dîdey waz waz min dîdey hem ve hem  
Terdîdê nefş mesdûd bî muhkem

103. Çerx le gerdişê men ab le ceryan keft  
Ta ruhê 'alem ve lamekan reft

104. Germ germ û serd serd cuft hereket guşaşt  
Ruh û masewa teweccuh nedâşt

105. Cenbey bil-wicûbiş mûhîyê lahûtî  
Cenbey bil-xeyriş mûcîdê nasûtî

106. Ve î beden da lamekan xel'et  
Nasût bî ruhê min ta murace'et

107. Ji Eshabê Kehf<sup>b</sup> bider ve min dil  
Ve awazê seg bires ve menzil

<sup>1</sup> Qur'an, Rehman 55/56: "Di wan (cennetan) de dîlberên wisa hene ku çavê wan tenê li mîrêwan e û beriya wan, ne însekî ne ji cinekî dest nedaye wan."

<sup>2</sup> Çar fırışteyên muquerreb: Cebrâîl, Mîkâîl, Israfîl û Azraîl.

3 Sûreyek ji Qur'anê ku naveroka wê qisseyâ Eshab el-Kehf e. Sed û deh ayet e, li Mekkeyê nazil bûye. Kehf, bi erebî 'şikeft' e. bnr. Qur'an, Kehf, 18/1-110

108. Derkê deryûze ferzîke mehal  
Eger yek dem in er sed hezar sal
109. Ve Qab-i Qewseyn wîyerd Ew Edna<sup>1</sup>  
Ne zeman me'lûm ne mekan peyda
110. 'Unsur ve ca hişt eger xelq maçan  
Îy i'tiqade kufr in ve nisyan
111. Ye xud mehal in meger ke Ehmed  
Cuzê' eşya bûwe Qa'idê Resed<sup>2</sup>
112. 'Enasir ve cenbê Nebî muhat e  
Çûn ve masewa darû ihate
113. Ihate daştin ve kullê masewa  
Ne quwwey wêş bî bel quwwey Xuda
114. Sevellah ve cenbê Nebî muhat e  
Ve masewellah Heq daşt ihate
115. Ve heşt çar sifat naşî bî  
Heq mucessem kird sifatê Nebî
116. Yek sifat xezeb yek heyat derî  
Yekî rezzaqî ve yek pêxemberî
117. Sifatê xezeb bî ve 'Izraîl  
Muhî û mumîtiş da ve Israfîl
118. Ve Mîkaîl da cenbey rizq derîş  
Cebreîl mucessem ve Pêxemberîş

<sup>1</sup> Qur'an, Necm 53/9: "Bi qasî du kevanan an jî hê jê kêmtiler nêzîkî wî bû."

<sup>2</sup> Îmamê Danzdehem, Hz. Mehdî.

119. Ve gamê evvel mat men Cebreîl  
Çun cenbey pest bî va mend ji delîl
120. Le 'Izraîl vîyerd her çar ve ca hişt  
Zatiş vî beden ve lamekan nişt
121. Ew ke mumeyyîzê serf û sîfr niyen  
Mumeyyîzê sifatê 'unsur Nebî yen
122. Er hey gûsaley<sup>1</sup> le temyîz qasir  
Ferqha ne mabeynê sifat û 'enasir
123. Zatî ke muhat ve wehmê tu bû  
Muce<sup>2</sup> meşîyyet î Ehmed mebû
124. Ve müşareket du hoz ji e'rab  
Du şeyx du keman henin 'Elî qab
125. Yek tîr ve du çiley du keman henen  
Herdu ve yek bar tîr reha meken
126. Ve nef' û zerer şerîk in ve hem  
Le Qab û Qewseyne yes e keyf û kem
127. Min bab-il mesel metleb carî ye  
Ve zill û zî-zill müşariket niye
128. Ew Edna ye'nî duwît nîye  
Qudret ji Heqq e dest ji Nebî ye
129. Tuxmê ita'et ve cayî kaştin  
Çun zill pey zî-zill hereket nedâstin

---

<sup>1</sup> Golik.

<sup>2</sup> Bi şan û e'zeme.

130. Çunke sabit biyen ve zîllullahî  
Zill zî-zill nemû eger agah î

131. Ve zill û zî zill dûrc in macera  
Zill mer'î meyû zî-zill la yura

132. Key şuhûd meyû esrarê kemûn  
*Înnî e'lemu ma la te'lemû*

133. Lena me'e Ellah atî maçan  
Ew min min ew ew ew min min zan

134. Gişt sayey Heq in sayey me'newî  
Ne sayey beden xelet neşnewî

135. Qudretiş ji qudret qedrî yaft bî hed  
Gişt mehw bû ji me'nay imkan ji Ehmed

136. Le şanê Nebî wat Yezdanê pak  
*Lewlake lemma xelegt-ul efłak'*

137. Leykin we-s sema-i Zat-il hubbuke<sup>2</sup>  
*Lewla 'Elîyyûn lema xelegtkeke<sup>3</sup>*

138. Xatem ve muhît Şah-i fermandeh  
Belê el-xatem ma yuxtim<sup>4</sup> beh

139. Çun darê şihûd ittihad meyû

1 Hedisâ qudsî: "Heke tu neba, min ev felekên hanê nedîafirandin." Temamî vê hedîse bi wî awayî hatîye neqlkirin: "Ya Ehmed! Heke tu neba min ev felekên hanê nedîafirandin, heke 'Elî neba min tu jî nedîafirandî û heke Fatima neba, min hûn herdu jî nedîafirandin." El-Behrânî el-Isfahanî, Ebdullah, 'Ewalîm ul-'Ulûm ve l-Me'arif ve l-Ehwâl min el-Ayat ve l-Exbar ve l-Eqwal, c. 11/1, Muessise el-İmam el-Mehdi, Qum, 1415, f. 44

2 Qur'an, Zariyat 51/7: "Sond bi asîmanê xwedan rêk..."

3 Hedisâ qudsî: "Heke 'Elî neba min tu jî nedîafirandî."

4 Kesê ku her tişt bi wî dawî dibe. Mebest jê Muhemed Pêxember e.

Eslê xud mutabiq ba sewad meyû

140. Qebz û best'akis ve 'eks kird nigah  
Xatem pey ihatê da Welîullah

141. Xuda ve Ehmed xeleqteke lî wat  
*Xeleqt-ul eşya' leke'* hem nedahat

142. Çun halatê me'e Ellahî yaft  
Fenafillah bî şahidê xeyb şitaft

143. Heqîqetê wêş dî ye'nî Wechullah  
Misdaqê men 'erefe Rebbehû guwah

144. Ji dil û dîde tuxmê feraq kaşt  
*Merec-ul behreyn yelteqîyan<sup>2</sup>* daşt

145. Mehwê cemal bî ji Heq hat xitab  
Wat beyn-ul ehbab tesqet-ul adab<sup>3</sup>

146. Weqtê tekellum 'eqlê kullû deq<sup>4</sup>  
Awazê Heyder sema' kird ji Heq

147. Wat sewtê Heyder meşnewim celî  
Heq wat min maçam ve sewtê 'Elî

148. Ew ke Wechullah ji rûş rûşen in  
La şubhe sewtiş her sewtê men in

<sup>1</sup> Hedişa qudsî: "Min her tişt ji bo te afirand, tu jî ji bo xwe." Muheqqiq Kerekî, Elî bin Huseyn, *Resayîlê Kerekî*, c. 3, amd. M. el-Hesûn, Muessise el-Neşr el-İslâmî el-Tabî'a li Cemaet el-Muderrîsin bi Qum, b. t., r. 162

<sup>2</sup> Qur'an, Rehman 55/19: "Xwedê, herdu derya (ya şîrîn û ya şor) herikandin ku ew digihîn hev."

<sup>3</sup> "Di nav dostan da qaîde radibin."

<sup>4</sup> Dîqqet, baldarî.

149. Ve 'erşê Xudast ew kursînişîn  
Er-Rehman 'il-el 'erş istewa' stîn

150. Neşnûftî kerrat Welî yê mutleq  
Wat men erenî feqed erene el-Heq<sup>2</sup>

151. 'Erz kird mezanûm ye sewtê kî ye  
Leyk qurbet meqamê xudbinî niye

152. Serapa gûş im ta çi fermayî  
Pa ta ser dîde ta rux binmayî

153. Ji xud bê xeber ji Heq agah î  
Her yes e me'nay fenafillahî

154. Duiyet key hat min nûr-i wahid  
Xeyben lem yudrik perîş bî şahid

155. Mepirs ji nuktey dîdariş dîden  
Er bînîş 'erz kir çeşmê tu rûşen

156. Hem ve dîdey hiss hem ve dîdey batin  
'Emîtu 'eynen la turak<sup>3</sup> watîn

157. Çun 'arî ji Zat 'eynê sifat î  
Lem 'ebdû Rebben lem ere<sup>4</sup> watî

1 Qur'an, Ta-Ha 20/5: "Xwedayê ku Rehman e, li ser 'Erşê raser bû (raserbûne-ke babetê xwe)." r. 311

2 "Yê ez dîtî, wekî ku Xwedê dîtiye." Di riwayetên devkî yên ş'a da gotineka mensûb bi 'Elî bin Ebû Talib.

3 "Bila kor be ew çavê ku tu wek çavdêrê xwe nizanî." Ji du'aya Huseyn bin 'Elî, ya roja 'Erefeyê. Qumî, Şeyx 'Ebas (berhevkar), Mefatîh el-Cinan, (bê tarîx, bê cih), r. 594

4 Hedişek ji 'Elî bin Ebû Talib, bnr. Kuleynî, Muhammed bin Yaquib, Üsûl el-Kâfi, c. 1, (wer. M. B. Kemereyi), İntisarat-ı Uswe, Tahran, 2008, r. 398

158. Kema Rebbanî sexîr ummû eb'  
‘Elî û Muhemmed ‘eded in ve Rebb

159. Hemd müşteq bîyen ji maddey’ Ehmed  
Ehmed müşteq bî ji maddey’ ehed

160. Çun hemdê Ehmed in ji nûrê mubîn  
*El-hemdû lillah Rebb-ul ‘Alemîn*<sup>2</sup>

161. Men zare exen lem yezuq şey’en  
Feke innema zare meyyiten<sup>3</sup>

162. Ji demiş bamê ezel bî rûşen  
*Luqmet-us sebah mismar-ul beden*<sup>4</sup>

163. Bi renc in dîdar mehbûbê wahid  
Xud Sûreyê’ Tewhîd we me’naş şahid

164. Birinc daneyê’ *qul hûwe Ellah*<sup>5</sup> nedâşt  
Tuxmê tewhîdiş le mezr’ê dil kaşt

165. Şîr te’bîr ve ‘ilm qûtê rûh yes e  
Me’nîyê şîr birinc şînûftî bes e

166. Feqerey tufah eger mechûl in  
Nîmî Zulfiqar nîmî Betûl in

167. Ismê e’zemî Esma-ul Husna  
Şefe’e we ter bi cenbê Zatit bî peyda

<sup>1</sup> Dê û bab.

<sup>2</sup> Qur'an, Fatîhe 1/2: "Hemd (pesn û spasî) ji Xwedê re be ku ew perwerdegarê 'alemî ye."

<sup>3</sup> "Her kesê ku birayê xwe ziyaret bike, keyfê ji vê ziyaretê nagre, weku çûbe serdana miriyek!"

<sup>4</sup> "Taştê, bizmara laş e."

<sup>5</sup> Qur'an, Ixlas 112/1: "Bibêje: Xwedê her yek e."

168. Er dîrîn we 'erş mumkin yekтай  
Le şeqq-ul qemer<sup>1</sup> enguşt nimayî

169. Pey icanâ xelq ji Heq menzûr bî  
Mustecme'ê mecmû'e we ter-ul mutur bî

170. Çun yek qebzêy mûm masewaş bi dest  
Coz Heq bi her şey' teserrufîş hest

171. Xasse Ehmed in masewa temam  
Pes na merbût in xerq û iltiyam<sup>2</sup>

172. Ger şahî zahir ji mulkî wîyerd  
Eser lêş niyen coz du sa'et kerd

173. Xur ker we batin Mi'râc her yes e  
Xane ger kes e î yek herf bes e

174. Dil mekanê Heq Heq ne dil mestûr  
Xeyr-ul ziyare fuqdan-ul mizûr

175. Besker Perişan perişan herfî  
Î bade pir zor tu tungê zerf î

176. Metleb keft ve dest firqey name'qûl  
Xase î 'ewamê ze'if-ul 'uqûl

177. La yetenahî herfî bî inşa'  
Çi derk mekey coz' we la yucza'

178. Min zehmet kêşam tu yad gîr we muft  
Hiley esb bendha balay gayê cuft

<sup>1</sup> Qur'an, Qemer 54/1: "Qiyamet nêz bû û heyy bû du şeq."

<sup>2</sup> Berbelavbûn û yekbûn, ku di felsefeya îslâmî da ne mumkin e.

179. Mesel meşhûr in bişnû keyf û kem  
Kar kirdin ye'für xurdenê ew şem
180. Şukrê min biker kirdimit agah  
Men lem yeşkur-un nas lem yeşkur Ellah<sup>1</sup>
181. Kunhê fehmê 'aciz ji me'nî der yab  
Islah we hek nekêy ji sefheyê Kitab
182. Qewlê Resûl wat Ibn Babûye<sup>2</sup>  
Et-teqa min şerr ehsent-ul ileyh<sup>3</sup>
183. 'Ibaret teng in bidar mu'affim  
Werne metalib 'umde meşkaf im
184. Watey min û tu key meyû zahir  
Belî el-me'na fî betinê şâ'ir
185. Watim çun tûtî mezan teqlidî  
Min 'inde Ellah zan 'ela teyîdî
186. Li mexzê şîrim xelq û tezerru'  
Coz 'arif bi Heq ehlê teşerru'
187. Watim mucmelen gişt ve kinaye  
Min el-bidaye il el-nihaye
188. Jew be'd qışrî lêş mustehzer mebû  
Cins ke erzan bî mulla xwer mebû

<sup>1</sup> Hedi sek mensûb bi çend imamên şî'a: "Yê ku şukrê xelkê neke, şukrê Xweda jî nake". Sedûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, *'Uyân Exbar el-Riza*, coz'ê sanî, İntişaratê el-Şerîf el-Rezi, Qum, 1378, r. 27

<sup>2</sup> Muhammed bin 'Elî bin Huseyn bin Babûye (m. 940?), 'alîm û muheddîsê navdar ê şî'i.

<sup>3</sup> Hedi sekâ bêsened, mensûb bi Pêxember: "Yê ku we qencî li wan kiriye, ji xirabiya wan bitirsin."

189. Ji elwarê kûh Heq peyda mebû

Ya min fi-l cibal xeza' inehû

190. Summî Vedûd 'Elîyen 'ezîm

Menn yuhîy-ul 'izame wehîyê remîm'

191. Teserruf dîrîn tu ve mewcûdat

Kullî şeye'n qedîr<sup>2</sup> Zatit xeyrê Zat

192. Basut-ul yedeyn bi-l rehmet<sup>3</sup> darî

Xinsir çeb kem ji yek meşmarî

193. Li behrê cûdit derya yek nem e

Destê kerîm key ji radî kem e

194. Kî xecil niyen ji ihsanê tu

Len tenalû-ul birre hetta tunfîqû<sup>4</sup>

195. Texyîr mederîn ve sirke şerab

Hubbit mekrûn gunah û sewab

196. Xudawend murîd tu iradey Heq

Fîl bî irade nemebû mutleq

197. Zatê Heq bê 'ilm û irade niye

Kî Zat ve bê 'ilm û irade diye

1 Qur'an, Yasîn 36/78: "Ma kî yê vî hestiyê riziyayî sax bike?!"

2 Qur'an, Mulk 67/1: "Ew li ser her tiştî qadir e."

3 "Ji bo rehmetê du destenê te yên vekirî hene". Hevokek ji du'a ya "Ya men Ezher el-Cemîl" ku wek diyarî ji bo Muhemed Pêxember, ji aliyê Xwedê ve bi réya Cebralî hatîye şandin. bnr. Sedûq, Muhammed bin Elî bin Huseyn bin Babûye, el-Tewhîd, tehqîq: H. Huseynî Tahranî, Muessise el-Nesr el-İslamî, Qum, 1430, r. 216

4 Qur'an, Ali İmran 3/92: "(Gelî bawermendant!) Heta ku hûn ji ya ku jê hez dikin (di rêka Xwedê de) xerc nekin hûn ê negîhên (xelata) xêr a herî qenc. Hûn ci xerc bikin ji Xwedê her pê dizane."

198. Zat û irade herdu qedîm zan  
Leyk Zatê bi Zat ew bi yek zeman
199. Çûn zill û zî zill çûn şems û zîya  
Infikakişan mehal ve me'na
200. Qedîm bi Zat ne qedîm bi zeman  
Vî meqamate şirk dîrî îman
201. Zatit çun nasim munşe'ê felah  
Wesfit çun maçûm xellaqit meddah
202. Çun xellaqê meddah Zatê 'Elî yin  
Meddahîyê 'Elî şirkê celî yin
203. Haşa key kesî qedrê tu zana  
Beyanê hal in ve ferdê dana
204. Perwerdey Ehmed Mekkey mekînî  
'Urwet-ul wusqa hebl-ul metînî<sup>1</sup>
205. Merd ve mesafit Rustem yek Zal in  
Hatem ji ewsaf sexay tu lal in
206. Ya ba'es îcad masewallah gişt  
Ya mayê randinê Adem ji bihişt
207. Ve kesrê esnam Seyyîd el-Wera<sup>2</sup>  
Ket kitf memhûr key ew ji kefê pa
208. Ne ew tabê barê nubuwvet nedâşt  
Nebî welayetê xasse ecrî daşt

<sup>1</sup> Benikê qewî. Mebest jê İslamiyet e.

<sup>2</sup> Muhammed Pêxember.

209. Leyk ve textê derê Xeyber guşayî

Pa niyan ve ban destê Xudayî

210. Qai'lê ene behr-ul hedîd<sup>1</sup> î

Ji qewlê Xuda bi'sê şedîdî

211. Sebbeh Ellah wirdê zebanit

Sûreyê Hedîd<sup>2</sup> wala ve şanit

212. Mezherê Heqq î bê şubhe û xilel

Leyk mumessil rah nîrît ve mesel

213. 'Ilmê 'am xas xas el-xasê 'emîm

Ve fewqê kull zemî 'ilmê 'elîm

214. Islahê metleb nemenin ve dehr

Zâher-ul fesad fî-l berrû-l behr<sup>3</sup>

215. Ve zû cenbeteyn wahidiyyet niye

Şahid nezelûna 'en-ul rububîyye<sup>4</sup>

216. Jew be'd wesfişan kirdît bikey kem

Misdaq in qalû fîna ma şî'tem<sup>5</sup>

217. Li wesfê Zatit mekirdim 'ulluvv

Xarê rahim bî meqamê xulluvv

1 Gotinek mensûb bi İmam 'Elî: "Ez deryaya hesinî me."

2 Sûreya 57emin a Qur'anê ye. Ji 29 ayetan pêk tê û li Medîneyê nazil bûye. Mé'neya zhedîd' di 'Erebî da 'hesin' e. Naveroka sûreyê tekoşîna di rîya Xwendê da û fanîbûna jiyana dînyayê ye.

3 Qur'an, Rûm 30/41: "Ji ber gunehên ku mirovan bi destê xwe kirin, xerabî li bej û behrê xuya bûye."

4 Di rivayetên şî'a da gotinek mensûb bi çend imaman: "Me ji xwedatiyê daxin. Hûn herçend behsa mezinahiya me bikin jî, hûn nikarin mezinahiya me tê bigehin." bnr. el-Sened, Muhammed, *el-İmamet el-İlahiyye*, telîf: M. R. Sa'îdi, el-coz' el-sanî, el-Emîret, Beyrût, 1433, f. 41

5 Berdewama riwayeta jor.

218. Ne min ve memduh bel mexlûq ve min  
 Xulluvv mekeran ji neqsê batin
219. Ne xullû bi qaf ne xullû bi 'eyn  
*La cebr la tefwiz emr beyn-ul emreyn<sup>1</sup>*
220. Penîr da coz da cemi'shan dewa  
 'Ilac mufsid û ifsad kirya
221. Nedîd û neşinaxt maçan Xudayî  
 Ne'uzûbillah er rux binmayî
222. Kî daşt serpencey Xeyber gûşayî  
 Kî ji bendegî mekird Xudayî
223. Adem sîneçakê gendumê xalit  
 Nûh xerqê tofanê behrê kemalit
224. Dawud bilbilê ne şaxey gulit  
 Xeylê Suleyman tarê sunbilit
225. Ye'qûb ji hesret e'may fuqdanit  
 Yûsif zindanî çay zenexdanit
226. Xelîl perwaney şem'ê cemalit  
 Zebîh qurbanî kûyê wisalit
227. Mûsa erenî-gûyê *len teranît<sup>2</sup>* in

<sup>1</sup> Hedîsek mensûb bi çend îmamên şî'a: "Ne emrîwakî ye ne ji bi zorê. Tiştekî di nav herdulan da ye". bnr. Kuleynî, Muhemmd bin Ye'qûb, *Usul el-Kâfi*, el-coz' el-ewwel, Menşûrat el-Fecr, Beyrût, 1428, r. 92

<sup>2</sup> Qur'an, E'râf 7/143: "Tu yê min nebînî." Temamî ayetê wiha ye: "Çi dema Mûsa ji bo civanê me hat û Xwedayê wî pê re peiyîv. (Mûsa) Got: Xwedayê min! Xwe nîşanî min bide da ez te bibinim. (Xwedâ) Got: Bêguman tu yê min nebînî. Lêbelê, berê xwe bide çiyê, êdî eger li cihê xwe rawestiya hingî tu yê min bibînî! Vêca çi dema Xwedayê wî ji çiyê re diyar bû (diyariyeke layiqî xwe), êdî çiya bû parce parce û bi erdê re misêwa bû."

Muştaqê yek herf hem zuwanît in

228. 'Îsa ve felek birdîş pelamar  
Pey 'etbe bûsît her subh her êvar

229. Ve şerîkî xor ta rojê memat  
Ew kesbê nûr key î kesbê heyat

230. Lewhê munqelib helû kelamit  
Qelem pa ber cay ewwelîn namit

231. 'Erş nîmey batin efkendin ve pa  
Bî dil ji 'işqit nemin pa ber ca

232. Kursî sergerdan ji daxê sewdat  
Neh eflak sellim pesttrîn mawat

233. 'Eşerîy 'uqlu de'wîm tuwzîh in  
El-kinaye eblex min-el tesrîh in

234. Ve Zatê Xuday 'arî ji xerez  
Wacib-ul wucûd î leykin bê 'erez

235. Husnê metle'i û ferdê ehed  
Siwwum wacib in misre'ê Ehmed

236. Mezherê Heqq i hem Zillûllah î  
Fi'lê Heq zahir lêyt bî gûwah î

237. Eger bi qezast muhewwelê hal  
Çun 'eksê rizast mecarî ehwal

238. Wesfit mekirim bi riza û tû'  
Ew qedr mezanûm tu yî Rebb-un nû'

239. Wesf li Zatit mekim deryûze  
Kuzeger hergiz neşinasut kûze

240. Pirsam li xired xurd biyen xurdgîr  
Pêxember batin ji heyyê kebîr

241. Ve î tewr meddahî ve şanê Heyder  
Merzî in ve lay Xuda û Pêxember

242. Wat Nebî rizast beyyin û şahid  
*Ene we 'Elî min nur-i wahid'*

243. Nebî Zillullah 'eqlê kul û neql  
Xuda bişnasîn ve delîl û 'eql

244. Ger metleb mechûl bo cîş me'dûm in  
Isterzayê zî zill ji zill me'lûm in

245. Min Perîşan im perîşanhal im  
Ji wesfê senay ewsafit lal im

246. Layê tîxit isbat we Ellah kirdin  
Me'nî La Feta La Seyf<sup>2</sup> hem kirdin

247. Du misr'eqs beytê muntxeb şimar  
Pey hifzê mezheb bî ve Zulfeqar

248. Weqtî cidâlit ve mexzûbîn in  
Senanit meddê ve le l-zalîn<sup>3</sup> in

<sup>1</sup> Hedîsa nebewî: "Ez û 'Elî ji yek nûrê ne". Ibn Bitrifq, 'Umde, 'Uyûn Sîhah el-Exbar, tehqîq: M. el-Mehmûdî, İ. el-Behadurî, el-coz' el-ewwel, Muessise el-Îmam el-Sadiq, Qum, 1412, r. 262

<sup>2</sup> Kurteya gotina "La feta illa Alî la seyfe illa Zulfeqar". "Ji 'Elî wêrektir mîr nîne, ji Zulfeqar baştir sûr nîne."

<sup>3</sup> Qur'an, Fatiha 1/7: "(Xwedayê min! Me rasterê bike) Li ser rêya wan kesên ku te qencî û dilşadî daye wan, ne li ser rêya wan kesên ku xezeb li wan bûye û rêya heq winda kirine."

249. Herkes ji fezlit mekerû inkar

Fehîtan dar ebîhu qisar<sup>1</sup>

250. Ji Xummê Xedîr<sup>2</sup> ehsen-ul beşer<sup>3</sup>

Cehazê şutir kirdîş ve minber

251. Destê 'Elî girt watiş bermela

Her kesê menîş mewlam 'Elîş in mewla<sup>4</sup>

252. New weqtê rehlet xemxwarê ummet

Ve Aqay Qenber<sup>5</sup> kirdîş wesîyyet

253. Be'd li min şemşîr mekêş ji xilaf

Meger heşt mu'în daştî ve mesaf

254. Destûr-ul 'emel yes e fer' û esl

Ta sahib-ul emr<sup>6</sup> neslen b'edê nesl

255. Şemşîrê 'Elî Şay Duldulsiwar<sup>7</sup>

Pey ci muleqqeb bî ve Zulfeqar

256. Piştiş heftad û du feqere daşt

Her feqere zebanîy ve e'da gumaşt

1 Nîvbeyta dawiyê helbestek e ji es-Sahib bin 'Ibad (m. 995) li ser medha 'Elî bin Ebû Talib û li hemberî dijminên wî. Sahib bin 'Ibad, *Dîwan el-Sahib bin 'Ibad*, tehqîq: I. Şemsedîn, Menşûrat Muessise el-E'lémî li l-Metbû'at, Beyrût, 1422, rr. 61-62.

2 Pişti Hecchet-ul Wedâ'a di 18ê Zî'l-Hecce sala 10ê koçî, Pêxember li cihekî bi navê Xummê Xedîr, 'Elî wek 'Weli' ilan dike. Ew roj, ji bo baweriya şî'a rojeka muhim e.

3 Qenctirîn beşer. Mebest jê Hz. Muhammed e.

4 Hesîda mensûb bi pêxember ku li Xummê Xedîr gotiye û 'Elî wek xelefê xwe destrişan kiriye: 'Men kuntu mewla fe haza 'Elî mewlah.' Her kesê ku ez rîberê wî me, 'Elî ji rîberê wî ye.'

5 Qenber, navê xulamê Hz. 'Elî ye. Axayê Qenber, yanî 'Elî.

6 İمامê Danzdehem Hz. Mehdi.

7 Siwarê Hespê Duldul, 'Elî ye. Huart, Cl., "Duldul", *EI2*, Vol. II, 1965, r. 639

257. Zebaney zerbî hezar kes mekuşt  
Quwwey îmamet Yedullah ve mişt

258. Ji yewmê Xendeq agah her kes e  
Zerebe Zeyd-un 'Emr<sup>1</sup> in her yes e

259. Ihate binger heftad pişt her yek  
Mulaheze kir bê reyb û bê şek

260. Ye gişt li qudret Kirdigar meyû  
Sahib feferatê Zulfeqar meyû

261. Ji bes çabûk bî ji bes celdî daşt  
Tîxiş ve 'eda ve du ser ingaşt

262. Ta'enen remheyn bî zarbê Siffin<sup>2</sup>  
Key du ser daşt tîx Shay Bedr<sup>3</sup> û Huneyn<sup>4</sup>

263. Dest ve dest resîd ta îmam el-gişt  
Ji e'da pir ken dûzex çun engişt

264. Pey xanezadîş di cayê ewlad in  
Hemze xud di cayê elif irşad in

265. Hemze şiklê 'eyn seriş pey çî in  
Kinaye ji namê pakê 'Elî in

266. Mehtûm in ji qewlê Xudayê Mecîd  
Hemze ra ve cay elif bişnasîd

267. Rûzey Remezan Şe'ban û Receb

1 'Emr bin 'Ebduwed, şervanê navdar ku di şerê Xendeqê da bi destê 'Elî hat kuştin.

2 Şerê Siffinê, sala 37ê koçî.

3 Şerê Bedrê, sala 2yê koçî.

4 Şerê Huneynê, sala 8ê koçî.

Medde wacib in meddê musteheb

268. Ve fikrê deqîq xwes̨ munasib in  
Hemze ta elif meddiş wacib in

269. Cezmet û ta'et ve şiddet 'ezm in  
Pey bendegîyê xas 'ezmit cezm in

270. Wucûd û Wacib-ul Wucûd wahid in  
Wehdet-ul Wucûd cenbey ba'id in

271. Hedîs şayî' in ji Resûlellah  
*El-qeyd kufîr in lew kanê billah'*

272. Muqeyyed ve qeydullah cismanî  
'Arîyen ji rah resmê muselmanî

273. Ism û fi'l û herf me'nay sifat in  
Ellah teswîrê hicabê Zat in

274. Faliq-ul esbah ve iznê Xuda  
Her tu yî faliq-ul hub we-l newa

275. Muhebbet xas in 'îşqê amîn exess  
Sûrey Yûsuf kird 'Ehsen-ul-Qises<sup>2</sup>

276. Yeselûneke 'en er-ruh ji Nebî  
Heq wat qu'l er-ruh min emrî Rebbî<sup>3</sup>

277. Ummî çi ra bî ehsen-ul beser  
Sîrrê yetîmîş ji mader peder

1 Ev gotina ku Mela Perîşan dibêje hedîs e, di çavkaniyan da peyda nebû.

2 Xweştirîn çîroka Qur'anê, qiseya Hz. Yûsuf.

3 Qur'an, Isra 17/85: "Di heqê (heqîqeta) ruh de ji te dipirsin (ka ruh çi ye). Bi-bêje: Ruh, ji karê Xwedayê min e. (Geli mirovan!) Ji bo we ji zanîneke hindik pê ve tu zanîn nehatiye dayîn."

278. Ta heyat daşt kes selamiş nekerd  
Bi coz Xudawend kes le jin û merd

279. Kes ulûhîyyet lêş nedaşt her bab  
Ta te'lîmiş key coz Rebb-ul Erbab<sup>1</sup>

280. Ta Heqê te'lîm Heqê walidîn  
Xud Heq selam çeniş nebû dîn

281. Muhtac bî ve Heq muhtac nevî ve kes  
*El-feqru fexrî<sup>2</sup> ye me'naş in bes*

282. Pey tenbîhê xelq ve kerrat mewat  
*Hubb-ud dunya re's kllu xetîyat<sup>3</sup>*

283. Çe xas ferman da Seyyîdê Kuneyn  
*Tekeddî es-sewad el-wech fî-d dareyn<sup>4</sup>*

284. Leyk ve be'zî teb'ê mekrûh xatir in  
Geda rûş siyah damaniş pir in

285. Bişnû ji goftey Mela Muhemmed Belxî<sup>5</sup>  
Bisyar şîrîn wat ew ne ve telxî

286. Mehremê î hûşe coz bê hûş niyen  
*Muşterîyê zeban bi coz gûş niyen<sup>6</sup>*

1 Rebbe rebban, Xudayê xudayan.

2 Hedîsa nebewî: "Feqîrî, fexra (serbilindiya) min e." Ehsaî, Ibn Ebî Cumhûr, 'Evalu el-le'alî fî l-Ehadîs el-Dînîyye, coz' ewwel, tehqîq: M. el-'Iraqî, Metbe'e Seyid el-Şuheda, Qum, 1403, r. 39

3 Hedîsa nebewî: "Hejékirina dînyâyê sersebebê hemû xetayan e."

4 Hedîsa nebewî: "Parsekî, rûreşıya herdu cîhanan e". Eslî hedîsî wek "El-feqr sewad el-wech fî l-ddareyn" tomar bûye. Ehsaî, Ibn Ebî Cumhûr, h. b., r. 40

5 Mewlana Celaluddîn Muhemmed Belxî el-Rûmî (m. 1207-1273).

6 Mela Perîşan ev beyt ji farsiya wê wergerandiye kurdi. bnr. Mewlana Celaled-dîn M. B., Mesnewî, amd. Tevfîq Subhanî, İntişaratê Rozeneh, Tahran, r. 5

287. Istib'ad mekey ji ehlê bihiş  
Pey xast her nîstî mewcûd kirdî gişt

288. Ger 'ebd teleb kird dinya ji Mewla  
Mewcûd mew periş terîqê ewla

289. Wat yebnê Adem etî'ûnî Heq  
Ec'elekum mislî fî-l ef'alê mutleq

290. Resûl ve tekmîlê be'zî meqamat  
*Rebbê zednî fîke li teheyyyere<sup>2</sup> wat*

291. Leyk gûş ker in ji ahengê esrar  
Dehanî meyû lebrêzê inkar

292. Çun geday Yehûd ne dinya û dîn  
*Zalike huwel xusran-ul mubîn<sup>3</sup>*

293. Ed-dinya we-l axiret uxtan in  
Her xurdbînî durişt ziyan in

294. Segê nefş mirdarê dinya mencilab  
Ed-dinya cîfe talibuha kelab<sup>4</sup>

295. Pey rizq le Rezzaq fire dûr keftî

<sup>1</sup> Hedîsa qudsî: "Ey ewladêni Adem, çîqas hewcedariya we heye ji bo ku hûn ibadeta min bikin."

<sup>2</sup> Du'a Muhammed Pêxember: "Ya Xweda, heyreta min zêde bike". Ehsaî, Ehmed bin Zeynedîn, *Cewami' ul-Kilem*, el-mucellid el-samin, Metbe'et el-Gedîr, Besre, 1430, r. 159

<sup>3</sup> Qur'an, Hecc 22/11: "Xeserata aşkera ha ev bi xwe ye." Temamê ayetê: "Hin ji mirovan hene ku şbadetê Xwedê ne ji dil dikin, vêca eger qencyiyek li wî bibe pê kêfxwêş dibe û eger belayek bi ser de were rûyê xwe diguherîne (ji dîn derdikeve). Bi vê rewşê li dinya û axretê ziyan kiriye. Xeserata aşkera ha ev bi xwe ye."

<sup>4</sup> Hedîsa nebewî: "Dinya leş e, yên ku wê dixwazin jî kûçik in". el-Eclûni el-Cerrahî, İsmail bin Muhammed, *Kesful-Xefa ve Muzîl ul-Elbas 'Emma Eşteher min el-Ehadîs 'ela el-Sinnet el-Nas*, Mekteb ul-Qudsî, Qahire, 1351, r. 409

Rizqek yetlebûk meger neşineftî

296. Peyaz kef welayê xelq fira birdin  
Ve pîlêk saxtin ji ebrû wîyerdin

297. Dest vaz kerem in dest bestê bird  
Istidlal ji fehm û nefs bayed kird

298. Ve tu pestî hat er fîkr key henî  
Her ve dinya mestê dena û denî

299. Hereket ger mekîn Heq bar ve xatir  
El-'ebd yûdebbir we-l Heyy yûqeddir<sup>1</sup>

300. Bişnû fermayışê Mewlayê mutteqîn  
Wat ene miskîn calîs-ul miskîn<sup>2</sup>

301. Meke pey dûnan ve dûnan feze'  
'Izze min qene' zille min teme<sup>3</sup>

302. Pey nemaz ser ve zemîn megzarî  
Ew we zemîn nerke ve serdarî

303. Iza qebiltû qebiltû masewa  
We iza reddet reddet masewa<sup>4</sup>

304. Nebî wat selat 'emûdê dîn<sup>5</sup> in

1 "Evd teşebbus dike, Xwedê teqdîr dike."

2 Gotinek mensûb bi 'Elî: "Ez miskîn im û li gel miskînan rûdininim."

3 Hedişek mensûb bi Muhammed Pêxember: "Heç qena'et bike, dibe xwedî 'iz-zet û şeref; heç tamahiyê bike, rûreş û rezîl dibe." bnr. el-Mazenderanî, Muhammed Salih, Şerhî Camî'î el-Kâfi el-Usûl ve l-Rewze li Sîqet ul-Îslam Ebî Cefer Muhammed bin Ye'qûb el-Kuleynî, me'e te'lîqat E. el-Şerîanî, el-Mekkeb el-Islamiyye, Tahran, 1386, r. 175

4 "Eger qebûl be masewa ji bila qebûl be, eger red be masewa ji bila red be."

5 "Nimêj, sitûna dîn e". Di nav gelek çavkaniyê sunnî û şî'i da ev hedîs, men-sûb bi Muhammed Pêxember hatiye qebûlkirin. Herwiha, berî ku 'Elî bin

Xîmey bêstûn ferşê zemîn in

305. Li weqtê ezan mekêşî siruş  
Elifê ezanit çun tîrha ne gûş

306. Zahir bîst heşt hûrûf meşmarû  
Lakin ve batin bîst pênc meverû

307. Ma ce'ellah recalen ve Qur'an  
Min qelbeynî fî cewfe<sup>2</sup> wat Yezdan

308. Pey tesxîrê 'ewam mekêşî sefir  
Inne enker-ul eswat li sewt-ul hemîr<sup>3</sup>

309. Ve yek merd du dil Heq neker xilqet  
Yek dil caş niyen cuz yek muhebbet

310. Zahir iyyake n'ebdû iyyake neste ïn<sup>4</sup>  
Batinî meçût ve qatir xerîn

311. Li mehzerê Heq fa'il munfe'il  
Nemazê wî tewre xecil

312. Kuntû fî qulûb-ul munkesir<sup>5</sup> yad ker  
Es-selatu M'irac mumîn<sup>6</sup> bawer ker

Ebû Talib bête şehîdkirin, di wesiyeta xwe da ji bo Hesen û Huseyn qala vê  
yekê kiriye. bnr. Sedûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, *Men La  
Yehzurehû l-Feqîh, el-coz' el-rabi'*, Muessise el-E'lemî li l-Metbû'at, Beyrût,  
1406, r. 145

1 Bîst û heşt herfên elifbêya 'erebî.

2 Qur'an, Ehzbâz 32/4: "Xwedê, du heb dil nexistine sînga tu zilaman..."

3 Qur'an, Luqman 31/19: "Béguman dengê herî kirêt dengê kerê ye."

4 Qur'an, Fatihe 1/5: "Em her te dihebînin û her ji te arîkariyê dixwazin."

5 Hedîsa qudsî: "Ez di nav dilên şikestî da bûm." Isfahanî, Hafîz Ebî Ne'im Eh-  
med bin Ebdîllah, *Hilliyet ul-Ewliya ve Tebeqat ul- Esfiya, el-coz' el-rabi'*, Dar  
ul-Fîkr, Qahire, 1416, r. 32

6 Hedîsa nebewî: "Nimêj, Mi'raca mumînan e". Meclisî, Muhemmed Teqî, *Rew-  
zet ul-Mutteqîn fî Şerhê Men La Yehzurehû l-Feqîh lil-Sedûq, el-coz' el-salis,*

313. Durc in ve reqem mubarek şiyem

Le mucidê xeleq Xalîqê 'alem

314. Înne eqreb-ul eleykum min hebl-ul werîd<sup>1</sup>

Ej regê gerden Heq niyen be'îd

315. Efereeyte min-et texezehû

Îlahehû huwîye we maxezehû<sup>2</sup>

316. Mef'ulê min erad fe'alê ma yûrîd

Xud we'dey' Heq meken ve we'îd

317. Muxatib nefş in me'e-l xeyr çi sûd

Weylun li men kufrehû Nemrûd<sup>3</sup>

318. Pey du rojey 'umr megzer ji 'uqbat

Xab û bîdarît dal in we isbat

319. Wîy xud-arayî wîy ten-perwerî

Arezûy male merdûm mekerî

320. Se'y kerû ixlas perî mudde'a

Leysel-ul însan illa mase'a<sup>4</sup>

321. Dinya bê wefast pûçê dûn-perwer

Zindanê mu'min bihiştê kafer

322. La yûkellefullah dînen we Kitab

Dar ul-Kutub el-Îslamî, Qum, 1429, r. 12

<sup>1</sup> Qur'an, Qaf 50/16: "Sond be, bi rastî Me însan afirandiye û ya ku nefsa wî jê re dibêje Em dizanîn û Em ji rahjiyana (şahdamara) wî ji bêhtir nêzîkî wî ne." Mela Perîşan di vê beytê da înne (ez) nivîsiye lêbelê li gor me'ala li ber destê me di ayetê da li şûna wê nehnû (em) heye.

<sup>2</sup> Qur'an, El-Casiye 45/23: "Erê ma te dît? Ew ê ku hewesa xwe ji xwe re kire îlah?" Ji bo dubareya heman ayetê bnr. Qur'an, Furqan 25/43.

<sup>3</sup> Meseleka 'erêbî: "Wey li wî kesî ku Nemrûd ji wî tekfir dike."

<sup>4</sup> Qur'an, Necm 53/39: "Ji însen re, ji kar û kiryarê wî pê ve tiştekî din nîne."

Hat nefsen illa wus'ha' xitab

323. We tedrîc têy ker rahê terîqet

Mecaz qenter in eray heqîqet

324. Kewn ha turuqî ve tedrîc ten dêh

Wucûdê naqis ji 'edemê sirf bêh

325. Çun Heq ji îcadê masewa perdaxt

Ji nûrê Ehmed lewh û qelem saxt

326. 'Erş û kursî hem ji nûrê Murteza<sup>2</sup>

Asman û zemîn hem ji Mucteba<sup>3</sup>

327. Ji nûrê Huseyn bihişt kird bîna

Cilwe ker bî nûrê Betûlê 'Uzra<sup>4</sup>

328. Nûrê Betûl kird müşate her heft

Etlesê eflak kirdîş ve zer beft

329. Çun ke rûşen kird kullî masewa

Muleqqeb bî ve Zuhreyê Zehra

330. Zemîr û ta'nîs racî'in her surî

We ke innema kewkebun durri<sup>5</sup>

331. La şerqîyyen we la xerbîyyen<sup>6</sup>

Muxtesê wucûdê pakê Nebî in

332. Eger huşyar î me'nî ker ve 'eyn

<sup>1</sup> Qur'an, Beqere 2/286: "Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, binbar dike."

<sup>2</sup> Leqebla 'Eli bin Ebû Talib.

<sup>3</sup> Leqebla Hesen bin 'Elî.

<sup>4</sup> Leqebla Fatime bintî Muhemmed.

<sup>5</sup> Qur'an, Nûr 24/35: "Her wekî stêreke ronak be..."

<sup>6</sup> Qur'an, Nûr 24/35: "Ne li rojhîlat e ne jî li rojava ye."

*Huseyn minnî ene min Huseyn'*

333. Kar ve cay resî Mu'awiyê kafer  
Le pêşgay Hesen seb mekerd Heyder

334. Pes heqîqetê namê Nebî temam bî  
Ne hukm baqî men ne namê Nebî

335. Ta ve şehadetê Seyyidê Mezlûm<sup>2</sup>  
Sîrrê ene min Huseyn bî me'lûm

336. *We fedeynahû bi zibhin 'ezîm<sup>3</sup>*  
Mûrad Huseyn bî ji Rebbê Kerîm

337. Zibhê Isma'il er newî qebûl  
Bayed ji nesliş peyda bû Resûl

338. Muxtesê tu in zibhê 'ezîm ta ve 'eyn  
*Huseyn minnî ene min Huseyn*

339. E'zas gişt 'ecîn ve turbetê Nebî  
Muxatib *Huseyn minnî ji Nebî*

340. Nehar ve leyl minmekem penc bar  
Men messê cildî lem temseh-un nar<sup>4</sup>

1 Hedîsa nebewî: "Huseyn ji min e, ez ji Huseyn im". Mufid, Ebî Ebdillah Muhammed bin Muhammed bin Nu'man, *el-Irşad fî Me'rîfet Huvec Ellâh 'ele l-'Ibad, el-coz' el-sanî*, Muessise Al el-Beyt li Ihya el-Teras, Beyrût, 1416, r. 127 2 İmam Huseyn bin 'Elî.

3 Qur'an, Saffat 37/107: "Me qurbanek mezin kire goriya wî."

4 Hedîsa nebewî: "Heçî destê xwe bide çermê min, agir wî naşewitîne." Ev hedîs di çavkaniyê İslâmî da zêdetir bi vî rengî hatîye qeydkirin: "Men messe demmuhu demmî, lem temsuhu ul-nar." "Heçî xwîna wî digehe xwîna min, agir wî naşewitîne." bnr. el-Belazurî, Ehmed bin Yehya bin Cabir, *Ensab ul-Eşraf*, mucellid 1, tehqîq: M. B. el-Mehmûdî, Muessise el-E'lemî li l-Metbû'at, Beyrût, 1394, r. 321

341. Qurbanî Huseyn herfek mechûl in  
Serdadey Huseyn ihyay Resûl in

342. Herf-ul weled sîrrê babî  
Mexûz in ji qewlê şerîfê Nebî

343. Sîrrê niyakan be ebî entûm  
Ba'isê îcadê we ummî telebtûm<sup>1</sup>

344. Huseyn û Şûbeyr<sup>2</sup> xud musexxir in  
'Alemê şihûd me'naş zahir in

345. Kemûn Eba 'Ebdûllah<sup>3</sup> mûsûm in  
Ene min Huseyn me'naş me'lûm in

346. Pûst û mexz û dehen erayê (qa'ide)  
Meselê seqîfey Benî Sa'ide

347. Curbuzê sami' temaşa mekem  
Metnê mersûle muheşşa mekem

348. Xaşiyê kubra xud medî xeber  
We resmê e'dad fitnetê 'Umer<sup>4</sup>

349. Dirextê bê mîwe sahib hurmet e  
Şecerey"Umer mîwes fitnet e

350. Nebî û Fatime ji pûstiş kişiya

<sup>1</sup> "Diya min û babê min fidayê te bin." Beşek ji du'aya Ziyareta Camî'e ya İmam Hadi, imâmî dehem ê şî'iyên danzdeh îmamî. Sedûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, *Men La Yehzurehû l-Feqîh*, el-coz' el-sanî, rr. 386-391

<sup>2</sup> 'Şerî biçûk'. Nasnavekî İmam Huseyn bin 'Eli ye ku Muhemmed Pêxember ji bo wî hilbijartîye.

<sup>3</sup> Babê 'Ebdullah. Leqebe İmam Huseyn bin 'Eli.

<sup>4</sup> 'Umer bin Xettab (m. 581 - 644). Di baweriya şî'a da, Ebû Bekir bi saya wî wek xelîfe tê hilbijartin. Lewma ji 'Umer wekî fitneya di nav ummeta İslâmî da tê qebûlkirin.

Xûnê 'Elî û Hesen ji mexziş şeniya

351. Dameniş made kird hat ve Kerbela

Ta heşr ve pa kird ï derd û bela

352. 'Ilm û meslehet ha ve lay Xuda

Xastê Xuda bî leyk newî riza

353. Er Xuda xwah bû *masha'allah kan*

*We ma lem yeşe' lem yekûn' bizan*

354. *Yuf'elû ma yeşa<sup>2</sup>* bi Qudretullah

*Yehkemû ma yûrid<sup>3</sup>* bi 'Izzetullah

355. Derkê fî mabeyn der xast ve riza

Le cebr û tefwîz wêş mekey reha

356. Er mudde'i bûwin eray ma du'a

'Ilm 'illet newî bel tabî' fi'lê ma

357. *Leweceddenî<sup>4</sup> ger newî agah*

Hedîsê muntehî kird ve Sarellah<sup>5</sup>

358. Xuda hal nîrît ta hal gerdan bû

Meşîyet tu yî beda ha ve tu

359. Mecûs Ermêni Gebr û Nesara

Yehûd û Kafer Bûtperes tersa

1 "Çi tişta ku Xwedê bixwaze pêk tê, tişta ku Xwedê nexwaze ebeden pêk nayê."

2 Qur'an, Hecc 22/18: "Béguman Xwedê, ya ku bivê dike."

3 Qur'an, Maïde 5/1: "Béguman Xwedê, tiştê bivê bîryarê pê dide."

4 Hedîsa qudsî: "Her kesê ku bixwaze, min peyda dike". Amîlî, Muhemmed bin Hesen bin 'Elî bin Huseyn el-Hurr, *Cewahir el-Sunnîyye fil-Ehadîs el-Qudsîyye*, Nu'man, Necef, 1384, r. 94

5 "Xwîna Xweda", nasnavekî İmam Huseyn e di baweriya şî'a da ku li Ziyareta Aşûrayê hatiye nivisîn. Ibn Qûlüye, Ebûlqasim Cé'fer bin Muhemmed bin Cé'fer bin Mûsa, *Kamil ul-Ziyarat*, Dar ul-Hucce, Qum, 1435, r. 382.

360. Kes ba'is ve qetlê Îmaman newî  
Gişt fitney kuhne musilmanan bî

361. Sengê aşna vî tewr zarib in  
El-eqaribû kel 'eqariben<sup>1</sup>

362. Zahir musilman batinen mel'ûn  
*Qetelehûm Ellah inna yûfekûn*<sup>2</sup>

363. Xeletkarî biyen ve cay rûteyla  
Salî sed hezar kar tene kêşa

364. Dayim ve bûstan xer mekey zîyan  
Suxanê gulşen pey hifziha bûstan

365. Nebî ve irşadê ummet ve dilxwah  
Wat tûxelliqû bi exlaqûllah<sup>3</sup>

366. Weqtî tevecuhiş ve nasût mehat  
*Kellemeynî ya Hûmeyra*<sup>4</sup> mewat

367. Wer ne Hûmeyra key ji Al-i Yasîn<sup>5</sup> in  
El-xebîsat lil xebîsîn<sup>6</sup> in

368. Le rojî mehser maçî ya eba

<sup>1</sup> "Xizm û eqreba, wek eqreban (dûpişkan) in."

<sup>2</sup> Qur'an, Munafiqûn 63/4: "Xwedê wan bikuje! Çawa ew (ji heqiyê) berê xwe vedigerînin?"

<sup>3</sup> Hedisa nebewî: "Exlaqê xwe bikin wek xulqê Xweda." Meclîş, Şêx Muhammed Baqîr, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar*, cild 58, Dar İhya el-Teras el-'Erebî, Beyrût, 1403, r. 129. Ji bo 'Xulqê Xweda' bnr. Du'aya Cewşena Kebîr, Qumî, Şeyx 'Ebas, h. b., rr. 145-165

<sup>4</sup> Riwayetek mensûb bi Muhemed Pêxember: "Ey Humeyra, bi min ra baxiye!" Humeyra: Jina spî. An jî 'gulesora bîçûk'. Leqebla jina wî 'Ayşe ye.

<sup>5</sup> Qur'an, Saffat 37/130. "Silav li ser ïl'yasîn be!" r. 450. ïl'yasîn an ji Al-i Yasîn, di baweriya şî'a da malbata Muhemed Pêxember e.

<sup>6</sup> Qur'an, Nûr 26: "Jinêner xerab ji bo mîrên xerab in, zilamên xerab ji ji bo jinêner xerab in..."

Kulle şey racı' ila esluha<sup>1</sup>

369. El-cins me'-ul cins yemîlû<sup>2</sup> derk kir  
Mucalisetit we na-cins terk kir

370. Bişnû it-teqî min mewaz'e et- tuhem<sup>3</sup>  
Kellem-en nas 'ela qedrê 'uqûlehum<sup>4</sup>

371. Ci xas herfî wat melayê Rûmî  
Mewcûdiş kirdim we ew me'dûmî

372. Zerre zerre kenderîn erz û semast  
Cinsê xud ra hemçü kah û kehrubast<sup>5</sup>

373. Le cehl ber mekêş ve metlebê redde  
Texsîs da Rûmî te'mîmiş mede

374. Her metleb zikr kird pey dewa' il-key  
Istisna kirdiş wat bişnû ji ney<sup>6</sup>

375. Neql û qewl mekey ji qewlê Ehmed  
Bisyar we ca wat tu mezaniş bed

376. Ehsen-ul wucûh<sup>7</sup> nîlê qelem in  
Resûl wî qelem ewwel 'elem in

1 "Her tişt vedigere ser 'eslê xwe."

2 "Her cins li cinsê xwe meyl dike."

3 Gotineka Hz. 'Elî: "Cihê ku dibe sebebê tohmet û tawanbariyê, jê dûr bikeve." Ibn Ebî l-Hedîd, *Şerhê Nehc ul-Belaxe*, tehqîq: M. İbrahim, el-mucellid el-tasi' (17-18), Dar ul Kitab el-'Erebî, Bexdad, 1428, r. 396

4 "Bi xelkê ra, bi qasê 'eqlê wan biaxive."

5 el-Rûmî, *Mesnewî*, (defter 6em), h. b. r. 917

6 "Bişnû ez ney çun hikayet mîkoned/Ez cudayıha şikayet mîkoned". Beyta destpêkê ya *Mesnewiya* Mewlana Celaluddin Muhammed Belxî el-Rûmî. bnr. h. b. r. 5

7 Xweşiktirîn sûret, rûyê herfî delal.

377. Itlaq ve mutleq fermûdey fazil  
Munserif mebû bi ferdê kamil

378. Istirzay Heq her mewad fikriş in  
El-xeyr fî ma weq'e' zikriş in

379. Le dinya asim le mehşer biryân  
Ji 'edl in *kema tedeynu tedan*<sup>2</sup>

380. Sicciyîn 'îliyyîn<sup>3</sup> mexlût in ve hem  
Infikakîşan ta nubûwwet ve hem

381. Mewqûf in bi nehwê fesxê 'ezai'm  
Zuhûrê mufûr-ul sirur Hezretê Qai'm<sup>4</sup>

382. Kimyay Zatiş ve gişt malik in  
Temîz dehendey naçî û halik in

383. Muhemmed aman çenî *Înnema*<sup>5</sup>  
Istixracîş ker bê çun û çira

384. We qa'idey e'dad înnema mutleq  
'Elî wesîy in damad in bi Heq

385. Tane yek tane çihil û penc mebû  
Ha penc yek ta penc û panzdeh meçû

386. Adem û Hewa lêşan bî hasil  
Cem'iş şest û sê yin însanê kamil

1 "Her tişta ku pêk hatiye, xêrek tê da heye."

2 "Tu çawa bikî, tê bersiva wê wisa bibînî."

3 Gunehkar û bêguneh.

4 Hz. Mehdi.

5 Qur'an, Maide, 5/55: "Dostê we yê qenc Xwedê ye, Pêxember e û bawermen-dên ji dil yên ku nimêjên xwe dikin û rojiyên xwe digrin."

387. Muhemmed ve sîn muxatib çirast  
Sîn ve beyyineyiş ve 'eded levast

388. *Ebûha haz-el umme mezanî*  
Walideynê heqîqî weli rûhanî

389. Nubûwwet çun cism welayet çun ruh  
Î bab ve erbabê 'irfan in meftûh

390. Heyy ve Muhemmed biyefza 'eded  
Şuhûd kir kemûn ruh û cesed

391. Ve tırsê sellem û sellem tırsî  
Şêx Recebê Bursî bi ew heme qursî

392. Pencah sal terîqê xidmetim guşaşt  
Curbuzey yek herf bîstir ew nedaşt

393. Îme ve 'eql û hûş behsiman kêşa  
Ej wehm ve xwar hat 'esq bê perwa

394. 'Eql wat Perîşan pur bê perwa yî  
'Esq wat ferq ha mabeynê kûr û bîna yî

395. 'Eql wat *kema hiye* çîşit in menzûr  
'Esq wat muhebbet hesûd mekey kûr

396. 'Eql wat mer imkan ne pa bestîş in  
'Esq wat xeyb-ul xuyûb<sup>2</sup> cenbey pestîş in

397. Wat xeyb-ul xuyûb ji cenbey Zat in  
Wat her ci xeyr fikir hat sifat in

1 'Eyn wisa ye.

2 Veşartiyê veşartiyân; Xweda.

398. Tu xud me'cûn î le çar 'enâsîr

Pey şinasay yek le çar in qasîr

399. 'Eql wat Perîşan megzer ji imkan

'Eşq wat dîwane est pa bi nerdîban

400. 'Eql wat zahirî el-wela çîş in

Batinî xeyb in lem yedrekî pêş in

401. 'Eql wat cay Heq biyel meker weswase

'Eşq wat Xuday cedar eray tu xas e

402. Xuday ke ve delîl beyû ne destim

Î new' xudawend nemîperestim

403. Sûrey Tewhîd wat 'eql delîl bes e

Wat suxra û kubra<sup>2</sup> netîceş yes e

404. Xelaf iz'af muza'ef deh bar

Mertebey 'Elî tenzîl bû naçar

405. Üsa we 'Elî huwe meratib in

Huwe xud işaret we me'anib in

406. Heq nezdîk ve gişt kes niyen ledeyh

Cihet ha ve şexsê muşar eleyh

407. Esl huwîyyet in Ellah dûnê ew

Ehed dûnê dûn pa petî medew

408. Ji fertê kerem Zulcelalê ferd

Pencey însanî şîklê Ellah kerd

<sup>1</sup> "Yê tahm nekirî, nizane."

<sup>2</sup> Suxra û kubra: Biçük û mezin. Herdu pêk ve ferziyekê pêk tînin û digehin encamekê.

409. Ji hem meşkafîn penc in ve şimar  
Bi nûnê enguştan 'ededê deh û çar

410. Pencey Yedullah 'Elîyy in menat  
*Yedullah fewqê eyddîhim'* Heq wat

411. Wehdetê new'î eray her kes e  
Ferqê fî mabeyn Xuda û xelq yes e

412. Ism û fi'l û herf me'nay sifat in  
Ellah teswîrê hicabê Zat in

413. Ji Xuda û Resûl du mertebe pest hat  
*Ene esxer min Rebbî bi seneteyn<sup>2</sup>* wat

414. 'Ehed Ehmed in eger agah î  
'Elîy in ji rutbey Ehmedullahî

415. 'Eqî wat semeddîyet muxtesê Heq in  
'Eşq wat ye xud ber Heq mutleq in

416. Zill fena zî- zill mustehlek nîye  
Zill xud qabilê qetrê tecewwuf nîye

417. 'Eqî wat Çardeh Ten *lem yelid<sup>3</sup> mebû*  
Du bîn ehwel in Çardeh bîn ha kû

418. Kilîdê yelid mecraş şaşdan e  
Me'sûm mewlûdiş ve pehlûy ran e

<sup>1</sup> Qur'an, Fetih 48/10: "Déstê Xweda li ser destên wan e."

<sup>2</sup> Hedîsek mensûb bi Hz. 'Elî: "Ez du sal ji Rebbê xwe biçûktir im". Qazî Se'îd Qumî, Muhemmed Se'îd bin Muhemmed, *Şerh ul-Erbe'in*, teshîh: N. Hebîbi, Neşrî Mîrasê Mektûb, Tahran, 1379, r. 355

<sup>3</sup> Qur'an, Ixlâs 112/3: "Kes jê çênebûye"

419. 'Eql wat lem yûled<sup>1</sup> eray kî min in

'Eşq wat Fatime kî ji şir senin

420. Lem yekûn lehû kufûwen ehed<sup>2</sup>

Medhê Heyder kird Heq eray Ehmed

421. Şexsê batin wat be'd ej mehzê Heyy

Her yes e leyse ke mislihî şey<sup>3</sup>

422. Huşê bîçare wêney Ka Şeref

Tenzîh yek teref t'elîqî yek teref

423. 'Eql û hûş hemtay barê 'eşq nehat

Le kum dînikum we lî dîn<sup>4</sup> 'eşq wat

424. Ya 'Elî min 'ebdê 'uqûbetbar im

Ji kiştey 'emelê wêm şermsar im

425. Ne Heq ne Nebî ne Welîm dîye

Desim ve damanê welayet bin bîye

426. Îman bi welayet ji xeyb awerdim

Yewminûne bi-l xeyb<sup>5</sup> min wêm şimurdim

427. Zindey mubed bîm ve neşe'teyn

El-mûmînûne heyy-i fî-d dareyn<sup>6</sup>

428. Hanay şaha hey er şêrê ner ker

Pey îqan destey gul ve Selman<sup>7</sup> der

1 Qur'an, İxlâs 112/3: "...û ew jî ji kesî çênebûye."

2 Qur'an, İxlâs 112/4: "Tu hemkûf û hevta jî jê re tun in."

3 Qur'an, Şûra 42/11: "Tu tişt mîna Xwedê tune ye."

4 Qur'an, Kâfirûn 109/6: "Dînê we ji we re û dînê min jî ji min re."

5 Qur'an, Beqere 2/3: "Ew ên ku bi xeybê, ya neliberçav baweriyê tînin"

6 "Mumîn, li her du cîhanan jî zindî ye."

7 Selmanê Farîsî (m. 568 - 656)

429. Ve piley dehim îman men hedeyt  
Muxatib *Selmanun min ehl-ul beyt*<sup>1</sup>

430. Ve yek riştey Cefr Zuhreyê Zehra  
Pey ‘ilmê makane ma yekûn<sup>2</sup> wana

431. Şertê huzûrit pey zemanê fewt  
El-intizar eşsedû **min-el mewt**<sup>3</sup>

432. Ya nuqtey merkezê da’irey imkan  
Mehw û isbat ker lewh ji emrê Yezdan

433. Nûmîd ve Zatit niyem ve Zatê Ellah  
Pey *la teqnetû min rehmetullah*<sup>4</sup>

434. *Hewwil halena min ehsen-ul hal*<sup>5</sup>  
Mewlay ‘alem û Mewlay Zulcelal

435. Xuda hal nêrît ta halgerdan bû  
Meşîyyet tu yî Beda’ha ve tu

436. Giriftarê nefsê dizd berrêy dîn ve kef  
Penahim ve tu ya Şehney Necef<sup>6</sup>

437. Ji baxê umîd bê werdim meke  
Giriftar ve nefsê namerdim meke

<sup>1</sup> Hedîsa nebewî: "Selman ji malbata min e". Tûsî, Ebî Ce'fer Muhemmed bin Hesen bin 'Elî bin Hesen, *Misbah ul-Muctehid*, Muessise Fiqh ul-Şî'a, Beyrût, 1411, r. 817

<sup>2</sup> Zanista li ser rabirdû û dahatûyê.

<sup>3</sup> "Bendemayîn ji mirinê zortir e."

<sup>4</sup> Qur'an, Zumer 39/53: "Hêviya xwe ji rehma Xwedâ nebîrin!"

<sup>5</sup> Du'ayeka 'erebî: "Ya Rebbî tu halê xweş bike nesîbê me". Meclîsî, Şêx Muhammed Baqir, *Zad ul-Me'ad, veyluhu Kitab Miftah ul-Cinan*, te'rîb ve te'lîq: E. E'lemî, Muessise el-E'lemî li l-Metbû'at, Beyrût, 1434, r. 328

<sup>6</sup> Parêzvanê Necefê. Leqeba 'Elî bin Ebû Talib.

438. Hadîyê dîn û bi wechê ehsen

Destê şikeste webalê gerden

439. Ji hewlê mehşer polê seratim

Ya Şayê Necef mal sext inkilat im

440. Mehşerê kubra ne weqtê zuhûr

El-eman ji yewmê yenfîx fî-s sûr'

441. Ji fi'lê rûsiyeh şermende û xefîf

Erhem ya letîf 'ebdûke-z z'eîf

442. We teb 'eleyna bi zenbin 'ezîm

Inneke ente-t tewwab-ur rehîm<sup>2</sup>

443. Hel yurhimû zelîl inneke Celîl

Ya Celîl erhem 'ebdûke-z zelîl<sup>3</sup>

444. Febeşerna<sup>4</sup> wat ji lutfê 'emîm

Bi mexfîretûn we ecrin kerîm<sup>5</sup>

445. Be'de ji kulle şey' Heq wat ve Yasîn

Ehseynahû fî îmamin mubîn<sup>6</sup>

446. We lesewfe yu'tîke feterza<sup>7</sup> xitab

Eray Zatit hat ve husn-ul meab

<sup>1</sup> Qur'an, Nebe 78/18: "Roja ku di Sûrê de were pifkirin, vêca hûn ê pêl bi pêl ber heşrê ve bêñ."

<sup>2</sup> Qur'an, Beqere 2/128: "Bêguman her Tu yî yê tobepejrên, yê dilovîn."

<sup>3</sup> Du'ayek ji Hz. 'Elî bi navê 'Munacat-i Hz. Emîr' ku di gelek pirtûkên du'ayêñ şî'a da cih digre.

<sup>4</sup> Qur'an, Hûd 11/71: "Di wê demê de jîna İbrahîm li piyan bû, vêca dikeniya. Edî me, bi çêbûna İshaq û di pey İshaq re ji bi çêbûna Yaqûb mizgîn dayê."

<sup>5</sup> Qur'an, Yasîn 36/11: "Vêca tu mizgîna lêborîn û xelateke héja bidê."

<sup>6</sup> Qur'an, Yasîn 36/12: "Her tişt di kitêbeke diyarker de nivîsandî ye."

<sup>7</sup> Qur'an, Zuha 93/5: "Xwedayê te dê bide te û tu dê razî bibî."

447. Dil ji muhebbetê mewalîm rîş in  
Pes el-qelbu yuhdî ile l-qelb' çîş in

448. Zikrê keremit çun mekem tecdîd  
Xewfim megrîzû ji bîmê umîd

449. Mepirs ji 'isyan xeffarî yes e  
We min-el xaî'n we el-xaîf<sup>2</sup> bes e

450. Yewme 'îzîn la yus'el-ur Rehman<sup>3</sup>  
Wat 'en zenbîhî ins we l- can<sup>4</sup>

451. Pes me'nay aye çîş in ve qiyas  
Kazimeyn-ul xeyz 'afîn 'en-en nas<sup>5</sup>

452. 'Usrê dinya dal ve yusrê 'uqebat  
Înne me'e-l 'usr be'd yusra<sup>6</sup> Heq wat

453. Er min bedkar im tu bedît bîş in  
Ferqê fî mabeyn ye me û tu çîş in

454. Du hedîs ne beynê xelayiq neşr e  
Maçan fermûdey şûfe'ayê heşr<sup>7</sup> e

455. We yek ca Nehnu iradet Ellah  
We yek ca Nehnu meşfiyyet Ellah

456. Pes bi her teqdîr irade ve mehel

1 "Dil rîberiya dil dike."

2 "Xayîn, tîrsonek e."

3 Qur'an, Rehman 39: "Ha wê rojê gunehê wî nayê pîrsîn..."

4 Qur'an, Rehman 39: "...ji tu însanî û ji tu cinekî."

5 Qur'an, Al-î İmrân 3/133: "(Geli bawermendan!) Ber bi lêborîna Xwedayê xwe ve û ber bi bihiştékê ve bibezin ku firehiya wê bi qandî erd û asîmanan e ku ew bihişt ji teqwedaran re hatiye amadekirin."

6 Qur'an, İñşîrah 94/5: "Vêca bi rastî li dû her tengasiyê firehî tê."

7 Yêñ ku roja qiyametê şefâ'etê dikin.

‘Eqreb in welay Xuday ‘Ezze we Cell

457. Cibrîl key qurbiş mebûy ve serhed  
Şahidê el-eqreb yumne’-ul eb’ed<sup>1</sup>

458. Men ‘ellemenî herfen<sup>2</sup> wat Nebî  
Qed sîyyerenî ‘ebden<sup>3</sup> wat ‘Elî

459. ‘Elî ji ezel ustادê Cibrîl  
Qed sîyyerenî ‘ebden hem we ew delîl

460. Resûlî key bendey bendey wêş  
Xeber nedî pêş nezanût ve pêş

461. Çun mekey de’wîy însanî agah  
Munsebê Ene meşîyyet Ellah<sup>4</sup>

462. Ictima’ê ziddeyn ve metlebê me’nen  
‘Ewam gişt maçan kûse rîş pehn in

463. Min ji lutfê Heq mekerim peyda  
Ta ke zahir bûwet ve her kes me’na

464. Cibrîl zahir in eray tu û min  
Deryab ez-zahiru ‘unwan-ul batin<sup>5</sup>

465. Heqîqetê Cibrîl kî in li tecrîd  
Fî mabeynê irade û murîd

<sup>1</sup> Qaideyeka fiqhî: Nêziktrîn, pêsiya dûrtirînê digire.

<sup>2</sup> “Kî min hînî herfekê bike...” Hedîsek mensûb bi Hz. Pêxember lê bê sened.

<sup>3</sup> “...çil salan xulamê wî me.” Hedîsek mensûb bi Hz. ‘Elî lê bê sened.

<sup>4</sup> Hedîsek mensûb bi imâmây yazdehem: “Qelbê me (imaman) ji bo iradeya Xwedê zerf in, lewma ji heke Ew bixwaze, em ji dixwazin.” Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar, c. 25, h. b., r. 337

<sup>5</sup> Hedîsek mensûb bi Hz. Pêxember: “Zahir, delîl e ji bo batin.”

466. Herfê mewzûna kirdin key herraflî ye  
Şâ'irî me'naş müşikafî ye

467. Menzûrim le şî'r metleb gûyî ye  
Ne xoşnûdî xelq pey dilcûyî ye

468. Bêzar im li şî'r û tem'e û sile  
*Ma 'ellemnahû-ş şî'r ma yenbexî leh'*

469. Eray loqmey nan Xuda zayı' ker  
Ba'isê tezyî'ê 'Elî û Pêxember

470. New çun şu'eray 'ixraq perdazî  
Pey dilcûyî yê xelq zemanesazî

471. Mekerî inşa' teme'ê yek barga  
Eray filan kes Xudawendkara (Xuda û qiblega)

472. Nisbet mederî mexlûq ve Xuda  
Le müsebbihûn bih, müsebbih exwa

473. Xasse şâ'irî Melayî' daştû  
Tuxmê ixraqış ne 'alem kaştû

474. Ji 'ilm û hikmet me'anî ve beyan  
Delîl mawerî her dem ve zeban

475. Haşîyey kelam mutewwel herf in  
Mentiqê usûlişan pey nehw û serf in

476. Ve irad girtin û sîxesazî  
Tirxîne der esl terxûne bî

477. Er hey mal xiraw weyl weşê wirrac

<sup>1</sup> Qur'an, Yasîn 36/69: "Me şî'r fêrî Pêxember nekiriye û ev ne babetê wî ye ji."

We neram nasib kûkeb-ul ebrac

478. Zeyd eray mizahê letîf û şîrîn  
Wat mate 'Emr min usûliyyîn<sup>1</sup>

479. Be'd ej xusl û kefnê nîyaniş ve çal  
Nekîrîn hatin her du pey sûal

480. Pirsan men rebbûk<sup>2</sup> er Rebbê tu kîst  
Wat evvel bigû'yîd ìn men ci menîst<sup>3</sup>

481. Min ê istifham ta min ê musûl  
Ferqişan jerf in ve qa'idey usûl

482. Tabi'ê şeyx niyem 'ilmim kesîr in  
Bi'retu delîl 'ela el-be'îr<sup>4</sup> in

483. Yek ro nişte bîm le rehguzerî  
Dîm ke peyda bî melay Eş'erî<sup>5</sup>

484. Yek paş 'erec bî yaftim le kemûn  
Nebî wat kullî naqisê mel'un<sup>6</sup>

485. Tefewwuq lêm kird nişt ve banê dest  
Wat imroj meger melay çûn min hest

486. Pirsam ismiş wat 'Usman musemma  
Watim el-esma tunzilu min-es sema<sup>7</sup>

1 Di rêzimana 'erebî da qaideya 'Zerebe Zeydun Emren.'

2 'Erebî: "Rebbê te kî ye?" Li gor dînê İslâmê, di qebrê da milyaketen sûalê Munkîr û Nekîr pêşî vê dipirsin.

3 Farsî: "Berî her tiştî bêje ka ev min ci min e"

4 "Bar nişaneyâ barkêş e."

5 Melayê Eş'erî (m. 874 - 936) daner û 'alîmê baweriya Eş'e'riyye, li hember Mu'tezile.

6 "Hemî kêmendam (astengdar), bêyom in."

7 Gotineka 'erebî: "Nav, ji asîmanan nazil dibin."

487. Axûnd ve 'edû xasibê salis  
Ve bî naxweşî zatê es-sedr ba'is

488. Beynî beynellah 'ilm çenîş bî bar  
*Mesel-ul himar yehmel-ul esfar*<sup>1</sup>

489. Behsiman kêşa ji xêr û ji şer  
Min balay 'Elî ew balay 'Umer

490. Min fezlê 'Elîm wat ew fezlê 'Umer  
Tesdiqîş kirdim ve qesdê kafer

491. Wat her ke wat 'Elî ji 'Umer bêhter in  
Ve Zatê Xuda bi-l qet' kafer in

492. Bihî xud eray 'Ummer mehal in  
Isbat nefy şey' mentiq memnu' in

493. 'Umer ve te'rîf 'Usman in muhtac  
Zexmê serê seg, seg mekey 'ilac

494. Ew ve muzbereh min ve seqlemî  
*Arwadin qehbe kopekoxlî*<sup>2</sup>

495. Her çe mawerdim delîl ji Qur'an  
Mewat yalandir kurd yoxdir i'man<sup>3</sup>

496. Watim kam delîl ve kudam aye  
Ji 'eql û ji neql ha kudam paye

497. Unzur esme' ehem e'lem<sup>4</sup> bider pey

1 Qur'an, Cumu'e 62/5: "Rewşa wan, wekî rewşa kerê ye ku barê kitêban hilgirtiye."

2 Tirkî: "Jina te qehb e, kurê seyê!"

3 Tirkî: "Derew e, i'mana kurdan nîne."

4 Bibîne, guhdarî bike, têbigehe, bizane.

Talibê mechûlê mutleq û ta key

498. Yek sed bîst çar hezar pêxember

Eray welayet gişt medin xeber

499. Xeberê tewatur mezaniş bazî

Bêhûde suxen we û dirazî

500. Dîn eray munker bî insaf medeh

*Serr-un nas men ba'e dînih li xeyreh'*

501. Yedê tulanî daşt belê ve yukfin

Ji teblê çadir riza kird qûşin

502. Er istidlal mekey delayil bes e

Me'nay en-nusûs ken-nusûs<sup>2</sup> yes e

503. Istidlal mekey bayed me'newî

Ne reg kirdin bi huccetê qewî

504. Kî ve her murid mewat mukerrer

*Lewla 'Elîyyûn lehelek 'Umer<sup>3</sup>*

505. Bugzer jî guftey exway şeytanî

Le 'esebbiyetê Ebû Sufyanî

506. Medhê kesî ker Xuda û Pêxember

Meddahîş kirdin, ne medhê 'Umer

<sup>1</sup> Hedîsa nebewî: "Însanê herî xirab ew e ku dînê xwe ji bo dînyayê bifiroşe." Se-dûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, *Men La Yehzurehû l-Feqîh, el-coz' el-rabi'*, h. b., r. 258

<sup>2</sup> Gotina eşkere.

<sup>3</sup> "Eger 'Eli neba dê 'Umer hilak bûya." Gotineka mensûb bi 'Umer bin Xettab ku di gelek çavkaniyêñ herdu mezheban da jî tomar bûya. Ibn Ebdulbirr, Ebî 'Umer Yusif bin Ebdillah, *el-Istî'ab fî Me'rîfet ul-Eshâb*, sehhehe ve xerrece ehadîsehu: A. Murşid, Dar ul-E'lâm, Urdun, 1423, r. 529

507. Gîrem her duk biyen nayibê Pêxember  
Ve î watin Xuda ve ew watin kafer

508. Her çi we barey ew watin lahûtî  
Her çi we barey î watin nasûtî

509. Her çi we barey ew watin fazil  
Her çi we barey î watin batil

510. ‘Elî li mabeyn Bûbekr û ‘Umer  
Xeyrî bî vaqi’ ne beynê du şerr

511. Eray suxrîye ve istihza û texfîf  
Watin ya letîf ew her du kesîf

512. *Ente beynena ke nûn Lena<sup>1</sup>*  
*Wat in ene lem ekûn entum la<sup>2</sup>*

513. *Yeqûlû bi efwah leyse fî qulâb<sup>3</sup>*  
Tuztehzûne billah ma fewq-uz zunûb<sup>4</sup>

514. Mehmûl xerez reddê vedad in  
En-necat fî-s sidq<sup>5</sup> irşad in

515. Gurbe napakî eger nedarî  
Der vê gorayî may ji buxarî

516. Tesdîqê rojê Elest ha nekîn  
*Meta hazel w’edû kuntum sadiqîn<sup>6</sup>*

<sup>1</sup> Gotinek mensûb bi Ebû Bekir: “Ya ‘Elî, di navbera min û ‘Umer da tu wekî ‘nûn'a di nav ‘lam’ û ‘elîf’ê da yi.”

Yanî di nav du kesên dirêj da tu kurt î.

<sup>2</sup> Bersîva ‘Elî bo Ebû Bekir: “Eger ez nebûma, hûn ê ‘la’ (tune) bûna.”

<sup>3</sup> Qur'an, Fetih 48/11: “Ew tiştê bi zimanê xwe dibêjin, ne ya di dilê wan de ye.”

<sup>4</sup> Gotineka ‘erebî: “Henekpêkirin guneha herî xirab e.”

<sup>5</sup> Gotineka ‘erebî: “Rizgarî, di sedaquetê da ye.”

<sup>6</sup> Qur'an, Yasîn 36/48; Mulk 67/25: “Dibêjin: Eger bi rastî hûn rastgo ne (de ka

517. Kecbehs rah nêrît ve bezmê sefa

Çi luzûm ji ekl ve min el-qefa

518. Waqif ji esrarê her zî- kemûnî

Selûnî qeble en tefqudûnî<sup>1</sup>

519. Ca-el Heq ve zeheq-el batil ve me'na

Înne el-batilû kane zehûqa<sup>2</sup>

520. Ta ve xerrayê dînê Pêxember

Sunnî mexlûb bî ji wesfê 'Umer

521. Wesfê Heyder kird bê çun û çira

El-fezlû kema şehidet bihî e'dâ<sup>3</sup>

522. Ve mezheba Ce'fer<sup>4</sup> du hûz kafir in

Yekî sûfiyye yekî mutekebbir in

523. Tekebbur muxtessê Kibriya yin

Heyy in Qeyyûm in ye Xuda yin

524. Qadir û Rezzaq Muhîyyê Dawer

Ne acizê merzûq murebbî bê wer

---

bibêjin;) ma ev peyman  
(a saxbûna pişti mirinê) kengâ ye?"

<sup>1</sup> Xutbeyeka Hz. 'Elî li mizgefta Kûfeyê: "Berî mirina min, hemû pirsên xwe ji  
min bipirsin". el-Hakim el-Nîsabûrî, *el-Mustedrik 'ele el-Sehîheyen, el-mucel-*  
*lid el-rabi'*, Dar ul-Tasîl, Qahire, 1435, r. 225

<sup>2</sup> Qur'an, Isra 17/81: "Bibêje: Heq hat û batil jî ji bin ve rabû. Bi rastî jî batil her  
ê çûyînê ye."

<sup>3</sup> "Fezilet ew e ku dijminê te pesnê te bide." Vê gotinê Muawiye, ji bo medhê  
'Elî dibêje ku dijminê wî ye. Qumî, Şêyx 'Ebbas, *Muntehî ul-Amal fi Tewarîx*  
*el-Nebî ve l-Al, el-coz' el-ewwel*, Dar ul-Mustefa el-'Alemiyye, Beyrût, 1432,  
r. 214

<sup>4</sup> Ebû 'Ebdu'llah Ca'fer bin Muhammed es-Sadiq (h. 148), imamê şeşem ê şî'a ya  
danzdeh imamî. Ji ber ku qeydiyên tarîxî yêñ zanistên şî'a ji aliyê wî ve hatine  
berhevkirin û senifandin mezheba danzdeh imamî wek Mezheba Ca'ferî tê  
nasîn.

525. Teswîye gerdiye mizanî kî ye  
Xab û bîdarîş xud musawî ye
526. Bu'd û mesafet telal û cibal  
Dîden û şinuften nedarû zewal
527. Qebay xudayî ve balaş in rast  
Ye xud Xuda niyen bel xudanemast
528. Mutemennî cay 'Elî ha ve kû  
Redd in le bihişt er Bu-l beşer' bû
529. Hem şanî kirdin ve Xuda û Resûl  
Kafir in ve layê erbabê 'uqûl
530. Lakin me'nay sûfîyyeyê peşm-pûş  
Kelab û seba' dewab û wuhûş
531. Tarikê selat malê merdimxwer  
Bi me'na sûfîyye wêney seg û xer
532. Deryay bê payan mekerû qetre  
Bugzer ji etwarê qewmê pest fitre
533. Nebat û cemad heywan mewalîd  
Sîrrî ji me'naş mekere tewlîd
534. Er hey munkeranê mezheba Ce'fer  
Mutessewifil çers û şerav-xwer
535. Du merteben pest nebat ji heywan  
Însanê eşrefî qedrê wêt bizan
536. Zû cenbeteyn in new'ê însanî

<sup>1</sup> Hz. Adem.

Nîmî fîrişte nîmî heywanî

537. Li cenbê' pestiş du mertebe pest  
Nebaten bişnû bidem şerh û best

538. Pey engûr û tak perwerîş medey  
'Uzreş min-el ma' kullî şey heyy'

539. Pey ma'-ul 'ineb ab medey baxîş  
Ta ke du sa'et ter buwe demaxîş

540. Teb'en li tak heşîş mekarû  
Ta avê xelyan eray dûst barû

541. Bil wucûbê mexlûb heywanî mekey  
Nebatî bi destê heywanî medey

542. Çun el-xerîq mexwanî ji pîş  
Yuteşebbisû bi kullê heşîş<sup>2</sup>

543. Nexlê me'siyet leqebiş xers in  
Ye me'nay şerav ye me'nay çers in

544. Menafi'-un nas neqşê zemîriş  
Ji xatir kirdin ismê kebîriş

545. Belê perwerîş medî ve beden  
Leyk qehbes<sup>3</sup> sed kird turqê Hesen

546. El-hesenat yuzhibne-s seyyi'at  
Es-seyyi'at yuzhibnû-l hesenat<sup>4</sup>

<sup>1</sup> Qur'an, Enbiya 21/30: "Me her tiştê zindî ji avê afirandîye."

<sup>2</sup> Gotineka 'erebî: "Yê ku dixeniqe, destê xwe davêje her tiştî."

<sup>3</sup> Mebest Ce'de, keça Eş'es bin Qeys e ku hevsera İmam Hesen bin 'Eli (h. 50) bû. Li gor riwayetên şî'a İmam Hesen bi destê Ce'de hatiye jehrîkirin.

<sup>4</sup> Qur'an, Hûd 11/14: "Bêguman qencî gunehan dibin."

547. Su'ûd kird bûxarê dûxanê hesîş  
Mexlûqê wêş kird ve xellaqê wêş

548. Ten ferbih mekey mekahî ji ruh  
Key tercîh medey ve erceh mercuh

549. Ji tenperwer ger metleb bî hasil  
Bayistî işkem bêhtir buwe ji dil

550. Key ji tenzil cûstin tefewwuq  
Meger neşnasî pişt û rûy qaşûq

551. Ji mehşer megzer gûnat kebîr bûwe  
Ceng ke mekerîn aştît biwêr bûwe

552. Neş'e yî peyda ker zewal nedâştû  
Ne pey du royê 'umr tuxmê esem kaştû

553. Mezanî çîş in neş'ey bêzewal  
Hubbê 'Elî û Al be'd ez Layezal

554. Ke pîşê çeşmim şerav xwar mebû  
Ke pîşê şemşîr ew ne xwar mebû

555. Zeyd<sup>1</sup> wat ya 'Elî mûradî darim  
Berayed ya Reb wat Mewlay 'alem

556. Meseliş ji hezret pirsam ji Qur'an  
Kullî fî felek<sup>2</sup> wat 'Elî Yezdan

557. Xelq wedî'ey Heq ha ve teht-i Şah  
Şah emînê Heq çenî Zillûllah

<sup>1</sup> Zeyd bin Haris (h. 8) yek ji musulmanên 'ewil e.

<sup>2</sup> Qur'an, Enbiya 21/33: "Ew ê ku şev û ro, roj û heyv asifandine Xwedê ye. Her yek ji wan di rêgeha xwe da avjeniyê dike (û bi lez digerin)."

558. Şeytan zi'b weş dehr bê aman in  
Xelayiq remîn' sultan şîwan in

559. Er şîban mebû eray ded û dam  
Xeyrê nam baqî niyen ji exnam

560. Ta'etê Sultan ta'et in ve Rebb  
Heraset wacib ita'et ewceb

561. Hûkemay felasifê İşraqî û Yûnan  
Wî istidlale ve dem maçan giyan

562. Cûnbanende ew merûhe Heqq in  
Min û tu kes niye Heq mutleq in<sup>2</sup>

563. Bî ew merûhe ev deme serd e  
Yes e ke maçan filankes murd e

564. Muqirr ve ziban munkir in ve dil  
*El-mer' edwwun bima cehil<sup>3</sup>*

565. 'Eceb kirdin we lay Xuday xefûr  
*La yûhibbû kullî muxtal-in fexûr<sup>4</sup>*

566. Hanay biragel ji ehlê Hemedan<sup>5</sup>  
Qezwîn<sup>6</sup> ve rû kird Qom<sup>7</sup> Isfahan<sup>8</sup>

1 Pez.

2 Nîvbeyta duyem di destxeta me da nîne. Me ji nusxeyeka dî temam kir.

3 Gotinek mensûb bi Hz. 'Eli: "Însan li dijî wî tişî ye ku nizane."

4 Qur'an, Hediid 57/23; Luqman 31/18: "Bi rastî Xwedê ji kesên qure û serxwe-veçûyi hez nake."

5 Bajarek e li Rojhilatê Kurdistanê. Paytextê eyaleta Hemedanê ye.

6 Bajarek e li Bakurê Iranê, paytextê eyaleta Qezwînê ye.

7 Li Iranê bajarekî pîroz e ji bo mezheba şî'a. Tirba Fatima el-Me'sûme (h. 201) keça İmam Mûsa bin Ce'fer

(h. 183) li vî bajarfî ye.

8 Bajarek e li Başûrê Iranê. Di dewra Sefewiyan da bûye paytextê împaratoriye.

567. Ehliş pey dinya ji Heq mehcûr in  
Rû ve milkê ken ehliş ma'cûr in

568. Medîne û Beqî<sup>1</sup> Mekey Muşerref  
Serrê men Reey<sup>2</sup> Kerbela<sup>3</sup> û Necef<sup>4</sup>

569. Meşhedê<sup>5</sup> Muqeddes Kazimeyn<sup>6</sup> û Qum  
Watî ed'ûnî istecîb lekum<sup>7</sup>

570. Ehliş henzel in xurs ne xuldê berîn  
'Eksê eşref-ul mekan bil mekîn

571. Ferqê fî mabeyn nutq û sukût  
Mesel awerdin ke ezzfed'ê we-l hût<sup>8</sup>

572. Ji 'eynê eltaf Heyyê tenya ferd  
Le sukûtê zikr nefşê ya Hû kird

573. Sakit bîm ji qewlê Şeyxê Mewlewî<sup>9</sup>  
Ve farsî yek beyt watiş me'newî

1 Goristana Beqî' li bajarê Medîneyê. Cihek giring û pîroz ji bo mezheba şî'a. Tirba çar imamên şî'a li wir e: Hesen bin 'Elî, 'Elî bin Huseyn Zeyn el-Abidîn, Muhammed bin 'Elî el-Baqîr û Ce'fer es-Sadiq.

2 "Her kesê ku bibîne bila kîfxweş be." Leqeба bajarê Samirra li Iraqê. Bajarekî pîroz ji bo şî'a. Tirba imam 'Elî bin Muhammed el-Neqî (h. 254) û imam Hesen bin 'Elî el-Eskerî (h. 260) li Samirrayê ye. Herwiha Samirra cihê jida-yikbûna Hz. Mehdiye.

3 Bajarek li Iraqê. Bajarekî pîroz ji bo şî'a. Tirba İmam Huseyn (h. 61) û 72 şehîdan li Kerbelâye ye.

4 Bajarek li Iraqê. Bajarekî pîroz ji bo şî'a. Tirba İmam 'Elî (h. 40) li Necefê ye.

5 Bajarek li Iraqê. Bajarekî pîroz ji bo şî'a. Tirba İmam Mûsa bin Ce'fer el-Kazim (h. 183) û İmam Muhammed

6 Bajarek li Iraqê. Bajarekî pîroz ji bo şî'a. Tirba İmam Mûsa bin Ce'fer el-Kazim (h. 183) û İmam Muhammed bin 'Elî el-Teqî (h. 220) li Kazimeyn e.

7 Qur'an, Mumîn 40/60: "Xwedayê we got: Hûn hêvî û dua ji min bikin, ez ê ji bersiva we bidim."

8 Beq-masî.

9 Mewlana Celaluddîn Muhemmed Belxî el-Rûmî. (m. 1207-1273)

574. *Her ke ra esrarê Heq amûxtend  
Mohr kerdend ve dehaniş duxtend<sup>1</sup>*

<sup>1</sup> "Heçî hînî sîrrên heqîqetê bûn / Devêñ wan mohr kirin û lêvêñ wan dirûn."  
bnr. Mewlana, h. b. (deftera 5em), r. 724

## Bab-i evvel

**Der mu'ize ve pend be zebanê hal ve der yaftenê ehlê  
‘irfan ve me'rîfet der heqqê işan ve gurîz be sehrayê  
purmelalê Neynewa ve şuhedayê Kerbela**

### Hû 110

575. Muderris watiş ferzendê xelef  
‘Ezîzê danat kirdin mukellef

576. Ne wadî teklîf nemendin melûl  
Pey rehnumayıt kiyana Resûl

577. Kiyana Nebî Kitab û Îmam  
Perî emr û nehy helal û heram

578. Mubeyyin kirdin temamê ehkam  
Huccet temam bî baqî wesselam

579. Ne fermanê Heq serkêşî meke  
Xakî nijad î ateşî meke

580. ‘Ulqe û muzqey xudbînî meke  
Ne cem’ê merdum bedbînî meke

581. Aferîde bît ji qetrey menî  
Sizawar niyen ji menî, menî

582. Menî ji ef’alê dêwê bedkar in  
Rehîm dergay perwerdigar in

583. Er bi huş î gûş ve şeytan meke  
Bi umîdê ‘effê Heq tu ‘usyan meke

584. Ji mekrê iblîs hîç îmin mebû

Duşmen in ìmin ji duşmen mebû

585. Er ìmin mewît ji dêwê şerûr

*Yexurrenekum billah el-xurûr<sup>1</sup>*

586. Ji mekrê iblîs ìminî sehl in

Ji xewfê Xuda ìminî cehl in

587. Ìminî ji 'eynê taet 'usyan in

Ji 'usyan ye'sit kufrê 'eyan in

588. Xewf û umîdit herdu şî'ar bûwe

Ji hamnişînî bedanit 'ar bûwe

589. Ji bedan bugzer ve nîkan bikerû

Ji xûyê xasişan bigîre girû

590. Hemnişînê bed mekerût zelîl

Libasê teqwat meberût ve Nil

591. Perît bawerim ji Qur'an delîl

Ji lem yettexîz<sup>2</sup> felan in Xelîl

592. Bi cidd mekeran ray rast bi tu sedd

Ne'ûzen billah ji qerînê bed

593. Ji ta'etê sustan be'ziyan cerî

Peyman-şikênan ji ìman berî

594. Xîreh nigahan çeşmê batin kûr

*Te'mî el-qulûb elletî fî-s sudûr<sup>3</sup>*

<sup>1</sup> Qur'an, Fatir 35/5: "Geli mirovan! Béguman peymana Xwedê heq e. Vêca zin-har bila jiyanâ cîhanê we nexapîne û bila şeytanê xapînok jî bi (efûkirina) Xwedê we nexapîne."

<sup>2</sup> Qur'an, İsra 17/11: "Hemd ji wî Xwedayî re be ku ji xwe re zarok negirtine."

<sup>3</sup> Qur'an, Hec 22/46: "Vêca bi rasti korayî ne korayîya çehva ye, belki korayî ya

595. Qewî bazûwan pay teqway leng  
Hemnişînişan ‘eyb û neqs û neng

596. Damanê nîkan bawere ve dest  
Ta ke ji iblîs nawerî şikest

597. ‘Ibad û muxlis ji me’sîyyet dûr  
Cahid û sabir qani’ û şekûr

598. Ne’reşan tekbir kemnamişan nam  
Karişan ta’et nakamişan kam

599. Husnişan tehlîl remhişan temcîd  
Vere’şan tesbîh tîxişan tewhîd

600. Dermanê nafi’ serapa derd in  
Ji masewallah bêgane û ferd in

601. Melahanê behrê muhîtê ‘irfan  
Mustexnî û bêbak ji keştiy tûfan

602. Er nesîb nebû suhbetê ìnan  
Bigre terîqê ‘uzletguzînan

603. Bugzer ji dinya ji dar û nadar  
Kull feramûş ker xêyr ji ‘îsqê yar

604. Sîne nedâstû ji ‘îsq iltihab  
Purgunah xalî yen çun kasey rûbab

605. Dilî ke ji ‘îsq hîçîş sûz niyen  
Mehremê esrarê dilfirûz niyen

606. Dîdey ke dîdarê dûstiş meyl nebû  
dilê sîngan de ye.”

Ji hûnê ciger dayim kêl nebû

607. Ne bazarê 'îşq hîç kalaş nebû  
Ne sefhey zemîn kaşkî caş nebû

608. Ne 'îşqê dilber dil pur ji xûn ker  
Ne ragey dîdeş temam bîrûn ker

609. Bi 'erzê dildar mer sût berû  
Esrînê 'aşiq germ û sebukrû

610. Ji lewmê la'im hîç perwat nebû  
Xêyr ji dînê dûst temennat nebû

611. Dîde û huş û gûş e'sab û 'urûq  
Bi kam in temam ve yadê me'şûq

612. Ji gûftey rasan şineftim newîd  
Kuştøy 'îşq ew şehîd in şehîd

613. Tu ke destresê Kerbelat newî  
Guzer ve sehray pурbelat newî

614. Ta ke 'eşîqan biwînî ve çem  
Bê ser û serdar ne sehray sitem

615. Seran ve nêyzey 'eda bî beden  
Ebdan ne sehray mehen bê kefen

616. Ji xûnê wêşan rengîn pa û dest  
Xerab û medhûş ji badey Elest

617. 'Eceb 'eşîqan perwerdey xasan  
Namişan nemebû berî ve asan

618. Çabûk-siwaran şuca'ê nû res  
Ve cengê xweşalan xeyûr kêm kes

619. Duşmen-efkenan ve bazûy yelî  
Şêranê bîşeyê Murteza 'Elî

620. Nîkû-qametan gulrû û bû-muşk  
Turencebîn û leb ji teşnegî xuşk

621. Haşimî eslan ji neslê Heyder  
Pey meydan sibqet ve yek dîger ker

622. Nazik miyanan qewî dil bi ceng  
Neheng sewletan celd tîz aheng

623. Bê newa mîran Neynewa medfen  
Yûsûf-sûretan gulgûn-pîrehen

624. Ne me'rikey 'îşq ji san guzeştin  
Ji giyanê şîrîn asan guzeştin

625. Çunke weslê dûst menzûrişan bî  
Qetl û nehbê ser çûn surişan bî

626. 'Işqiyan fiday xakê patan bam  
Fiday padşahê kêm sipatan bam

627. Qetîlan xweşa bi halitan bûd  
Heniyen lekum cennat-il xulûd<sup>1</sup>

628. Camê şehadet guwaratan bûd  
Nehnû 'ettaş û entûm Vedûd<sup>2</sup>

<sup>1</sup> "Bihiştâ xweş noşî canê we be." bnر. Qur'an, Qaf, 50/34: "Ji bo cenebiyan tê de tiştê ew bixwazin ji wan re heye û li cem Me hê ji wê zêdetir jî heye."

<sup>2</sup> "Em tî ne, hûn xweşewîst in."

629. Ebî 'Ebdullah' bi feday namit  
Yek demî dinya newî ve kamit
630. Evvel musîbetê ceddit Pêxember  
Bêhterîn xelq seyyîdê serwer
631. Duwomîn 'ezay Hezretê Betûl  
Me'sûmê kubra memdûhê Resûl
632. Salihey 'uzma mihnet rû dade  
Matemzedey mergê babê azade
633. Sevvomîn 'ezay namiwer pêder  
Şerê Kirdigar nefşê Pêxember
634. Çaromîn 'ezay wala berader  
Durrê deryay hilmê Hezret Dawer
635. Hesen nû nehal baxê Murteza  
Mesmûmê sabir riza ve qeza
636. Pêncum mûsîbetê deştê pur xeter  
Zebanim çak bû xakim bû ve ser
637. Şehîdê sehray Kerbela Huseyn  
Ve belay 'ezîm mubtela Huseyn
638. Warisê 'ulûmê enbiya Huseyn  
Qetîlê herbê eşqiya Huseyn
639. Ne meydanê ceng cûn Heyder Huseyn  
Sabir cûn Eyyûb Pêxember Huseyn
640. Zebîhê zeman bê yawer Huseyn

<sup>1</sup> Leqeba İmam Huseyn.

Bê yar û ferzend berader Huseyn

641. Cismê mutehher ne rûy deşt Huseyn  
Behay xûnê tu heşt biheşt Huseyn

642. Matemzedey mergê yaweran Huseyn  
Pamalê sitûrê kafiran Huseyn

643. Ehl-i beyt esîr herasan Huseyn  
Serit ve nêyzey nakesan Huseyn

644. Ey 'eslê sabitê baxê 'ibadet  
Wey zibhê 'ezîmê deştê şehadet

645. Ey şems-uz zuha ji teşnegî zerd  
Wey gulgûn-qebay me'rekêy neberd

646. Ey sabit qedem şuca'ê roy rezm  
Serwerê merdan merdê sahib 'ezm

647. Ey sabit qedem merdê mumtehin  
Şahê kêm sipah ne sehray mehin

648. Kes çun tu sabir ne bela newî  
Mubtela bi deştê Kerbela newî

649. Ceddê tu Xelîl rehberê enam  
Yek qurbanî kird ewiş natemam

650. Heftad û du ten qurbanî kirdî  
Heqa ne rayê dûst merdane merdî

651. Perwerdey axûşê Xeyr-ul Beşer ro<sup>1</sup>

---

<sup>1</sup> "Ro!" yan jî "hey ro!", nîdayeka heyflêanînê ye. Di kurmancî da beramberî wê "wey li min!" heye. Ev mersiye ji bo neviyê Muhemed Pêxember,

Şuca' şehîdê sanî yê Heyder ro

652. Bazûy pehlewî ji kar keftit ro  
Gerd alûy sûretê mahê du heftit ro

653. Zinetê damanê Zehrâ Betûl ro  
Pey mergê yaran zar û melûl ro

654. Lû'lû'yê mercanê behrê Qur'an ro  
Warisê 'ulumê pêxemberan ro

655. Waweyla ji dest çerxê exzer ro  
Zarîy ze'ifî Al-i Heyder ro

656. Yekke şehsiwar gulgûn-qeba ro  
Nexlanê gulşenê Al-i 'Eba' ro

657. Tenanê nazik ve bî kefen ro  
'Ezîzanê xarê deştê mehen ro

658. 'Erûsiy Qasim<sup>2</sup> bî ve 'eza ro  
Ah jîy musîbetê mihnet-efza ro

659. Qamet şimşadê 'Elî Ekber<sup>3</sup> ro  
Gelûy tîrxwirdey 'Elî Esxer<sup>4</sup> ro

---

qurbaniyêñ Kerbelayê İmam Huseyn bin 'Elî û heftê û du kesên ji ehlê beytê,  
wekî zêmarekê hatîye nivísin.

<sup>1</sup> Malbatâ 'eba ango Pênc Ten: Muhemmed Pêxember, Fatima, 'Elî, Hesen û  
Huseyn. bnr. Qur'an, Ehzab, 33/33. Ji bo van pênc kesên ji Al-i 'Eba, herwiha  
Eshabê Kîsa ji té gotin. Hedîsa Kîsa, di çavkâniyêñ jêbawer yêñ şî'i û sunnî  
da cih girtiye. bnr. Algar, Hamid, "Al-e 'Abâ", Encyclopaedia Iranica, Vol. I,  
Fasc. 7, 1984, r. 742

<sup>2</sup> Qasim kurê İmam Hesen û mustaqbel zavayê İmam Huseyn e. Li Kerbelayê di  
16 saliya xwe da berî zewacê şehîd dibe. Te'ziyeya zewaca Qasim, temayeka  
sereke ye di edebiyata şî'a da.

<sup>3</sup> 'Elîyê Mezin. Kurê İmam Huseyn ku di 28 saliya xwe da li Kerbelayê şehîd bû.  
<sup>4</sup> 'Elîyê Biçûk. Kurê İmam Huseyn ku 6 mehî bû û bi tîrê Hermele bin Kahil, li  
Kerbelayê şehîd bû.

660. Ebasê 'Elî' sahib 'elem ro  
Zeyneb<sup>2</sup> cur'enûşê mihnet û xem ro

661. Zarî Sekîne<sup>3</sup> naley' Kulsûm<sup>4</sup> ro  
Ah û waweyla jîy rojê şûm ro

662. Taze nehalan baxê Heyder ro  
Ji tîşey e'da bê şax û ber ro

663. Esîrîyê 'itretê şahê 'ereb ro  
Ve bî meqni'e û çadir Zeyneb ro

664. Ferzendê 'ezîz-i saqîy kewser ro  
Lebteşne şehîd jêr xencer ro

665. Beden müşşebbekê tîrê cefa ro  
Huseyn qurbanî kûyê wefa ro

666. Bi xak û bi xûn ten axîste ro  
Sanî Yehya ah jîy kuşte ro

667. Jîy musîbete ta roy mirdin ro  
Ta demê teslîm giyan siperdin ro

668. Bigîryûm çun ebr binalim çun ney  
Muxteser waçûm wey ve halim wey

669. Kafiran kirdin perî mulkê Rey<sup>5</sup>  
Nexlanê gulşenê Alê 'Eba pey

1 'Ebbas bin 'Elî, bira û alemdarê Îmam Huseyn. Li Kerbelayê şehîd bû.

2 Keça Îmam 'Elî (h. 62)

3 Keça Îmam Huseyn (h. 117)

4 Ummê Kulsûm, keça Îmam 'Elî.

5 Mebest 'Umer bin Se'd e ku li hember Îmam Huseyn fermandariya arteşa Yezid qebûl kiriye. 'Umer bin Se'd sala 66ê hicrî, bi destê Muxtarê Seqeffî hatiye kuştin.

670. Sitem bê payan ji endaze kirdin  
Ferzendê Zehra ve berde birdin

671. Nezer ker ve kînê çerxê çenberî  
Quwwetê kuffar ze'fê Heyderî

## Bab-i dowwom

### Der mededxwasten ez Saqîyê Heqîqî be cihetê tewhîdê hezret Rebb-ul erbab

#### Hû

672. Saqî bawere camî pey mestî  
Sûdim mestîyen ziyan ji hestî

673. Camî ke mexzim bawerû ne cûş  
Dinya û mafîha bikim feramûş

674. Ne jew badey bezmê herîfanê redd  
Munhîyê Ellah muzillê xired

675. Mestanê mecaz dîwane in mest niyen  
Hewa-perestan Xuda-perest niyen

676. Jew badey bê xeş xûmxaney dêrîn  
Muşribê merd-efken telxê leb-şêrîn

677. Bider ta yek ca pak ji gunah bûm  
Mestî bawerû fena'fillah bûm

678. Muselmanî ker min teşnekam im  
Kafirê zuhd im murîdê cam im

679. Bider binûşim ve yadê mestan  
Pencey iblîspêç peyman durustan

680. Saqî pir biker camê yek menî  
Şayed bugzerim ji ma' û menî

681. Ta ke binûşim be yadê kesî  
Zindegîm merg in bî ew nefesî

682. Yek nefes be ew er rû be rû biwim  
Kafir im eger cûyay mînû biwim
683. Çi hacet bi xuld hur û qusûr in  
Biheşt-perest niyem dûstim menzûr in
684. Zahid tu û hur û biheştê berîn  
Min û xakê kûyê dilrubay dêrîn
685. Min bi abê 'îşq xakim sîriştin  
Yek cefaş ji lam çun heşt biheşt in
686. Her tîrî ji şestê safê dilber in  
Zamiş ji mîwey Tûba xweşter in
687. Bê zexmê xedeng mujey dilaram  
Neng in pa niyan ve sehray qiyam
688. Bê zexmê xedeng mujey mehrûwan  
Neng in ve sehray qiyamet liwan

## Hû 110

### Bab-i sevvom

**Der beyanê tewhîdê hezretê wacib-il wucûd be revîyyê  
ve qanûnê edilleyê şerî'et ve terîqet ve heqîqet ve me'rîfet**

689. Bi namê Xuday Rehman û Rehîm  
Bexşendey heyat Tuwanay Qedîm

690. Innehû E'izzu E'zemû ve Ekber  
Men in yûvvesif û men in yuzkker

691. Senagûyê Zatiş kûteh meqal in  
Pey burdin ve kunhê Zatiş mehal in

692. Pey kelematis ve midad bû yem  
Seqeleyn katib eşcar bû qelem

693. Wesfiş bi tehrîr bê ihtimal in  
*Qul lew kan-il behr' şahidê hal in*

694. Behsî hen ji beynê cem'ê 'ulema  
Ilmiş qebl û be'dê hudûsê eşya

695. Her kes jî babe sûxen biranû  
Ilm 'eynê Zat in ji ku mezanû

696. Ve me'lûmatîş kes pey nebardin  
Ji ilm û hilmiş xired ser werdin

697. Pey ilmiş biyen ne defter inşa

<sup>1</sup> Qur'an, Kehf 18/109: "Bibêje: Eger ji bo peyvên Xwedayê min derya hibir bûna  
û me ew qasî din jî lê zêde bikira, beriya peyvên Xwedayê min biqedin, ew ê  
derya biqediyana."

*La yûhîtûne illa bima şâ<sup>1</sup>*

698. Her kes dem bidî ve Zatê Bêçun  
We ïn yeqûlû ma la t'elemûn<sup>2</sup>

699. Zatiş qedîm<sup>3</sup> in qayim bi Zat in  
Jî kunhê Zatiş 'eql leng û mat in

700. Mucîr û Muxîs Fatih el-ebwab  
Feryadresê ferd Hazim el-ehzab

701. Bînay la yera danay la ye'lem  
Me'bûdê la reyb karsazê 'alem

702. Wehdehû la şerîk Heyyê la yemût  
Malikê riqab sahibê ceberût

703. Wahid û Ehed ferd û Semed in  
Tenhayê lem yelîd we lem yûled in<sup>4</sup>

704. Danay durustkar hakimê 'adil  
'Elîm û Helîm Hekîmê Kamil

705. Semî' Besîr Nesîr û Xebîr  
Qewwîyû 'Elîyy û 'Ezîmê Kebîr

706. Rehman û Rehîm Xefûrê Vedûd  
Mun'im û Mufzil Munîr û Me'bûd

<sup>1</sup> Qur'an, Beqere, 2/ 255: "Xwedê çi qasî bixwaze, însan ew qas ji 'ilmê Xwedê têdigehin, zêdetir tênagehin."

<sup>2</sup> Qur'an, Nehl 16/8: "Xwedê, ya ku (iro) hûn pê nizanin ji dê biafirîne."

<sup>3</sup> 'Qedîm', wek term bi vî awayî tê pénasekirin: Destpêka hebûna Xwedê nîne û ew bêyî ku muhtacê kesekî an tiştekî be, jixwe her û her hebûye. Herwiha di Qur'anê da peyva 'qedîm', bi ma'neya 'tiş an ji baweriyên kevnar' hatiye nivîsin. bnr. Qur'an, Yûsuf, 12/95; Yasîn, 36/39; el-Ehqaf, 46/11.

<sup>4</sup> Qur'an, İxlâs 112/3: "Kes jê çênebûye û ew ji ji kesî çênebûye."

707. Refîq û Şefîq Wesîq û Kerîm  
‘Ezîz û Qedîr Qedîm û Muqîm

708. Celîl û Cemîl Wekîl û Kefîl  
Muqîl û Munîl Nebîl û Delîl

709. Dawiyê kullê da’ dafi’-un neqem  
Şahid û Şamil Şafî-us Seqem

710. Letîf û bê cism bê kiswe û libas  
Bê ekl û bê şurb bê newm û nu’as

711. Dawerê dadres şay fermanrewac  
Kerîmê bê buxl xenîyê la yuhtac

712. Xuday xetapûş bê manendê wend  
Mewlay gunehbexş bî me’na peywend

713. Muberra ji neqs Settarê ‘eyb in  
Muxbirê sadiq ‘alimê xeyb in

714. ‘Alim in ‘ilm in ‘ilmiş bê te’llum in  
Murîd û mudrik mutekellim in

715. ‘Ilmiş ‘eynê Zat Zatiş napeyda  
Qeyyûmê Qadir qudret huwedyda

716. Dûr başış kelamê *len teranî* yen  
Wechê ew baqî baqî fanî yen

717. Rebb-ul Erbab in kesiş Rebb niyen  
Cewher û ‘erez murekkeb niyen

718. Xalîqê kewneyn bi mekan niyen

<sup>1</sup> Qur'an, E'raf 7/143: "Tu yê min nebînî."

Bi behsê efkarê ins û can niyen

719. Mewsûfê qiyam û qu'ûd niyen  
Ya ve hereket ya cihûd niyen

720. Siza ve hudûsê balîden niyen  
Pezîray fesadê kahîden niyen

721. Qadir in 'eczîs ve hîç bab niyen  
Muhtac bi alet û esbab niyen

722. Bi çişm û bi gûş dest û rû niyen  
Her ci ve xatir bugzerû niyen

723. Qesrê celaliş berz û napeydast  
Kemendê xired ve laş narisast

724. Kursînişinanê 'erşê nubûwwet  
Qa'idanê rûy ferşê futûwwet

725. Hîç kam nizanan ew ci û çûn in  
Ji kunhê 'uqûl temam bîrûn in

726. Ji ma 'erefnak hedîsim wana  
Zanîm ke Zatiş kesî nizana

727. Be'zî ne hudûd tecawiz kirdin  
Pey ve biyabanê zelalet bîrdin

728. Delîlê bê pa û bê ca awerdin  
Ve 'eqlê naqis wî tewr fehm kirdin

729. Hulûlê Wacib ve kullê mewcûd  
Qedîmê 'alem wehdetê wucûd

730. Je lay 'uqela key mebû mesmu'  
Yekî bê wucûd sani' û mesnu'

## Bab-i çeharom

Hû 110

Der sifatê Barî Te'ala

731. Ya Reb tu raziqê rûzî xwaran î  
Menşe'ê sehab qetreyê baran î

732. Raziqê cenînê tiflê sexîr î  
Rehîmê Rahim şeyxê kebîr î

733. Rebb el-'erzeyn û heft semawat î  
Mumît ul-ehya' Muhî ul-emwat î

734. Muterreh nemay cismê kesîf î  
Ulfet-dehendey ruhê letîf î

735. Qadirê Qehhar hem burdbar î  
Ji dirextê sebz agir berarî

736. Xalîq û Barî hem Musewwer î  
'Ezîz û Cebbar Mutekebbir î

737. Sani' î Cabirê 'ezmê kesîr î  
Kerîm î Xafîrê zenbê kebîr î

738. Wahid î Munîsê kullê wehîd î  
Mulazîy mulce'ê kullê terîd î

739. Ey rumûzê umûrê 'eqlê nuktedan  
Tab tevanbexşê cismê natuwan

740. Rûzî dehendey şerîf û wuzî'  
Ulfetbexş beynê murzi' û rezi'

741. Ey mijînamûzê tiflê şîr-xwer  
Nûrbexşê qemer ji pertewê xwur

742. Ey berarendeyê ‘uyûn ji hecer  
Şecer ji zemîn semer ji şecer

743. Engebîn ji nehl sahibê şûr û şer  
Ji betnê sedef lulu lalay ter

744. Ji kan bê kû yaqûtê ehmer  
Ji nafey ahûyê Xuten müşkê ezfer

745. Ni'metit ewfer ihsanit ekser  
*Men en yûhsîha we men en yûşker*<sup>1</sup>

746. Ey tu rehnumay şakir û kufûr  
Menzilê Furqan Tewrat û Zebûr

747. Fermanit ferman xedîwan pizan  
Zelîl in ji lay qudret ‘ezîzan

748. Wacib î mumkin nînit misal  
*Fe ente illa 'ela fewq-i kull-i hal*<sup>2</sup>

749. Kemerê şahan pey te'zîmit xem  
*Ente el-e'izze-l ecel-il ekrem*<sup>3</sup>

750. Ve iradeyê tu megzerû eşya'  
*We ma teşa'ûne illa en yuşa*<sup>4</sup>

1 “Yên ku şukur nakin û yên ku şukur dikin...” Ji hedîsek mensûb bi îmamê heştem ‘Eli bin Mûsa el-Riza: Sedûq, Muhammed bin ‘Eli bin Huseyn bin Babûye, *Uyûn Exbar el-Riza*, coz’ê sanî, h. b., r. 27

2 “Tu li ser her tiştî yî.”

3 “Tu yê herî bi izzet î, herî bi e’zemet û herî rêzdar î.”

4 Qur'an, Tekwîr 81/29: “Heta ew Xwedayê ku perwerdekarê ‘alemê ye nexwaze hûn nikarin bixwazin.”

751. Muşebbekê cenne tedbîr pey qezat

Qeder carî in bi tebeqê rizat

752. Leyse li-l emr illa ma qezat

We la min el- xeyr illa ma 'etat'

753. Qezat muberhen emrit muhkem in

Zehrit tiryaq in zexmit merhem in

754. Ber neçiyen ji teht hikmet ins û can

La tenfuzûne illa bi sultan<sup>2</sup>

755. Her kes bizanû 'esa tekrehû<sup>3</sup>

Riza û qeza ve qederit mebû

756. Cuyay xeyrê tu xiyaliş xam in

Metleb her tu yî xeyr ji tu kam in

757. Bes in pey tenbîhê her sahib-şu'ûr

Ela îlellah tesîr-ul umûr<sup>4</sup>

1 Ji du'aya 'Elî bin Huseyn es-Seccad: "Ji bo me tiştek tune ji xeynî teqdîra te  
û ji bo me başî tune ji xeynî diyariya te." *el-Şehîfet el-Kamilet el-Seccadiyye*,  
İntişaratê Ensariyan, Qum, b. t., r. 33

2 Qur'an, Rehman 55/33: "Geli civata cin û însanan! Eger hûn dikarin ji aliyên  
erd û asîmanan (ji binê desthilatiya me) derkevin (û neyêne heşrê) de derke-  
vin. Lî belê hûn bêyi hêzekê nikarin derkevin. (Ew hêz ji ji bo we ne mumkin  
e.)"

3 Qur'an, Beqere 2/216: "Her çiqas bi we ne xweş be ji şerkirin (di riya Xwedê  
de) li ser we hatiye ferzkirin. Pêkan e hûn tiştekî nevîn û ew ji bo we baş be  
û pêkan e hûn hez ji tiştekî bikin û ew ji bo we xerab be. Xwedê dizane û hûn  
nizanin."

4 Qur'an, Şûra 42/53: "Ku ew riya Xwedê ye, ew ê ku yên li erdê û asîmanan tev  
êñ Wi ne. Guhdar bin! Her kar û bar bi 'bal Xwedê ve vedigerin."

**Hû 110**

**Bab-i pencom**

**Der i'tiraf be gunahan ve nadimşoden  
ez e'malê qebîhe ve amalê şenî'e**

758. Ya kerîm ul-'ef 'ezîm ul-bîrr î  
Xeyr el-mes'ûlîn'alîmî sirr î

759. Min 'ebdê miskîn feqîr û zelîl  
Xeyr ji lutfê tu nînim delîl

760. Hurr û 'ebd û mulk malik ji tu wen  
Çun tu rehnumay bî geda ku wen

761. Sergeste pa leng râgem kirdin gum  
Watî ed'unî istecib lekum'

762. Ed'uke ya men yuqbil ul-yesîr  
'Ef kerî ji min cerîmey kebîr

763. Ji siqlê curmim tudey xak der hem  
Taqt niwen taqê poşt beqer xem

764. Ne cenbê zenbim kuh derem yem nem  
'Edadê nucûm mûr û melex kem

765. Zenbim 'ezîm in ta'etim seqîm  
Ya Reb 'Ezîm î û Kerîm î Rehîm

766. Zunûb el-letî tuheddîs  
Zunûb el-letî tuwerrîs un-nedem

---

<sup>1</sup> **Qur'an**, Mumîn (Xafîr), 40/60: "Xwedayê we got: Hûn hêvî û dua ji min bikin, ez ê ji bersiva we bidim."

767. Zunûbî ba'esê sîyahî dil bû  
Zunûbî muzennib ji ew xecil bû

768. Zunûb el-letî  
Zunûb el-letî tehtik ul-'isem

769. Zunûbî ba'esê fitney qubûr bû  
Zunûbî ba'esê de'wey subûr bû

770. Zunûb el-letî tunzel el-bela  
Zunûb el-letî tunzel ul-'eda

771. Zunûbî muzennib lêş bê xeber bû  
Ji siqliş zemîn zîr û zeber bû

772. Zunûb el-letî tuhbis ud-du'a'  
Zunûb el-letî tuqt'e ur-reca'

773. Zunûbî fatihê ebwabê nar bû  
Zunûbî mani'ê qetrey' emtar bû

774. Zunûb el-letî tures uş-şifa'  
Zunûb el-letî tukeşif

775. Zunûbî katib ji ew aciz bû  
Zunûbî şafî' lêş muhteriz bû

776. Zunûb el-letî tumeni' ul-qeza'  
Zunûb el-letî tuzellim ul-hewa'

777. Zunûbî 'alem ji ew peşêw bû  
Zunûbî mayey surûrê dêw bû

778. Ji lay 'usyanim meken ji şimar  
'Edad ur-remmal qeter ul-metar

779. Giranî gunah piştim şikestin  
Leşkerê hewa ray rast lêm bestin

780. Çenî bêbakan bêbakîm kirdin  
Kirdinim gunay fire ve gerdin

781. Ewamir temam niyam ve kenar  
Girdê nevahî girdîm çun pergar

782. Tab'iê hewanefsê le'îm bîm  
Esîrê kemendê dêwê recîm bîm

783. 'Arî ji suhbetê qewmê xusûs bîm  
Refîqê naehl rezlê nusûs bîm

784. Pencah dam ve ser henûz cahil bîm  
Perî mesîyet ferdê kamil bîm

785. Pey axiret tuxmê nîkî nekaştım  
Pasê şerî'et hergiz nedâştım

786. Çun geday kafir ne dinya û ne dîn  
*Zalike huwe xesran ul-mubîn'*

787. Nimetit temam ji naspasî  
Kirdim serfê lehw le'eb me'asî

788. Fire serpêçî fermanit kirdim  
Ve kullê e'za 'usyanit kirdim

789. Er xwastit bîya mekirdîm esem  
Ekme û e'rec 'eqîm û ebkem

790. Er hilmit manî'ê 'itabet nebû

<sup>1</sup> Qur'an, Hecc 22/11: "Xeserata aşkera ha ev bi xwe ye."

Kerîmît hicabê 'iqabet nebû

791. Eger xeffarît ve min nekî meyl  
Feba şeqûnî ya 'ulî ya we'yl<sup>1</sup>

792. Namey 'usyanim er tu nekî hek  
Fe men ze-l lezî yesfe'û 'indek<sup>2</sup>

793. Ey pûziş pezîr 'asî û ba'is  
Tewbe-dehendey xatî û ya'is

794. Nazil-kunendey ayey la tey'es<sup>3</sup>  
Ya sadiq ul-we'd ve feryadim res

795. We'dê wefa ker ji we'id bugzer  
Gunam kîj in Ellahû Ekber

796. Besa bedkarîm sebt in ne zemîr  
Besa gunahan çînim ji wîr

797. Kul sebt in ve rûy namey e'malim  
Min xeflet zedem bed ew halim

798. Gişt ta'etê xuşk mu'etel kirdim  
Abê zindigî temam (hil)<sup>4</sup> kirdim

799. Eger nemaz bêm emma bi wuzûh  
Huzuriş newî çun cismê bêrûh

800. Qiyam û qu'ûd rikû' û sicûd  
Temam naqis bî ey danay me'bûd

<sup>1</sup> Gotineka 'erebî: "Min meyla karêñ nebaş kir û çûm ser rîya şas."

<sup>2</sup> Qur'an, Begere 2/255: "Ji bili yê ku wî destûr dabe ew kî ye (bê destûra wî) li  
cem wî mehderiyê bike?"

<sup>3</sup> Qur'an, Yûsuf 12/87: "Hêviya xwe ji rehma Xwedê qut nekin."

<sup>4</sup> Nîvbeyt ji destxeteka dî hate temamkirin.

801. Zakirê ewrad im eger ji ber bî  
Çun hezyan guwwan dil bê xeber bî
802. Wetin eqşî'rar bê qerarîm ne  
Ve xeddîn ji 'eyn dem' carîm ne
803. Fena û bê xwedî ji rûy şewqim ne  
Xuşu'û xuz'û 'isq û zewqim ne
804. Te'fir û zarî perîşanîm ne  
'Ereqê xiclet ve pîşanîm ne
805. Nemazê menût ji sehw û nisyan  
Bi sûret nemaz bi me'nî 'usyan
806. Eray ta'et in bes 'usyan kam in  
Ey xakim ve ser karim temam in
807. Eger sa'im bîm gahî ve zahir  
Lakin ve batin muftir bîm muftir
808. Nezer ji sûretê butan nebestim  
Zeban ji xeybet buhtan nebestim
809. Herîsê ha'im çun beha'im bîm  
Weqtê xena'im daîm na'im bîm
810. Eray ta'et in pes 'usyan kam in  
Îy xakim ve ser karim temam in
811. Eday zekatim eger hasil bî  
We men eza<sup>1</sup> ewiş batil bî
812. Istita'etim eger pey hecc bî

<sup>1</sup> "Ji ku hatiye?"

Pay himmet e'rec iradem kec bî

813. Pa leng û rah dûr kemzad û xemnak  
Ferar mumteni' menzil holnak

814. Bayed bikîşûm her demî sed ah  
Ji kemyê tûşe ji diraziyê rah

815. Çun min şermende hîç bende niyen  
Xêyr ji tu zîba dehende niyen

816. Min bendey 'asî ji xeyr bê nesîb  
Giriftar bi destê nefşê naşekîb

817. Emmare û sû'ê nefş na hencar  
Lehw le'eb pêşey şûmê sitemkar

818. Mul'eyê şer' û xetayê kesîr  
Mubaderet ker ve gunay kebîr

819. Iza musseha-ş şer cezû'en  
Iza musseha-l xeyr menû'en'

820. Mayil ve hûbe kesîr ul-'ilel  
Gahî ve tewbe tevîl ul-emel

821. Peyrew ve iblîs mutî'ê hewes  
Asî destê nefş çun men niyen kes

822. Ya Reb ve lutfit derîx nekerdî  
Ve pêxemberan yek yek siperdî

823. Meken peyrewî iblîsê le'în

<sup>1</sup> Qur'an, Me'aric 70/20: "Dema nebaşî bi ser de tê (xemgîn dibe û) dike feryad.  
Gava ku qencyiek bi ser de tê destgirtî û çıkış dibe."

*Innehû lekum 'eddûwû mubîn'*

824. Lakin min ze'if ew qewî-bazû  
Kah û kûh key biyen ve hem terazû

825. Mer lutfê tu bû biderîm penah  
Carî bûm bi emrê *tûbû illellah*<sup>2</sup>

826. Ya Xafur uz-zenb tewbe-pezîr î  
Ne behrê 'usyan tu destgîr î

827. Keştim ha ne mewc xired naxudaş  
Xired naxuda heyran in ji laş

828. 'Aliman melah kem se'yê kahil  
Min ve gêcê mewc ewan ve sahil

829. Er lutfit nebû pey min rehnimûn  
*La serîxe lî we la yunqezûn*<sup>3</sup>

830. Der her pille feryadres tu yi'  
Der yabim kesê her bê kes tu yi'

831. Min bi wêm xecil nefşê min şûm in  
Ef'alê ziştım bi tu me'lûm in

832. Şertê bendegît ve ca nawerdim  
Heway wêm ve 'eql musellet kirdim

833. Ta ji 'eqlê wêm terfî nebestim

<sup>1</sup> Qur'an, Yasîn 36/60: "Béguman ew (şeytan) ji bo we neyarekî aşkera ye."

<sup>2</sup> Qur'an, Tehrîm 66/8: "Berê xwe bidin Xwedê û bi tobeyeke ji dil û can tobe bikin."

<sup>3</sup> Qur'an, Yasîn 36/43: "Eger em bixwazin (digel keştiyan ji) em ê wan binav bikin û bixeniqñin, wê çaxê ji wan re ne hewar dê hebe' ne ji ew ê bêne rizgarkirin."

Mukerrer tewbe kirdim şikestim

834. Er bes peyderpey şikestim tewbe  
Abê tewbey min biyen ve hûbe

835. Zadê rehawerd cuz hûbem niyen  
Nemez çûn bikem cay tewbem niyen

836. Hem bi lutfê tu awerdim penah  
Amam bi rûy zerd bi namey siyah

837. Min penah awer ya Reb tu mucîr  
Min tewbe-şiken tu tewbe-pezîr

838. Amam bi dergat bendey rûsiyah  
Mu'terif ve sû' muqîr ve gunah

839. Ente ila Mewla Kerîm  
Rahim 'ela 'ebdê leî'm

840. Înî lem ehed sewak el-Kerîm  
Ente l-Kerîm we ene l-leî'm<sup>1</sup>

841. Kerîm î kerîm kerîm ey Wedûd  
Key kerîm kirdin mustecîr metrûd

842. Eger redim key pes penam kî yen  
Xêyr ji dergay tu gurîzgam niyen

843. Eyne l-meferrî rûhî fî yedeyk<sup>2</sup>  
Şukût zillî ve huznî ileyk<sup>3</sup>

<sup>1</sup> "Ji xeynî te xwedan-keramet nîne. Tu Kerîm î û ez gunehkarekî xirab im."

<sup>2</sup> "Ka cihê revê? Ruhê min li ber destê te ye."

<sup>3</sup> "Ev, şikayet û xema min e."

844. Her 'ebdê zelîl rûsiyay dilrîş  
Rucû' mekerû xêyr ji Mewlay wêş

845. Mewlay mewla yî penah awerdim  
Ta'etim niyen gunah awerdim

846. Min bi nefsê wêm kirdinim sitem  
Mayem hesret in xiclet û nedem

847. Umîdvar im na umîdim nekey  
Min mustecîr im (terîdim)<sup>1</sup> nekey

848. Min 'ebdê miskîn efa'lîm qebîh  
Tu Mewlay muhsin sirpûş û nesîh

849. Kem min 'uyûb ve cinayetî  
Kem min qebîh ve isaetî

850. Tu pûşay ji lutf min şermende bîm  
Tu nî'm el-Mewlay min bed bende bîm

851. Her kesî umîd ve kesî dîrî  
Weqtê tengnay dadresî dîrî

852. Leste we 'erif Mewlin se'wak  
Rûyê rehmetit kirdî müştê xak

853. Ya faliq ul-behr pey Mûsa ji Nil  
Ya rizvan numay agir pey Xelîl

854. Yûnis xelas ker ji betnê mahî  
Yûsuf ji çah ber ve textê şahî

855. Ya red-konendey Yûsuf ve Ye'qûb

<sup>1</sup> Nîvbeyt ji destxeteka cuda hate temamkirin.

Ve islah awer zerer ve Eyyûb

856. Pey mubtelayan kes her tu yî bes  
Messenî-ye zurru<sup>1</sup> ve feryadim res

857. Hazim-ul ehzab<sup>2</sup> pey Xeyr-ul Beşer  
Ya qali'ul-bab Xeyber<sup>3</sup> pey Heyder

858. Ya pezîrendêy tewbe ji Dawud  
Ya mursel-ur reyh pey 'Ad û Semûd<sup>4</sup>

859. Min peşîman im tewbem qebûl ker  
Bedxahanê min xarê mexzûl ker

860. Eger rûsiyam ne yewm ul-hisab  
Er ji eşqîyam ne umm ul-Kitab

861. Ercûke fe-sbih Rebbê şefayî  
Ed'ûke fe-qbil Rebbê du'ayî<sup>5</sup>

862. Ente l-mefze'u fi l-mulimmatî  
We ente l-med'uvvu lil-mulimmatî<sup>6</sup>

863. Wesse'e 'eleyy rizqek el-Wedûd<sup>7</sup>  
Kema esneyte nefsek bi el-cûd<sup>8</sup>

<sup>1</sup> Qur'an, Enbiya 21/83: "Eyyûb ji, dema gazî Xwedayê xwe kir; (Xwedêyo!) Der-dekî giran bi min girtiye û tu dilovantirînê dilovanan î."

<sup>2</sup> Şerê Ehzab (hizban) yan ji Şerê Xendeq, sala 5ê hicrî, bnr. Qur'an, Ehzab 33/9-26.

<sup>3</sup> Şerê Xeyberê, sala 7ê koçî.

<sup>4</sup> Ji bo qisseyâ qewmên 'Ad û Semûd, bnr. Qur'an, Enkebût, 29/1-69.

<sup>5</sup> "Ya Rebb têm ba te şifaya min bide, ya Rebb duaya min qebûl bike."

<sup>6</sup> Du'ayek mensûb bi 'Elî bin Huseyn es-Seccad: "Wexta felaketê, Tu stargeh î. Tu vexwendî yî ji bo karêن giring". el-Sehîfet el-Kamilet el-Seccadiye, h. b., r. 37

<sup>7</sup> Ji du'aya 'Semat'ê: "Rizqê xwe ji bo min zêde bike". Tûsi, Ebî Ce'fer Muhammed bin Hesen, bin 'Elî bin Hesen, Misbah ul-Muctehid, h. b., r. 420

<sup>8</sup> Du'ayek mensûb bi Pêxember: "Ez pesnê te nadim çimkî te pesnê xwe daye".

864. Rûy rehmetit kirdî muştê xak  
We el-'efû 'ennî heyn el-qak<sup>1</sup>

865. *Mucrim*<sup>2</sup> firawan bi wêş kird sitem  
Feteb 'eleyh-i Rebb exferû erhem<sup>3</sup>

---

Meclîsî, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Etar*, c. 68, h. b., r. 23

<sup>1</sup> Du'ayek mensûb bi 'Elî bin Huseyn es-Seccad: "Heyna hevdîtinê, tu min 'efû bike". Tûsî, Ebî Ce'fer Muhemmed bin Hesen, bin 'Elî bin Hesen, *Misbah ul-Muctehid*, h. b., r. 133

<sup>2</sup> 'Mucrim' (Gunehkar), di beytên dawî yên du beşan da tê tekrarkirin. Mumkin e ku mexleseka Mela Perîşan be.

<sup>3</sup> "Xwedayê min, kerem bike bibexşe û rehmê li min bike."

## Bab-i şeşim

### Hû 110

Der munacat be dergahê qazi-yul hacat ve hezretê xetmê  
risalet ve cenabê şahê welayet-meab ra şeff'e nimûden  
bi cihetê icabetê du'a ve 'effê ecrام

866. Xudaya ve zatê pakê Xuda yît

Ve yeganegî ve tuwana yît

867. Bi ismik el'-ezîm e'zem ul -e'zem

Bi celalike l-ecel il-ekrem

868. Ve pak tînetan û murselînit

Ve mela'ike û muqerrebînit

869. Ve iħram-bendanê 'Uzza û Lat' şiken

Ve qurbanîyanê gułnarî kefen

870. Ve ze'if-halanê zarê mustemend

Ve qani' nefsanê seng ve şikembend

871. Ve lebbeykê hacê Mescîd-ul Heram

Ve Merwe û Sefa û rukn û meqam

872. Ve naley cansûz 'uşşaqqê mehcûr

Ve şeb-bîdaran ji asayış dûr

873. Ve hunê çenîn merdê namidar

Ve kird pêçanê deştê karizar

874. Ve mucahidanê qedem ustuwar

<sup>1</sup> Navê du putên sereke yêñ ku berî İslâmê di nav Ka'beyê da bûn û piştî fetha  
Mekkeyê (sala 10ê hicri) ji aliye misilmanan ve hatin şikandin.

**Ve destê cudayê Ce'ferê Teyyar<sup>1</sup>**

**875. Ve nukê nêyzey Hemzey<sup>2</sup> namidar  
Ve parey cîger destê Cigerxwar**

**876. Ve tundîy Duldul berqê Zulfeqar  
Ve ne'rey mehîbê Heyderê Kerrar**

**877. Ve mubtelayanê sabir kezîm  
Ve Çar Kitabê menzilê 'ezîm**

**878. Ve qurb û rutbey Cebreîl-i Emîn  
Ve hebîbê tu xetm-ul murselîn**

**879. Ve sahib minber Meqamê Mehmûd  
Zîl wech ul-Cemîlê munhîyê (meşhûd)<sup>3</sup>**

**880. Yetîmê sabir Seyyîdê sermed  
Xetm-ul enbiya' yenî Muhammed**

**881. Rûy rehmetit kirdî muştê xak  
We el-'efû 'ennî heyn el-qak**

**882. Ya Şay ulûl-'ezm rehnumay rehber  
Tewrat û Incîl sûhûf mensûx ker**

**883. Ji mewludê tu cehan bî bû-muşk**

<sup>1</sup> Ce'fer bin Ebî Talib (Ce'ferê Teyyar: Ce'ferê Firoke). Birayê 'Elî bin Ebî Talib û pismamê pêxember. Di şerê Mûteyê da (h. 8) ji aliyê pêxember ve wekî fermandarê artêşa misilmanan hatiye tayînkirin. Di şer da herdu desten wî hatin jêkirin û şehîd ket. Pêxember li ser wî wiha kerem kiriye: "Xwedê li şûna du destan, du çeng bexşandine bo Ce'fer ku bi wan çengan li biheştê difire." Meclisi, Şêx Muhammed Baqîr, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar*, h. b., c. 21, r. 54.

<sup>2</sup> Hemze bin 'Ebdulmuttalib. Mamê Pêxember e. Di şerê Ûhûdê da bi destê Wehşî, hat şehîdkirin.

<sup>3</sup> 'Meşhûd' nehatiye nîvîsîn, me ji destxeteka dî wergirt.

Taqê Kesray<sup>1</sup> kesr Deryay Sawe<sup>2</sup> xuşk

884. Seylê celalit cehan girt newer  
Ateşgedey<sup>3</sup> Fars<sup>3</sup> xamûş kird yekser

885. Nûrê bêsaye beşîr û nezîr  
Perî ‘asiyan şefî’ û nezîr

886. Nûrit ne eslab zahir bî çun mah  
Her ne Bû l-Beşer<sup>4</sup> ta ve ‘Ebdullah<sup>5</sup>

887. Je lay qedrê tu şuca’ û sexî  
Purê Zal<sup>6</sup> çakir Hatem<sup>7</sup> metbexî

888. Pey remyê remhit ama izremeyt<sup>8</sup>  
We la tebsutha ma e’tat<sup>9</sup>

889. Destit ve sexa er bes mayîl bî  
We la tebsutha perîş nazil bî

890. Gulê gulistanê Xelîlullah<sup>10</sup> î

1 Taqê Kisra yan jî Eywana Medaîn. Avahiya herî navdar a serdema Sasaniyan.  
Li gor baweriyyê, şeva jidayikbûna Pêxember, çardeh beşen wê hilweşiyane.

2 ‘Behra Sawe’, li gor riwayetên İslâmî, di şeva jidayikbûna Muhemmed Pêxember da hişk bûye, av tê nemaye.

3 ‘Ateşgedeyê Azer’ yan jî ‘Ateşgedeyê Fars’. Cihekî pîroz e bo Zerdeştiyan. Li gor riwayetên İslâmî, şeva Muhemmed Pêxember ji dayik bûyi, agirê wî yê hezar salî vemiriye.

4 Hz. Adem.

5 Ebdullah bin ‘Ebdulmuttalib. Babâ Muhemmed Pêxember.

6 Rustomê Zal.

7 Hatem bin ‘Ebdullahê Tayî (h. 46), bi camêri û comerdiya xwe, di nav ‘ereban da meşhûr e.

8 Qur'an, Enfal 8/17: “Vêca (di cenga Bedrê de) ne we ew dikuştin, lê belê Xwedê (bi arîkariya xwe) ew dikuştin.”

9 Qur'an, Isra 17/ 29: “Di riya Xwedê de yekcar destgirtî nebe û bi temamî des- tvekîri jî nebe, paşê tu yê lomedar û destevala rûnê.”

10 Hz. İbrahim.

Nûbadey letîfê Zebîhullah<sup>1</sup> î

891. Ve yek işare Qemer du nîm ker<sup>2</sup>  
Dilê kafiran pur xof û bîm ker

892. Ba'is îcadê temamê 'alem  
Fexrê dûzmanê Hezretê Adem

893. Ya 'eyn ul-heyat îman kamil  
Ya berqê xermanê ediyan batil

894. Ya Muhemed esl ya Xeyr-ul Beşer  
Ummetê 'asît bawer ve nezer

895. Neqdê 'umr zayı' min bê beza'et  
'Ereb dexîlim biker şefa'et

896. Îlahî bi heqqê 'Elîyyê welî  
Ve sîrrê xefî û nûrê celî

897. Ve zorê bazûy şîrî bîşey tu  
Harisê bê bak bê endîşey tu

898. Rakibê Duldul merdê Xeyber-ken  
Şîrê Merheb<sup>3</sup>-kuş ser ji 'Emr-efken

899. Tarikê dinya mafîha temam  
Bêhterîn xelq çun xeyr ul-enam

900. Ve qurb û zuhd û xuşu'ê ew  
Ve teqwa vere' û xuzû'ê ew

---

1 Hz. İsmâîl.

2 Wekî mucîzeyekê, Muhemed Pêxember heyva li aşîmanan dike du şeq.  
*Qur'an*, Qemer, 54/1.

3 Fermandarê Keleha Xeyberê. Bi destê Hz. 'Elî hat kuştin.

901. Rûy rehmetit kirdî muştê xak  
We el-'efû 'innî heyn el-qak

902. Ya Şîrê Yezdan kenendeyê Xeyber  
Ve nessê Qur'an nefşê Pêxember

903. Ya destê qudretê Hezret-i Dawer  
Carî bi emrit qeza û qeder

904. Qedrê tu ji layê her sahib-nezer  
Jî 'erş û ji ferş ji kursî berter

905. Qismet kunendeyê Biheşt-i Heştder  
Fetwa dehendeyê her Çar Defter<sup>1</sup>

906. Malik<sup>2</sup> bi emrit agir efrûz in  
Nîran bi fermanê tu munkir sûz in

907. Xêyrê Heq kesit bala-des niyen  
Her kes munkir bû Heq-peres niyen

908. Qadirê Bêçûn senaxwanê tu in  
Ruh ul-emîn tiflê debistanê tu in

909. Nuh taqê felek er bi qertas bût  
Katib melayîk cinnî û nas bût

910. Bihar murekkeb eşcar qelem bût  
Henûz pey wesfit ya 'Eli kem bût

911. İbrahîm ji dest taifey merdûd

<sup>1</sup> Çar kitêbên pîroz.

<sup>2</sup> Malik bin Harisê Nexe'i. Bi navê Malikê Eşter meşhûr e. Serdar û sehabeyê nezîkê 'Eli. Di şerê Cemel (h. 36) û şerê Siffinê da (h. 37) serokê arteşa Hz. 'Eli ye. Sala 39ê koçî şehîd dibe.

Weqtî müşrif bî bi narê Nemrûd

912. Fewcê melayîk çenî Cebre'îl  
Ji sema aman bi yarîy Xelîl

913. Watin hacetî er darî rewast  
Wat ihtiyacim bi lutfê Xudast

914. Çun nûrit ne selbê Xelîl qerar daşt  
Ji isti'anetê melayik 'ar daşt

915. Netirsa ji nar ta ama ilham  
*Ya narû kuni berden we selam<sup>1</sup>*

916. Ey sabit qedem şuca'ê roy rezm  
Serwerê merdan merdê sahib 'ezm

917. Ey derhem-şiken 'Uzza Lat û Wedd<sup>2</sup>  
Qati'ê heyatê 'Emrê 'Ebduwed

918. Berqê şemşîrit kufriş kende kird  
Seday tekbîrit İslâm zinde kird

919. Sê şeb peyderpey kirdî ey Emîr<sup>3</sup>  
It'amê miskîn yetîm û esîr

920. Xêyr ji 'etary tu te'am nayab bî  
Sa'im bît sê şeb iftarit ab bî

921. Zehra û ferzandan bîrê wêt kirdin  
Her kam nesîbî ji feyze birdin

<sup>1</sup> Qur'an, Enbiya 21/69: "Me got: Hey agir! Ji bo İbrahim bibe hênik û selameti".

<sup>2</sup> Navê sê pûtên sereke yên Ka'beyê.

<sup>3</sup> Emîr el-Mumînîn. Di baweriya şî'a da tenê leqeba 'Elî bin Ebû Talib e.

922. *Hel Eta' perî wesfît nazîl bî*

Her muxalifî xar û xecil bî

923. *Ya ferezendey Sûrey' Hel Eta*

Ya berazendey tacê La Feta<sup>2</sup>

924. *Sexat ne 'alem bêda kird şuy'û*

Zekatê sa'il ne halê rukû<sup>3</sup>

925. *Yûfûne bi-nnezr<sup>4</sup> ve şanê tu bî*

Ayeyê innema<sup>5</sup> burhanê tu bî

926. *Tu ve Pêxember herdu bê şikî*

Ne sûret du in ve me'nî yek î

927. *Hergiz jî behse nemarûn kemî*

Bi nessê hedîsê lehmîke lehmî<sup>6</sup>

928. *Eger ew<sup>7</sup> tîn in tunîş Zeytûn<sup>8</sup> î*

<sup>1</sup> Qur'an, Xaşıye 88/1: "Ma xebera 'xaşıyê' ji te re nehat?"

<sup>2</sup> "La feta illa 'Eli la seyfe illa Zulfeqar."

<sup>3</sup> Hz. 'Eli li ser nimêjê gustîla xwe wekî zekat dide feqirekî. Piştî vê bûyerê jî ayeta 55ê ya Sûreya Maîde ji bo Muhammed Pêxember nazîl dibe. Tebrisî, Ebi 'Ali el-Fezî bin el-Hesen, *Mecme' ul-Beyan fi Tefsîr el-Qur'an*, el-cuz' el-salis, h. b., rr. 295-299

<sup>4</sup> Qur'an, İnsan 76/7: "(Ew bend e), nezr û peymanê xwe tînin cih û ji rojekê wisa ditîrsin ku kes jî şerê wê veder nîn e."

<sup>5</sup> Qur'an, Maîde 5/55: "Bêguman dost û arîkarê we tenê Xwedê ye, Pêxemberê wî û yên ku bawerî anîne; ew ên ku bi berdewamî nimêj dikin, zekata malê xwe didin û ew her (li ber fermaña Xwedê) xwe ditewînin." Ev ayet di bawerî ya şî'a da wek isbata welayeta 'Eli tê qebûl kirin.

<sup>6</sup> Hedîseka ku Muhammed Pêxember ji bo 'Eli bin Ebû Talib dibêje: "Lehmîke lehmî, demmîke demmî, ruhîke ruhî, cismîke cismî". (Goştê te goştê min e, xwîna te xwîna min e, ruhê te ruhê min e, cismê te cismê min e). el-Teberî, 'Imadeddin, Hesen bin 'Eli bin Muhammed bin 'Eli bin el-hesen, *Kamilâ Behayî*, tehqîq ve teshîh: E. Sefderî Qezwînî, İntişaratê Murtezewî, Tahran, 1383, r. 89.

<sup>7</sup> Hz. Muhammed.

<sup>8</sup> Qur'an, Tin 95/1: "Sond bi hejîr û zeytûnê..."

Er ew çun Mûsa in tu çun Harûn' î

929. Ey şexs ecel pey Heq neşnasan  
Duşmenan ji zerbê tixit herasan

930. Ey qewî bazûy destê qeza-pêç  
Bi hukmê Qadir qeder bê tu hîç

931. Ey siddîq newaz mîrê muqteda  
Ey 'edû gudaz çun qehrê Xuda

932. Ey esedullah mensûr royê herb  
Qudretullahê re'd seday berq zerb

933. Sabit û sabir qahir pey duşmen  
Xazi' û xaşı' perî zul-minen

934. Berguzîdey Heq ne Mubahile<sup>2</sup>  
Vasîyê Nebî bila fasile

935. Er feslî rûda kirdişan tezwîr  
Cay şîrişan girt rûbehanê pîr

936. Şehbaz û xufaş key biyen nezîr  
*We ma yestewa-l 'ema we-l besîr*<sup>3</sup>

937. Ya zewcê Betul emîrê sefder  
Ya ebe l-Hesen saqîyê Kewser

1 Bira û cîgirê Hz. Mûsa. Hedîsek mensûb bi Muhemed Pêxember: "Ya 'Elî! Harûn ji bo Mûsa ci be, tu ji bo min ew î. Lîbelê piştî min pêxember nayên." Ev hedîs di nav çavkaniyêن şî'i û sunnî da cih digre. bnr. Ibn Ebdulbirr, Ebî 'Umer Yusif bin Ebdillah, *el-Istî'ab fî Me'rîfet ul-Eshab*, h. b., r. 526

2 Munazaraya Muhemed Pêxember û yekî xristiyan. Pêxember li gel 'Elî, Fatime, Hesen û Huseyn diçe munazarayê. Ew pênc kes wek 'eshabê kîsa' meş-hûr in. bnr. *Qur'an*, Ehzab, 33/33.

3 *Qur'an*, Fatir 35/19: "Yê kor û yê bi çav ne mîna hev in."

938. *Mucrim* çem werdin ji siqlê gunah  
Ya 'Elî işfe' lena 'inde Ellah

## Bab-i heftom

Dermezemmetêxulefayêselasevemunkirînûmunafiqîn  
û xainîn û xasibînê heqqê hezretê Emîr ‘eleyhû selam

939. Ya ‘Elî bi heqq-i ‘Elîyyê ‘ezîm

Ve ismê e’zem Dawerê Kerîm

940. Muxalifanit neng biyen ta heşr

Mexzûbê Xuda Resul royê neşr

941. Rihletê Nebî çun surişan bî

Huznê Haşimî<sup>1</sup> mesrûrişan bî

942. Revan biyen gurûhê namusa’ide

Ta ve Seqîfey Benî Sa’ide

943. Pey selahiyet cem’ biyen musilmûn

Ela înnehûm hûm-ul mufsîdûn<sup>2</sup>

944. Ve furset-zanan çâştî sûz kird

Leyse el-’ereb minnî<sup>3</sup> burûz kird

945. Bey’etişan kird gurûhê bêdîn

Ve Bûbekrê şûm bedbextê le’în

946. Ve fikrişan çî zu l-minne wala

Feramûş kirdin men kuntû mewla<sup>4</sup>

947. Her kî xêyr ji tu mewlaş in bî kem

<sup>1</sup> Benî Haşim. Malbata Pêxember.

<sup>2</sup> Qur'an, Beqere 2/12: "Agahdar bin, bi rastî yên ku fesadiyê dikin her ew bi xwe ne, lêbelê ew tênağıhîjin."

<sup>3</sup> Riwayetek mensûb bi Muhammed Pêxember: "Ez 'ereb im lê 'ereb ne ji min in."

<sup>4</sup> "Men kuntû mewla 'Elî in mewla." Xutbeya Pêxember, roja Qedîr, sala 10ê koçî.

Wasil bî ve cem'ê la mewla lehum<sup>1</sup>

948. Pey ji şeqawet kirdey nameqbûl  
Mehrûm ji techîz nemazê Resûl

949. Pey xesbê Fedek<sup>2</sup> ve kec kirdin behs  
Le'netulah ila yewm-ul be's<sup>3</sup>

950. Ji bî yawerî kar ve tu sext bî  
Suleyman heyranê dêw ne rûy text bî

951. Ne ji ew bedbextan endîşe kirdî  
Bi 'ehdê Nebî sebr pişê kirdî

952. Her kes bi 'ehdiş mekerû wefa  
Summe yuczehu l-ceza' el-ewfa<sup>4</sup>

953. Xulefayê naheq ji bedan bedter  
Hergiz nekirdin xêyr ji karê şerr

954. Ji muxalifetê ceyşê Usame<sup>5</sup>  
Ji mumani'etê wesîyyetname<sup>6</sup>

1 Qur'an, Muhemmed 47/11: "Bi rastî ji bo yên kafir, tu piştgir û arîkar tun in."

2 Wekî hat gotin, baxçeyeka xweş ku piştî şerê Keyberê, Pêxember wek diyarî ji bo keça xwe dihêle. Piştî wefata Pêxember, Ebubekir dibêje mîratgirê Pêxemberan nînin, dest datîne ser Fedekê. Ev mesele bûye mijara niqaşekê di nav Fatime û Ebûbekir da. Di literatura şî'a da ev bûyer wek dijminatiya Ebubekir li hember keça Pêxember tê behskirin.

3 "La'net li wan be heta roja qiyametê!"

4 Qur'an, Necm 53/41: "Piştre Xuda dê bedêla kar û kiryarên wî békemasî bide wî."

5 Usame bin Zeyd bin Haris (h. 52). Piştî hecca dawî, Usameyê ciwan ji aliyê Pêxember ve wekî serokê arteşa İslâmî hatiye vezîfedarkirin. Lê fermandariya Usame ji aliyê hin sehabeyan ve nehatiye qebûlkirin. Di gel ku Pêxember ferman dide, hindek sehabê tevlî arteşê nabin heta ku Pêxember wefat dike.

6 Herwekî berê ji hatibû behskirin, li gor hin riwayetên İslâmî, Pêxember beriya wefatê ji bo nivîşna wasiyeta xwe kaxez û qelemê dixwaze lê daxwaziya wî ji aliyê 'Umer bin Xettab ve nayê qebûlkirin.

955. Guya pêxember ji asman keft

*Inne recûl liyehzû' şineft*

956. Axiray 'umrê ye pêxember bî

Ji pêxemberan temam berter bî

957. Qedriş ji Sûrey' *fetehna*<sup>2</sup> guzeşt

Ji *Qab-i Qewseyen Ew Edna*<sup>3</sup> guzeşt

958. *We ma yentiq 'en el-hewa*<sup>4</sup> bî

*Inne huwe illa wehyun yûha*<sup>5</sup> bî

959. Nisbetê hezyan be ew çun hebû

Ji fi'lê ziştit ciger xûn mebû

960. Qanûnê Îslam bird ji qa'ide

Şûray Seqîfey Benî Sa'ide

961. Icma' dest-awîzî perî Yezîd<sup>6</sup> bî

Huseynê 'Elî ew ro şehîd bî

962. Ew roje nehse besa karan bî

Fesad yek newî bel hezaran bî

963. Te'tîlê wesî tezîy'ê Îslam

Tebdîlê sunnet texyîrê ehkam

<sup>1</sup> Di hin riwayetên Îslamî da gava Pêxember daxwaza kaxez û qelemê dike ji bo nivîsîna wesiyyeta xwe, "Umer bin Xettab dibêje, "Ev camêr (Pêxember) wirêne dike (di ber xwe da diaxive)." Li gor riwayetên Sunnî, "Umer bin Xettab gotiye, "Ev camêr koç dike." (Inne el-recûle li-yehcir.) Nîvbeyta duyem ji destxeteka dî hate temamkirin.

<sup>2</sup> Qur'an, Fetih 48/1: "(Ya Muhemed!) Bi rastî me deriyê serkeftineke aşkera ji bo te vekir."

<sup>3</sup> Qur'an, Necm 53/9: "Bi qasî du kevanan an jî hê jê kêmtür nêzîkî wî bû."

<sup>4</sup> Qur'an, Necm 53/3: "Ew, ji dilxwaziya xwe napeyive."

<sup>5</sup> Qur'an, Necm 53/4: "Peyva wî her wehya ji cem Xwedê ye."

<sup>6</sup> Yezîd bin Mu'awiye (h. 64).

964. Ji xesbê Fedekê Zehray Betûl  
Îradey texrîbê merqedê Resûl<sup>1</sup>

965. Bes pey cezayê mela'înê dûn  
Ji sû' ellezî kanû ye'melûn<sup>2</sup>

966. Maçim Pêxember wesîyet nekird  
Qebaley Fedek ve Zehra nespird

967. Axir ve dewletê ismê babê ew  
Biyen ve sahib-mulk Fir'ewn Xusrew

968. Er menzûrişan ve fesad newî  
Fedek ve Zehra hîç ziyad newî

969. Men'i irs kirdin ve Zehray Betûl  
Ne xewf ve Xuda ne bîm ji Resûl

970. Ta biyen ve met'ûn-i Qur'anê 'Ezîm  
*Menna in lil xeyr mu'tedin esîm<sup>3</sup>*>

971. Narûn hamîye<sup>4</sup> perîşan ewla  
Yewme la yuxnî mewlen 'en mewla<sup>5</sup>

972. Le'nişan biker ey Xuday ehed  
Le'nin la yuxtir malê Ehmed

1 Heye ku mebesta Mela Perîşan Şerê Herre be. Di sala 63yê koçî piştî serhildana xelkê Medîneyê, bi fermandariya 'Ebdullah bin Henzele, li diji Dewleta Yezid bin Mu'awiyê, arteşa Şamê érişi Medîneyê dike. Eskerên Şamê sê rojan temamê bajêr talan dikin. Li gor çavkaniyên dirokî çend hezar kes têñ kuştin. Ji wan 700 kes hafizîn Qur'anê ne û 80 kes ji sehabeyên Nebî ne. Li gor riwayetan piştî Şerê Herre, ji şervan û sehabeyên Bedrê kes li Medîneyê nema û hemû hatin kuştin.

2 Qur'an, Zumer 39/35: "(Xwedê ev peyman bi wan re da;) da ku neqenciya berê kirin, veşêre û da ku qenciya ew dikin bi ya herî spehitir wan xelat bike."

3 Qur'an, Qâlem 68/12: "Ew ê çikûsê xérnexwaz ê ta'deker ê gunehkar."

4 Qur'an, Qâfir'e 101/11: "Agirekî cansoz û dijwar e!"

5 Qur'an, Duxan 44/41: "Wê rojê, tu dost nikare feydê bide dostekî, arîkariya wan ji dê neyê kirin."

## Xatime

**Der haletê musennif ve sifatê rûz-i mehşer  
ve ‘edlê Xaliq ul-Ekber ve temme bi l-xeyr bi heqqê e’im-  
met ul-huda selewatullah ‘eleyhîm ecme’în**

973. Ya Malik ul-mulk bedî’ul-eflak  
Aferîdet kird Bu l-Beşer ji xak

974. Melayîk memûrê sucûdiş kirdî  
Iblîs iba kird merdûdiş kirdî

975. Muhlet teleb kird na fermanê şûm  
Metleb rewan bî ta Yewm ul-me'lûm

976. Muhletiş bexşay ji te’zîbê fewt  
Innema yu’cil min texaf ul-mewt<sup>1</sup>

977. Dêwê xudpesend sicde inkar kir  
Dîndaran çend ji dîn bêzar kir

978. Zînet dehendey e’malê bedan  
Salihan lexzin redîfê redan

979. Perî inhîrafê insan kemer best  
Be’zî lexzena be’zî nedaş dest

980. Damiş gustera wêş bî gûsegir  
Ve kemanê mekr ve tîrê tedbîr

981. Daniş ve rûy dam paşa ve bî qeyd  
Ew bî ve seyyad<sup>2</sup> Benî Adem seyd<sup>3</sup>

<sup>1</sup> “Ewêñ ku ji mirinê ditirsin, dê vê bikin.”

<sup>2</sup> Nêçîrvan.

<sup>3</sup> Nêçîr.

982. Ji xulf û enam yemîn û yesar  
New' new' gunahan temam da qerar

983. Ji buxl û sem'e ji cewr û zina  
Ji kibr û hesed ji 'ucb û rîya

984. Şerab û xumar pes exnîya  
Kizb û xudbînî xiybeyt û rîya

985. Dizdî û rehzenî xemmazî buhtan  
Eklê malê xeyr ulfetê bûtan

986. Şîrîn-kemalan ser ta pa şîrîn  
Kul zînet damê Iblîsê le'în

987. Naz û xemzeşan yek işaret bî  
'Eql hezîmet kird ta'et xaret bî

988. 'Ezazîl seyyad damîş çay asam  
Min seydê herîs amam ve sûy dam

989. Her tîrê Iblîs nîya ne keman  
Sînem amac bî ama ve nîşan

990. Zexmê sîyaset firawan dîrim  
Derdê bêderman ji 'usyan dîrim

991. Er nekey çare zexmê diyarîm  
Er nekî derman derdanê karîm

992. Er qebûl nekey inabe û zarîm  
Fe wa 'esefa ji şermisarîm

993. Er bikey zarî û inabem qebûl  
Hebîbit şad in duşmenit melûl

994. Ya Reb duşmenit furset awerdin  
Axir bendey tum min hicran kirdim

995. Ve hilakê min şad in bedgewher  
Ve merhemê ‘efû şadîş batil ker

996. Er min bedkar im tu keremdar î  
Min ji teqway ‘ur tu wêt settar î

997. Er lutfit nebû pey min rehnimûn  
*La serîxe lî we la yunqezûn'*

998. Er lutfit nebû perî min rehber  
Metersûm ji huznê *feze'ul-ekber*<sup>2</sup>

999. Xêyr ji tu niyen kesim destgîr  
*Ni'm el-mewla we ni'm en-nessîr*<sup>3</sup>

1000. Her çend bedkirdar hem ‘usyanbar im  
Ve *la taqnetû*<sup>4</sup> umîdvar im

1001. Her çend bedkarîm bê hed û ihsast  
Ji lay keremît çun qetrey deryast

1002. Deryay rehmetit weqtî medey cûş

1 Qur'an, Yasîn 36/43: "Wê çaxê ji wan re ne hewar dê hebe ne jî ew ê bêne rizgarkirin."

2 Qur'an, Enbiya 21/103: "Wê roja ku em ê ezmên bipêçin mîna pêçandina rû-pelên kitêban; Em ê dîsa mirovan vejînin ka çawa cara pêşîn me ew afirandibûn. Ev peymaneke li ser me ye, beguman em ê (peymana xwe) bi cih bînin."

3 Du'ayek mensûb bi Pêxember ku di gel ayeta 173yem a Sûreya Ali İmran (Has-bûnallah we ni'mel wekîl) tê gotin: "Xwedê ji bo me çi xweş mewla û çi xweş arîkar e."

4 Qur'an, Zumer 39/53: "Hêviya xwe ji rehma Xwedê nebirin!" Temamê ayetê wiha ye: "(Resûlê min!) Tu vê gotina Min ji wan re bibêje: Gelfî bendeyên min ên ku ji ola xwe derketine! Hêviya xwe ji rehma Xwedê nebirin! Bêguman Xwedê tevekî gunehan dibore. Bêguman yê gunehjêbir, yê dilovîn her ew bi xwe ye."

Ji qe'rê dûzex nar mekey xamûş

1003. Sehabê lutfit er bikey nem nem  
Sed namey gunam meşûrû derdem

1004. Key namey gunam meşûrû sed yem  
Xeysê rehmetit kafî yen yek dem

1005. Îlahî bi zatit kes pey neberdit  
Bi qedrê qudret 'alem perwerdit

1006. Çun ji nefxê Sûr bîdarim bikey  
Bi sehray mehser ihmazrim bikey

1007. Daxil bi Eshabê Yemînim<sup>1</sup> bikey  
Sahib ixlasê yeqînim bikey

1008. Bi tehtê leway Ehmed cam bikey  
Şeffî'im Huseynê teşnekam bikey

1009. Merhûmê mexfûr hisabim bikey  
Ji badey la xewf sîrabim bikey

1010. Bi qehr û xezeb 'etabim nekey  
Ve elem e'hed<sup>2</sup> xitabim nekey

1011. Ve elem e'hed ileykum<sup>3</sup> neda  
Nekerîm ji rûy xezeb ey Xuda

<sup>1</sup> Yêñ ku roja qiyametê deftera e'melên wan di destê rastê da ye. bnr. Qur'an, Beled 90/13-18; Haqqe 69/19-20-21-24; İnşîqaq 84/7-9; Waqî'e 56/27-40.

<sup>2</sup> Qur'an, Yasîn 36/60: "Geli zarokên Adem! Erê ma (bi navgîna pêxemberan) me qewîfî li we nekiribû ku hûn şeytên nehebînin. Bêguman ew ji bo we neyarekî aşkera ye!"

<sup>3</sup> Qur'an, Yasîn 36/60: bnr. Berdewa ayeta jor.

1012. Hukm li xuzûhu *fegullû' nekey*  
*Summ-el cehîm we sellûhu<sup>2</sup> nekey*

1013. Zebanê min lal rûsîyam nekey  
Dest û pam ew ro bi guwam nekey

1014. Bidarîm bi hubbê Nebî û Ehlê Beyt  
*La tuziq qelbî be'de iz hedeyt<sup>3</sup>*

1015. Xuda min bendey naçîzê zelîl  
Gunahim kesîr ta'etim qelîl

1016. Çenim 'edalet mekerî kerîm  
Bibexşim bi lutf bi fezlê 'emîm

1017. Rûy rehmetit kirdî müştê xak  
*We el-'efû 'innî heyn el-qak*

Temmet-ud dîbaçeyê zîbaçe be 'ewni Melîk-ul mennan fî xamis Şehr-i Siyam yewm-ul erbe'a senet 1313 'ela yedd-ul heqîr-ul feqîr-ul 'asî-yul xatî-yul mezlûm wel cuhûl we-l muntezir bi şefa'etê Sibt-ur Resûl, Hezretê Ebî 'Ebdullah 'eleyhî selam, Muhemed Qulî Her-sînî cihetê yadîgarî tehrîr şod iltimasê du'a est.

<sup>1</sup> Qur'an, Haqqe 69/30: "(Tê gotin) Wî bigirin û bi zincîran (destên wî bi stûyê wî ve) girê bidin."

<sup>2</sup> Qur'an, Haqqe 69/31: "Paşê wî biavêjin nav agirê bipêt!"

<sup>3</sup> Qur'an, Ali İmran 3/8: "(Ewêna zana û pispor wiha dua dikin) Xwedayê me! Piştî te em anîn ser riya rast dilên me jê venegerîne. Ji cem xwe rehmê li me bike. Em bawer in ku yê pir dayende û bexşende her Tu yî."



Qabiliyeta berhemên daner ew e ku li ber bêrehmiya demê, bi awa-yekî mucîzewî xwe diparêzin û piştî sedsalan dîbin xelekek ji zin-cîreya kanona edebî. *Perîşanname*, yek ji wan berhemên yekane ye, ji çesnê mesnewiya dînî û ‘irfanî. Mela Perîşan di gel kûrahiyeka felsefî û ayînî, bi fexr û serbilindiya baweriya xwe, ji sedsala 14ê, mînakeka balkêş ji edebiyata mînor a zimanê kurdî, ji lehceya goranî/hewramî û li ser baweriya şî’ayê danzdeh îmamî pêşkêşî me dike. Ji ber hêmanên eşkere yên terza ‘ilm-el hûrûfê û qismen ji şopên tevgera hûrûfiyye, ji bo lêkolîna me ev berhema taybet hate hilbijartin.

Me di sê beşan da xebata xwe bir serî û hewl da ji dawiya sedsala 14ê nusxeyeka *Perîşannameya* Mela Perîşanê Dînewerî bi tîpêñ kur-dî-latînî, bi zarê kurmancî bidin nasîn û analîzeka naverokî li serê bikin ku sala 1896ê ji aliyê mustensîx Muhemmed Qulî Hersînî ve li gundekî Rojhilatê Kurdistanê hatiye nivîsîn û di nav arşîva rojhilat-nasekî da hatiye parastin. Di beşa yekem da li ser jiyan û baweriya Mela Perîşan, bajarê wî û pêwendiya wî di gel Şêx Recebê Bursî, temayêن sereke yên berhemê û şiroveyên naverokî hatin rêzkirin. Analîz û dahûrîna naveroka berhemê, gewdeyê xebata me pêk tîne

û beşa duyem li ser van tehlîl û raveyan e. Di beşa sêyem da jî bi alfabeşa kurdî-latînî transkripsiyonâ berhemê heye. Destxet zêdetirî hezar beytan di nav xwe da dihewîne û jêrenotên amadekarêن xebatê li ser ayet, hedîs, du'a, mezmun, kesayet û telmîhan, di gel çavkaniyêن xwe di binê transliterasyona beytan da cih digrin.

Di encama lêkolînê da şik û gumanêن me yên li ser agahiyêن derheq jiyana muellifê berhemê da babebaş nehatine berterefkirin. Dîsa jî vê xebatê armanca xwe ya sereke, yanê musbet danasîn û belavkirina *Perîşannameyê* eger pêk anîbe, cihê keyfxweşiyê ye. Ev xebata danasîn, dahûrîn û transliterasyonê, herwisa pêngaveka mutewazî ye ji bo destpêka temasekê di navbeyna destxetêن cuda yên lehceyên kurdî. Her çend gelekên wan nehatibin temamkirin jî, bi zêdehiya hejmara nusxeyên xwe yên berdest, şahesera Mela Perîşan, hêjayî edîsyon-krîtikêka berfireh e.

## ÇAVKANÎ

- Qur'an, *Wergera Qur'ana Pîroz bi Zimanê Kurdi*, wer. Mela Huseyn Esi, Mela Se'id Girdarî, Mela Muhemmed Bérkevanî, ç. 4, Şûra Yayınları, İstanbul, 2014
- 'Amîlî, S. M. E., *A'yân el-Şî'a*, c. 6, Dar-ul Te'aruf, Beyrut, 1983
- Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê-Dî edebiyata kurdî ya klasîk da*, Nûbihar, İstanbul, 2019
- Ahmedî, Cemal, *Tarîxê Edebiyatê Kordî Ez Axaz Ta Cengê Cîhaniyê Evvel*, Întişaratê Gotar, Seqiz, 2016
- Algar, Hamid, "Âl-e 'Abâ", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. I, Fasc. 7, 1984
- Algar, Hamid, "Cahârdah Ma'sûm", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. 4, Fasc. 7, New York, 1990
- Amîlî, Muhemmed bin Hesen bin 'Elî bin Huseyn el-Hurr, *Cewahir el-Sunnîyye fi l-Ehadîs el-Qudsîyye*, Nu'man, Necef, 1384
- Amir-Moezzi, "Note Bibliographique sur le Kitâb Sulaym b. Qays, le Plus Ancien Ouvrage Shi'ite Existant", Le Shi'isme Imamîte Quarante Ans Après, Hommage à Etan Kohlberg, sous la direction de Mohammad Ali Amir-Moezzi, Meir M. Bar-Asher, Simon Hopkins, Brepols, Belgium, 2009
- Amir-Moezzi, M.A., "La Perle Précieuse Attribuée à Rajab al-Bursî, Les 500 Versets Coranique au Sujet de 'Alî", di Ali, *Le Secret Bien Gardé*, CNRS Editions, Paris, 2020
- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, "La Préexistence de l'Imam", di *La Religi-*

*on Discrète, Croyances et Pratiques Spirituelles dans l'Islam Shi'ite*, Vrin, Paris, 2006

- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, "Notes a Propos de la Walâya Imamite", di *La Religion Discrète, Croyances et Pratiques Spirituelles dans l'Islam Shi'ite*, Vrin, Paris, 2006
- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, "Savoir C'est Pouvoir, Exégèses et Implications du Miracle dans L'Imamisme Ancien", di *La Religion Discrète, Croyances et Pratiques Spirituelles dans l'Islam Shi'ite*, Vrin, Paris, 2006
- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, "Seul l'Homme de Dieu est Humain, Théologie et Anthropologie Mystique à Travers L'Exégèse Imamite Ancien", *Arabica*, Vol. 45, No. 2, 1998
- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, Jambet, Christian, *Qu'est-ce que Le Shi'ism*, Fayard, Paris, 2004
- Amir-Moezzi, Mohammad Ali, *Le Coran Silencieux et le Coran Parlant, Sources Scriptuaires de l'Islam Entre Histoire et Ferveur*, CNRS Editions, Paris, 2011
- Amolî, Seyid Ebdilhuseyin Şerefeddîn, *Munazirat-i Şî'a ve Sunnî, tercüme-yi Farisi-yi El-Muracaat*, wer. Serdar Kabulî, Neşrê Sayê, Tehran, 1380
- Amolî, Seyid Heyder, *Cami' ul-Esrar ve Menbe' ul-Enwar*, muqeddime: Henry Corbin, Osman Ismail Yahya, tecumê: S. j. Tabatabâi, Muessimî el-Tarîx el-Erebî, Beyrût, 1426
- Amolî, Seyid Heyder, *Ness ul-Nusûs fî Şerhî Fusûs ul-Hikem*, teshîh: Henry Corbin, Osman Ismail Yahya, IFRI, Tehran, 1352
- Aqîlî, S. A., "Zuhûr-i Firqey Hûrûfiyye ve Tesîrat-i Fikrî ve Siyasiyê An Der Isfahan", *Mecelleyê Pejûheşhayê Tarîxiyê Íran ve İslâm*, hej. 10, 2012
- Aqtepî, Şêx Ebdurrehmanê, *Rewdin Ne'îm*, Weşanxaneya Spîrêz, Duhok, 2011
- Arikoglu, İsmail, "Ferişteoğlu'nun Cavidân-nâme Tercümesi: 'Îşk-nâme'" (teza doktorayê ya çapnebûyi), Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Van, 2006
- Bashir, Sh., *Fazlallah Astarabadi and the Hurufis*, Oneworld Publications, Oxford, 2005
- Bashir, Sh., *The Messianic Hopes and Mystical Visions, The Nûrbakhshîya Between Medieval and Modern Islam*, University of South Carolina Press, 2003
- Bekran, Muhammed bin Necîb, *Cihannuma*, be kûşêşê M.A. Riyahî, İnti şaratê Kitabxaneyê Îbn Sîna, Tehran, 1342
- Bîdakî, Hadî, "Fihristê Tewsîfê Mutûnê Xettîyê Kordî der Kitabxanehayê Íran-Menzûmehayê Dînî ve Aşıqane", *Keşkol*, c. 1, hej. 2, Tahran, 2016

- Bosworth, C. E., "Dînavar", *Encyclopaedia Iranica*, Vol. VII, Fasc. 4, 1995, New York
- Browne, E. G., *A History of Persian Literature-Under Tartar Dominion*, Cambridge University Press, Cambridge, 1920
- Bursî el-Hilli, el-Hafiz Receb, *Dîwan el-Hafiz Receb el-Bursî el-Hilli*, Tehqîq: S. M. el-Gayûrî, el-Tab'a el-Husayniyya el-Muqaddasa, Bagdad
- Bursî, el-Hafiz Receb, *Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Esrar Emir el-Muminîn*, Menşûrat Muessise el-E'lemî li-l Metbû'at, Beyrût
- Bursî, Hafiz Receb, *Meşariq Enwar el-Yeqîn fî Heqayiq Esrar Emîr el-Muminîn*, ji 'erebî bo farsî wer. E. M. Yezdî, Întişarat-i 'Ilmî Ferhengî Sahib el-Zeman, Tâhran, 1389
- Cebecioğlu, Ethem, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ağaç Kıtabevi, İstanbul, 1997
- Corbin, Henry, *En Islam Iranien, Aspects Spirituels et Philosophiques*, vol. III, *Les Fidèles d'Amour, Shî'isme et Soufisme*, Gallimard, Paris, 1972
- Corbin, Henry, *En Islam Iranien, Aspects Spirituels et Philosophiques*, vol. IV, *L'école d'Ispahan, l'école Shaykhie, le Douzième Imam*, Gallimard, Paris, 1972
- Corbin, Henry, *Histoire de la Philosophie Islamique*, Gallimard, Paris, 1986
- Corbin, Henry, *History of Islamic Philosophy*, wer. L. Sherrard, The Institute of Ismaili Studies, London, 1962
- Dawûdî, Said, Rostam Nîjhâd, Mehdi, 'Ashoora, Rîşê ha, Engîzê ha, Rûy-dad ha, Peyamed ha, Întişaratê Îmam Ali, c. 5, Qum, 1387
- Ehsâî, Ehmed bin Zeynedîn, *Cewami' ul- Kilem*, el-mucellid el-samin, Metbe'et el-Gedîr, Besre, 1430
- Ehsâî, Ibn Ebî Cumhûr, 'Evâlî el-le'alî fî l-Ehadîs el-Dînîyye, coz' ewwel, tehqîq: M. el-'Iraqî, Metbe'e Seyid el-Şuheda, Qum, 1403
- El-Behrânî el-İsfehânî, Ebdullah, 'Ewalîm ul-'Ulûm ve l-Me'ârif ve l-Ehwâl min el-Ayat ve l-Exbar ve l-Eqwal, c. 11/1, Muessise el-Îmam el-Mehdî, Qum, 1415
- el-Belazurî, Ehmed bin Yehya bin Cabir, *Ensab ul-Eşraf*, mucellid 1, tehqîq: M. B. el-Mehmûdî, Muessise el-E'lemî li l-Metbû'at, Beyrût, 1394
- el-Belazurî, Ehmed bin Yehya, *Futûl el-Buldan*, amd. A. Enîs el-Tebba', Muessise el-Muaf, Beyrût, 1987
- el-Eclûnî el-Cerrahî, İsmail bin Muhemmed, *Kesful-Xefâ ve Muzîl ul-El-bas 'Emma Eşteher min el-Ehadîs 'ela el-Sinnet el-Nas*, Mekteb ul-Qudsî, Qahire, 1351
- el-Eyyâşî, Şeyx Ebî Nezr Muhammed bin Mesûd, *El-Tefsîr*, el-cuz' el-sanî, Muessise el-Bî'se, Qum, 1430

- el-Hakim el-Nîsabûrî, *el-Mustedrik 'ele el-Sehîheyen*, el-mucellid el-rabi', Dar ul-Tasîl, Qahire, 1435
- el-Hilâlî, Suleym bin Qeys, *Kitab Suleym bin Qeys*, Tehqîq: M.B. Ensârî, Teb' Xamis, Delîl Ma, Qom, 1428
- el-Hillî, Hesen bin Yusif bin Mutahhar, *Kesf ul-Yeqîn fî Fezayil Emîr el-Muminîn*, tehqîq: H. Dergahî, el-Teb' el-Ûla, Tehran, 1411/1991
- el-Mazenderanî, Muhammed Salih, *Şerhî Camî'î el-Kafî el-Usûl ve l-Rewze li Siqet ul-Îslam Ebî Ce'fer Muhammed bin Ye'qûb el-Kuleynî*, me'e te'lîqat E. el-Şe'rânî, el-Mekteb el-Îslamiyye, Tehran, 1386
- el-Qundûzî el-Heneffî, Suleyman bin Îbrahîm, *Yenâbî' el-Mevedde*, el-teb'e el-Sabi'e, Menşûrat el-Heyderiyye ve Mektebetuha fî el-Necef el-Eşref, 1384/1965
- *el-Sehîfet el-Kamilet el-Seccadiyye*, Întişaratê Ensariyan, Qum, b. t.
- el-Sened, Muhammed, *el-Îmamet el-Îlahiyye*, telîf: M. R. Sa'idî, el-coz' el-sanî, el-Emîret, Beyrût, 1433
- el-Teberî, 'Imadeddin, Hesen bin 'Eli bin Muhammed bin 'Eli bin el-heserî, *Kamilê Behayî*, tehqîq ve teshîh: E. Sefderî Qezwînî, Întişaratê Murtezîwî, Tehran, 1383
- el-Teberî, Muhammed bin Cerîr, *Tarîx el-Rusul ve l-Mulûk*, cild 4, tercumê A. Payandeh, çap 3, Întişaratê Esatîr, Tehran, 1363
- el-Tebrîsî el-Nûrî, Huseyn, *el-Necm ul-Saqîb fî Ehwal el-Îmam el-Huccâ el-Galib*, tehqîq: S. Y. Musavî, Enwar Huda, Qum, 1415 / Şêxê Sedûq, Ebî Ce'fer ibn Babûye, *Kemal el-Dîn ve Temam el-Nî'me*, tehqîq: H. A'lâmî, Muessise el-E'lemî li l-Metbûat, Beyrût, 1412
- Emînî Necefî, Ebdilhuseyin, *El-Gedîr fî el-Kitab ve l-Sunne ve l-Edeb*, Muessise el-E'lemî li-l Metbûat, Beyrût, 1994
- Erbilî, Ali bin Isa, *Kesf ul-Xeme fî Me'rîfet ul-E'imme*, muheqqiq-museh-hih: H. Rasuli Mahallati, c. 2, Neşr-i Benî Haşimî, Tebriz, ç. 1, 1381/2002
- Fuad, Kamal, *Kurdische Handschriften-Verzeichnis der orientalischen Handschriften in Deutschland*, Wiesbaden, Deutschland, 1970
- Gölpinarlı, Abdülbaki, *Hûrûfîlik Metinleri Katalogu*, TTK Basimevi, Ankara, 1973
- Gölpinarlı, Abdülbaki, *Tarih Boyunca Islam Mezhepleri ve Şîâlik*, Dar Yâynları, 2003
- Güngör, Ş., "Maktel-i Hüseyin". dnd. *Islam Ansiklopedisi*, c. 11, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2003
- Hakim Nişabûrî, Ebî Ebdîllah Muhammed bin Ebdîllah, *Mustedrek, el-eucz' salis, Kitab el-Hicre, Kitab el-Mexâzî ve l-Suraya, Kitab Me'rîfet ul-Se habe*, Dirase ve tehqîq Mustefa Ebdîlqadir Eta, Li Neşr Kutub el-Sunne ve

- I-Cema'e, Dar ul-Kutub el-İlmîyye, Beyrut, Lubnan, 1422/2002
- Hosseini Abbariki S. Arman, "Yaftehayi Novîn Derbarê Ehval ve Eş'arê Molla Perîşan", *Journal of Kurdish Literature*, Spring and Summer 2021, Vol. VII, No. 1, serie 11
  - Huart, Cl., "Duldul", *EI2*, Vol. II, 1965
  - Ibn Bitrîq, 'Umde, 'Uyûn Sîhah el-Exbar, tehqîq: M. el-Mehmûdî, Î. el-Behadurî, el-coz' el-ewwel, Muessise el-Îmam el-Sadiq, Qum, 1412
  - Ibn Ebdulbirr, Ebî 'Umer Yusif bin Ebdîllâh, *el-Istî'ab fî Me'rîfet ul-Eshab*, sehhehe ve xerrece ehadîsehu: A. Murşîd, Dar ul-E'lâm, Urdun, 1423
  - Ibn Ebî el-Hedîd, Şerhê Nehc ul-Belâxe, el-Mucellid 'Aşîr, tehqîq: M. İbrâhîmî, Dar ul-Kitâb el-Xerbî, Bagdad, 1428
  - Ibn Esîr, Izzeddîn, *El-Kamil*, cild 3, tercumê S.H. Rûhanî, İntişaratê Esatîr, çap 3, Tehran, 1383
  - Ibn Qûlûye, Ebulqasim Ce'fer bin Muhemmed bin Ce'fer bin Mûsa, *Kamil ul-Ziyarat*, Dar ul-Hucce, Qum, 1435
  - Isfehanî, Hafiz Ebî Ne'im Ehmed bin Ebdîllâh, *Hilliyet ul-Ewliya ve Tebeqat ul-Esfîya*, el-coz' el-rabi', Dar ul-Fîkr, Qahire, 1416
  - Jafariyan, R., *Tarîxê Teşeyyu' der Êران, ez Axaz ta Tulu'ê Dewletê Sefewî*, Neşrê Ilm, Tehran, 1388
  - Karaismailoğlu, Adnan, "Sâkînâme", dnd. *Islam Ansiklopedisi*, c. 36, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2009
  - Kuleynî, Muhammed bin Yaqub, *Üsûl el-Kâfi*, c. 1, (wer. M. B. Kemereyî), İntişarat-i Uswe, Tahran, 2008
  - Kuleynî, Muhammed bin Ye'qûb, *Usul el-Kâfi*, el-coz' el-ewwel, Menşûrat el-Fecr, Beyrût, 1428
  - Lammens, "Le Triumvirat Aboû Bakr, 'Omar et Aboû 'Obaida", *Mélanges de la Faculté Orientale de l'Université St. Joseph de Beyrouth*, vol. iv, 1910
  - Lawson, Todd, "The Dawning Places of the Lights of Certainty in the Divine Secrets Connected with the Commander of the Faitful by Rajab Bursî (d.1411)", di *The Heritage of Sufism* (vol. 3): *The Legacy of Medieval Persian Sufism (1150-1500)*, ed. Leonard Lewisohn, Oneword Publications, Oxford, 1999
  - Lory, Pierre, "Souffrir Pour La Vérite Selon L'ésotérisme Chiite de Rajab Borsî", di *Le Shi'isme Imâmîte Quarante Ans Après, Hommage à Etan Kohlberg*, sous la direction de Mohammad Ali Amir-Moezzi, Meir M. Bar-Asher, Simon Hopkins, Brepols, Belgium, 2009
  - Macit, Muhsin, "Münâcât", dnd. *Islam Ansiklopedisi*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2006
  - Madelung, Wilferd, *The Succession to Muhammad, A Study of the early*

*Caliphate*, Cambridge University Press, 2004

- Meclisi, Muhemmed Teqî, *Rewzet ul-Mutteqîn fi Şerhê Men La Yehzurehû l-Feqîh lil-Sedûq*, el-coz' el-salis, Dar ul-Kutub el-İslamî, Qum, 1429
- Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar*, Kitab tasi' 'eşere, *El-Qur'an ve l-Du'a*, İhya el-Kutub el-İslamiyye, Qum, 1388
- Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar*, Kitab xamis' eşere, *El-Îman ve l-Kufr ve Mekarim ul-Exlaq*, el-qism sanî, İhya el-Kutub el-İslamiyye, Qum, 1388
- Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, *Bihar ul-Enwar, el-Cami'a li l-Durer Exbar el-E'immet el-Ethar*, c. 58, Dar İhya el-Teras el-'Erebî, Beyrût, 1403
- Meclisi, Şêx Muhammed Baqir, *Zad ul-Me'ad, veyluhu Kitab Miftah ul-Cinan*, te'rîb ve te'lîq: E. E'lemî, Muessise el-E'lemî li l-Metbu'at, Beyrût, 1434
- Mewlana, Celaleddîn M. B., *Mesnewî*, amd. Tewfiq Subhanî, İntişaratê Rozeneh, Tahran, 1378
- Mewlana, Celaluddîn Muhammed Belxî el-Rûmî, *Mesnewî Me'newî*, tes-hîh: M. A. Movahhid, c. 1, ç. 2, İntişaratê Hermes, Tahran, 1396
- Meybûdî, Ebûlfezî Reşîdeddî, *Kesf ul-Esrar ve'det ul-Ebrar*, Me'rûf be Tef-sîrê Xwace Ebdullah Ensarî, c. 3, amd. A. A. Hikmet, İntişarat Emîr Kebîr, Tahran, 1376
- Mir-Kasimov, Orkhan, "Esoteric Messianic Currents Of Islamic East Between Sufism and Shi'ism (7<sup>th</sup>/19<sup>th</sup> -6<sup>th</sup> /15<sup>th</sup> Centuries)" di *L'ésotérisme Shi'ite, Shi'i Esoterism, Sous La Direction de Mohammad Ali Amir-Mo-ezzi*, édité avec: Maria de Cillis, Daniel De Smet, Orkhan Mir-Kasimov, Brepols, Belgium, 2015
- Modarressi, Hossein, *Crisis and Consolidation In The Formative Period of Shi'ite Islam, Abû Ja'far ibn Qiba el-Râzî and His Contribution to Imâmite Shi'ite Thought*, The Darwin Press Inc., Princeton, 1993
- Momen, Moojan, *An Introduction to Shi'i Islam*, Yale University Press, Connecticut, 1985
- Mufid, Ebû Ebdillah Muhammed bin Muhammed bin Nu'man, *el-Işşad fi Me'rîfet Huvec Ellâh 'ele l-'Ibad*, el-coz' el-sanî, Muessise Al el-Beyt li İhya el-Teras, Beyrût, 1416
- Mufid, Muhammed bin Muhammed bin Nu'man, *El-Ixtisas*, be kuşeshê A. A. Gaffarî, Cemaet el-Muderrisîn fi Hewze Ilmiyye, Qum, b.t.
- Muheqqiq Kerekî, Elî bin Huseyn, *Resayîlê Kerekî*, c. 3, amd. M. el-Hesûn, Muessise el-Neşr el-İslamî el-Tabî'a li Cemaet el-Muderrisîn bi Qum, b. t.
- Musahib, G., *Dayiret ul-Me'arifî Farsî*, c.1, İntişaratê Amir Kebîr, ç. 3, Tehran, 1381

- Muzaffer, Muhammad Riza, *el-Seqîfe*, Muessimâ Ensariyan Li l-Tiba'e ve l-Neşr, Qum, 1415
- Nubextî, Hesen bin Mûsa, Qomi, Sa'd bin Abdullah, *Fîreq el-Şî'a*, teshîh: A. el-Hefenî, Dar el-İrsad, 1412
- Panahloo, Omran, İhtişaminia, Mohsen, "I'tiqadat-i Îmamiyye der Hewzê Îmamet ez Menzerê Hafiz Receb Bursî", *Feslnamê Ilmî-Pejûhişî Pejûhiş-hayé I'tiqadî-Kelamî*, sal 9, şomarê 34, Tabistan 1398
- Qazî Se'îd Qumî, Muhemmed Se'îd bin Muhemmed, *Şerh ul-Erbe'in*, teshîh: N. Hebîbî, Neşrê Mîrasê Mektûb, Tehran, 1379
- Qumî, Şeyx 'Ebas (berhevkar), *Mefâtîh el-Cinan*, (bê tarîx, bê cih)
- Qumî, Şeyx 'Ebbas, *Muntehî ul-Amal fî Tewârîx el-Nebî ve l-Al*, el-coz' el-elewel, Dar ul-Mustefa el-'Alemîyye, Beyrût, 1432
- Sahib bin 'Ibad, *Dîwan el-Sâhib bin 'Ibad*, tehqîq: İ. Şemsedîn, Menşûrat Muessise el-E'lêmî li l-Metbû'at, Beyrût, 1422
- Schimmel, Annemarie, *The Mystery of Numbers*, Oxford University Press, New York, 1993
- Sedûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, 'Uyûn Exbar el-Riza, coz'ê sanî, İntişaratê el-Şerîf el-Rezî, Qum, 1378
- Sedûq, Muhammed bin 'Eli bin Huseyn bin Babûye, *Men La Yehzurehû l-Feqîh*, el-coz' el-rabi', Muessise el-E'lêmî li l-Metbû'at, Beyrût, 1406
- Sedûq, Muhammed bin Elî bin Huseyn bin Babûye, *el-Tewhîd*, tehqîq: H. Huseynî Tehranî, Muessise el-Neşr el-Îslamî, Qum, 1430
- Şeybî, Kamil Mustafa, *Hembestegî Miyanê Teşeyyu' ve Tesewwuf*, tercumê A. A. Shahabi, İntişaratê Danişgahê Tehran, 1354
- Şeybî, Kamil Mustafa, *Teşeyyu' ve Tesewwuf Ta Axazê Sedê Dewazdehumê Hicrî*, tercumê A. Zekavetî Qaragozloo, İntişaratê Amir Kabir, Tehran, çap 5, 1387
- Seyyidi, S. H., Înayetî Rad, M. J., Huseyni Şahrûdî, M., "Berresî Mefhûmî Guluw der Nezeriyatê Welayî Hafiz Receb Bursî", *Costarhayî der Felsefe ve Kelam*, sal 49, şomarê peyapey 98, 1396
- Subhanî, J., *Mosû'ê Tebeqat el-Fuqeha*, c. 9, Mu'essisey-i Îmam Sadiq, Qum, 1418
- Şûşterî, Qazî Nurullah, *Mecâlis el-Muminîn*, cild 2, Kitabfîrûşî İslamiyye, Tehran, 1377
- Tebrisî, Ebî 'Ali el-Fezl bin el-Hesen, *Mecme' ul-Beyan fî Tefsîr el-Qur'an*, el-cuz' el-samin, Dar ul-Murteza, Beyrût, 1427
- Tek, Ayhan, "Kolektif Bellekte Kırılma ve Yeniden İnşa Olarak Kerbela Yası", *Monograf*, hej. 11, 2019, İstanbul
- Tek, Ayhan, *Hamîsiz Şair Babasız Metin*, Nûbihar, İstanbul, 2018

- Temo, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, c. 1, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2013
- Toprak, Mehmet, "Cevşen". dnd. *İslam Ansiklopedisi*, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 1993
- Türkoğlu, S., "Türk Edebiyatında Maktel-i Hüseyinler ve Bekâî'nin Kitâbî Kerbelâ Mesnevisi", *A. Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, hej. 58, Ankara, 2017
- Tûsî, Ebî Ce'fer Muhammed bin Hesen bin 'Elî bin Hesen, *Misbah ul-Mûctehid*, Muessise Fiqh ul-Şî'a, Beyrût, 1411
- Umerayî, İ. X., *Şerh-i Dîvan-i Molla Perîşan*, amd. E. Xezenferî, İntişaratê Şapûrxwast, Xuremabad, 2008
- Usluer, Fatih, *Hurufilik İlk Elden Kaynaklarla Doğuşundan İtibaren*, Kâbalci Yayıncılık, İstanbul, 2014
- Vali, Shahab, "Mefhûmê Pîr der Fermanê Mensûb be Îmam Sadiq", *Cawîdan Xired*, dowrê Cedîd, şomarê 6, 1389
- Vali, Shahab, "Negahî be Fermanê Mensûb be Îmam Sadiq", *Meskûye*, Danışgahê Azadê İslâmî Şehrê Rey, şomarê 5, 1385
- Vali, Shahab, *Kurdên Yarsan-Dîrok û Mîtolojî*, wer. S. Orak Reşitoğlu, Weşanê Avesta, Stembol, 2018
- Xeza'ul-Arifîn, "Mecmûa-i 'Ilmî ve 'Irfânî ve Felsefi", amd. Ali bin Muhammed Baqîr el-Darneğanî'ul-Esl-i Kirmanşahî Mesken, Kitabxane-i Meclîs-i Iran, Tehran, 1334
- Xeznedar, M., *Mejûy Edebî Kurdi*, c. 2, Dezgây Aras, Hewlêr, 2010
- Yavuz, Yusuf Şevki, "Gulüb", dnd. *İslam Ansiklopedisi*, c. 14, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara
- Ye'qûbî, Ehmed bin İshaq, *Tarîxê Ye'qûbî*, c. 1, Tercumê M. İ. Ayetî, İntişaratê 'Ilmî ve Ferhengî, Tehran, 1382
- Zibacûyî, Feth'elî Heyderî, *Dîvan-i Molla Perîşanê Kurd*, Çap-i Muhemmedî, Kirmanşah, 1916

## ÇAVKANIYÊN ELEKTRONÎK

- MacKenzie, D. N., *Gurani*, Encyclopaedia Iranica, Vol. XI, Fasc. 4, 2012, II.  
401-403, <https://www.iranicaonline.org/articles/gurani>, (20.11.2022)
- Temo, Selim, *Fuzulî'nin 'Kürtçe' Şiirleri*, 2016, <https://www.gazeteduvar.com.tr/kitap/2016/12/01/fuzulinin-kurtce-siirleri>, (20.11.2022)
- Staatbibliothek zu Berlin, Digitalisierte Sammlungen, 2014, [https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht?PPN=PPN781376718&PHYSID=P\\_HYS\\_0001&DMDID=&view=picture-toolbox](https://digital.staatsbibliothek-berlin.de/werkansicht?PPN=PPN781376718&PHYSID=P_HYS_0001&DMDID=&view=picture-toolbox) (20.22.2022)

## FERHENG

'edad:	hejmar	dûn:	1. kiras, 2. payenizm, bêqîmet
'edû:	neyar, dijmîn	duwît:	dubendî, duserî
'emayim:	mela, şâşikspî	duwom:	duyem
'ewam:	xelk, gel	emrax:	murx, balinde
ama:	hat	enguşt:	tilî, pêçî
ba:	bila, ji bo ku	eray:	ji bo
babuha:	deriyê wî	erbab:	1. mirovên mezin 2. pêşeng 3. hoste
bayed:	divê, lazim e	evvelin:	destpêk, ya 'ewil
be'd:	piştî	ewsaf:	prj. taybetî, wesf
be'zî:	hinek	ewset:	yêñ vasat, navincî
bendegî:	koletî, xulamtî	ewseteha:	yêñ vasat, yêñ li ortê
berzex:	araf	eyyam:	dewr, qern, qonax
beza'et:	sermiyan	faq:	jor, bilindahî
bezm:	meclisa suhbetê	ferma:	kerem kir, got
biçîman:	em biçin	fermûdey:	gotinên wî
billûhîyyet:	ehmeqî, nezanî	ferş:	erd
birûz kerd:	eşkere kir	fesl:	beş, demsal
bugzer:	dev jê berde, guh nedê	firûzenî:	geşbûna agir, çirûskvedan
bûs:	maçîk	gam:	gav
ca:	cih	gerdiş:	gerîn, zivirîn
cehl:	nezanî	gişt:	giş, hemû
cenbe:	alî, teref	gûsale:	golik
çenî:	li gel, pê re, çendî	guwah:	şahid, yê ku dîtiye
çeniş:	giş, her tiş	hudûs:	piştre avabûn
çerx:	felek, dewran	huş:	hiş, aqil
cuft:	cot	husn:	bedewî, spehîtî
çun:	wekî, şubhî	ibtida:	destpêk
dared:	heye	ifrat:	zêdegavî, ji heddê derketin
daşt:	hebû	ifsad:	fesadî, bêbextî
daşten:	xwedîbûn, girtin	înfikak:	cudahî, dûrketin
derc:	qeydkirin	ittihad:	yekbûn
derk:	gehiştina mebestê, bidestve-anîn	ixraq:	mubalexe, lêzêdekirin
deryûze:	parsek, xwazok	jerf:	kûr
dewab:	dewarêñ siwariyê, prj. dab-be	jîy / ji ëy:	ji wî / ji wê
		kam:	kîjan

**kaşten:** çandin  
**kelab:** xwediyê kûçik, yê ku tajiyê  
nêçîrê digre  
**kemûn:** xef, xwe veşartin  
**kerrat:** dubare, tekraren  
**kerrûbiyan:** çar milyaketên mezin  
**kirdîş:** wî/wê kir  
**kîş:** dîn, bawerî  
**la yetenahî:** bê dawî, ebedî  
**lahûtî:** xudayî, pîrozwerî  
**lamekan:** bê cih û war  
**le beyn:** di navberê da  
**lew:** lewma, ji ber wê  
**lîk / leyk / leykin:** lê, lêbelê  
**mabeqî:** yêñ mayî, tiştên dîtir  
**maçam:** dibêjim  
**maçan:** dibêjin  
**medê:** dide  
**mehrem:** qedexe, kesê taybet  
**mekem:** dikim  
**melfûz:** ya hatî gotin, lefza hatî  
bilîvkirin  
**menîşîş:** kirinêñ wî/wê  
**mesdûd:** girtî, sînorkirî  
**meşîyiş:** meşa wan, rêveçûna wan  
**meşîyyet:** daxwaz, îrade  
**metbû'êm:** bi dilê min  
**metleb:** mijar, mesele, armanc  
**mexzûb:** yê xezeb lê bûyî, telef  
**mezanî:** dizanî  
**mişareke:** şîrîkatî  
**misdaq:** pîvan, rêje  
**mubîn:** zelal, eşkere, vekirî  
**mucessem:** heyî, bi cism û hebûn  
**mucrim:** gunehkar  
**mudde'a:** tişta ku tê îddiakirin  
**mufsid:** fesad  
**muft:** bêpere, belaş

**muhat:** eşkerekirî, dorgirtî  
**muhît:** yê her tiştî dizane, îhate dike  
**muhkem:** qewî, saxlem  
**muje:** mûçav  
**mulûk:** xwedî, pirhejmara 'malik'  
**mumeyyîz:** yê ku temyîz dike, ji  
hev derdixe  
**munderic:** naverok, di nav tiştî  
da binecihkirî  
**munkir:** înkarker, ne-bawermend  
**munqelib:** guherandî, qulubandî  
**muqeyyed:** qeydkirî, girêdayî  
**mûşikâfi:** karê bi baldarî, bi kitekit  
**mustecme'i:** berhevkirî, lêkdayî  
**mustehzer:** çêkirî, hazirkirî  
**muşteq:** yê ku dixwaze, xwedî iştî  
yaq  
**mustexnî:** çavtêr  
**mutabiq:** 1. lihevkirî, 2. guncaw  
**mutemennî:** yê ku dixwaze, te-  
mennî dike  
**muteqqedis:** qudsî, yê ku hatiye  
pîrozkirin  
**mutessefil:** yê ku heyf lê hatiye, zi-  
yanbûyî  
**mutte'arif:** navdar, naskirî, yê ku tê  
zanîn  
**muvech:** bi şan û 'ezeme, mezin,  
pîrozwer  
**muxtes:** taybet, 'aydê yekî, xaseten  
**muzennib:** gunehkar  
**naşî:** ciwan, cahil  
**nasûtî:** beşerî, dinyewî  
**nedaşten:** xwedînebûn  
**nehw:** rêziman, gramer  
**nemevat:** nedigot  
**neşnewî:** nebîhîzî, seh nekî  
**nessê ayet:** mebesta ayetê, ayeta

eskere	teşerru': reftarêن li gor hukmên şeri'etê
nezerbazî: lénérîn, temaşekirin	teserrafil: kirin, reftar
nigah: nêrîn	tewlid: welidandin, xuliqandin
nişt: rûnişt	texyîr: xirakirin, guhertin
nîz: jî	ulûhîyet: pîrozwerî, xudayî
nubûwwet: pêxemberî	ûrûc: bilindbûn, firîna ber bi jor
pehlû: ran, kemax	uzletguzîn: yê ji tenêtiyê hez dike, munzewî
perî: jî bo	va mend: wisa ma
perît: jî bo te	vat: got
qale: got	vatim: min got
qews-i nizûl: nîv-dayreya ber bi jêr	ve: bi
qews-i si'ûd: nîv-dayreya ber bi jor	vî / ve ûy: bi wî / wê
qidem: qedîmbûn, pile, radde, de- rece	wechûhû: rûyê Wî, cemalê Xwedê
qurresî: kûrahî	welayet: nûnertî, berpirsyarî
raki' û sacid: rukû û secdeya nimêjê	wicûbiş: hewceyî, lazimbûn
randin: renîn, teraştin	wird: pistepist, du'a
remîn: pez	wuhuş: prij. wehşî, kovî
saye: sih, sîber	xasib: xesbkar, yê ku dest daniye ser
sebteynit: her du kur (Hesen û Hu- seyن)	xecil: fediyok, şermoke
selb: winda, jiholêrabûyî	xel'et: cilê ku wek diyarî hatiye dayîn
semend: hespê beza	xetiş: xeta wî/wê
serf: kirin, reftar	xeyr-ul kelam: baştirîn, xêrtirîn gotin
sevaullah: ji xeynî Xwedê her tişt	xeyr-ul umûr: baştirîn, xêrtirîn kar
sewad: tarîti	xor: tav
şinaxten: sehkirin,bihîstîn	xud: xwe
şineft: bihîst, seh kir	xurden: xwarin
sinn: temen, sal	xurreşî: famkorî
şita': zivistan	xutut: prij. xet, xêzêن nivîskî
şitaft: revî, bezî	yafaten: wergirtin, têgehiştin, pey- dakirin
şutur: deve	yed-i qudret: destê qudretê
te'mîm: qanûn, rêzik	zill: sih, sîber
tefrît: lipaşmayîn, têrnekirin	zuwan: ziman
temcid: paşîv	
temşîyyet: pêkanîn, birêvebirin, îcrakirin	
terdîd: zede kirin, şik, dudîlî	

**Perîşanname**

**Mela Perîşanê Dînewerî**

**Shahab Vali & Erol Şaybak**

[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)


[avestayayinlari@yahoo.com](mailto:avestayayinlari@yahoo.com)

<https://twitter.com/avestayayin>

<https://instagram.com/avestayayin>

<http://www.youtube.com/avesta1995>

<http://www.facebook.com/wesanenavesta>



**p**erîşanname, xaseten li Rojhilat û Bakurê Kurdistanê bûye mijara gelek lêkolînên edebî û mensûbiyeta ‘tevgera hûrûfiyye’ ya muellifê wê Mela Perîşanê Dînewerî jî tê de, gelek îddiyayê mezin li ser vê berhemâ balkêş hatine nivîsîn. Pisporêñ edebiyata kurdî li ser cureya metnê û nasnameya muellifê wê, fîkrêñ dûrî hev pêşkêş kiribin jî, heta roja îro nusxeyeka sehîh ji berhemê nehatiye belavkirin.

Li gor tarîxa nivîsîna berhemê û çavkaniyêñ berdest, Perîşan-name di sedsala 9ê koçî ango di sedsala 14ê mîlâtî de hatiye nivîsîn û kevtirîn mesnewiya bi zimanê kurdî ye ku heta niha gihiştiye destêne me. Berhem, bi temamî pabendê baweriya ‘Mezheba Şî’â’ ye û muellifê wê Mela Perîşan, şeyxul îslame-kî kurd e. Naveroka Perîşannameyê bi gelek bûyer û temayêñ sereke ji tarîxa dînê Îslamê, nemaze li ser îsbatkirina heqaniyet û welayeta zavayê pêxember, xelîfeyê çarem ‘Elî bin Ebû Talib hatiye dariştin.

Di gel hejmara zêde ya nusxeyêñ berhemê, heta niha bi şerh û şiroveyeke qanehker nusxeyeke kamil nehatiye çapkiran. Ev xebata li ber destê we, danasîn, şirove û ronkirinek e li ser hezar beytên Perîşannameyê ku berhemeka yekane ye ji gencîneya veşartî ya edebiyata kurdî ya klasîk.

